

"Herçî bire şûrî destê hîmnet  
Zebt kir ji xwe re bi mêrî dewlet  
Bê ceng û cîdal û bê tehevwir  
Qet vê şûxlê mekin tesewwir"  
-Ehmedê Xanî-

# REWŞEN

Hejmar  
5

Buha: 5.-DM

Payiz 1990

Kovara Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan

- Hevpeyvînek Di Gel Casimê CELÎL
- Dîmenek Ji Jînenîgariya Îsmail BEŞÎKÇÎ
- Kovarek Ji Nav Tariya Zindana Dagîrkeran - ŞEQWA BERXWEDAN
- Hevpeyvînên Angelika BEER û Marko TRONTI Di Gel Îsmail BEŞÎKÇÎ
- Kurd û Kurdistan - Berê 112 Salan Bi Çavên Biyaniyan  
/ FR. Von HELWALD & L. C. BECK

TEWAN  
Û  
TOLE  
LI  
KURDISTANÊ  
- IV -

A. Dicle

- Ehmedê Xanî - Rewanê gel, hunera vehûnana helbestan / R. Cîzîrî
- Niştimana xwe binase / Piştîwan B.
- Tenbûrên kurdî / Gulê Silopî
- Ji hunerên çerxa 15 / B. Botanî
- Folklordê zazakî (dimilkî) ra çend nimûney / J. Espar
- Berxwedankarî û gerdenazadiya Emê GOZÊ / R. Dengîr
- Çend têbîniyên li ser ziman û wêjeya klasîkî / M. Şevhat
- Qonsolosxaneyên iraqî û gotinên pêşiyên / G. Çiyan



# Rewşen

## REWŞEN

KOVARA YEKÎTIYA REWŞENBÎRÊN  
WELATPARÊZÊN KURDISTAN E.

KOVAREKE KURDÎ YA ÇANDÎ, HUNERÎ,  
WÊJEYÎ, DÎROKÎ Û RAMYARÎ YE.

SALÊ ÇAR CARAN DIHÊ WEŞANDIN.

XWEDÎ Û BERPIRSIYARÊ  
KARÊN WEŞANDINÊ:

### YRWK

(Yekîtiya Rewşenbîrên  
Welatparêzên Kurdistan)

Max Str. 50 - 52  
5300 Bonn 1- BRD

Tel: (0228) 63 09 90

RÊZKIRINA NIVÎSAN:  
Weşanên **REWŞEN**



Navnîşana  
Kovara **REWŞEN**:  
Max Str. 50 - 52  
5300 Bonn 1- W. GERMANY


DI WARÊ NIVÎSARÊN  
JI KOVARÊ RE HATI DE,  
DEMA DAXWAZEK NE HATIBE  
DAXUYANIKIRIN,  
WÊ GAVÊ  
MAFÊ SERRASTKIRIN,  
WEŞANDIN AN  
NE-WEŞANDINA NIVÎSARAN,  
YÊ SERNIVÎSARIYA  
KOVARA **REWŞEN** E.

JI KOVARA **REWŞENê**  
3000 NIMÛNE ÇAP DIBIN

### BUHA :

5.- DM / 20.- SEK / 1.- £ / 5.- SFR  
15.- DKR / 20.- NKR / 15.- FF

GELÎ XWENDEVANAN  
BIBIN ABONEYÊN **REWŞENê**



**REWŞENê** BIXWÎNIN

**REWŞENê** BIXWAZIN

**REWŞENê** BELAV BIKIN

**REWŞENê** Re BINIVÎSIN

TEVLÎ XEBATÊN **REWŞENê** BIBIN

## KARTA ABONETIYÊ

Ji KEREMA XWE RE  
JI HEJIMARA ..... PÊ VE  
MIN BIKIN ABONEYÊ/A  
KOVARA **REWŞENê**

Nav: .....

Paşnav: .....

Navnîşan: .....

Bank:  
Ekram Nassan  
Postgiroamt Koln - BRD  
Konto Nr: 21 21 14 - 504

Aboneyên hêja,  
Vî cihî dagirin û tevî kopiyeka  
pelê razandina beramberê  
20.- DM yan jî 35.- DM pere  
bişînin ser navnîşana YRWKê.

**Buhayê abonetiye di salê de: Almanyaya 20.- DM, Welatên din 35.- DM**






Rûpel 8 - 18



Rûpel 19



Rûpel 48


## NAVEROK

## Rûpel

Name ji xwendevanan re .....	4
Nameyên Xwendevanan .....	5 - 7
Hevpeyvînek di gel Casimê CELÎL .....	8 - 18
Dîmenek ji jînenîgariya Îsmail BEŞÎKÇÎ .....	19
Hevpeyvînen Angelika BEER û Marko TRONTÎ- Di gel Îsmail BEŞÎKÇÎ .....	20 - 24
Çend têbîniyên li ser ziman û wêjeya klasîkî / M. Şevhat .....	25 - 29
Folklorê zazakî ra çend nimûney / J. Eşpar .....	30 - 33
Tewan û tole li Kurdistanê / A. DÎCLE .....	34 - 37
Ehmedê Xanî - rewanê gel, hunera vehunana helbestan / R. Cizîrî .....	38 - 43
Ji hunera çerxa 15 / Beşîr Botanî .....	44 - 45
Qonsolosxaneyên iraqî û gotinên pêşyan / Gabar Ç. ....	46 - 47
Tenbûrên kurdî / Gulê Silopî .....	48
Niştimana xwe binase: Hewlêr / Piştîwan B. ....	49
Kurd û Kurdistan-Berê 112 salan bi çavên biyaniyan / THUNMAN-HELLWALD	50 - 53
Helbest / Hozan .....	54 - 56
Ji Rohilata Navîn çend teraqên hingivîn / Resûl .....	57 - 59
Ozal û Bush û Reagan / Kurdo .....	60
Kovarek ji nav tariya zindana dagîrkeran - ŞEWQA BERXWEDAN .....	61
Xaçatûr Abovyan û pirtûkeka wî ya bi navê "Kurd-Êzdî" / B. Izet .....	62
Berxwedankarî û gerdenazadiya Emê GOZÊ / R. Dengîr .....	63 - 66
Bang û vexwendinek - Ji vekolîner, hunermend, dîroknas û zanyarên Kurdistanê re	67



Rûpel 49



Rûpel 50 - 53

## REWŞEN

## Xwendevanên hêja

Dîsa ezmanê Kurdistanê dibe mij û dûman. Dîsa bêhna barûda kutayî xwe li poz û bêvilan dixê. Dîsa gurme - gurma ewran û şîqe - şîqa brûskan e, ezmanan vediciniqînin. Dengê gavên gerîllayên me yên qehreman, paytexta dijmin ji binî ve dileqînin û zingila azadiyê bilind dikin. Êdî ew Kurdistanê ku ji bo me bûye jiyana, bi kincên bûkan xwe ji me re dixemilîne û xwe ji bo roja binê amade dike. Kêlî bi kêlî, dem bi dem, roj bi roj, girsên gelê me, ji bo rizgarbûna ji zencîrên xwe yên koletiyê, serî li raperînan dixin û bêhtir û perwa, bi kevir û kuçik, bi dar û dep, bi çekên xwe, di hajan ser dijminê kedxwar û talankar. Mizgîni û awazên serketin û serfiraziyê diyarî gelê me dikin. Ji Nîsêbînê, ji Cizîra Botan, ji Mêrdînê heya navenda Diyarbêkrê, radi bin ser xwe û li hevberî mirinê şer û cenga jiyane li dar dixin. Di tax û kolanên di bin destên dijminan de, karwanê xwe yî girseyî û şoreşgerî bi rêvedibin. Bi ew dirûsmên ku zikê ezmanan diqelêşin: "Bijî Kurdistan! Bimre Dağîrkerî! Bimre Dewleta Tirkîyê! Bijî Serxwebûn! Bijî Azadî! Bijî PKK!" Bi van deng û awazên şoreşgerî, gav bi gav, her ber bi roja serxwebûn û azadiyê diçin û wê bi dilekî germ hembêz dikin.

Dağîrkerên tirk, bi her çûre û babetên hovîtiyê, çî ji aliyê sansurkirina rojname û weşanan ve û çî jî, ji aliyê serbestnehiştin û qedexekirina amadebûna rojnamegerên biyanî li qad û herêmên şerî de, dixwazin lebat û karguzeriyên gelêrî biniximînin. Bi bangêşî û propagandaya weşan û publikasyonên xwe yên sextekar û durû, dixwazin, rastiye şaş û çewt nîşan bidin. Di wê hewl û kêferatê de ne, ku ji awira gelemperî û dengê giştîyê cihanî re bidine daxuyanîkirin, ku kurd ji vê jiyana xwe şukurdar û razî ne. Dibêjin "qet pîrseka bi navê pîrsa kurdî li Tirkîyê nîn e!" Dijmin dixwaze bi vê derewa xwe ya ku ew jî pê bawer nake, hêzên demokratîkî û mafmîrovhezên cihanê bixapîne. Lê belê fûre - fûra hêrs û nîrfîna gelê me yê leheng, hemû dunya bi xwe hesand û vê durûtiya dijminê derewkar û sextekar li pêşberî tevayê cihanê eşkere kir. Gelê me careke din da zanin ku tu çember li banga serxwebûnê nakeve û tucaran ev deng nayête nizimkirin. Gelê me, careke din da nîşandan ku her çend hovîtiya dijminan xurt bibe, her çend awayên nuh ji sitem û

zinetkariya xwe bîfirîne, dê dîsan jî, awirên zaroyên azadîxwaz, dê dîsan jî, kalên ku li dawîya temenê xwe li jiyaneke serbixwe digerin û tîfîngên baz û eyloyên serfiraziyê, gerîllayên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan-ARGK'ê, dengên xwe bigehînine tavayî cîhanê. Darê wan ê zorê, dê were şikandî. Dê serî li ala wan a li ser çiya û baniyên Kurdistanê, were tewandin û dê ala me ya netewî bi serfirazî û serbestî pêlan bide xwe.

Ev e asteng û aloziya ku dijmin têde diji. Dijminê poz û şerêşikestî, her rojên diçin li ber lingê yekî digere. Jê hawarê dixwaze. Êdî nikare tu çarenivîsan ji rewşa xwe ya ketî re bibîne. Roj bi roj, qonaxa şerê me yê mafdar berz û bilind dibe. Lehiya şoreşgerî ya li Kurdistanê xurt û har dibe. Pêlên xwe dihavêje ser rejîma dijminên faşîst û yekîtiya gel û gerîlla tîrsa mirinê berdîdine dilê leşker û serleşkerên artêşa tirk. Xaka Kurdistanê ji bo wan dikine dojeş û goristan. Dijmin li ber van lebat û karguzeriyên serxwebûnparêzkar, neçar û bêzar maye. Ji ber vê sedemê ye, ku her rojên diçin, mîna keftar û çeçelên piştîşikestî û ziravqetiya, bi hemû liv û lebatê xwe, xwe li bin guhên kaş û zinaran dixê. Jê re baş diyar bûye ku çî rê û çareyên vê çûnê li ba wî nîne. Weke civatnasê hêja İsmail Beşikçi di axiftineka xwe ya li gel parlamentera almanî Angelika Beer û rojnamevanê İtali Marko Tronti dibêje: "ew bi xwe gav ji vê qadê ber bi paş ve dihavêje û vêca li ser çareserkerîna pîrsê jî hûrdibe. Yan bi rastî û durustî pîrsê çareser dike - ku nikare vê yekê bike - yan jî ji wê meydanê derdikeve diçe." Belê çûna dijminê hov û har gelek ne maye. Rojên nêzîk, dê van gotinan biguncênin û ew roj dîrokê dê ji bo me kurdan jî rûpeleke nuh û taze veke.

Weke di hête zanîn, şoreşa rizgariya netewa Kurdistan, bi wan hilgavînan û hilpişkinên xwe yên tunde, rûpela dîrokê ya kevnar ditewîne. Rûpeleke nuh vedike û bi xwîna xwe ya sor li ser dastanên berxwedanê dinivîsîne. Ji ber vê sedemê, neyar êrişên xwe yên durî mirovayetiye, li ser welatparêz û niştimanperweran xurt dike. Baş dizane ku Kurdistan roj bi roj, ji bin karbidestîya wî derdikeve. Êdî hew dikare xwe biparêze. Bi kurtî, bizava şoreşgerî bi her awayî û ji her aliyên ve, birêve ketiye. Yekîti û komên gel, ji ya zaroyan bigirin, heya bighê yekîtiya kal û oldaran, anku ji 7 salî heya 70'ê salî, tev ji bo amancekê, di vê rêveçûnê de, kar û xabatên xwe dikin. Îro nêzîkî, hemû mirovên qada welatê me, di her emr û temenê de, xwe pozberî dijmin dikin û êrişan li hevberî dijminan li dar dixin. Her wisan jî, di tevgera rewşenbîriya welatparêz de, erk û delamet, li gor rewş û nîrê Kurdistanê, xwedî barekî giran e, ku divê

qenc were hilgirtin. Ji ber ku wan, her tiştên girêdayê ziman, çand, tore û wêjeyên me, xistine nav çembera asimilasyonê. Heya ku em kelepora bav û bapîran, ji wê çemberê rizgar bikin, divê em pênuş û xameya xwe, her weke tîfînga şoreşgeran bi doliwgeriya biyanî de biteqînin. Rola pênuş û xamê, di dîrokê de gelekî bilind e. Weke ku tîrsa dijminan ji tîfîngê heye, her wisan, tîrsa dijminan ji pênuşê jî heye.

Di vir de mirov dikare bibêje, delameta rojnamegeriyê ya herî pêvîst ew e, ku nekeve dafa burjuwaziya biçûk, ku çand û toreya kurdî di bazara bazirganiyê de, erzan û bênirox difiroşe. Îro bi çand û toreya kurdî, ku bi sede - salan hatiye parastin, dilîzin. Divê rewşenbîrên welatparêz, xwe ji vî bayê ku mirov bi saxî dike gorê, biparêzin û di rêça serbixwebûn û azadiyê de, ji xwe re cihêkî bigirin. Rûmet û bilindbûn, li ser vê riyê ne.

Li ser vê bingeşê, bi vê bîr û baweriyê ku çî hêz, çî nihêrinên din ên çewt, nikarin me ji ser bixin, em dîsan bi vê hejmara REWŞENÊ ya pêncemîn, ku mîna gulekê di gulistana toreyê kurdî de vebûye, diçin. Em hêvîdar in ev berhema me ya çandî û torevanî, bi çavekî rast û durust, ji aliyê we ve, were nixandî û di bin çavan re were derbaskirin. Hingê em'ê gelekî şad û dilxweş bibin.

Di dema çûyî de, tîkiliyên me bi zan-yar, xwendewar û kategoriyan girsên gelî re, xurt bûn. Mişe (gelek) name gihane ser-nivîsariya REWŞENÊ. Naveroka wan, bi gelemperî pîrozbahî û spasiyên ji bo Kovarê bûn. Di gel nixandî, pêşniyar û rexneyên wan, me gelek berhem jî, ji xwendevanan wergirtine. Li gora derfeta rûpelên Kovarê, em pişkekê ji wan diweşînin. Em'ê jî hejmara 6'ê û pêve, li gor derfetê, rûpelekê yan du rûpelan, bersiva nameyan jî bidin. Berî ku em bigihêjine dawîya vê nameya xwe, hêviya me ji xwendevanan ev e, ku di warê çand, tore û babetên din de, nivîsar û berhemên xwe, bi berdewamî bigehînine Yekîtiyê. Ber bi damezirandina Yekîtiya Nivîsevanên Welatparêzên Kurdistan, Yekîtiya Rewşenbîrên welatparêzên Kurdistan - YRWK'ê xurttir bikin. Em pêkve di bin ala Yekîtiya xwe de, bi her awayî êrişî ser mirovkujên biyanî bikin.

- Bila her gav dirûsmên me, wisan bilind deng bidin û hemû babetên berhem û nivîsarên me, bila her dem ji bo geştiyê ewça serxwebûn û azadiya kurd û Kurdistanê bin!

REWŞEN



## Nameyên Xwendevanan

### Hevalên heja yên li kovara REWŞEN'ê, Silavên hev girtî yên germ ji we re !

Ez li ser derketina hejmara çaran, ji kovara REWŞEN'ê pir dilşad bûm. Bi bîr û bawerîya min, hemû kesên xwe rewşenbîr dibînin, bi berxwedana (berdewama) vê kovara pêşengî û bihengehdanayî, ji bo pêşketin û xwegirtina ziman, rêziman û nivîsên kurdî yên nûjen, bihêztir û zortir bû. Tiştê bi tevayî baş û rast di jimara teze de ev e, ku xwedî naverokeke bihengehî û zanistî bûn. Wekî hûn dizanin, ez bêhtir giranî didim ser tiştên zanistî û tiwêjin (kolîn/lêgerîn/abhas). Çimku mirovên vê kovarê dixwînin, dixwazin bi tiştîni gelemperî fêr bibin, bi babetîni gerengî nasbibin. Nêrîna min

li ser têxistina helbestan (hozanan/şihran) di kovara REWŞEN de ev e, ku pir kesên helbestvan bi rastî derewan dikin, yanî naxwazin, zanebûn û seyrên (nirînen) xwe, bi şêweyekî zanistî û aşkera, yanî bi şêweyekî, ku hemû xwendevanên REWŞEN'ê jê sûd wergrin, bidin nivîsandin.

Çetnahiyên rastrnivîsa kurdiya nûjen, dê hîna bimîne. Bi tenê welatê Kurdistan serbixwe dê çareyekî (derrêkî/hilîkî) ji van çetnahiyan re bibîne. Lê, ez bawer dikim, ku REWŞEN dikane, pêşkarekî mezin û bihengeheke serrast ji bo serhatina û sergeyîstina rastrnivîsandina kurdiya nûjen bike. Ew kesên, komên ku dibêjin, ku ew bi vî karî radibin, lê di eyin wextî de jî, li dijî serxwebûna welêt dicivîlin, bisemakevin û bêhtirên wan jî derew e, ew karî risa û xweperist dikin. Bi tenê rewşenbîr

bixwazin ew dê bikaribin, serhatin, sergeyîstina û rastrnivîsa nûjen û yekîtiya kurdî pêkbînin.

Jimara çaran a kovara REWŞENê, ku esta (tehnga/mustewa) wê bi rastî jî bilind e û dê her bilindtirîne kovarên çandiyên nûjen ên din ên kurdî bimîne û bi serkeve. Bi sedan rewşenbîrên kurdî û biyanî ji neha de, di REWŞENê de rêhbereke yekkirinî û ronakdar dibînin û xwe tevî kerewanê wê dikin.

Ez ji we re listeyek fehrîstîkî li ser ferhengên kurdî dişînim. Hinek ji wan derketine û hinik jî hîna derneketine. Wekî din ez hêvîdar im, ku hûn di karê xwe (me) da pêşkevin!

Bi silavên hevalî  
Abdallah Osman

### Hevalên delal,

nameyek li gel çend kart û destûra YRWK, ji desteka rêveberîya REWŞENê, gehîştê destê min. Ez gelekî pê xweş bîm û gelek keyfa min hat. Hîvîdar im hûn di hemû kar û barê xwe de serkeftî bin. REWŞEN karekî gelek pîroz e. Divêt hûn her berdewam bin li derhîna wê.

Hunermend Erdewan ZAXOYÎ, bi destê Baasa faşîsta Iraqê hate şehîdkirin. Li sala 1986'ê, dengbêjê bi nav û deng Erdewan ZAXOYÎ li bajarê Bexdadê hate girtin. Ji ber çend stranê ramiyarî (siyasî) ewêt ku wî, li ser Kurdistanê li ahangekê gotin, ji wê rojê heta sala 1989'ê, kesê ne dizanî, ka çî pê hat û ka li kîjan girtîgehê ye. Li havîna vê salê, faşîstê xwînmij Saddam hate bajarê Zaxo'yê. Li wê 'rê dayka Erdewan çû def wî û pirsîyara kurê xwe jê kir. Piştî çenda, rojekê hukmeta Iraqê ya faşîst, kaxeza mirinê ji mala wan ra birêkir û li vê 'rê jiyana vî welatparêzî, bi dûmahî hat. Ez, Erdewan ZAXOYÎ ji zarokî nas dikim. Bi rastî, her li zarokîya xwe, bêhîna Kurdistanê lê dida û evîndarê welatî bû. Her axiftin û stran li ser digotin. Li sala 1982'yê, xwe gehande refê şoreşê li Kurdistanê başûr. Belê her wekî her mirovek pêşverû nekarî bistirê. Cihê xwe li nav vê şoreşa paşkefî bibînit, çimku vê şoreşê, rê ne dida mirovê şoreşger û xudan bîr û bawerî. Piştî çend wextekê, li Îranê ma û vegerya Kurdistanê başûr. Bi dilekî çirmisî û nexweş. Ew piştî hingê zivirî hat bajarê Zaxoyê û li wê 'rê ma



Erdewan Zaxoyî

heta hate girtin û xatîra xwe ya dumahiyê xwest. Ez çî çaran ji bîr nakim wextê vî dengbêjî digot:

\* Dayka Kurdistan!

Lahndikê te çar in

û li çar ciyan belav in

Îro ezê nizanim lorî-lorî

û layê-layê,

ji bo kîj lahdikê bêjim?

Dayka Kurdistan!

Ma her dê bêjin yan Kurdistan?

Ma her dê bêjin yan qebristan?

Ji bo çî welat maye bê xudan?

Ev ro maye li bin destan.

Dayka Kurdistan! \*

Li dûmahiyê, sed silav li ser rih û canê Erdewan ZAXOYÎ û sed hezar silav li ruh û canê hemî şehîdên Kurdistanê. Li gel silavê min yê germ bo hemî xebat û karê REWŞENê.

Cotyar Zaxoyî  
12 Îlon 1989 / Amsterdam



## Hevalino,

Îroj şoreşa li welêt vêketî, lêdanên mezin û dijar li dagîrkerên tîrkan dixê, serhildan û berxwedana gelêrî dawiya bindestiyê, dawiya stemkarî û dagîrkerên ku welatê me dagirtine, nêzik kiriye. Livbaziyên ku ji destên pêşmergeyên qehreman, li bakurê Kurdistan çêdibin, taya mirinê berdidine nava dijmînên kedxwar. Tirseka mezin li nav wan peyda dikin. Tirsa tunebûn, tirsa hilweşandinê ye ev. Liyanên pêşmergeyan li ber çavên faşîstên tîrkan, bûne ezraîlên mirinê. Jiyan li ber wan kirine gora reş û tarî. Dizanin ku dawiya wan bi destên ARGK'ê ye. Lewma xew û xwarin li nav wan bûne jehr û zeqqûm. Deriyê dojehê ji wan re hatiye vekirin û bêyî hejmar cendekên faşîstan tevî kumên xwe yên gemar tê de disotin. Cirm û toleya qirkirina gelê me bi serzêdayî didin. Gelo çima û ji bo çi, gehîştine vê pêpelûkê? Pêpelûka tunebûn û qirkirinê? Çima li metropol û li çolistanan bênan û av, tazî û pêxwas in? Ji bo çi wan em xistine vê merhelê ku em şev û roj kar dikin, lê nanê beyanî heye û yê nivrojê nîne? Gelo sedem çi ye? Sedema vê neheqiyê û bêedlahiyê çi ye? Bi hezaran pirs tene ser zimên. Lê, gelek ji me hene, ku bi bersivê nizanin. Yan jî xwe dikine nezan. Bersiv ev e; dara jiyana me bi êşeke kûr û dijar ketibû. Êşeke kevnar ketibû koka wê. Şaxin jê hişk kiribûn û hin jî yên li ber hişkbûnê hene. Gelo ji bo parastin û dermankirina vê darê, çi girîng bû? Eger dermanên hezar bijîşk û dermandaran, li şaxên wê bibin ku rizgarî ne ji êşê bû; ji ber ku jan di kokê de bû, di qurm û rehan de bû.

Koka êşa me ji bindestiya welatê me ye. Lê rizgarî û dermanê vê bindestiyê çi ye? Rizgarî û serbixwebûna welêt bi xwe ye. Derman ji lûleyên tîfingên me ne. Wekî pêşengekî milletekî gotiye: "Serxwebûna gelan, ji lûleya tîfingan re derbas dibe."

Jiyana ku em tê de ne, mirineke reş û êşkere û dijar bû. Rojê hezar carî em mirinê bi çavan dibînin. Ji devê dijmînan, hezar sixêf û gotinên bênamûsiyê dibihîsin. Rojê hezar axîn û keseran berdidin û dibêjin: *Ax welat!* Lê welat bi gotinan nayê! Welat tenê bi xwestek û hêviyan çênabe. Welat bi kar û xebatê, bi ceng û têkoşînê, bi şer û xwînê û berxwedanê rizgar dibe.

Ciwantirîn slav  
D. Hoşiyar

TBN (têbînî): Destpêka nameya D. Hoşiyar di hejmar 4'ê de hatibû weşandin. Ji ber dirêjiya wê, li du beş û hejmaran hate dabêşkirin.

## Bi silavên rizgariya netewî

Kovara REWŞENê gihiştê destê min. Ez, pê gelekî kêfxweş û şad bûm. Lê belê ez dixwazim bibêjim ji bo çi, we ew pirtûkên min ji we xwestine, we ji min re ne şandin?

Di vê dawiye de, li her çar hêlên Bulgaristanê, meşên protestokirina siyaseta dewleta Tirkîyê hatin çêkirin. Van meşên protestokirinê, pîrsa destdirêjiya Tirkîyê li nava Bulgaristanê, anîn ziman.

Di nava van meşan de, meşinek gelekî mezin li bajarê Plovdiv, di roja 1. 6. 1989'ê de, ku bi çarçiva pêşengiya avahiya Partiyê bi rêket û berê xwe da balyozxana Tirkîyê.

Ji bo em xwendekarên kurd li Bulgaristanê têkilî meşê bibin û pankartekê bi navê kurdan di meşê de hildin, em çûn ba berpirsiyarekê dewleta Bulgaristanê. Me ev da-xwaz jê re bir û wan jî daxwaza me pejirandin. Ji bo em têkilî meşê bibin, me xwe amade kir. Bele hemû hevalên grûbên kurd, ên reformîst, piştî xwe dan me û gotin ev pirs ne pîrsa me ye.

Di roja 1. 6. 1989'ê de, me bi navê hemû xwendekarên kurdên li Bulgaristanê, gotarek li pêşya gelê Bulgaristanê yê bi hezaran kom bûbûn, xwend. Gotin gelekî germ û baş hate guhdarî kirin. Piştî gotinê, me xwe da balyozxana Tirkîyê. Di wê şevê de saet 23, di nava dengûbehsa radyo û televîzyona Bulgariya, ev rûdan, mîna xeber pêşan bû û roja din di hemû weşan, kovar û rojnameyan de hate weşandin.

Bi rastî, ev têkilî û gotina me, mîna ku tu kulmekê li serçavê kesên reformîst bidî, weha li wan giran hat. Niha li Bulgaristanê, ji zarokên biçûk û heya kalên ixtiyar, her kes, li ser pîrsa gelê Kurdistanê xeber didin. Ev pirs bi vê rûdanê xwe piçeke din li nav civata gelê Bugariya da ber çavan. Divê her ciyê ku kurd lê hene, bi van awayên rûdanan, pîrsa gelê xwe bikin malê dengê giştîya civatê. Seferberbûna piştigiriya wan welatan gelekî girîng e.

Daxwaza me ew e ku hûn hemû weşanên partiyê û bi taybetî jî yên kurdî û erebî ji bo me birêkin û kitêbên dîrokî bişînin.

(...)

Gotara ku me ji koma gelê Bulgaristanê re xwendibû, bi kurtî ev e:

## Hevalên delal,

### Gelê Bulgaristanê yê hêja,

### Hemû kesên pêşverû û sosyalîst!

Bi navê hemû xwendekarên kurd li Bulgaristanê, em dixwazin piştigirî û dilsoziya xwe, ji bo we nîşan bidin û biratiya gelên Bulgaristan û Kurdistanê binine zimên.

## Hevalino

Wekî din jî em dixwazin li ser rewşa bakura Kurdistanê, li ser asimilasyona ku bi gelê kurd hatiye spartin, li ser kemalîzmê û li ser perçiqandina mafên mirovî li Tirkîyê, we agahdar bikin. Dewleta faşîstên tirk, hemû rengên lêdan û qirkirinan li ser gelê me pêktîne. Zarokan ji hembêza dayikên wan vediqetîne. Bi destên xwe yên gemmar, dest dirêjê namûsa keç û jinên mirovên hejar û reben dike. Gundan talan û wêran dike û dişewitîne. Malên xelkê bi ser serê wan de tîne xwarê û xelk koçber û penaber dike. Çawa ku di dîrokê de, çinên serdestên Tirkîyê, gelê Bulgaristanê qir kirine, vê bêbextiyê, ji wê hin hovtir û dijaratir, bi ser serê gelê me de dikin.

Dewleta faşîstên Tirkîyê, ji alîkî ve, hêstirên krokodîlan, yên derewîn li ser mafên mirovan dibarîne û ji aliyê din ve jî, bi her awayî dijminahiya mafên mirovan dike û mafên mirovan li bin lingan de diperçiqîne. Tew îroj, qiyma xwe tenê bi vî nayne û dixwaze destên xwe dirêjî nav sîstema sosyalîzmê jî bike û rewşeke nebaş derxîne holê.

Em bi navên hemû xwendekarên kurd, careke din piştigirtina birayetiya di nava gelan de dijar dikin û hêvidar in ku piştigiriyeka zexm û tund di navbera gelên Bulgaristan û Kurdistanê de hebe. Dîsa em bawer dikin ku îro ew dijarîyên ku hene, dê nika ribin li pêşya pêşketina sosyalîzmê û birayetiya gelan rawestin.

- Bijî yekgirtina piştigiriya di nava gelên Bulgaristan û Kurdistan!

- Bijî internasyonalîzm û birayetiya gelên cîhanê!

- Bijî aşî û mafên mirovan!

Feyaz Mihemed  
Bulgaristan



## Hevalên Hêja û delal di redaksiyona kovara REWŞEN da,

slavên min ên germ ji we re û ez ji bona vî karê we yê giranbuha û bi rûmet, we hemûkan bi herî germî himbêz dikim û destê we dişidînim.

### Hevalino!

Bi rastî ez aboneyekî REWŞENê yê kevn im. Lê belê cihê min hate guhartin. Neha ez li Bulgaristanê, li Sofiya dimînim. Min REWŞEN, li welat, bi riya kurdek heval we vergirt.

Lê, xwendina wê li welat, hîn bêhtir xweş bû û gelê me Rewşenbîrên Kurd li welêt, bi xwendin û dîtina vî kovara hêja, pir bextiyar in.

Li Bulgaristanê xwendevanên kurd pir hene. Gelek dost dixwazin bi zimanê dayka xwe bi xwînin û binivîsin. Ji bona vî yekê, em dixwazin ku hûn hejmarên berê ji me re birê-bikin. Eger hûn bikaribin vî bikin, emê pê pir

kêfxweş, bextiyar û şad bin.

Ji bona vî yekê, belku rojên ku werin, mirov bikaribe ji bona durustkirina demezirandina liqê YRWK'ê li Sofiya, xebatê bike.

Eger we program çekiribe, ji me re wê ji bi rê bikin, ku em jî, wê nîşanê xwendekarê kurd bikin û guftûgo li ser hindama rêxistinê bikin. Yên rêxistin ji wan re gerek e, mirovên wilo gelek in.

Emê nameya xwe direj nekin. Em carek din slavên xwe ji we re bi rê dikin. Kêfxweş behra we be û em hevîdar in ku karê we her dem û roj pêş de here. Divê pênûsa xwendevan û Rewşenbîrên Kurd bibe weke gullê û tekeve nav çavê dijminê gelê me.

- Bijî Hevgirtina Rewşenbîrên Kurd  
di binê ala YRWK'ê de!

Nûbar Zaza

## Birayên delal,

berî giştî, ez ji dil da dixwazim weşandina REWŞEN pîroz bikim. Ev ji bo pêşvebirina xebata gelê kurd, livek û gavek pir hêja ye. Min du hejmarên we dîtî û xandin (1, 2) û gelekî ecibandin.

Min dît tiştên gelekî baş û hêja tê de hatine nivîsandin. Ji bo wê, ez dixwazim, ji kerema xwe, hûn min bikin aboneyê Kovarê.

Min ji bo buhayê abonetiye, pere li ser navnîşana kontoya YRWKê, şandin.

Ji kerema xwe, hejmarên ji 2 û bi şûnda ji min re bişînin. Bi şorên din, hejmarên 1, 2 berê li cem min hene. Her roj û her dem hûn xweş û sax bimînin.

- Bila kar û xebata REWŞENê bibe  
kelemê ber çavên dijminan!

Bi silavên biratî  
A. Mistefa

## EM Û PKK

Piştî ku bi saya xebat û kêferata PKK'ê, rast û rewa û piştî ku hîç partî û sazî û hîç rêxistineka kurdî li Kurdistanê bakur ne mayî û piştî ku endamên wan ji dil û can xwe kirin hevalbendên PKK'ê... em dibihîsin ku hinek ji endamên wan partî û sazîyên li Ewropayê, xwe dikin kosp û asteng di rêya xebata PKK'ê ya siyasî da!

Me çî li ser PKK'ê ye, PKK çî li ser me ye?

Em ji PKK'ê dixwazin ku rêberîtiya şoreşa Kurdistanê bikim û yekîtiya wê biparêzî û îbret ji çewtî û kêmasiyên rabûnên berî xwe werbigirin û hay ji xap û pîlanên Seddam û Refsencanî jî hebit. Çinku bê guman ev her du dîktator ji Ozal pirtir ji PKK'ê ditirsin û PKK jî ji me divê, nemaze ji partî û sazîyên Kurdistanê ku xwe ne kin kosp û tegere di rêya şoreşa gelê xwe da... Belku gerek e ev partî û sazîyên me, çalakî û tevgerên qehremanên PKK'ê di kovar û belavokên xwe da belav bikin. Çimku bê guman ew siyasî û têkoşerên hêja, bi xwe jî, wek me dizanin û dibînin ku îro milletê kurd bi PKK'ê serbilind e û şanaziyê bi xebat û şoreşa qehremanên PKK'ê dikit û bi germî himbêz dikit û xwîn û xuhdanê jê ra dirêjit.


### Vî teyrî çî zilqeq kir?

Zavayê Seddam Husên û waliyê Mûsilê bi serdaneka resmî hatin Tirkîyê - Qonya û Mardîn. Li wê rê şekirek ji rojnama

"Hurriyet"ê ra şkandin û ji bêbextiya xwe gotin:

- Em dê sînor li PKK'ê bigrin û koka wan ji dinyayê biqelînin."

Yanî eger dewleta tirkan çekên kîmyayî li dijî milletê kurd bi kar bînin, em dê sînorên xwe bigrin û nehêlin ku bihêne nêv axa me... Helbet vî "xweş mirovî", bi fermana xezûrê xwe Seddam şekir belav kir.



Seddame xwînmij û mirovkuj, li gel  
Yildirim Akbulut'î dipeyivit:

Seddame:

- Gotina te li ser serê min... Lê min daxwazek heye. Tenê daxwazek! Ew jî ew e ku hûn û dewleta xwe, wekî min kurdkuj bin. Rast e û ez jî dizanim ku hûn jî kurdkuj in.

Lê ez dixwazim hûn jî wekî min bikin! Eger ez bûma û hewe jehr û kîmya reşandî, min dê

### Deholvanek

Li meha Remazana borî, mêrikekî mitrib çû nik qeymeqamê Misêrbînê û jê ra got:

- Efundim tu destûra min bidî ku li deholê xim, xelkê rakim paşivê û rizqê zarokên xwe peyda kim. Qeymeqam xeyidî û di ser da xurrî:

- Yasaq e! Haydî ji vir here! Van kafirên ermen hişyar neke! Bila razên û qet ranebin!



sînor bigirta û libek ji mirinê ne diverist! Eger tu ji min bawer nekî, fermo jehr û kîmyayê li wan bibarîne! Haydê me bicerbîne û bibîne!

Têbînî: Ev gotinên he, li jêr wêneya Seddam û Yildirim Akbulut tene nivîsîn, spas!

Ji REWŞENê ra di gel silavên  
birayê wê  
Sîpanê Şîşîlî  
Mêrdîn / KURDISTAN



# "HÊVIYA MIN EW E KU HÛN SILAVÊD MIN BIGEHÎNINE HEMÛ ŞERVANÊD SERXWEBÛN Û AZADIYÊ, DI SERÎ DE RÊBERÊ GELÊ ME SEROK APO ..."

## Xwendevanên Hêja

Ev hevpeyvîn, di roja 5'ê meha hezîrana sala 1990'î de, ji hêla sernivîsariya kovara me REWŞENê ve, li gel rewşenbîrê kurd Casimê CELÎL'î hatiye kirin.

Bi rastî dawiya dengkirinê li gel Casimê CELÎL nayê. Lê belê dîsan jî me hewl da xwe ku em bîranînên kûr û nêrînên wî yên nuh bigehînine xwendevanên xwe.

Neha, temenê wî, bi ser 82 salan ketiye. Lê belê hîna jî weha dibêje: "Nebê-jin Apê Casim kal bûye! Hîna dilê min wekî dilên pêşmergeyan lêdide. Baweriya min xurt e. Kengê mabe emê vegerin Kurdistanê serbixwe û yekbûyî. Ji neha ve ez dixwazim têkilî nava şervanên serxwebûn û azadiyê bibim. Bila ez li serê çiyayên Botan şehîd bibim. Eman, hevalno ez di bextê we de me! Ez nexwazim di nava cih-nivînên xwe de wisan bi hêsani bimirim."

Her çend dereng jî mabe, em cih û girîngiya vê hevpeyvîna dîzanin û lewma jî di vê hejmarê kovara xwe REWŞENê de, diweşînin.

## REWŞEN

**REWŞEN:** Em bawer dikin, hemû kesên ku bi huner û çanda kurdî ve mijûl dibin, hemû kesên ku barê komkirin, parastin û vejandina çand û toreya gelê me dane ser milên xwe, navê we bihistine. Tevan, we weke mamostekî nas dikin. Weke mirovekî ku, di vî warî de bi hostane gavên pêşin avêtine. Ji bona ku we ji bo vê rûniştinê amadekariya xwe diyar kir û bi dilgermî ev daxwaza me pejirand, em gelekî kêfxweş in. Di vê civatê de, em dixwazin bêhtir li ser bîranînên we rawestin. Hema ji niha ve em bi navê kovara REWŞENê sipasiya we dikin û em di vir de dixwazin gelek tişt pêşkêşî xwendevanên kovara xwe bikin.

Beri her tiştî, em dixwazin apê Casimê CELÎL, xwe ji bona xwendevanên Kovarê, bide naskirin. Anku malbata xwe, gundê xwe, kîjan salê derbasî vê axê bûn, dema ji welêt koçbar-bûnê, çî dijwarî û nexweşî ji hêla roma reş (tirkan) ve hatine dîtin, qirîkirin, hovîti û êrîşên faşistê tirkan çawa dikarin werine ziman? û hwd. Bi kurtî, em dixwazin hemû hoyên wan rojan, weke bîranînekê ji bo xwendevanên me bihêne rêzkirin.

**Cesimê CELÎL:** Ez ji aliyê Serhedan (Qers) im. Navê gundê me Quzilqule bû. Li bin tara Dîgorê bû. Dîgor navçeyeka Serhedî bû. Ji dayika xwe ez di sala 1908'ê de bûme. Dibe ku ev sala 1906, yan jî sala 1907 be jî. Ma kes jî me, mirovên wan salan dikare bibêje ez vê salê, vê mehê û vê rojê bûme? Lê 82 saliya min ku tamam e, ew xeber dikare hebe. Dê û bavê min gundî bûn. Hemû gundiyan me û şênîyan gundê derdora me jî gelekî jir û jêhatî bûn. Tevan alîkariya hev dikirin. Ji êla me re digotin êla êzdiyan. Lê herdemê, me xwe eşî-reteka kurdan didît. Çawa em dibêjin êla broka, êla zîlana, û hwd. Hûn dîzanin di nava me de bi hezaran êl hene. Em, pêşiyên me, mezinên me, biçûkên me, heta roja îroyîn kurd jî Kurdistanê ne. Tu caran mafê me tuneye, ku em navê êl, ol û eşîra xwe, bêxin ser navê kurd û Kurdistanê.

Di gund de, bavê min, gundiyan me, dayka min, pîrka min, bêzar berçav bûn. Mêvantiya me hebû. Gelek gelek mêvantiya me hebû.

**REWŞEN:** Em dixwazin bizanibin pira-

niya gundiyan wê demê, bi çî karî ve mijûl dibûn? Anku karê bingehîn çandinî bû, yan jî xwedîkirina pez û sewalan bû? Dikarî hinekî li ser rewşa gund û gundiyan bipeyivî?

**Casimê CELÎL:** Bi rastî mirov dikare bibêje ku gundiyan wê demê, bi çandinî, bi dewar, bi sewal û pez xwedîkirinê ve mijûl bûn. Piraniya gundên derdora me, gundên kurdan bûn. Hîna tê bîra min berê revê, yanê berî sala 1918'yê ku me tevî ermenan bar kir em hatin "Filehistanê" (Ermenistanê), wê demê di nava kurdan de, kesekî nikarbû pîrsa êl û eşîran bida ser pîrsa kurdayetiyê, yan jî bigota ez kurd im - ne kurd im. Me tevan, bi serbilindî digot em kurd in û jî filan êlê ne. Di gundê me de, bawer bikin kesekî tî, birçî û halnexweş tunebû. Tevan bi xurtî karê xwe dikirin. Gundê me gundekî wisa bû, ku di Qersê de jê re digotin Deştê Zêra yan jî gunde Zêra. Her wisan pincar, ceh, genim, hejir lê şîn dihatin. Dema bihar dihat gundiyan radidan tevrên û radikirin. Her kesê gêşnê xwe û gayê xwe dibirin, bostan radikirin û teslîmê Şahînan dikirin. Ew jî du-sê bira bûn. Belê mirovî gelek maqûl bûn. Bi xwe jî laz bûn, lê belê te digot qey ji nava dilê kurd û Kurdistanê derketine.

**REWŞEN:** Hûn wê demê bi wan kesên laz re, bi çî zimanekî dipeyivîn?

**Casimê CELÎL:** Belê, belê hemû danû-standin tenê bi kurdî dibûn. Di hundirê malan de, di nava civatên gund de, di stran, awaz, urf û adetan de, tevek bi kurdî bûn. Çawa neha em gişt li vê derê bi kurdî deng dikin, rabûn û rûniştina me bi kurdî ye, her wê demê jî weha bû. Koloz, şîr destmala seriyên, şemaqî, dawet, govend, şahî, her tişt bi kurdi bûn. Mezin, biçûk, jin, zaro, xort û qîzan, tenê zimanê daykê xeber didan, Yanê qet rewşeka wekî vê rojê tunebû. Niha êl, malbat û eşîrên me hev nagirin, alîkariya hev nakin. Ev yek tiştê gelekî nerast û neqenc e.

Dem a li gundê me dibû dawet, ne tenê gundiyan me, belê hemû gundiyan derdora me jî xwe komê ser hev dikirin, ji her êl û eşîrêkê dihatin.

**REWŞEN:** Baş e, tiştê ku em têdigihin, rewşa gundê we gelekî xweş bûye. Lewma em dixwazin ku, tu, sedemên serrast ên ha-



tina we ya Rewanê, ji me re piçekî şîrove bikî.

**Casimê CELÎL:** Şer bû, şerê împiryalîzmê yê yekemîn bû. Di salên 1915 - 1918'an, di navbera herdu dewletên Rûsyayê û Tirkîyê de şerekî giran li holê bû. Heya, wê rojê, hîna kurd tev di warê bav û kalên xwe de bûn. Em li ser axa Kurdistanê şerîn bûn. Wisa çêbû ku tirkên faşist, dest bi qirkirina ermenan li ser axa Kurdistanê kirin. Bi rastî jî gelekî bi hovîti, çav-sorî û rewanekî faşist wan dikuştin û malên

**REWŞEN:** Weke em dizanin hinek kesên ku bi rast û durustî li ser dîrokê ranewestî ne, dibêjin ku, kurdan jî, ermenan qirkirine û bi vê yekê dixwazin biratiya dîrokî, ya di navbera kurd û ermenan de heye, hilweşînin. Bê şik û guman e ku ev kesên han, çawan be jî bi tore û xefikên împiryalîzm û faşîstên tirk ve, girê-dayî ne. Belê em dixwazin zanibin ku Apê Casim li ser vê pîrsê çawa bîr dike.

**Casimê CELÎL:** Na... Kesên wê gotinê

ku wextê qirkirina ermenîyan bi sed hezaran dostên me yên ermenî jî zilm û hovîtiya roma reş parast û xelas kirin. Her weha jî biraziye Flîte QUTO, Hecî Mihemedê Mistê QUTO, 40 gundên ermenan (weke deh hezar mirov) li deşta Qubînê (Bişêriyê) jî qirkirine parast û derbasê Sûriyê kir. Bila her kes bizanibe ku kurd û ermen brîndarê şûrekî ne. Ev jî bona vê rojê jî tişteki giring e. Biratî û hevgirtin hîn xurt dibe. Êdî mirov bighê encamên nuh ên

" Em tucaran bi navê yezîdîtiyê xwe ji kurdan enda nakin. Belê, her mirovek çî dihebîne serbest e. Ema bingeha me, hebûna me, her tim Kurdayetî ye û welatê me jî Kurdistan e. Kurdên yezîdî li hemberê ereban rawestiyane û ji dîne xwe cuda ne bûne. Yanî li ber zor û zexta ereban, misilman ne bûne. Kesên vê pîrsê dixwazin bavêjin holê ew peyayên dijminê kurdan in. Ew dijminê ku her rojê dixwaze kurdan ji hev bixe. Li ser yezîdan dixwazin vê listikê bileyizin. Her weha jî pîrsa zazan, loran û hwd, dihavêjin holê. Na, ne rast e. Kurd tev kurd in û hebûna êl, eşîr û olên pîrî, nişaneka zengîniya millet e. Tenê yek rê me rizgar dike; heta dawiyê hevgirtin û ji holê rakirina hemû nexweşiyên nava civakê ye ev rê. Kesên bibin haletên van siyasatên dijminan, ew mirovên xwe jî bîr kirinê. Li hemberê kal û bavê xwe gavên xwar avêtine. "



Casimê CELÎL, sala 1927 - Baku

wan talan û wêran dikirin. Di vir de kurdên jî êla yezîdîyan jî ne dixwestin dev ji ola xwe berdin û bi zorê bibin misilman. Lewma di vê xalê de, fermanên qirkirin ên êlên kurdên yezîdî jî derketin. Ji wê çaxê ve, me bi temamî pîrsa cudahiye olî di navbera xwe kurdan de qebûl ne dikir û me tu caran rê ne dida vê yekê. Hebûna kurd û Kurdistanê di ser her tiştî re dihate girtin. Wisan çêbû ku pêşiyên me tevî ermenan bar kirin hatin Ermenistanê.

dikin gelekî nerast in. Baş tê bîra min di nava ermen û kurdan de çet dijminahî tunebû. Herdu gel jî bi hev re pak bûn. Lê belê, dema romê şer kir, wisa çêbû ku hinek kurd jî tevî şer kirin. Komeka gelekî biçûk bûn. Ew bi xwe çend mirovên xulamên dijmin bûn. Hemû ermenên cihanê gerek e vê rastiyê zanibin: Kurdan, gelek ermen jî kuştinê parastine û di malên xwe de xweyî kirine, mezin kirine.

Em bîr bînin Murtalê Begê MUKSê, yê

xebatê. Tevî vê yekê jî ew kurd zû hatin sekinandin. Lewma bi xurtî li kêleka ermenan rawestî û zanibûn ku eger ermenî şiv bin, wê kurd jî ji bona faşîzma Tirkîyê bibine paşiv.

Dema kurdan, ermen diparastin, romê, ji bo navbera wan xera bike, radibû kincên kurdan li leşkerê xwe dikirin û diçûn ermenî qir dikirin. Belê, rastî ew e ku kurdan xwestiye ermenîyan ji tunebûnê rizgar bikin. Belê bi xwe



jî rastê rewşeka qirkirinê ya herî hov û dirinde hatine.

Kurdan ji roja berê de, tucaran nexweşî û bêdadî li milletên dinê ne kirine. Hemû kesên di Kurdistanê de, nava kurdan de jiyabûn, mîna tirkên, ermenan, laz û ereban ji hêla kurdan ve rastê birayetiyeke difireh hatine.

Niha ez dixwazim çend gotinan li ser gundê me bibêjim. Di gundê me de, aveka zelal ji jor de dihat. Ji çavkaniyê, ji hêla ermen Çayîrê Agaragê û Dîgorê. Di gundê me de, du aş hebûn, ji aşê jorê re digotin aşê Margar Axa û ji yê jêr re digotin Aşê Teyo Beg. Her aşek bi du kevîrên giran kar dikir, rojê bi tonan genim diheran û hemû gundên derdorê berê xwe didan gundê me.

Pêşya gundê me temam bax û baxçe bûn, kehniyên avê bûn. Darê rezan hebûn. Piştî gundê me ciyê dankutanê bû. Bênder bûn, ciyê kayê bû. Bilind cî bû. Çiyayek hebû li piştî gundê me ku rûsan gelek caran li wê derê bi romê re şer kiribûn. Gelek fişek û bermayên topan lê rijiyabûn. Ne tenê gundê me, lê belê temamiya navçeya Qersê bawer bike cihekî xwedêdayî bû.

Gundê me ji tixûbê ne zahf dûr e. Eger dema ji bilindî, ji serê çiya dîniherî, gundê me, Dîgor, Agarag û Silbî tev têne xuyanê. Wekî ew tenûrê dadidin, duyê tenûran û ciyê gundan yek bi yek tê naskirin.

Dema dibû nêzikê payîzê di gunde me de çî bixwazî çêdibû, her cûre meywe û şînahî hebûn. Hemû şênîyên gundê me xwedî sinçeka hêsangîr bûn, ne xelkê şerê-xirabiyê bûn. Ne tenê xelkên gundê me belê temamiya kurdan weha bûn. Dîfîreha û hezbiriyê mirovatiyê bûn, mêvan hez bûn, sibê heya êvarê di nav hevde bûn. Rojên xwe mîna li şahî û dawetan derbas dikirin.

Di kêleka gundê me de, gundek hebû digotinê, gundê Hemze Begê. Hemze Beg, kurdekî gelek hêja bû. Hemze Beg û Teyo Beg kur-apê hev bûn. Têkiliyên gundên me bi hev re gelekî xurt bûn. Em diçûn nav hev, qîz û bukên me bi hev re seyran dikirin, şahiyên gelekî xweş çêdibûn. Hemû kurd te digo belkî zarê yek dayikê ne. Nexweşî û nakokiyên olî û eşîrî tune bûn.

Şermeka mezin bû, wekî yek bibêje ev yezîd e, ev misilman e. Her kes bi kurdayetîya xwe serbilind bû. Teyo Beg û Hemze Beg misilman bûn. Me gelekî ji hev hez dikir. Yanî cudahiyan olî ne dihatin nişandan. Belê navê eşîran di hate hildan, çawa em bêjin hezar

eşîrêd hene, her kesê jî, bi vê yekê warê kal û bavên xwe nas dikirin.

Em tucaran bi navê yezîdiyê xwe ji kurdan enda nakin. Belê, her mirovek çî dihebîne serbest e. Ema bîngeha me, hebûna me, tim Kurdayetî ye û welatê me jî Kurdistan e. Kurdên yezîdî li hemberê ereban rawestiyane û ji dînê xwe cuda ne bûne. Yanî li ber zor û zexta

*"Rom hatin, tê bîra min em li Pampa kurdan (Niha Sîpan) bûn. Du Pamp hebûn. Yek a ermenan bû û yek jî ya kurdan bû. Berî evarê jin û mêran digotin; rom hatiye! Belê dawetê belav ne bû gurme-gurma defê bû, govend digeriya. Dawetê de, aliyek jin bûn aliyek jî mêr. Paşê mêr birin, çûn. Çûn û êdî ne hatin. Ji ber spîtakê (Berê digotin hemam) re birin. Tev di rê de kuştin. Paşê me bihist 3-4 mirov ji wan xelas bûbûn. Ev hovîti qet li ciyekî din ne bûye."*

ereban misilman ne bûne. Kesên vê pîrsê dixwazin bavêjin holê ew peyayên dijminê kurdan in. Ew dijminê ku her rojê dixwaze kurdan ji hev bixe. Li ser yezîdan dixwazin vê listikê bileyizin. Her weha jî pîrsa zazan, loran û hwd dihavêjin holê. Na, ne rast e. Kurd tev kurd in û hebûna êl, eşîr û olên pîrî, nişaneka zengîniya millet e. Tenê yek rê me rizgar dike; heta dawiyê hevgirtin û ji holê rakirina hemû nexweşiyên nava civakê ye ev rê. Kesên bibin navgînên van siyasetên dijminan, ew mirovên xwe ji bir kîrinê. Li hemberê kal û bavê xwe gavên xwar avêtine.

Helbete kurd li Yekîtîya Sovyêtê ne zehf in. Niv milyon jî tunene. Lê belê xwendevan û rewşenbîrên me, hemû mirovên pêş û zana ji hebûna kal û bavên xwe cuda nakin. Her çend rewşa kurdan bi tevayî baş be jî, dîsa hûn dibînin hinek sîxur jî hene. Cahş li her ciyan hene. Li ba me jî çendek hene (Apê Casim dikene). Dikare di her gundî de jî hebe. Ema hevalê R., delalê min, tu bi çavê xwe her tiştî dibînî. Tu di vê gera xwe de jî baş dibînî. Wekî dibînî li ba me, kurd û Kurdistan çi qas hezkirî ye û dema navê kurd û Kurdistan were ser lêvan, dilên mirovên me bi hêrs lêdixin.

Her straneka me kurdan, her gotin, çîrok, serpêhatî û êposeka me, ya me gişkan e.

Tiştêk jê cihê nabe. Her tiştêka em li vir dibêjin, hemû tiştên li çar perçeyên Kurdistanê têne gotin. Tev yek in, tev yê me kurdan e.

Me di sala 1918'yê de, li gel ermenan bar kir, em hatin Ermenistanê. Wê gavê ez 8-10 salî hebûm. Em hatin ser vî deştî. Tevî ermenan ji ser avê re derbas bûn. Ava Lenînkane bû. Ava Axuryan digotinê. Rewş gelekî zor bû. Em hatin ber avê rawestiyane. Êvareka payîzê bû. Millet gelek bûn. Li ber avê xwe danîn. Pez bûn, mal bûn, hal bûn, kinc bûn. Tiştên me jî tev man bi şûn de, me nikaribû tiştêkî hilda. Romê destê xwe dirêj kurdan jî dikirin.

Li ber avê gule avêtin, gotin tirk tên. Hemû kes neçar man ku wê şevê dereng xwe bavêjin avê (Ava Axuryan). Digotin aliyê nêzikê Tilik, nêzikê Elegyazê. Tevan xwe avêtin nav avê. Wê şevê gelek di avê de çûn û qir bûn.

Piştî em derbasê vî alî bûn, şev bû, tarî bû. Li vira jî me re digotin kurd jî derbas bûne û hatine. Gerek e mirov vê rastiyê bîne ziman. Ermenan digotîne hew xwedîtiyê li kurdan bikin. Ji ber ku ew jî bi me re hatine û zulm û zora tirkên faşîst qebûl ne kirine. Lewma wê şevê em bi cih û war kirin. Hîna wê çaxê li vira Yekîtîya Sovyêtê ne hatibû avakirin. Li Rûsyayê şoreşa oktoberê teze çêbibû. Heta sala 1920'ê hîna nû li vira ferdandariya Sovyêtê çêbû.

Sibê zû em rabûn. Kê zaroyên xwe wînda kiribû, kê qîza xwe, kê dayka xwe... Payiz bû ema te digot ka çî bûye ewqasî lehî rabibû. Lewma di rê de gelek çûn, wînda bûn. Piştî demekê, careke din dîsa em zivîrîn çûn aliyê Qersê. Bi xeberdana Rûsyayê gerek bû em bi şûn de biçûna. Salên 1919 û 1920, careke din em zivîrîn çûn cih û warên xwe. Her kes çû cihê xwe yê berê, mala xwe.

**REWŞEN:** Yanî mirov dikare bibêje ku wê çaxê Rûsyayê hûn qebûl ne kirin ?

**Casimê CELİL:** Na, qebûl kir. Lê xeberdan wisa bû ku wekî her kes gerek e vegere cihê xwe. Wê demê Kemal Paşa rabûbû. Helbete dengkirinekê di nava Rûsyayê û Kemal de çêbûbû. Tê bîra min, em zivîstanê jî li wir man. Kêmek jî salê, me li wê derê derbas kir, careka dinê, gotin me, gerek e hûn ji welatê xwe derkevin. Careka din em koçber bûn. Belê, vê carê qirkirin tunebûn.

Em hatin Ermenistanê û sêwî man. Malbata me mezin bû. Apanên min, xalanên min, em gelek mirov bûn. Belê kes ne ma, tev çûn.



Roma reş hate gehiştê vî alî jî. Ji hêla Lenînanê ve hate gehiştê Axbaranê, niha Elag Yaz dibêjin, yan jî Saxka Hovî dibêjin.

**REWŞEN:** *Hatina romê vê carê di kîjan salê de bû? Berî çend rojan ku em çûn wî gundî, digotin romê li vê derê 70 mîrên kurd ji dawetê derxistine û tev ji gundî dûr xistine û kuştine?*

**Casimê CELİL:** Baş nayê bîra min, ema ez texmîn dikim di sala 1919'yê de yan jî 1920'î de bû. Heftê-heştê çî ye? Ez bêjim sê sed, tu bêje na, pênc sed! Ez bêjim heft sed, tu bêje na, hezar! Gelekan kuştin, gelekan qir kirin û hemû jî bi hovîti.

Rom hatin, tê bîra min em li Pampa kurdan (Niha Sîpan) bûn. Du Pamp hebûn. Yek a ermenan bû û yek jî ya kurdan bû. Berî evarê jin û mîran digotin; rom hatiye! Belê dawet belav ne bû, gurme-gurma defê bû, govend digeriya. Dawetê de, aliyek jin bûn aliyek jî mîr. Paşê mîr birin, çûn. Çûn û êdî ne hatin. Ji ber spîtakê (Berê dogotin hemam) re birin. Tev di rê de kuştin. Paşê me bihist 3-4 mirov ji wan xelas bûbûn. Ev hovîti qet li ciyekî din ne bûye.

**REWŞEN:** *Wisan xuya dike divê em romanekê binivîsin. Rewşeka trajedîkî li vir jî hatiye pêkanîn. Em dixwazin careke din hîn fireh li ser vê yekê biaxîfin. Niha, em dixwazin bizanibin we çawa dest bi xwendinê kir û di rewşên wan rojan de, dewletê çawa alîkariya we dikir?*

**Casimê CELİL:** Filleh [ermen] jî aliyê me, ji Qersê-Dîgorê ez nas kiribûm. Ez birim avêtin sêwîxanê (vorpanos-êtîmxanê). Wê çaxê digotin Emerîka komekê (alîkariyê) dide sêwîxanan û Ermenistanê, wekî xwarinê, kinc û dermanan ji bona bijîn. Ji van sêwîxanan re digotin palîgon. Palîgon berê cihên leşkeran bûn.

**REWŞEN:** *Di sêwîxanê de wan, hûn bi zimanê kurdî hîndikirin an bi zimanê ermenî?*

**Casimê CELİL:** Na, her tişt bi zimanê ermenî bû. Lê belê min kurdî qet jî bîr ne dikir. Her demê min ji xwe re stran û helbestên kurdî digotin. Min digot: Ya Rebi-Xwede, dibe ku, ez rojekê karibim tiştêkî ji mirovatîyê û gelê xwe re bikim.

Xwişkên min jî çûn wînda bûn. Min jî yek wînda kir navê wê Xecê bû, Nayê bîra min di kîjan gundî de wînda bû. Belê ez dizanim ku gundekî fileyan bû û di sala 1920'î de bû. Çawa min got filehên nas, yê Dîgorê ez birim

sêwîxanê. Di sêwîxanê de, ez mezin bûm û min xwendina xwe di navbera salên 1920 û 1926'ê de, pêşxist. Ne ez tenê, bi hezaran mirovên weke me di van ciyan de hebûn. Jiyana me li wîra baş bû. Em birçî ne diman, mamostayên me baş bûn. Rojê sê caran xwarin didane me. Rewşa me baş bû. Ne xerab bû.

*"Dema em di Texnîkomê de bûn, di sala 1929'ê de li Bakuyê ji bona milletên biçûk alfabe ya bi tipên latîni çêdikirin. Eger ez ne şaşbim serkarê wê komê AZÛNDOF bû. Heta sala 1931'ê, êdî du-sê pirtûkên bi zimanê kurdî derketin. Vê carê kurdan dest bi xwendina xwe kir. Tipên latîni wê çaxê ji bona me hatin heqkirin. Vêca nebêje tipên latîni, bibêje zêr, bibêje şewq, bibêje tav û roj! Gelekî rind bûn. Ew tipên latîni gelekî bi kêrî zimanê me dihatin. Ew tip jî hêla Îshaq MOROGOLOV ve hatibûn çêkirin. Ew bixwe mirovekî Aşûrî bû. Hebû dev-devî 65-70 salan. gelekî têgihîştî bû."*

**REWŞEN:** *Niha jî em dixwazin bizanibin ku piştî we mekteba leşkeriyê bi dawî anî, we çawa dest bi xebata welatparêziyê kir? We çawa dest bi xwendin û nivîsandina kurdî kir?*

**Casimê CELİL:** Piştî min mekteba leşkeriyê jî bi dawî anî, ez hîna xort bûm. Wek 22-23 salî bûm. Ez hê nû ber bi çavan diketim. Xeberdana min, bîr û baweriyên min, kar û xebatên min, hêdî hêdî pêş diketin. Wê çaxê di navbera her sê dewletên Qafqasiyayê de; Gurcistan, Ermenistan, Ecemistan federasyon hebû. Gelê wan welatan, hêdî-hêdî ez nas dikim. Sala peşin a xwendinê, em hatin Tibîsê û li wîra gurcan jî ez nas kirim. Dû re li Erîvanê Texnîkom (zanîngeha navîn) vekirin. Vekirina Texnîkomê li ser bîngeha biryârên dewleta sovyetî bû. Ew jî girêdayê Texnîkoma pêdagogiyê ya Qafqasê bû. Heta wê gavê hîna mirovên xwendevan di nava gel de zahf derneketibûn. Bi tenê çend mirov hebûn, ew jî li gundan dijîyan û di hundirê saziyên dewletê de, cihên xwe ne girtibûn. Lê belê hinekî li ser karên çandê radiwestin. Wê çaxê wan ez nişan dam direktorê (serkarê) Texnîkoma kurdan a Qafqasiyayê. Ev ciyê pêşemîn bû ku, ji bo xwendina bilind a kurdî hebû.

Xwendevanên Texnîkomê ji sê dewletên cihê-cihê ên Sovyetê dihatin. Ji Ermîstanê dev-devî 30-50 mirov hebûn. Ji Gurcistanê û Ecemistanê nêzî 30 mirovan dihatin. Di wê demê de otonomiya kurdan di Azerbeycanê de hebû. Jê re digotin LAÇIN yan jî Lenîn jê re gotiye "Kurdîstana Sor."



Casimê CELİL, sala 1928

Ji bo fêrkirin û dersên kurdî keyseke baş bû. Vê otonomiyê ji sala 1923'ê heta sala 1929'ê jiyana xwe domand. Lê belê di dema Bagîrov de asimîle kirin, vemirandin û hînbûnê dan sekinandin. Li wîra kitebên dersê jî der-

**REWŞEN:** *Ew pirtûkên fêrkirinê yê destpêkê ji aliyê kê ve hatibûne nivîsin?*

**Casimê CELİL:** Kitab li ba min hene. Bîborin min navê wan mirovan jî bîr kirine. Ez dûre dikarim li kitêban vegerim.

Dema ez bûm direktorê Texnîkomê, gelek şagirtên min hebûn. Piraniya wan du-sê çar-pênc salan ji min mezintir bûn. Gelekî jîr û jêhatî bûn. Ez jî gelekî li ser xwe bûm. Ji hemû alîyan ve xebat û têgihîştina min xwe xurt nişan dida. Dema em di Texnîkomê de bûn, di sala 1929'ê de li Bakuyê ji bona milletên biçûk alfabe ya bi tipên latîni çêdikirin. Eger ez ne şaşbim serkarê wê komê AZÛNDOF bû. Heta sala 1931'ê, êdî du-sê pirtûkên bi zimanê kurdî derketin. Vê carê kurdan dest bi xwendina xwe kir. Tipên latîni wê çaxê ji bona me hatin heqkirin. Vêca nebêje tipên latîni, bibêje zêr, bibêje şewq, bibêje tav û roj! Gelekî



rind bûn. Ew tîpên latîni gelekî bi kêrî zimanê me dihatin. Ew tîp ji hêla Îshaq MOROGOLOV ve hatibûn çêkirin. Ew bixwe miroveki Aşûrî bû. Hebû dev-devî 65-70 salan. Gelekî têgihîştî bû.

Dema hîna min li Bakuyê dixwend, ew jî li ser van tîpan dihat û diçû, li ser dixebitî. Car jî caran banî min dikir me bi hev re gelekî dirêj-dirêj deng dikir. Wisan digote min: Te çawa zimanê xwe yê kurdî ji bir ne kiriye? Te çawa karibûye zimanê dayika xwe ev qasî biparêzi? Çawa min gotibû, di Texnikomê de ji her sê dewletan dev-devî 100-130 şagirt hebûn. Li kêleka vê jî, koma dersdaran a yekê jî hebû. Serkariya wê komê jî dabûn destê min. Li dora min gelek lawên kurdan kom bûbûn.

**REWŞEN:** *Gelo şagirtên te yê wê demê têne bîra te? Hinek ji wan niha li jiyane mane yan na? Navên wan çi ne?*

**Casimê CELİL:** Belê, zahf in. Gelek hene. Hinek jî di şerê împiryalizmê yê duwemîn de, dema me li hemberê Almanya Nazi şer dikir, hatin qirê. Gelek ji wan mirin. Lê belê va ye li gel hinekan ez jî dijîm. Eger dema we hebe em dikarin bi hev re herin malên wan jî. Niha nêzikê me hene; Afoyê Rûso, Sebriyê Aslan, Qaçaxê Mehmed û gelek lawikên me jî êla Brokan jî hebûn.

Di Texnikomê de, li ba min dixebitîn lawikên mîna Heciyê CINDÎ, Emînê EVDAL, Cerdoyê GÊNCO. Paşê dereng sala 1932'yê min çû Wezirê NADIRÎ anî. Dîsa li min hebû Etarê ŞERO. Li gel van revan jî hevalên me yê ermenî hebûn. Ji wan jî meriyên gelekî baş hebûn. Bi durustî kar dikirin û di xwendinê de gelekî li pêşbûn. Vana herdemê li kêmaniyên me xebir didan û dixwestin karê me xurt û geş bibe.

Dewşgirtiyê (afîkarê) min jî Vartan PÊTOYAN, bi xwe him mekteba polisîyê û him jî mekteba Rûhaniyê xilas kiribû. Vartan jî min bi nêzika 10-15 salan mezintir bû. Akadimik SORÊN YEREMİYAN jî wê çaxê li ba me kar dikir. Samson GASPIYAN jî ji aliyê Romê hatibû û li stran û awazên kurdî kar dikir.

**REWŞEN:** *Em dixwazin bizanibin ku te çawa dest bi nivîsa kurdî kir. We bi çi awayî dixwest girêdana xwe bi kurd û Kurdistanê ve bikin? Nivîsên te yê pêşîn çi bûn? Pirtûka te ya yekemîn kîjan bû?*

**Casimê CELİL:** We xêr e hûn lez dikin? (Apê Casim dikene) Ez pir dirêj dikim. Her tişt ji were kin gerek e. Lê belê ez nikarim. Ka em

îro piçekî li ser pirsê vê Texnikomê rawestin.

Di Texnikomê de, me kadirên hêja amade kirin. Dûre me di gelek gundan de bi zimanê kurdî dibistan vekirin. Di wan dibistanan de bi tîpên latîni ku Îshak MOROGOLOV çêkiribûn, dihatin xwendin. Me ziman û çanda kurdî dida hîn kirin. Ez dikarim niha hinek pirtûk bidim we ku, bi wan tîpan hatine nivîsandin.

**REWŞEN:** *We dibistana pêşîn li ku derê vekir?*

*"Xeberên tirkî û erebî me gelek bi kar dihanîn. Mê pêşiya xwe gelek ne didît. Yanî dema me dest bi xebatê kir, pêşiyên me keleporên mezin li şûn xwe ne hiştibûn.*

*Bingehên me ewqasî ne xurt bûn. Me pirtûkên xwe yê dersê tenê bi tîpên latîni diweşandin.*

*Hemû pirtûkên dersê cûre bi cûre, mîna pirtûkên ermenan me derdixistin. Naveroka hemû pirtûkan me jî zimanên din werdigerandin ser zimanê kurdî. Tenê pirtûkên litratûrê me bi xwe amade dikirin. Di nava vê xebatê de tiştêkî ku heta niha gelekî hêjayî bibînim ew e, ku me di sala 1930'ê de Atlasekê derxist. Niha jî wê Atlasê tenê libek li ba min maye. De bêje Apê Casim te çima hesabê xwe nekir, te şeş-deh heb hildaba! Ma te nizanibû ku tu wê bibi 82 salî û hînî bijî. Bi rastî gelekî dilê min têşe gava ku ez dibinim ji hinek pirtûkan tenê yek lib mane."*

**Casimê CELİL:** Me li hemû gundan, dibistan vekirin. Piştî sala 1931'ê di Ermenistanê de tenê wekî 30 gundên xwedî dibistan hebûn. Dibe bêhtir jî be. Navê wan gundan tev li ba min nivîsandî hene. Mamostayên van gundan tevan jî nava koma dersdara a li kêleka wê vebûbû, dihatin peydakirin. Gelek mirovên mamoste jî habûn bi zimanê ermenî xwendina bilind hilgirtibûn. Vana jî dihatin ba me hîne kurdî dibûn û dûre diçûn dibûn mamosteyên dibistanên kurdan.

Ew li ser van dibistanan tevan digerin. Me kêmaniyên wan nişan didan û rê li pêşiya wan vedikir.

Yanî dixwazim bêjim bi xebata texnikomê bingeha ziman û litratûra kurdî li vira hate danin.

Hinek dibêjin ku Erebe ŞEMO tîpên kurdî-latîni çêkiriye. Na, ev ne rast e. Erebe ŞEMO li ba Ishak MOROGOLOV dixebitî. Belê tîp bi destê Ishak hatine çêkirin. Gerek e mirov her tiştî rast bibêje. Wê demê pirtûkek dora 300 rûpelan jî hêla "komîteya tîpên latîni bona gelên biçûk" hate weşandin û tede jî bona 30-50 gelên "biçûk" tîpên latîni hatin amade kirin. Navenda wê komîteyê li Baku'yê bû û serkarê wê jî weke tê bîra min Axama OXLÎ bû.

Di Texnikomê de Ishak MOROGOLOV ders didan. Vartan PÊTOYAN jî aliyê Wanê bû, baş bi kurdî dizanibû. Wî jî ders didan. Yê-rêmiyan bi kurdî nizanibû, lê belê gelek tişt şirove dikirin.

Hemû pirsên diravî yê texnikomê dewletê li ser milê xwe girtibûn. Şagirtên texnikomê hemû tiştên di odên kurdan de hîn bibûn, ziman, folklor, taybetiyên kurdan û rûniştin û rabûna wan, cilên kurdan, gotinên wan, stran û awazên wan, jî hev re digotin û dinivîsandin. Di serî de jî alîkarê min Vartan Pêtoyan jî tevan bêhtir ev tişt kom dikirin û dinivîsandin. Wekî bi wê nivîsa li ser kurdan ewî dîsêrtasiya (xebata bona standina navê dotoryê) xwedî kir. Min didît ku ew çî dike. Belê hêviya min hebû wekî wê nivîsê neke malê mileteki din, bi helalî binivîse. Dûre min zanibû ku gelek tiştên kurdan kirine malê ermeniyên, yê Sasonê û cihên din. Belê, mirov dikare hebûnên her mileteki binivîsê, lê girîng e mirov pê ne leyiye, bi helalî bimîne. Mafê kesekê tuneye wekî hebûnên miletên din talan bike, bugêhere û bêxe bi navê gelê xwe. Niha di pirtûkxana min de libek jî pirtûka wî peyda dibe.

Hemû kesên di Texnikomê de, dixebitîn jî hebûna kurdan û hemû taybetiyên wan ne biyanî bûn. Xortên gelekî hêja û jêhatî bûn. Eger em baş bigerin wekî 20 mirovan jî şayirtên texnikomê hîna jiyana xwe dewam dikin.

Piştî du salan jî vekirina texnikomê me şadîmaniya du daliya wê piroz kir. Di tiyatroya Ermenistanê ya herî mezin de ku bi navê Sundukiyana e, gelek mirov me kom kirin. Nûnerîn gelek dewletan hazir bûn. Belê yê dewleta Romê ne hatin. Wana dixwestin jî dût ve zanibin em çî dikin, çî nakin. Wê demê her cihekî me lingê xwe tavê wê derê me serkevîtinê hêja pêktanîn. Kesekî pêşiya me ne digirt û ji me re asteng demedixistin.

**REWŞEN:** *Em niha dixwazin tu li ser rola xwe, li ser nivîs û xebatên xwe biaxivî. Te çawa dest bi komkirin û nivîsandina berhemên kurdî kirin?*



**Casimê CELİL:** Baş e, baş e. Ez neçar im li vira bibêjim.

**REWŞEN:** *Em bawer dikin ku eger bi vî cûreyî here, hemû rupelên REWŞENê jî têra me nakin. Em dikarin wan pirsan careka din vekin. Eger niha li ser xebatên xwe yê nivîsandinê rawestî, dê gelek baştir be.*


**Casimê CELİL:** Di Texnikomê de, pirtûkên dersê kêmbûn. Bi tenê, du-sê pirtûkan ronahî dîtibûn û dûre sekinibûn. Lewma wê çaxê ji bo vê pirsê verêsim, Komîta Navendî ya Partiyê gazi min kir. Êdî min di wî cihê de, dest bi amadekirina kitêbên dersê kir. Di vir de, ez dixwazim bêjim ku di nava fileyan (ermanan) de, gelek mirovên maqul hebûn, ku bi rastî wana jî bona kurdên Sovyêtê gelek xizmet kirine.

**REWŞEN:** *Weke em dizanin, ji demeka dirêj ve ye ku te di nava refên partiya kommunist (Bolşevîk) de, cihê xwe girtiye. Li vira em dixwazin li ser dîroka girêdana te ya bi Partiyê ve rawestin. Her wisan em dixwazin tu bidî xuyakirin, ku tiştên te bi Partiyê ve girêdidin çi ne?*

**Casimê CELİL:** Di sala 1926'ê min di nava refên Yekîtiya Xortên Kommunist-Kom-somolê de, cihê xwe girt. Belê di sala 1930'ê de, dema min di mekteba Vayênî li Bakuyê dixwend, ez têgihîştim wekî partiya kommunist xebatên gelekî baş û bi rêberiya rast ji bo hemû çîn û birên welatparêz weke karkeran, gundiyar, cotkar û paleyan, xwendevanan û hemû mirovên zehmetkêş, lewma min xwest ez xwe tevî vê partiyê bikim û ji bona hemû mirovatiyê xebatên xwe pêşkêş bikim. Piştî min daxwaza xwe nîşan da, ji bona partiyê gelekî bi şahî ez hildame ser destê xwe û endametiya min sala 1930'ê hate pejirandin.

Di despêka sala 1933'ê de, careka din Texnikomê gazi min kir, gotin, "Hevalê Casimê Celîl, çawa be te Texnikom gihandiye hev, pêş ve biriyê. Serkar hene, niha xebata wê ser hîmekî delal e, lê belê bona pirtûkan biweşînin, pirtûkên dersan û xwendinê, yê dinêzanbûnê (cografîyayê), matematîkê, fizîkê, kîmyayê û yê xwerustiyê, hata niha me kes peyda ne kiriye bona amade bike. Di dibistanên we de gelekî kêmasî ji ber neyîna van pirtûkan, hene. Ev ders hemû bi zimanê ermenî derbas dibin, em dixwazin ew jî bi zimanê kurdî çêbin. Lewma em dixwazin te bibin bikin serkarê weşandina pirtûkan. Hemû berpirsiyariya vî karî tu bidî ser mil xwe."

Pêşî gotin, gerek e tu pirtûkên dersê amade



Casimê CELİL, 1970

bikî. Paşê jî gotin, pirtûkên bedewetiyê, siya-setê [ramyariyê], partiyê û yê mayîn. Min got, hûn dizanin çawa dilê we dixwaze ez amade me. Li ber hemû zoriyan amade me. Weha jî bona navê Ermenistanê wekî ev çendê komekê (alîkariyê) dide me. Gotin, "madem ku wisa ye emê niha te biguhêzin ser pirtûkan."

Min got, ser seran û ser çavan û ez derbasê ser karê pirtûkan bûm.

Dema min berpirsiyariya pirtûkan da ser milê xwe, tê bîra min weke sê pirtûkan tenê hatibûn weşandin. Îshak MOROGOLOV, Robên DRAMPIYAN çêkiribûn. Lê belê destê Erebe ŞEMO jî tê de hebû. Bi xwe di navbera salên 1928-1930'an de, camêr di kelhê (zindanê) de rûniştî bû. Nawxazim bêjim çima, ema mirovekî xwenda bû. Camêrekî heja bû, zimanê rûsî xwendibû. Kurdî rind dizanî, eslê xwe ve jî şêx bû. Lê wekî ji bo şêxan gerek e divê hinekî bizanibe.

Derfetên me gelekî hindik bûn. Kadroyên ku vî karî zanibin tune bûn. Lê belê me bi çî halî be jî despêkir. Rola min ev bû ku him ez serkarê vê xebatê bûm û him jî bi xwe redak-

torê berpirsiyar bûm. Dema ez derbasê ser pirtûkan bûm, min nêrî [dikene] dora min tiştek tune ye. Bi tenê di nava 4-5 salan de du-sê pirtûk derxistine. Ema ew pirtûk tev bi tîpên latînî bûn. Tîpê latînî nebêjê, bêje cewahir Apê Casim! Bêje morî û mircanên di ustuyê bûkên şazdeh salî de darda kirî, dev û daweta wê ye. Heta îro jî ew tîpên latînî tén hez kirinê.

Biborin, ez dikarim bona hevalan plakatekê ya wan tîpan bişînim. Bi destê we diyarî hevalan bikim. Paşê bîne bira min. Min ew, ji wê çaxê ve, ji sala 1930'ê û 1931'ê, li ba xwe hiştine û hilanîne. Ezê bidim we. Paşê hûn dikarin mezin bikin. Ez ew diyarî we dikim. Dibe rojekê ji hêla gelê me ev tîp werin pejirandin. Ez baver dikim ev tîpên latînî wê bibin sertacê nivîsevanên me.

Piştî ez çûm ser karê pirtûkan, her tişt ket destê min. Êdî min bixwesta minê bixwara, vexwara, birijanda, bişewitanda û ava bikira. Her tiştê êdî ez bûm. Lewma min got: Yarebbî, xwedê wekî te evqas kar daye min ezê çawa karibim vê delametê bi temamî û bi durustî bikim û min hewl dida xwe ez di karê xwe bi şûn de nemînim. Di karvaniyê de min xwe xurt kir û kar bi tevayî li ser mirovên dora xwe



parve dikir. Her yek di warê zanîn û hişyariya wî de, min kar dida ber. Weke Haciye CINDÎ, Emîne EVDAL, Wezîre NADIRÎ, Cerdoyê GÊNCO û gelek hevalên fileh wekî Robêrt DRAMPIYAN û gelek hevalên mayîn.

**REWŞEN:** *Hûn dikarin dijiwariyên ku li ser xebatên zimanî derketibûn pêşiya we, bi hênin ser zimên?*

**Casimê CELÎL:** Xeberên tirkî û erebî me gelek bi kar dihanîn. Mê pêşiya xwe gelek ne didît. Yanî dema me dest bi xebatê kir, pêşiyên me keleporên mezin li şûn xwe nehiştibûn. Bingeheên me ewqasî ne xurt bûn.

Me pirtûkên xwe yê dersê tenê bi tîpên latîni diweşandin. Hemû pirtûkên dersê cûre bi cûre, mîna pirtûkên ermenan me derdixistin. Naveroka hemû pirtûkên me ji zimanên din werdigerandin ser zimanê kurdî. Tenê pirtûkên lîtratûrê me bi xwe amade dikirin. Di nava vê xebatê de tiştekî ku heta niha gelekî hêjayî bibînim ew e, ku me di sala 1930'ê de Atlasek derxist. Niha ji wê Atlasê tenê libek li ba min maye. De bêje Apê Casim te çima hesabê xwe nekir, te şeş-deh heb hildaba! Ma te nizanibû ku tu wê bibî 82 salî û hînjî bijî. Bi rastî gelekî dilê min têşe gava ku ez dibinim ji hinek pirtûkan tenê yek lib mane.

**REWŞEN:** *We çawa dest bi pirtûkên lîtratûr û toreyê kurdî kir?*

**Casimê CELÎL:** Hemû pirtûkên bedewiyê, lîtratûrê û toreyê, me ji lawikan dest pêkir. Me her tiştî ji folklor û serhatiyên kurdan digirt. Min digot kesên dora xwe, niha ewqas dema me tune ye em bikaribin tiştên nuh ên pir baş çêkin. De ka em niha folklorê xwe kom bikin, belav bikin û biparêzin. Bi ser de ji tiştên em biweşinin. Gerek e biçûk û mezin xwe lê bigrin.

Li gel vê xebatê jî me bi tîpên latîni di gundan de destpêkir ku mezinan hîne xwendin û nivîsandina kurdî bikin. Heta mirovên temenê wan 50 salî jî tevî komên vê hînkirinê dibûn. Bi van karên xwe me kir çavên mirovên xwe û hemû şagirtan vekirin. Me tevan bi hev re ev pirtok çêdikirin. Hinek jî min tenê çêdikirin. Belê me ev kar gelekî bi durustî dikir.

Paşê me dest bi weşandina pirtûkên ramyarî yanî pirtûkên Partiyê kir. Ber-pirsiyariya wî karî jî sipartine min.

**REWŞEN:** *Erê ew pirtûkên Partiyê ku we weşandine têne bira te?*

**Casimê CELÎL:** Belê, me gelek nivîsên

Stalîn û A. XANCIYAN derxistin. Paşê me Manifestoya Kۆmmunîzmê derxist. Di vî karê xwe de min gelekî bi dêhn û bal xebat dikir ku tiştekî li derveyê politîkaya dewleta Sovyetê nebe. Ew roj jî bona me gelekî hêja bûn û gelekî alîkarî bi me re dihate kirin. Her cara ku dê pirtûkek derketiba, berî bigihê weşandinê, min du-sê caran wê dixwend.

*".. di sala 1955'ê de, Radyoya kurdî, li Rewanê [Erîvan] dest bi jiyana xwe kir. Vekirina radyoya kurdî, berhemekî karê me ye ku gelek caran em çûn Moskoyê û daxwazên xwe ji bona berpirsiyariyên vê pirsê hildidan.*

*"Pêşiyê jî bo her rojê 15 deqîqe dane me. Roja 1. çileyê paşin jiyana radyoyê destpêkir. Çiqas ku hindik jî bû, lê me ew pejirand. Me got baş e ev gaveka yekemîn û encameka gelekî heja ye. Ji bona hamû kurdan me xwest em kar û barên hêja pêşkêş bikin. Ne tenê ji bona çend êl û eşîran, ne tenê ji bo kurdên li Sovyêtê. Belê me dixwest ji bo hemû gelê Kurdistanê bi pêlên radyoya xwe, dilevîniya xwe û rewan û hêrsa vegera welat em diyariyê bikin. Her weha jî bi vê yekê nişan bidin ku gelê me xwediyê hebûnên gelekî hêja û bi nîrx e.*

*"Rojnâmeya Riya Teze di sala 1930'yî de cara yekemîn hatiye weşandin. Bi rastî serkariya Ermenistanê wê çaxê komeka gelek mezin daye kurdên vê derê. Bi vê jî me li vîra di nava hemû gelên Sovyêtê de, da pejirandin ku em milletekî gelekî kevin in. Hemû gel û berpirsiyarê Ermenistanê di vî warî de, alîkariya me kirine."*

**REWŞEN:** *Weke em dizanin hinek pirtûkên te yê din jî hene. Weke: Xana Dimdim û yê mayîn. We çawan dest bi van nivîsan kir û di vî warî de prensîbên wê çî bûn?*

**Casimê CELÎL:** Pêşî, ez gelekî li ser vê pirsê radiwestim. Min got, heta em dest nehavêjin bostana dayka xwe, çawa zaroyek ku pêsiyêrê dayika xwe dimije û pê diji, em jî heta li bostanê dayka xwe xwedî dernekevin û nekolin kesekî me nikare pêşve here. Belê ka kîjan e ew bostan? Zengîniya çand û hebûna

kurdan wekî derya mezin e. Cihan tev destê xwe dirêj dike, jê direvine û dixwe û dibêje yê ne ne, ne kurdî ne û ne jî kurd hene.

Belê, di Kurdîstana delal de ku niha nava çar dewletan de hatiye perçekirin, bi kêmanî 25 milyon kurd hene. Li Tirkiyayê wekî 15 milyon kurd hene. Hîna jî dewlet dibêje "Kurd kimdir?" - "Kurd kî ne?" dibêjine me "tirkên çiyayî". Niha, va ye em bi zimanê tirkî nizanin, em bi zimanê kurdî deng dikin. Bavo vêca em çaw a tirk in?

Kurd xwediyê toreyeka gelekî kevin û hêja ne. Şekspîr di sedsala 16'ê de, em bir anîne û gelek tiştî jî toreyê Rojhilatî hildane. Em ji nisleta Ehmedê XANî ne. Em xwediyê Melayê CIZIRÎ ne. Ez çî bêjim hûn jî me çêtir dizanin. Ew kor in.


**REWŞEN:** *Piştî ku we li wê derê berpirsiyariya weşandin û derhanîna pirtûkan kirin, pê re we çawan dest bi nivîsandinê kir? Em dixwazin hûn hinekî li ser destpêkirina nivîsên xwe yê toreyê rawestin. Anku pirtûkên weke: Kurdê Bengî, Kofiya Diya Min, Oda Kurdan, Klamên Çiyan û yê dinê.*

**Casimê CELÎL:** Dema ez çûm ser karê pirtûkan, wê çaxê kesekî din ku wê wezîfê bikira tunebû. Ne kadroyên zana û ne jî rewşenbîrên ku karibin karekî weha birêve bibin peyda ne dibûn. Li wê derê em giştî bi hev re sê-çar mirov bûn. Ji nava wan wekî redaktor, bersivdar û serkarê vê pirsê ez hatim bijartin. Di wê navendê de, me gelek pirtûkên dibistanê û pirtûkên siyasî jî derxistin û gelek tiştên din.

Di pêşiyê de rola min bi wergerandin (tercume) destpêkir. Merema min jî vê ev bû ku gelê ermen, kurdan baş nasbike û zanibe ku kurd miletekî navdar û di hunerên xwe yê gelî de gelekî zengîn in. Piştî belavkirina çend pirtûkên fêrkirinê (dersê) dûre min hinek nivîs û helbestên Pûşkin wergerand. Her wisa jî nivîsên Hohanês TOMANIYAN min wergerand û ji gelek klasîkên mayîn, yê xweşnas. Lê hema berê her karekî, me hîma xwe dida pirtûkên dibistanê yê heta koma heştan. Min ev karê xwe tev Emîne EVDAL û Hecî, li wê derê berdewam kir. Paşê me êdî her yekê bi serê xwe kitêbên cûre-cûre çêkirin. Dû re mîna her nivîsevanekî kurd, bi dilê hesret û evîna welat, hêdî hêdî min nivîsên xwe belav kirin.

Me di nivîsên xwe de, di serî de girêdana xwe ya bi zimanê dê re, bi lîtratûr û zargotina kurdan re, xurt kir. Weke Dimdim, Memê û





Casimê CELÎL, 1980

Eyşê û gelek tiştên dinku van nivîsên pêşin li pêşiya me rê vekirin. Bi xwe ji nava toreya gelêrî me destan hildidan û ji nuh ve çêdikirin. Ne tenê me, weha kiriye. Belê, nivîsevanên mezin yê weke Pûşkîn û Hovhanês TOMANIYAN jî ji nava gelek tişt hildane û çêkirine. Yanî ne tenê mina ku tê gotinê hatine nivîsandin, belê rewanekî nuh mirov berdide ser wê destan an jî çîrokê.

Yanî di salên 1932-1933'an de, êdî weşandina pirtûkên me destpêkir. Ji wê rojê ve haya niha, bi zimanên kurdî û ermenî nêzikê hejmarê 12 pirtûkên min derketine.

Xebata min a nivîsandinê ez dikarim bi kinahî weha bînim ziman. Ema piştî wê demê bi çûn û hatinên gelek pêwîst, di sala 1955'ê de Radyoya kurdî, li Rewanê dest bi jiyana xwe kir. Vekirina radyoya kurdî, berhemekî karê me ye ku gelek caran em çûn Moskoyê û daxwazên xwe ji bona berpirsiyarên vê pirsê hildidan.

**REWŞEN:** Tu dikarî bi kurtî li ser rola xwe ya vekirina Radyoyê bipeyivî? Li rojên pêşin porgram çawa bûn?

**Casimê CELÎL:** Pêşiyê ji bona her rojê 15 deqîqe dane me. Roja 1. çileyê paşin jiyana radyoyê destpêkir. Çiqas kû hindik jî bû, lê me ew pejirand. Me got baş e ev gavêka yekemîn û encameka gelekî heja ye. Ji bona hamû kurdan me xwest em kar û barên heja pêşkêş bikin. Ne tenê ji bona çend êl û eşîran, ne tenê ji bo kurdên li Sovyêtê. Belê me dixwest ji bo hemû gelê Kurdistanê bi pêlên radyoya xwe, dilevîniya xwe û rewan û hêrsa vegera welat em diyarî bikin. Her weha jî bi vê yekê nîşan bidin ku gelê me xwediyê hebûnên gelekî heja û bi nîrx e.

Piştî me ev berhem bi dest xwe xist, vê carê ez bi giranî li ser programê rawestiyam ku me bibe niv saetê. Û me xwe gihande vê meremê jî. Paşê jî bû saetek û hêdî hêdî me gihande saet û nivêkê. Gelek dijarî û zehmetî li pêşiya me derdiketin. Belê her carê jî em bi ser diketin.

Di radyoyê de gelek mirovan li ba me kar dikir. Mîna Amedê GOGÊ (karbidestê radyo yê vê rojê), Xelîl MÛRADOV. Xabata min di radyoyê de ji sala 1955'ê heya sala 1963'yê berdîrêj bû.

Gelek stranbêj, sazband û hunermend, li dora radyoyê civiyabûn. Di nava wan de Memê, lawekî heja bû. Her weha jî Şamilê BEKO yê ku li meyê dixê û Egidê CIMO. Bi rastî hinekî din jî hebûn. Me tevan alikariya hev dikir û programên xwe zengîn dikir. Me cûre-cûre komên stran û awazan çêdikirin. Lê hema girîng e em vê yekê jî bînin ziman ku ev hemû hunermendên li dora me, vî karî bi dilxwaziya xwe û ji bo parastin û pêşvebirina çandî dikirin û qet buhayê vî karê xwe jî ne digirtin.

Bi vî rengî radyoya me jiyana xwe heya vê rojê berdewam kiriye. Di salên ez berpirsiyarê radyoyê bûm, dewletê ez berpirsiyarê yekemîn nas dikirim. Çi dema kêmaniyek an şaşiyek derketiba holê, wê çaxê hemû çareserkirina wê, dewletê ji min dixwest. Belê qet ji zehmetiyekê re min serê xwe netewand û heya me bingeha xebateka weha rast û xwedî serpêhatî danî holê, ez hema çûm ser her zorî û dijarîyan. Wê demê tişteki hazir tunebû. Dema me radyo vekir, tê bira min, min got, em tişteki naxwazin. Lê hema bê stran û awaz çawa dibe? Lewma serkariya Ermenistanê komek ji bo alikarî da me ku, em hevîyên gelê xwe pêş de bibin.

Piştî radyoyê, careke din ez wekî 10 salan vegeriyam hatim ser karê xwe yê şêşemîn; rastkirin, nivîsandin û derîna pirtûkan.

**REWŞEN:** Wisan xuya ye ku nêzî pira-niya gelê Kurdistanê guhdariya programên radyoya we dike û jê haydar e. Gelo hûn programên radyoyê çawa dibînin? Gelo bi bîr û baweriya we, îro ev radyo karê xwe çawa dike? Bi çi rengî dikare li ser 40 milyon kurd postdeyên xwe bihêle?

**Casimê CELÎL:** Radyoya me di bingeha xwe de ji bona kurdan û Kurdistanê hatiye vekirin. Na, ne tenê ji bo kurdên Ermenistanê! Ku niha hinek ji wan koçber bûne. Em baş dizanin ku radyoya me belavî tevayî Rojhilatê dibe. Nûçeyên baş digehine me. Ev jî hêrsa me bilind dike. Haya me jê heye ku pêşmergeyên rizgarî û serxwebûna welat, di baregeh û hêlînen xwe de, li ser serê çiyayên azad û leşkergehên hînbûn û perwerdebûnê de, guhdariya me dikin û bi stran û awazên gelî dilşad û dilxweş dibin. Weha jî gelek milletên din jî bi dengê me dihesin.

Heya vê rojê jî, em li ser wê pirsê radiwestin ku rêvebirina radyoyê li gora berjewendên hemû kurdan be, ne li gora rewşeka ku xwe li ser nakokî û dubendiyên êlî û olî weve pêşvebirin. Kurd bi hemû êl, eşîr û olên xwe ve tenê kurd in û girîng e di vê demê de ji bo



kurdayetiya xwe bixebitin. Ji hev hez bikin û piştgiyariya berxwedana gelî tev bi hev re bikin. Ev nêzikê du salan e, hinekî dijwarî û asteng pir bûne. Li hemberê van hemû zor û dijwariyan bi hemû derfet û delivên xwe, tiştên em dikarin bikin bi xurtî û rindî pêktinin.

*"Ew riya ku PKK'ê pê girtiye, riyeka heta dawiyê rast e. Riya rizgarî û azadiyê ye. Keç û xortên tede dixebitin û jiyana xwe ji bona gel diyarî dikin. Li hemberê her dijwarî û zoriyê, bi tenê berjewendên welat û gel diparêzin. Em gişt temamiya kurdên mayî, ew ên ku navê kurdan dizanin, pêşiyên xwe dizanin, kal û bavên xwe dizanin, gerek ji PKK'ê û di serkariya kurdan de paşde nemînin. Em gişt gerek e tevî wê serkariyê bibin û çî bi destan ve were ew ji bona tevayiya millet bi rê bixin."*

**REWŞEN:** *Tu dikarî hinekî salên pêşemîn ên dema weşandina rojnameya Riya Teze'yê bihênî bira xwe?*

**Casimê CELİL:** Rojnameya *Riya Teze* di sala 1930'yî de cara yekemîn hatiye weşandin. Bi rastî serkariya Ermenistanê wê çaxê komeka gelek mezin daye kurdên vê derê. Bi vê jî me li vira di nava hemû gelên Sovyêtê de, da pejirandin ku em milletekî gelekî kevin in. Hemû gel û berpirsiyarê Ermenistanê di vî warî de, alîkariya me kirine. Her kesê li vira, kommunistan, mirovên maqûl û yên ji derve hatine, tevan bi çavekî baş li kurdan dinêrin. Her çiqasî hinekî nebaş jî carnan peydadibûn, lê belê bi himlî çawa dewlet çawa gelê ermen, çawa partî gereke e z sipasiyê xwe ji bona wan binim ziman. Hindik jî be, gelekî komek alîkarî dane me. Niha gelek rewşenbîr û mirovên zana yên me kurdan li vira hene, di her babetekê de mirovên weke doktoran, endeziyaran, filologan û kurdologan, xwe pêşde birine.

Dema rojnameya *Riya Teze* derket, ji bona me kurdan çavronahiyeke gelekî mezin bû. Pêşî Heciyê CINDÎ li ser dixebitî. Li kêleka wî jî Emînê EVDAL û gelek hevalên ermen jî hebûn, ku bi kurdî gelekî baş dizanin. Vana di bingeha xwe de ji derdora Wanê hatibûn. Bi rastî vana mirovên gelekî halal bûn û niha hîna jiyana xwe berde-wam dikin. Alîkariya van mirovan gelekî gi-haye me kurdan.

Li ser bingehên ku rojname, radyo û pirtûkên kurdî derketin, bi rastî niha bireka rewşenbîrên hêja, mezin, delal û gelek maqûl jî çêbûne ku dilê mirov gelekî şad dikin. Em bi hebûna wan dikarin hesab bidin, ku gelê me li vira çiqasî xwe pêş xistîye.

Kurdên me, zû hîn dibin. Hiş û bîrên wan, hîna li ser wê yekê ye, ku hema wekî tiştêkî hîndibin, êdî jî bîrkirina wan tune ye. Çi zimanî dibe bila bibe, kurd dikarin bibin hêzên hilgirtina xwendin û zanîna bilind.

**REWŞEN:** *Her weke dihête zanîn, niha li Kurdistanê, nivîsevanên xort, ên bi Zimanê Zîmakî dinivîsin, hene û di tore û çanda kurdî de, dest bi vekirina rûpeleka nuh dikin. Em dixwazin Apê Casim ku, xwendeyê ev çend serpehatiyên jiyane ye, mesajekê ji nav rûpelên REWŞENê bigihîne ji bo wan xortên nuh ber bi nivîsa rastîniya xwe ve diçin.*

**Casimê CELİL:** Ji roja ku destpêbûne, rojname, radyo û pirtûkên me, ji wê rojê ve heya îro, her demê şîreta me ji rewşenbîr û cahilên (xortên) kurdan re ew e, ku em yek millet in. Lê cûre-cûre eşîret hene, ku ev eşîret nayêne wê manayê [wateyê] ku her bi serê xwe milletek e. Na, em hemû kurd in û girîng e ev bawerî me gişan komê ser hev bike. Em giş xwediyê yek ziman, xwendin, gotin, çand, zargotin û rewanekê ne. Her wehaji stran, awaz û govendên me yek in. Me tenê bi vî rewanî bangên xwe bilind kirine. Îro jî em banî hemû xort û rewşenbîran dikin ku bila zanibin kurd û Kurdistan li benda wan e. Girîng e her mirovekî welatparêz û dilsoz girêdayê axa bav û kalan bimîne û di avakirina welatekî serbixwe û azad de ew jî kevirkî di cih de lêbike. Bila her kes zanibe mirovê bê welat be, tu mafê jiyane jî bo wî li derekê peyda nabe. Jiyan tenê bi girêdana gel û welat ve dikare berde-wam bibe.

Xortên me li ser riya rast hîn bûne. Va ye heval pir in. Hûn bi çavên serê xwe dibinin ku çiqas hezkirina wan ber bi serxwebûn û azadiyê ye, ber bi Partiya Karkerên Kurdistan-PPK'ê ye. Ev li ser bîr û baweriyên rast û li ser riyeka pak çêbûye. Belê, li ba me jî hîna gelek kes hene ku bi bîr û baweriyên xwe gelekî li paş mane. Dixwazin kurdan ji bona berjewendên xwe perçe bikin. Vana destê xwe dihavêjin her karekî nebaş û vê dawiyê jî bi pîrsa ofî, bi vir û derewan, bi xulamî û koletiya biyaniyan dixwazin yekîtiya gelê me ji hev de bixin. Dîsa dibêjin dîrok wê navê wan kesan bi reşî binivîsîne. Gelê kurd jî dê hesaba xwe ji wan bigre û bersiva wan bide. Serkeftin tenê ji

bona hêza rast û yekîtiyê ye. Hûn dibinin ku ji sedî 95 (% 95) kurdên Sovyêtê hêvî û hatina xwe bi riya rast ve, bi rewanê mêranî û qehremaniyê ve dane girêdan.

**REWŞEN:** *Em dixwazin Apê Casim ni-hêrîna xwe li ser riya xebata van nivîsevanên nûhatî nîşan bide. Divêt van nivîsevanên nuh bi çî awayî bi girêdana çandê û zargotina kurdan, roleka vejandina jiyana gelî hildine ser milên xwe û ji bo çand û toreya qedexekirî ya gelê me yê bindest, bi çî awayî kar û xizmetê bikin?*

**Casimê CELİL:** Ez bawer dikim ev gilî gelek rast e. Bêyî gotinên kal û bavên, bêtê-gihîştina bûyerên derbasbûyî, bêhezkirina kurd û Kurdistanê, kesek nikare tiştêkî bi nîrx û giranbuha derêxe holê. Ne di warê nivîsandinê û ne jî di warê kar û xebatê de. Xortên me niha mezin bûne û heta gelek jî me jî pêşdetir çûne. Şikir ji navê Xwedê re! Li ser hîmê folklor û zargotinê û evîna kurd û Kurdistanê pêşve çûne. Niha ez dikarim bêjim tevayî dest bi kar û xebateka nuh kirine. Belê ka çiqasî dê bigi-

*"Belê, eger milletek biryara xwe bike yek, çiqasî hêzên xerab û hov li hemberê wî rawestin jî, nikarin meşa wî ya ber bi serkeftin û serfiraziyê rabiwestînin. Em van dersan ji dîrokê baş hîn bûne. Nemaze ku milletek kurdan gotin û karê wî yek e. Rast e, heta koçberaka bilind politîkayên dijîmin yên asimilasyonê, cihê xwe girtine. Hûn dibinin ku, nivê me çûye û nivî maye. Eger em vê rewşê nedin rawestan, yên mayî jî wê wînda bibin. Belê tenê peşmerge bi yekbûna kurd û Kurdistanê dikarin vê yekê bikin. Pîrsgirêk jî di yekbûnê de ye. Her yek dibêje ez mezinê filan partiyê me, nizanîm çî. Bi şaşî nêzikê yekîtiyê dibin. Gerek e, yekîti tenê ji bo xurtkirina berxwedana gel û rizgariya welat çêbe. Hemû nêrinên şaş girîng e ji holê werin rakirin."*

hin berhemên hêja û pêşve herin, hîna jî me ve baş xuya nîne. Em rê li pêşiya tevan vedikin. Ji tevan re pêşketin dixwazin. Mirovên ku derefetên mezin li pêşiya wan hene gelek in.



**REWŞEN:** *Em dixazin bibêjin ku, îro li Kurdistanê têkoşîneka nuh û nûjen destpêki-riye û bûye xwedî derfetên gelekî mezin. Weke dihête zanîn, ev têkoşîn ji bona serxwebûn û azadiyê ye. Îro bi hezaran pêşmergeyên me li çiyayên Kurdistanê cihê xwe girtine. Em, dixwazin Apê Casim ji wan re gotinekê bibêje. Anku tu silavên xwe çawan ji wan re dişînî.*

*" Gelê kurd li Yekîtiya Sovyêtê dilşad û dilbivîn dibe. Gelek baş dizanin ku, îro pêşmerge gelek zordariyan dibîne. Zivistanê, buharê, payizê li çiyân ji bona azadiya kurdan jiyana xwe gorî dikin. Divê jiyana me ji bona wan be. Lewra jiyana pêşmergeyan ji bona tevayiya kurd û Kurdistanê ye. Derfet nîne em jiyana wan ji vê rastiye endam bikin. Em gelekî mezinahiya wan dibînin. Rewanê wan pak dibînin. Ji ber ku ew ji bo gelê xwe, ev karê mazin û giran dane ser milê xwe. Ev keda wan ji bona 30-40 milyon mirovên kurd e û di cihanê de winda nabe û dê bighîje rojên xwe yê rohnî. "*

**Casimê CELİL:** Kal û bavên pêşiyên me, berê bêhtirî 4000 salan, her demê azad bûne, tenê aza mezin bûne. Kurdistan jî welatekî di tevayê cihanê de, bi ciwanî û rengîniya xwe navdar e. Ji her hêlê ve, zencîrên çiyân li ser axa Kurdistanê digihin hev. Zagros, Cûdî, Gebar, Agrî, Nemrût û hwd, ewrê Kurdistanê bi tevayî xemilandine. Jiyana kurdan û azadiya wan jî bi van çiyân ve dihate girêdan.

Kurd mêr in. Dibêjin em kurd in, hene di dunyayê de, belê kêmin in. Kurd di dilê min de, her xortekî wan dikare bi deh şervanan re ser bike. Kurdan tevî hemû êrîşên dijminên biyanî, dîsa heya vê rojê karibûne xwe biparêzin. Her çiqasî dagîrkaran bi sistemên gelekî dijwar asimilasyon li ser kurdan bikaranîne, lê belê dîsa ziman û hebûna kurdan, heya vê rojê hatine parastin û niha kurd xwe gelekî serbilind dibînin.

Her dem di pîlanên hêzên dagîrker de, ji hebûnê rakirina kurdan hatine danîn. Nemaze

piştî şerê cihanê yê yekemîn ku Kurdistan bû çar parçe, vê carê bi hemû azîneyên faşîst, hov û barbar xwestin pirsra kurdan bikin pirsra milletekî ji-holê-rabûyî. Lê belê, careka din kurdan heya pîvaneke bilind şerê xwe di bin ala netewî de bilind kirine û niha tevgera nûjen bi destxistîne. Bi armanc û daxwaza serxwebûn û azadiyê kurd diçîne pêş.

Lê belê mêr in kurd, cahil [xort] û qîzên kurdan nebez in eger ku qet serdestiya biyanîyan qebûl nekin. Şerê niha di welat de xurt dibe ev şerê hemû kurdên welatparêz e. Şerê rûmet, namûs, şeref û hebûn û tûnebûna kurdan e. Ne şerê komeka biçûk e. Niha tevayiya gel mafdariya di vî şerî dizane û her yek di nava rêzen xwe yê pîroz de cihêk ji bo xwe wergirtiye.

Dijmin hîna dixwaze asimilasyonê li ser me zêde bike. Zimanê me, kultura me, gotin, awaz û helbestên me didizin û dikin malê xwe. Bi ser weha dibêjin ku qet milletek bi navê kurdan tune. Ev li ku jî mîjara me bi kêmanî 30 milyon mirov hene. Ev reşiyeka gelek mezin e ji bo wan. Giring e cihan vê mafkujîya li ser kurdan nepejirîne. Giring e dengê xwe hilde bêje, na kurd xwedî dozên mafdard in. Çawa ji bona her mileteki mafê çarenûsiyê heye, giring e ku ji bona kurdan jî ev maf were bidestve xistin. Kurd jî di mava malbata mirovatîyê de cihêkî xwe bi azadî bigrin.

Dijminên Kurdistan, me tirk, ereb û faris hesab dikin. Ev nerastiyeke bêmîmûne ye. Kurd jî berê ve hebûye û dê her hebe kurd.

Ew riya PKK'ê pê girtiye, riyeke heta dawiyê rast e. Riya rizgarî û azadiyê ye. Keç û xortên tede dixebitin û jiyana xwe ji bona gel diyarî dikin. Li hemberê her dijwarî û zoriyê, bi tenê berjewandên welat û gel diparêzin. Em gişt temamiya kurdên mayî, ew ên ku navê kurdan dizanin, pêşiyên xwe dizanin, kal û bave xwe dizanin, gerek ji PKK'ê û di serkariya kurdan de paşde nemînin. Em gişt gerek e tevî wê serkariyê bibin û çî bi destan ve were ew ji bona tevayiya millet bi rê bixin.

Lo, helbete zorî û nexweşî li pêşiya me gelek in. Li pêşiya kurdan pirsgrîrek gelek in û her gelek in.

Ez weha kin dikarim bêjim, belê kirinên me kurdan gerek giş bighin hev. Keda me, teveçûna me, hêvî û armancên me tev yek bin.

**REWŞEN:** *Kurdên Sovyêtê çiqasî deng û bahsên pêşmergeyan guhdarî dikin? Li hevberî cenga rizgarkirina welat erk û dela-*

*metên xwe çawan dibînin?*

**Casimê CELİL:** Gelê kurd li Yekîtiya Sovyêtê dilşad û dilbivîn dibe. Gelek baş dizanin ku, îro pêşmerge gelek zordariyan dibîne. Zivistanê, buharê, payizê li çiyân ji bona azadiya kurdan jiyana xwe gorî dikin. Divê jiyana me ji bona wan be. Lewra jiyana pêşmergeyan ji bonatevayiya Kurdistanê ye. De-

*" Me Bêrîvana xwe ji bo temamiya qîz û keçên kurd û Kurdistanê nişan da. Ne tenê Bêrîvanê ji xwe re nav qezenc kir. Navê milyaketa, navê pakiya qîz û kulfeta kurd li dinyayê xist. Bêrîvan niha bona me kurdan tev bûye ziyarefî. Bûye piroziyeka gel a gelekî giranbuha. Li ku derê ew laşê pak danîne Rehme lê bel-ji bona me bûye nişaneka hezkirin û evîna welêt. Hûn dibînin her rojê, bi sedan daxwaz digihin berpirsiyariya radyoyê. Helbesta Bêrîvanê dixwazin her êvarê bibihên. Hemû kurdên Sovyête weha ne. Ez dixwazim her qîzeka kurdan, her keçeka kurdan mîna Bêrîvanê be. Gelek bi evîn û dilxweşî em guhdarê vê helbesta weha xweş hatî çêkirin, dikin. "*

refet nîne em jiyana wan ji vê rastiye endam bikin. Em gelekî mezinahiya wan dibînin. Rewanê wan pak dibînin. Ji ber ku ew ji bo gelê xwe, ev karê mazin û giran dane ser milê xwe. Ev keda wan ji bona 30-40 milyon mirovên kurd e û di cihanê de winda nabe û dê bighîje rojên xwe yê rohnî.

Gelek milletên bi 3 milyonan, bi 5 milyonan xwe xwedî dikin. Bi serbilindî jiyana xwe dibin. Ew serbixwe welatê xwe ava kirine. Belê hîna milletê me nikariye xwe bigihîne avakirina dewleteka serbixwe. Hîna me mafê xwe bi dest ve nehanîne.

**REWŞEN:** *Lewma ji ber vê yekê ye, kurd neçar in. Lê îro destê xwe avêtine çekan û ji bona rakirina dagîrkeriya biyanîyan bi biryardarî cengê dikin. Tenê bi vê riyê mirov dikare zoreka şoreşgerî derxîne holê. Ji xwe di cihanê de wekî xuya bûye, eger heta dawiyê, gelê vî welatî li teniştê hemû azîneyên xebatê çeka zorê pêk neyîne, rewşeka bi rohnî ji bona welatekî dagîrbûyî peyda nabe.*



**Casimê CELİL:** Dijminên li hemberê gelê Kurdistanê rawestane, bi rastî gelekî hov û barbarên sondxwarî ne. Hebûna me qet bi rengêkî na pejirîne. Li hemberê rewşeka weha ma gelo derefet heye ji zimanê çekan pêve, ji mirov fam bike? Na, heta dawiyê girîng e em vî azîneyê bikarbînîn, tucaran sist nebin.

Belê, eger milletek biryara xwe bike yek, çiqaşî hêzên xerab û hov li hemberê wî rawestî jî, nikanin meşa wî ya ber bi serkeftin û serfrazîyê rabiwestînin. Em van dersan ji dîrokê baş hîn bûne. Nemaze ku milletê kurdan gotin û karê vî yek e. Rast e, heta koçberaka bilind politîkayên dijmin yên asimilasyonê, cihê xwe girtine. Hûn dibînin ku, nivê me çûye û nivî maye. Eger em vê rewşê nedin rawestan, yên mayîn jî wê wînda bibin. Belê tenê pêşmerge bi yekbûna kurd û Kurdistanê dikarin vê yekê bikin. Pirsgirêk jî di yekbûnê de ye. Her yek dibêje ez mezinê filan partiyê me, nizamim çî. Bi şaşî nêzikê yekîtiyê dibin. Gerek e, yekîti tenê ji bo xurtkirina berxwedana gel û rizgariya welat çêbe. Hemû nêrînan şaş girîng e ji holê werin rakirin. Evji bo yekîtiyê pir gerek e.

Gelê kurd tu caran welatê xwe nekiriye navendeka êrîşbaziyên li ser gelê derdorê. Her dem bi viyan û xwestekên xwe, dijê şer derketiye. Bi tenê ji bona parastina azadiya xwe destê xwe avêtîye çekan. Li welatê bav û kalan şerê jiyane domandiye.

Rast e di Kurdistanê de li cem kurdan hinek ermenî jiyane. Lê belê bi êrîşên hov û barbar yên dewleta Roma Reş, ermenî hin hatin qirkirin û hinek jî reviyên Ermenîstanê. Di vir de dixwazim bêjim gunehê kurdan di vê pîrdê de nîne. Guneh yê kî ye, divê ew xeber bidin. Kurd bi hebûna xwe aşîxwaz in û qet êrîşên xwe nebirine ser mafê milletên din.

**REWŞEN:** Em weha dibînin ku helbesta "Bêrîvanê-Bêrîvanê" weke di radyoya kurdî de, dihê bihistin, bûye malê hemû kurdên Sovyete jî. Ev stran li ser zimanê her kesî ye Bêrîvanê-Bêrîvanê. Her weke "Bêrîvanê" bi

*xwe jî pehlîvaniya jina kurd di hundirê xwe de pêktîne. Em dixwazim Apê Casim ji me re çend gotinan di warê vê helbestê û jina kurd de bibêje.*

**Casimê CELİL:** Me Bêrîvan'a xwe ji bo temamiya qîz û keçên kurd û Kurdistanê nişan da. Ne tenê Bêrîvanê ji xwe re nav qezenc kir. Navê milyaketa, navê pakiya qîz û kulfeta kurd li dinyayê xist. Bêrîvan niha bona me kurdan tev bûye ziyareti. Bûye pîrozîyeka gel a gelekî giranbuha. Li ku derê ew laşê pak danîne - Rehme lê be!- ji bona me bûye nişaneka hezkirin û evîna welêt.

Hûn dibînin her rojê, bi sedan daxwaz digehineber destê berpirsiyariya radyoya kurdî. Helbesta Bêrîvanê dixwazî her êvarê bibihên. Tevayiya kurdên Sovyete weha ne.

*" Riya Bêrîvanê girîng e, riya hemû jinên kurdên welatparêz be. Bêrîvan ku îro bûye destaneka qehremaniyê, mirov vê manayê têderdixê ku êdî jina kurd zencîrên koledariyê çirandiyê û di nava rêza pêşmergeyên egîd de cihê xwe girtiye. "*

*Hêviya min ew e ku hûn silavêd min bigehînine hemû şervanêd serxwebûn û azadiyê, di serî de rêberê gelê me Serok APO û hemû mirovên welatparêz û şoreşger. "*

Ez dixwazim her qîzeka kurdan, her keçeka kurdan mîna Bêrîvanê be. Gelek bi evîn û dilxweşî em guhdarê vê helbesta weha xweş hatî çêkirin, dikin.

Riya Bêrîvanê girîng e, riya hemû jinên kurdên welatparêz be. Bêrîvan ku îro bûye destaneka qehremaniyê, mirov vê manayê têderdixê ku êdî jina kurd zencîrên koledariyê çirandine û di nava rêza pêşmergeyên egîd de cihê xwe girtine.

**REWŞEN:** Bibore, me tu gelek westandî. Niha em dixwazî Apê Casim li ser rûpelên kovara me REWŞENê gotineka xwe bigehîne xwendevanan. Li ser kovara REWŞENê bi kurtî hûn dikarin çî bibêjin ji xwendevanên Kovarê re?

**Casimê CELİL:** Dema mirov kovara REWŞENê, dixwîne, rastiyê tedê dibîne. Her tişt vekirî û zelal dibîni. Bona yekîtiya millet û pêşveçûna wî, bona em bibin hêzeka xurt û serbixwe, girîng e, em pêşî Zimanê Dayka

xwe biparêzin û pêşve bibin. Di hemû nivîsên xwe de bangên hevgerî, yekîti û berxwedanê bilind bikin. Bi vê yekê emê karibin bersiva demê bidin û li kal û bavên xwe xwedî derkevin. Dibe ku dema berê gelek nexweşî di nava me kurdan de habin, lê belê di rojên îroyîn de, di vê bafelîskê de, her tişt girêdayî ye bi zimanê dê ve, bi lîteraturê ve, bi hevkarî, yekîti û pişgirtinê ve. Em hêvîdar in ku kurd li ku derê dibe bila bibê, kurdîtiya xwe jî bîr neke, gelê xwe jî bîr neke û zimanê dê û bavên hîn geş bike.

Biborin, ez dixwazim di vir de çend giliyan derheqa koma stran û awazan, *Koma Berxwedan* de bibêjim.

Ew ne tenê *Koma Berxwedan* ye, ew koma rewanê kurd û Kurdistanê ye. Wekî em stran û awazên wan dibihîsin, bi rastî em gelekî şad dibin. Rewşa şer, qehremaniya pêşmergeyan, dilevîni û lehengiya gel, xweşiya çiya, deşt û baniyên welat, tevan bi hevretînin ziman. Hûn dibînin ku çawa hemû kes dixwazî weşanên komê ji xwe re peyda bikin. *Koma Berxwedan*

xwe gihandiye hemû taxên erdê me. Di welatê me de kesek tune ye ku li ba wî kilamên *Koma Berxwedan* ê peyda nebe.

*Koma Berxwedan*, çî dibêje dilê me û ruhê me de rûniştiye. Beden, sifet, şer bedewatî, mêranî û mêrxasiya kurdan nişan didin. Ji bo vê yekê lê xwedî bin ku nehêlin ev kom ji hev belav bibê. Ev kom ji Xwedê de hatiye, milyaketa berhevê ser hev kiriye. Çî xebere jî de vê wan derdikeve, ew xeber bona me ziyareti û pîroz e.

Gotinên *Koma Berxwedan*, dengkirina wan, giliyên wan, dengbêjiya wan, ji me re ziyareti ye. Em teweqe dikin wekî hemû kesetên wan û bi teybetî yen nuh derdikevin hûn bona me bişînin. Bi rastî em bi hewceyê vê yekê ne.

Hêviya min ew e ku hûn silavêd min bigehînine hemû şervanêd serxwebûn û azadiyê, di serî de rêberê gelê me Serok APO û hemû mirovên welatparêz û şoreşger.



## Dîmenek

### Ji Jînenîgariya Îsmail BEŞİKÇÎ

Di sala 1939'ê de, li bajarê Çorûmê - li Îskilîpê, çavê xwe li dunyayê vekir. Di sala 1962'yê de xwendegeha ramyariya bilind a bi navê "Siyasal Bilgiler Fakültesi"-li Anqerê, bire serî. Heyamek li avahiyeka dewletî mamûrî kir. Di sala 1964'ê de, li unîversîteya (zanistgeha) Erzeromê, mîna asîstanê sosyolojiyê (civatasîyê) dest bi kar kir. Doktora xwe ya li ser babeta sosyolojiyê, di sala 1967'yê de têkuz kir. Di vê salê de, beşdarî hinde xwepêşandan û numayîşên (meeting) li Kurdistanê bû. Ji bo vê yekê, xebateke vekolînî amade kir. Dûre, di sala 1969'ê de, pirtûka xwe ya bi navê "Sazendiya Rohilata Anatolyayê-Bingehên Sosyo-Ekonomîkî û Etnîkî / Dogu Anadolunun Duzeni-Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temeller" nivîsî. Ji ber amadekirina vê pirtûkê, rejîmê, ji karê xwe yê unîversîteyê ew derxist. Di sala 1971'ê de, rejîmê ew girt û sizand Bi bexişandina giştî (genel af) ya sala 1974'ê, ji girtîgehê derket. Piştî ku azad bû, xwast karê xwe yê li unîversîteyê berdeyam bike. Lê careke din karê wî yê berê nedane wî. Li sergotina "azîneya zanistî - bilim yontemî" û li ser, li Tirkîyê bideştgirtin û bikaranîna vê gotinê, vekolîn çêkirin. Wî, ev vekolînên xwe, mîna pirtûk dane weşandin. Ji ber van pirtûkên wî, rejîmê dîsan ew girt û xiste zindanê. Hingê sala 1979'ê bû. Paşê rejîmê ew ajot girtîgeha Adapazarî yê. Sala 1981'ê di vê girtîgehê de bû.

Sala 1981'ê, ji hêla Rêxistina Hindekarî, Zanist û Ferhengê ya Koma Neteweyan - UNESCO (United Nations Educational Scientific and Cultural Organisation), mîna, sala Atatîrk hatibû

daxuyanîkirin. Îsmail BEŞİKÇÎ ji zindanê nameyeka 70- 80 rûpelî, ji vê rêxistinê re nivîsî. Tê de, li ser vê karguzeriya wan a şaş, rexne girtin û rewşa dagîrkerbûna Atatîrk, a li ser gel û welatê kurdan, ji wan re bi awayekî xurt da ber çavan. Wê demê, li tiliyên destên wî û li serê wî xistin û şikenceyên dirinde û hovane pê kirin.

Di sala 1980'yî de, dema di girtîgeha Stanbolê (girtîgeha Toptaşı) de bû, ji seroka Yekîtiya Nivîsevanên Swîsrê, ji Madam Boulanger re nameyek nivîsî. Di vê nameyê de, mêjokdarî û şovenîzma dagîrkerên tirk li ser hebûn û hêjayiyên gelê kurd salix da û ew rewşa han rexne û teşîr kir. Nimûneyek ji nameya wî kete destê şikencekarên zindanê. Hingê, biryarên li ser pirtûkên wî yên derbareyê kurd û Kurdistanê, yek bi yek vebir dibin û dagîrkerên kemalîst, jê re bi dehan sal ceza birîn. Ew her di "mehkemeyên kemalîstan" de, parastina maf û berjewendên gel û welatê kurd bi gerdenezadî û nebezî berdeyam kir.

Di navbera salên 1981 û '87'ê de, şeş salan di girtîgehê de ma. Dema sala 1987'ê de ew ji girtîgehê berdan, rojnamevanek, ji wî welê pirsî: "Neha tu ji zindanê derketî, tu çi difikirî?" Îsmail BEŞİKÇÎ bersiva wî dide, dibêje: "Eger di welatekî de girtiyên zindanan benzîn bi ser serê xwe de werkin û xwe bisotînin, cudabûna derva û hundurê vî welatî tune ye! Tirkîye bi çarmedora xwe zindaneke tarî ye!"

Ji ber pirtûka xwe ya bi navê "Kurdistan: Dagîrgeha Di Nav Dewletan De / Devletlerarası So-



murge Kurdistan", di destpêka meha avdara sala 1990'î de, dîsan ji nuh ve ew girtin û avêtin zindanê. Dema li zindanê bû, du pirtûkên wî yên din jî, yên bi navên "Zanistî - İdeolojiya Fermî, Devlet - Demokrati û Pirsra Kurdan / Bilim - Resmi ideoloji, Devlet - Demokrasi ve Kurt Sorunu" û "Rewşenbîrek, Rêxistînek û Pirsra Kurdan", hatine weşandin. Li ser vê yekê, "mehkemeyên kemalîstan" cezayên xwe li ser wî bêhtir û pirtir kirin û xwastin di navbera 7 û 15 salan de cezayê zindanî bidine wî. Di vê navberê de gelek caran ew derhanîne mehkemeyên kemalîstiyê. Wî di "mehkemeyên kemalîstan" de jî, tiştên ku li van pirtûkên xwe nivîsîbû, bêtirs û bi mîranî, li pêşiya ruyên dadgîrên (sawciyên) kolonyalîst qîriya. Di mêjûya 19'yê hezîrana sala 1990'ê de, dîsan ew derhanîbûn mehkemeyekê. Gava wî dest bi axiftina xwe kir, wisan got: "Dema ku min ji girtîgehê dihênine vir, ez li ber geleki dijwarî û zorkariyan dimînim. Wan li nezaretxaneyê jî destên min li kelemçê ez didim rûniştandin. Dema ez dihême daniştina (celseya) dadgehê, ez dibînim ku polis li temaşevanan dixin. Li vê derê jî em li binê darê

polîtîkayeka terorî ne. Dewleta tirk di vê dawiyê de, li gundê Gêrê 27 hemwelatîyên kurd kuştin. Lê vê qirîkirinê dixê ustiyê PKK'ê. Nabe! Em tucaran vê napejîrînin! Ev qirîkirinê e ku ji aliyê hêzên dewletê ve pêkhatiye. Çapemenî (press) û weşanên tirkî, li ber van bûyeran, mîna buroyeka MIT'ê dixebitîn. Ez protest dikim!"

Di meha tebaxa sala 1990'î de, gava ji girtîgehê hate der, dîsan rojnamevanekî tirk jê pirsî: "Dewlet di îddîayên xwe yên li hevberî te de, dibêje ku tu propagandaya kêrîkirinê (boluculuk) dikî. Tu derbareyê vê yekê de çi dibêjî?" Îsmail BEŞİKÇÎ lê vedigerîne û dibêje: "Rast e, bûyerêka kêrîbûnê heye. Lê bi kêmanî divê em vê bûyerê jî destpêka vê sedsalê, ji mêjûya sala 1919 û '20'î ve de bigirine dest. Yên ku gel û welatê kurdan tevî împeryalîstên Îngîlîz û frensiyên kêrî kiribûn, nikarin ji yekî din re bibêjin kêrîkar! Yên ku gel û welatê kurdan kêrî kirine dewletên Îngîlîtere û Frense, dewleta Tirkîyê û bi taybetî jî Mistefa Kemal Atatîrk bi xwe ne!" Niha jî li ser vî mirovê gerdenezad û rûmeta dostaniya gelan, meheme jî derve berdeyam dikin.



## "Xwebirêvebirin û xweidarekirina kurdan ya herî xerab, ji birêvebirin û idarekirina herî baş a van dewletan çêtir e."

- Di nivê meha tebaxê de, parlamentera almanî Angelîka BEER û rojnamevanê îtalî Marco TRONTI, di gel İsmail BEŞİKÇİ hevpeyvînek kirine. Gava BEŞİKÇİ di vê hevpeyvînê de bersiva pirsên wan da, li ser xapandina otonomiya dijimini welê got: "Xwebirêvebirin û xweidarekirina kurdan ya herî xerab, ji birêvebirin û idarekirina herî baş a van dewletan çêtir e." Anku Ev dewletên dagîrker ku dibêjin me bi nîya otonomiyê, xwebirêvebirin û xweidarekirina herî baş û qenc kirîye para kurdan, ew hêzên dijimini ne ku dijminatîya herî xirab li ser vî gelî dîkin. Ma gel û milletek bêhîrî 30 milyonan ne hêjayê azadiyê ye? Bê guman gelê kurd jî weke gel û milletên din hêjayê serxwebûnê ye.

- Ev dagîrkerên nehemdem, bersivên xwe welê ji BEŞİKÇİ wergirtin: Bihêlin bila gelê kurd xwe bi xwe û serbixwe, xwe idare bike.

- Bidestxistina materyal, nivîsar, hevpeyvîn û berhemên BEŞİKÇİ yê heya neha bi zimanê kurdî hatine nivîsîn, gelekî bitixûb (mahdûd) in, yan jî qet nîn in. Ji ber vê hindê ye û ji ber ku BEŞİKÇİ di vê hevpeyvînê de li ser Têkoşîna Rizgariya Netewa Kurdistanê, dîsan diyardanên gelekî girîng û helez dike, em li jêrê, vê hevpeyvîna Angelîka BEER û Marco TRONTI di gel BEŞİKÇİ hatiye kirin, ji xwendevanên REWŞENê re, bi kurtebirî werdigêrinin kurdî.

**Angelika BEER:** Ez jî, di wê danîştina dawiyê ya ku hûn tê de hatine berdan, beşdar bûm. Rewşa dawîya dawayê, dizanim. Gelo dewleta tirk, ku bi ev çend lédanan baş û xurt ketiye tengezariyê, di danîştina roja 11'yê îlonê de dikare çi helwêstek nişan bide?

**İsmail BEŞİKÇİ:** Di rojên 11 û 12'yê îlonê de, du roj li pey hev danîştin heye. Ez wisa bawer im, ev her du dawan, dê bi hev re werin girêdan û bibin dawayekî. Pêşiyê sê dawa hebûn. Wan bi hev girêdan û xistin du dawayê. Neha jî ya duwemîn dê bi ya yekemîn ve bihêre girêdan. Bi gotineke din, dê dawîya danîştinan neyê. Lê belê hingê, ez jî, di babeteka din de hinde diyardanî bikim. Ev diyardan dê derbareyê rengê sizadan û mehkemekirina tirk û babeta Kurdistanê be. Anku, çawa Tirkîye, Kurdistanê mehkeme dike û mehkemekirinên di babeta pîrsa kurdî de, ji kûja sizadan û dadgeriya (huqûq îcrakirina) tirk ve, dihête kîjan wateyê (manayê)?

Ji bo nimûne, ev heftê sal in dawayên derbareyê Kurdistanê li Tirkîyê çawa çêdibin? Ji kûja pîrsa kurdî, dadimendiya (hukuk) tirk dadnasiya (adalet) tirk dihête çi wateyê? Herî pir ez dixwazim li ser van tiştan rohnî bikin û di danîştina min a roja 11'yê îlonê de, ez dixwazim her tenê vê yekê derînim ber çavan.

**A. Beer:** Tiştê ku van Qerarnameyên Siyasî (ramyarî) yê vê dawiyê derxistin holê welê bûn: "Diviya ku te yan bigota "hemû kesên vî welatê tirk in û vê yekê bipejiranda, yan jî vê yekê negota û nepejiranda. Gava eger te wekî wan jî got; hingê, tu dê rastiya xwe wenda bikira û tu dê biketaya rewşeke tawanberiyê (sûcdariyê). Lewra rejîm dixwaze ku sistemeke (sazûmaneke) weha ava bike. Lê di vê

dawayê de mehkembûna we bi xwe, bi serê xwe tenê be jî, li hevberî van polîtîkayan rabûna we, li hevberî vî tiştî rawestana we, gelo vana, ji betalmayina van polîtîkayan re nikarin bibine nişanek?

**İ. Beşikçi:** Dibe jî. Lê belê tiştê baştir nişan û diyar e û fonksiyona van Qerarnamayan bi wan daye wendakirin ev tişt bi xwe ye: Di mêjûya (tarîxa) 10'ê hezîrana 1990'î de, li gundê Gêrê 27 hemwelatîyên kurd hatin kuştin. Hingê radyo û televîzyona tirkî got ku "PKK'ê bi kuştina zaroyan berdewam e. Şebekeya destbixwîn, jin û zaro dikuje." Roja piştî çapemeniya tirk jî bi semivîsîn (manşetên) xwe yê mazin nivîsîn, ku PKK'ê bi kuştina zaro û jinan ve û bi kuştin û birînên xwe ve, berdewam e. Lê piştî çend rojan, roja 12'emîn yan jî 13'emînê hezîranê derkete meydanê, ku van kuştinan her bi xwe bi destê hêzên rejîmê hatine kirin. Gelo min baş da têgihîştin yan na? Anku derket meydanê ku van kuştin û cînayetan, kuştina zaro û jinan, bi destê hêzên rejîmê bi xwe çêdibin û PKK'ê ji ber vê yekê berpîrsiyar dijmêrin. Lê amanc û mebesta Qerarnameyê, weşartina vê rastiye bû. Dîsan amanca wan, li ber vê rastiye asteng derhanîn bû. Astengbûna li ber agahdariya dengê giştî, ji vê rastiye bû. Lê rasti di demeke kin de hate zanîn û deşîfrekirin. Li gor bîr û baweriya min, Qerarname di vê xalê (nuqteyê) de fonksiyona xwe wenda kir.

Li teniştê vê jî, mirov dikare bibêje Qerarname welê hinde ne bêfonksiyon e. Ji bo nimûne mirov gava pirtûkekê binivîsîne û bibe çapxaneyê, çapxane dibêje: "Ez nikarim vê pirtûkê çap bikim. Ji ber ku Qerarname heye. Eger ez vê li çapêdim, dê çapxanewere girtin û cezayê bidine min. Dibêje ku hingê min

têkine hundir jî." Bêguman li ber belavkirina bîr û hizrên mirovî, li ber çap û belavkirina pirtûk û kovarên mirovî ev kirina han astengeke girîng e. Em li vê derê posîde û hikariyên ku van Qerarnamayan dikarin bikin, dibînin. Ji ser vê astengê gavavêtin welê hêsan jî nîne. Dîsan ji bo nimûne, dema ji bo çapkirina pirtûkê mirov here çapxaneyêke din, her ew jî dibêje ez nikarim li çapêdim. Mirov nikare çapxaneyêke sêyemîn jî peyda bike. Lê li hevberî vê yekê, dîsan jî mirov bîr û baweriya xwe bi hinde riyan dikare bide xuyakirin. Mirov nikare kovarê bide weşandin, lê bi fotokopî dikarî bîr û baweriye xwe biweşîni. Li şûna heştê rûpelî, bîst rûpelî-diweşîni. Li şûna pênc hezarî, pênc sedî çap dikî. Lê bi fotokapiyê. Her dîsan jî mirov dikare riyên ji ser Qerarnamayan gavavêtinê bigere û bibîne. Ji ber vê yekê dê ev Qerarname wisan temendirêj nebe.

**M. Trontî:** Her bi vî awayî mirov dikare bibêje, li gor atmosfera rojên ku hîna teze ev Qerarname derketibû, rewş piçeke ber bi başiyê ve dihere. Hûn vê yekê bi çi ve girêdidin?

**İ. Beşikçi:** Îro li Kurdistanê şerekî çekdarî heye. Dengê giştî heya kerta xwe ya dawiyê polîtîze bûye. Neha ev girîng e. Ji bo nimûne li dora gundekî şerekî çekdarî dibe. Gerilla û esker li hev dixin. Em bibêjin ku sê esker dihêne kuştin û gerilla jî bêyî ku ji wan yekî were kuştin, bi şûn de dikişin. Lê êvarê televîzyon wisan nabêje. Televîzyon dibêje "terorîstekî kuştî kete dest." Ji kuştina eskeran çi kadeknake. Anku tiştê ku li dora gundê milletê dibe û tiştê ku televîzyon dibêje, ji hev cuda ne. Belê, lê gel êdî bi çavkaniya deng û nûçeyên (xeberên) rejîmê bawer nake. Li şûna wê, guhdariya BBC, Radyoya Komara İslam a Ecemî, Radyoya Erîvanê guhdarî dike.

Anku baweriya xwe bi danezanên waliyê Kurdistanê û danezanên çapemeniya tirkî nahêne. Ji xwe çapemeniya tirkî, li dervayê nûçe û danezanên waliyê Kurdistanê pêve, nûçeyeka din nikare bide. Bi gotineke din çavkaniyên nûçeyên tirkî; radyo û televîzyona tirkî, çapemeniya tirkî, nîrx û bihayên xwe yê pêbawerbûnê wenda kirine. Gel destpêdike nûçeyan ji Ecmistanê, ji Erîvanê û ji BBC'yê guhdarî dike. Wisan diyar e ku Qararname di van mercan de nikarin fonksiyonekî dagirin. Ji xwe tiştên dibin millet venaşêre. Ji bo nimûne tiştê ku li gundekî dibe, gundên din zû pê dihesin û piştî çend rojan her kes pê dizane.

**M. Tront 1:** *Tu dikarî bibêji ku di destpêkirina kêmbûna posîde û hikariyên ve Qararnameyê de, bi hinde cûreyan, rola zexnişandana dengê giştî ya cihanî jî tê de heye?*

**Î. Beşîkçî:** Erê, mirov dikare wisan bibêje. Ji bo nimûne min gava din kada bûyerekir. Bûyera gundê Gêrê. Televîzyona dewletê teşqeleyek mazin kir. Got "PKK'ê zaro û jin kuştine" Rojnameyên dîtira rojê vana dane xuyakirin û nûçeyên van rojnameyan hatine fotokopî kirin û şandine Kopenhagê. Wan ev nûçeyên şaş şandin Komcivîna Hevkarî û Parastîniya Ewropayê - KHPE'yê, ku hingê li Danîmarkê civiyabû ser hev. Hikûmeta tirkî li wê derê hewl da ku vi tiştî bibêje: "Hûn piştigirîya PKK'ê û kurdan dikin. Hûn rû didine wan. Ew ji we piştî û moral digirin û kuştin û cinayetan çêdikin. Zaro û jinan dikujin. Ew mirovên ku hûn piştigirîya wan dikin ev in."

Wan fotokopiyên nûçeyan bi vi rengî hatine belav kirin. Lê piştî çend rojan, kurdan rastiya ve bûyere dane zanîn û gotin ku ev kuştin û vekuştin bi destê dewleta tirkî ve pêk hatiyê. Di ve xalê de kurdan girovên (delîlên) berçavî dane nişandan. Belê, ev tişt dewleta Tirkîyê, di rewşeke pir tengzariyê de hişt. Hem li Helsînkîyê û hem jî li Kopenhagê pir di tengzariyê de hişt. Di ve rewşê de dewleta tirkî nikare bi biryardariya xwe ya berê, di şopa Qararnameyê de here û ji reaksiyona dengê giştîya cihanî xwe diparêze. Anku bi vi rengî kuştin û cinayetçêkirina rejîmê, bûyereka bi serê xwe ye. Dengê giştî ya cihanî bi serrastî pê dizane ku rejîma tirkî ve kuştinê bi destên xwe kiriyê û car bi car jî ve kirinê dihêne bira wê.

Belê, wisan biryardarbûna di warê Qararnameyêka welê de, reaksiyona dengê giştî ya cihanî, spartekeke girîng e. Mirovên ku beşdarê civînên li Helsînkîyê û li Kopenhagê dibin, ve bûyere bi birxistina bi diplomat, bi rojnamevan û bi nûnerên universîteya rejîma

tirkî, bûyereka gelek girîng dihênine ber çavan.

**A. Beer:** *Li hevberî gelê kurd xurtbûna terora dewleta tirkî, têkoşîna serxwebûna kurdan di mehên avdar, nîsan û gulana ve salê de, gehişte gehînekeke nuh. Hat û gehişte e gehînekeka welê ku mirovên kurd bi mêr û jin û zaro reaksiyonên girseyî nişan dan. Tirs ji holê rabû. Ew bîr û baweriya, ku dibêje "tenê bi têkoşîneka rêxistî gehîştina armancê mumkun e," cîyê xwe girt. Hingê ez bi xwe jî*

*"Bi baweriya min li Tirkîyê avahiyêke îlegal heye. Anku li tenişta hikûmetê, hinde grûbên ku hikûmet nikare kontrol li ser wan bike, heye. Ji bo nimûne ji her çar salan carekê hilbijartin çêdibin û partî jî beşdarî van hilbijartinan dibin. Ji hilbijartinan parlamentekê derdikeve meydanê û parlamento jî hikûmetekê çêdike. Bi rastî di civateke demokrat de ji her çêbûn û rûdanan divê hikûmet berpirsiyar be. Lê, li Tirkîyê pirs Kurdîstanê ne ew pirs e ku ji hêla hikûmetê ve dihê bir û hizirkirin û birêvebirin. Li Tirkîyê di pirs Kurdîstanê de, nîrx û qiymeteka herî hindik a hikûmetê, a partiyên ramyarî û a parlamentoyê nîne. Pirs Kurdîstanê bi bingeşî û bi tevahî jî hêla Encumena Parastîna Netewî (Millî Guvenlik Kurulu) ve dihê bîr û hizirkirin, pêkanin û li karxistin. Ji bo nimûne li Kurdîstanê gû bi mirovan didine xwarindanê. Hêzên legal ên dewletê wisan bi hêsanî nikarin gû bi mirovan bidine xwarindanê. Lê, li ve derê hinde hêzên li dervayê bir û hizra hikûmetê dixebitin hene, ku hikûmet nikare wan kontrol bike. Û li ser jiyana siyaseta tirkî kar û giraniyên berçavî yê van hêzan bêhtir e. Ew van politîkayan jî bi rê ve dibin."*

*li wê derê bûm. Min ew hevoka (cumla) ku dibêje "Tiştê ku em wenda bikin tune!" gelekî caran dibihîst.*

*Neha piştî ve bûyera Iraqê, di ve rewşê de çî guherandin dibe çêbin? Tirkîyê ku endamê NATO'yê ye, di bin navê amadekariyên li hevberî xetera Iraqê, dikare çî bi gelê kurd bike?*

**Î. Beşîkçî:** Li pêşiyê ez dixwazim tiştêki din li ser ve babetê bibêjim. Divê ev jî were ser zimên. Lewma berî ve bûyere di axaftina li ser ve yekê de sûd û kelk heye. Li ser kurdan li Tirkîyê terora dewletê heye. Anku ya ku terore dîke rejîm bi xwe ye. Ji bo nimûne rejîm dikare li Kurdîstanê welê jî bike: Zaroyan li binê dîwarekî rêz dike. Li hêla din, li binê dîwarekî jî, bav yan jî kalên van zaroyan dîke rêzê. Du malên li beramberî hevdu lêkirî hene. Li ber dîware malekî bav û kal şikencê dibînin, li ber dîware mala dinê jî zaro û zêrçên wan. Dewleta tirkî ber çavên zaroyan şikencê bi bav û kalên wan dikin. Dewlet van hemû tiştan dike. Li ber çavên peya şikencê bi jinan dikin. Ev bûyere li hemû qada Kurdîstanê berfireh e û her dem rû dide. Ya terore dîke dewlet bi xwe ye. Îro hêzên parastîni yê tirkî (devlet guvenlik guçleri), li Kurdîstanê, li çî demekê, çî mirovekî bixwazin, dikarin bikujin. Bi hêsanî dikarin vi karî bikin. Çî pirs û astengek li ber wan nîne. Û tu kes jî dermafê wan de çî pîrsekê nikare, ji wan bike. Ji xwe li gora mercên Rewşa Awarteyî (Olaganustu Hal) jî, kes derbareyê wan hêzên parastîni de nikare pirs û pîrsiyarekê veke. Dadgerî û sizadana (icrayê huquq) li dermafê wan, tenê jî hêla avahiyên birêvebirinî (maqamên îdarî), bi xwe ve, dikare bibe. Bi gotineke din, ew hêzên taybetî di dadgehên normal de nikarin werin dadgerî û sizadanê. Teroreka tund a dewletî heye. Ji bo birrîna dengê gefî, bi awayekî tundî, hemû cûreyên zext û zordariyê bi kar dihênin.

Ez dixwazim bi taybetî li ser du bûyeran rawestim. Ya pêşîn, di meha çirîya duwem (november) a sala 1989'ê de bûyereka li gundekî Hekarî bi navê Setê ye. Di meha 24'ê çirîya yekem a sala 1989'ê de, li gundê Setê, li Hekarî, bi zar û zêrç nêzî 30 mirovên kurd hatine kuştin. Rejîmê ve qirkirinê dihavêje ser PKK'ê. Dibêje "PKK'ê kuştîye." Lê belê rewş ev e ku em baş pê dizanin kirina ve qirkirinê bi destê rejîmê bûye. Ya duduyan jî, ew bûyere ku me gava din çêla wê kir. Bûyereka li gundê Gêrê ku di 10'ê meha hezîrana sala 1990'î de hatibû pêkhatin. Ev jî jî hêla hêzên parastîni yê rejîmê pêk hat. Lê dîsan jî dihavêjine ser PKK'ê. Ez dixwazim ve bûyere bi hênime ber çavan: Vana tev qirkirin in. Van qirkirinên li Kurdîstanê tev kir û karên dewleta tirkî ne. Û dewleta tirkî vana di zemanekî welê de dike, ku ji bo nimûne, di senatoya amerîkî de, li ser qirkirinên ermenan bemameyeka pêşniyarî heye. Çapemenî û dewleta tirkî dibêje; "me qirkirin û tiştê welê ne kiriyê. Me ermenan gelekî baş xwedî kiriyê. Ji ber ku ermen nankor in, van çeyîyên me nabînin." Ez dix-



wazim vê yekê bidime ber çavan. Gava ku Tirkiye bi qirkirina ermen dihê tewanberkirin û di demeka ku qirkirina ermen di çapemeniya tirk de bi israr dihête inkarkirin, vêca dewleta tirkî li Kurdistanê dest bi qirkirinan dike. Wê ev tişt du caran kiriye. Bi zar û zêrç pêşiyê 30 kesan û paşê jî 28 kesan dikûje û hewl dide ku vê bike ustuyê PKK'ê. Lê belê di warê bi destê dewletê kirina van cinayet û qirkirinan de, piçek jî gumana me nîne. Dewlet van tiştan dike.

*"Îro gotareka Gorbaçov hate weşandin. Ev cara yekemîn e ku Gorbaçov derbareyê Rohilata Navîn de hinde tişt dibêje. Gorbaçov di vê gotara xwe de rexneya Iraq û Sedam Husênî dike. Dibêje ku "min çek dabûne te ku ev çekên parastinê bûn." Mirov dibêje qey wî ev çekên han ji bo li hevberî Israîlê bikaranînê dane Seddamî. Gorbaçov her wisan berdewam dike û dibêje "te rabû ev çekên han li hevberî Kuweytê bikarhanîn." Gorbaçov ji bo vê yekê rexne li Seddamî digire û ewî bi xiyaretê tewanber dike. Lê, ma ne sal-sal û nîvekê berê bû, ku her ev çekên sovyetî li başûra Kurdistanê, li Helepçê hatine bikarhanîn? Bi deh hezaran mirov bi wan hatine kuştin. Anku çekên kîmyewî bi deh-hezaran mirov kuştine. Wê gavê dengê Gorbaçovî her demeket. Qet tiştek ne got. Hetta Sedam Husênî jî ber bikaranîna çekên kîmyewî rexne jî ne kir. Hingê jî çekên sovyetî li hevberî kurdan hatibûn bikarhanîn. Lê Sovyetê rexneyeka herî biçûk jî ne hanî ser zimên. Ji ber ku ev çekên ku li Kuweytê hatine bikarhanîn, Gorbaçov hîna jî neha de radibe rexne li Seddam Husênî digire."*

**M. Trontî :** Baş e, li Tirkîyê mirovên ku piştgirîya vê yekê dikin kî ne? Kok û binyada vê polîtîkayê çî ye?

**Î. Beşikçi :** Bi baweriya min li Tirkîyê avahiyeye îlegal heye. Anku li tenişt hikûmetê, hinde grûbên ku hikûmet nikare kontrol li ser wan bike, heye. Ji bo nimûne ji her çar salan carekê hilbijartin çêdibin û partî jî beşdarî van hilbijartinan dibin. Ji hilbijartinan parlamente-

kê derdikeve meydanê û parlamento jî hikûmetekê çêdike. Bi rastî di civateke demokrat de ji her çêbûn û rûdanan divê hikûmet berpirsiyar be. Lê, li Tirkîyê pîrsa Kurdistanê ne ew pîrs e ku ji hêla hikûmetê ve dihê bir û hizirkirin û birêvebirin. Li Tirkîyê di pîrsa Kurdistanê de, nîrx û qiymeteka herî hindik a hikûmetê, a partiyên ramyarî û a parlamentoyê nîne. Pîrsa Kurdistanê bi bîngehî û bi tevahî jî hêla Encumena Parastina Netewî (Millî Guvenlik Kurulu) ve dihê bir û hizirkirin, pêkanin û li karxistin. Ji bo nimûne li Kurdistanê gû bi mirovan didine xwarindanê. Hêzên legal ên dewletê wisan bi hêsanî nikarin gû bi mirovan bidine xwarindanê. Lê, li vê derê hinde hêzên li dervayê bir û hizra hikûmetê dixebitin hene, ku hikûmet nikare wan kontrol bike. Û li ser jiyana siyasetê tirkî kar û giraniyên berçavî yên van hêzan bêhtir e. Ew van polîtîkayan jî bi rê ve dibin.

**M. Trontî :** Ez jî neha miraçan dikim ku vana çî tewr mirov in. Anku van mirovên van polîtîkayan bi rê ve dixin, xwediyê bîngêhên civakî, ferhengî û psikolojîkî ne?

**Î. Beşikçi :** Ji bo nimûne dihête gotin ku "Ozel Tim" (Tîmê Taybetî), vana xwediyê perwerdekirin û hindekariyên taybetî ne. Li gor bir û baweriya min gava vana dihêne perwerdekirin, li ser bîngêhê dijminahiya gelê li herêmê jî hindekar û perwerde dibin. Van mirovên ku em ji wan re dibêjin "Ozel Tim", ji bo şerîyê li navçeyên Kurdistanê hezkirin û rêzgirtineka herî hindik jî hîs nakin. Gelekî bi hêsanî dikarin mirovan bikujin. Gelekî bi hêsanî dikarin xwe bilivînin. Bi gotineke din ji perwerdekirin û hindekarkirineke taybetî ve dihêne derbas kirin.

**A. Beer :** Di wateya li hevberî kurdan, hevxebatkariyêke navneteweyî de, li welatê me jî, li Almanyaya Rojava, li hevberî PKK'ê, ji tawanberkirina "damezirandin û piştgirîkirina rêxistineke terorîst", li gor zenda xalê 129a dawa hatine vekirin û birêvebirin. Gelo bi ev tiştên ku we li jor gotî û ev daxwaziyên dijminane yên mîna bi dawînanîna pîrsa kurdî, bi hev re ne girêdayî ne? Li dervayê vê jî, gelo hêzên dijminên kurdan, ji sûdwergirtina keys û derfeta krîz û aloziya peravê (xelîcê), li hevberî kurdan bikaranîna çekên kîmyewî, bi qirkirînê girseyî, ma bi vî rengî dikarin bir û hizira "çareserkirineke" serteser (ebedî/nîhayî) bikin?

**Î. Beşikçi :** Ez ne bawer im ku Iraq û Tirkiye di vê rewşê de, dê şerê hev bikin. Her çend di rewşa îro de Tirkiye xwe li hevberî Iraqê, li hêla Rojavê xuya dike jî, dîsan ez ne

bawer im ku di rewşa cengeke germ de Tirkiye bi Iraqê re bikeve cengê.

Eger rewşeka welê rû bide, ev dê weha be: Tirkiye dê kurdên Iraqê biçewsîne, cih û warên wan bombbaran bike. Desthelatiya Iraqê jî, dê li kurdên Tirkiyê xe. Ez ditirsim ku wilo bikin. Ji ber vê çendê ye ku divê mirov li dijî şerî raweste.

**A. Beer :** Ma dibe ku hinde rewş û hêlên vê bûyerê hebîn ku di nav hêzên çep de û her weha jî di nav tevgera kurd de, bi tevayî bibe sedema kêrîbûn û jihevqetandinekê? Ji bo nimûne weke xetara dema ku mirov xwe li hevberî Saddamî bigire, dikare bibe piştgirî imperyalîzma amerîkî? Li gor dîtina we, posîde û hikariyên vî tiştî li nav bizava kurdî, dê çî bibe? Gelodî vî warî de, hinde pîrs dibe xuya bibin yan na?

**Î. Beşikçi :** Erê. Îro Kurdistan welatekî perçe û kêrîbûyî ye. Gel û milletekî perçekirî li holê ye. Ev babeteka heya kerta xwe ya dawiyê girîng e. Anku di destpêka sedsala 20'î de, parçekirin û kêrîkirina Kurdistanê bûyereke gelekî girîng e. Hingê imperyalîzma îngilîzî, dewleta Tirkiye, dewletên ereb û eceman Kurdistanê di navbera xwe de par û kêrî kirine. Ji xwe diwariya bîngêhîna a di bizava kurdî de, ji vê derê derdikeve. Anku mirov mîna tevgera rizgariya neteweyî, ne tenê li hevberî Iraqê rawestiyayî ye. Ne tenê li hevberî eceman têdikoşe. Têkoşîna li ciyekî, dibe sedema li hevberî kurdan rabûna hemû hikûmetên li herêmê. Rewşa berçavî ev e. Ev rewşa berçavî li ber te dibe kosp û asteng. Ev di pîrsa Kurdistanê de her dem hebûye. Îro jî heye. Ji ber vê hindê tevgerên siyasîyên kurdî, yan jî kadroyên ku têkoşîna rizgariya neteweyî bi rêve dibine, ew xweş û baş haydarê vê rewşê ne. Ji ber ku liv û xebata di vî warî de gelekî sext û dijwar e.

Ji bo nimûne îro Celal Telebanî ji Kurdistana başûr, çûye Amerîkayê. Ev çend roj in ku çapemeniya tirkî vî tiştî guftûgo dike. Dibêjin gelo dê Celal Telebanî li Amerîkayê çî bibêje? Gelo dê Amerîka wî qebûl bike? Gelo dê Amerîka bi wî re hevduîtinekê bike? Eger diyalogek hebe, gelo ew dê çî bi hev re bipeyivin? Belê, ev çend rojin ku çapemeniya tirkî her roj van tiştan guftûgo dike. Çapemeniya tirkî di ser de jî rêberî û aqil nîşaniya Amerîkayê dike. Dibêje ku: "Pê re hevduîtîna çênekin! Wî qebûl nekin! Bawerî bi wî neyînin!" Anku dema kesek ji Kurdistana başûr dihere Amerîkayê û ev kes çapemeniya tirkî bi awayekî tund têkildar û eleqedar dike. Ma li Ecemistanê jî tevgera muxalîfiyê tune ye?

Çima têkildarê wan nabin? Em bibêjin ku serokê tevgera muxalîfî ya ecemî, çûye Amerîkayê yan jî Fransayê. Em bi vê yekê nizanin. Çapemeniya tirkî vê yekê nizane û li ser vê yekê napeyive. Mesût Recawî jî serokê tevgera muxalefetiye ye. Ciyê Mesût Recawî, çûna wî ya Amerîkayê, hebûn û tunebûna wî em pê nizanin. Çapemeniya tirkî li ser vê yekê napeyive. Lê belê çûna Celal Telebanî, çapemeniya tirkî jî nêzîkî ve têkildar û dike. Çimku ev babeteka li ser kurdan e. Ev yek derbareyê kurdên li başûrê Kurdistanê ye. Lê ji ber ku bi awayekî organîkî û ji nêzîkî ve jî kurdên li Tirkîyê eleqedar û têkildar dike, loma çapemeniya tirkî jî gelek rojan vê de ye ku li ser vê yekê rawestiyaye û guftûgo dike. Dibêje gelo dê wezîrê derveyî yê amerîkî wî qebûl bike yan na? Dê ji hev re çî bibêjin? Gelo dê alîkariyê bidine kurdan? Ji bo ku alîkariyekê nedine kurdan çî pêwîst e were kirin? Çapemeniya tirkî li ser van pirsan radiweste. Ev encam (netîce), ji ber parçe û kêrîkirina Kurdistanê derketiye holê. Kurdên li kîjan herêmî dibin bila bibin, dema ew rabine bizava rizgariya neteweyî, dê hikûmetên din her demî xwe li hevberî wan ragirin.

Parçe û kêrîkirina Kurdistanê, parvebûna Kurdistanê, bi rastî ji bo neteweya kurd, derb û lêdaneka gelekî mazin e. Anku ji ber vê hindê ye ku careke din rabûn û li ser lingên xwe rawestana neteweya kurd gelekî dijwar e. Kurd piştî vê parçebûn û kêrîkirinê careka din bi hêsanî nikarin werine xwe. Çimku mejiyê wî hatiye belakirin, skeleta wî hatiye jilhevdxistin û parçekirin. Di Rohilata Navîn û li Dûnyayê bêdost maye!

Îro gotareka Gorbaçov hate weşandin. Ev cara yekemîn e ku Gorbaçov derbareyê Rohilata Navîn de hinde tişt dibêje. Gorbaçov di vê gotara xwe de rexneya Iraq û Sedam Husênî dike. Dibêje ku "min çek dabûne te ku ev çekên parastinê bûn." Mirov dibêje qey wî ev çekên han ji bo li hevberî Israîlê bikaranîne dane Sedamî. Gorbaçov her wisan berdewam dike û dibêje "te rabû ev çekên han li hevberî Kuweytê bikarhanîn." Gorbaçov ji bo vê yekê rexne li Sedamî digire û ewî bi xiyaneî tewanber dike. Lê, ma ne sal-sal û nîvekê berê bû, ku her ev çekên sovyetî li başûra Kurdistanê, li Helepçe hatine bikarhanîn? Bi deh hezaran mirov bi wan hatine kuştin. Anku çekên kîmyewî bi dehhezaran mirov kuştine. Wê gavê dengê Gorbaçovî her derneket. Qet tiştek ne got. Hetta Sedam Husênî jî ber bikaranîna çekên kîmyewî rexne jî ne kir. Hingê jî çekên sovyetî li hevberî kurdan hatibûn bikarhanîn. Lê Sovyetê rex-

neyeka herî biçûk jî ne hanî ser zimên. Ji ber ku ev çekên ku li Kuweytê hatine bikarhanîn, Gorbaçov hîna ji neha de radibe rexne li Sedam Husênî digire.

**M. Trontî :** *Eger em neha dîsan bizivirine ser rewşa Tirkîyê û bêjine; ku li gor dîtina we gelo çepbûna tevgera gerîllaya kurdî li bakura Kurdistanê, dikare bibe astengek li ber hevberî û yekgirtineka bi wan re?*

**Î. Beşikçi:** Di van salên dawiyê de, tevgerên çep li Tirkîyê, di baweriya pêwîstbûna bi kurdan re girêdana yekîtiyê û hevberîyeka nêzîktir de ne. Li gor bîr û baweriya min, berî deh-panzdeh, daxwaziyên çekirina van yekîtiyê û hevberîyan, weke vê rojê wisan ne zelal û diyar bûn. Bi gotineka din çepê Tirkîyêweke îro ji bo pîrsa kurdî ne xwedî têkildarî û eleqederbûnêka welê pir bûn. Bi xwe pîrsa kurdî nizanibûn. Lê belê neha bêhtir xwedî zanebûna pêwîstiya girêdana yekîtiyê û hevberîyeka baş de ne. Wisan diyar e ku ev qazenceka girîng a bizava kurdî ya van salên dawiyê ye.

**M. Trontî :** *Li gor bîr û baweriya we, di nav vê rewş û pergala îro de, çî çareserkirineka durust ji bo vê dozê heye?*

**Î. Beşikçi :** Ji ber ku bûyer bi serê xwe gelekî dijwar û tevlihev e, bersivdana vê pîrsê gelekî dijwar e. Ji ber ku Kurdistan herî hindik di bin nîr û vegirtina çar dewletan de ye. Hatiye parçe û kêrîkirin, parvebûn. Hemû nîrx û hêjayiyên wê hatiye çar-çûrîkirin û tune û wenda-kirin. Her parçeyeka axa Kurdistanê ji serî heya binî hatiye vegirtin û li binnîrxistin. Lê îro kurd gehîştine wê zanebûn û hişyarbûnê ku statû û pergala jiyana wan a civakî, di kîjan kertê de hatiye daxistin, neteweya kurd di çî kertê de hatiye dîl û kolehiştin û bêkok û binyadmayin. Îro kurd vê têkoşinê didin. Êdî îro ji bo ku ew jî bi jiyaneka serbilind bijîn, li Rohilata Navîn û li cîhanê, bi gel û neteweyên din re bi awayekî wekhev û azad bijîn, têkoşinê didin.

Li gor dîtina min eve heya kerta xwe ya dawiyê dijwar e û ne tiştekî wilo ye ku hema ji ser îro re bersiva xwe ya siberojê derîne. Ev têkoşineka wilo ne hêsan e. Lê wisan bi serpilkî tiştê ku ez di vê rewşê de dibînim ev e; ku kurd di vêt têkoşina xwe de, dê her here giraniya xwe dahênin holê û têkoşinê dê bêhtir tund û mazin bibe. Bi gotineka din, dê li hemû rexên Kurdistanê zanebûna civakî û dîrokî pêşve here.

Dê çareserkirineka çawanî be? Bi bîr û daxwaziya min, ew tiştê ku ez dixwazim;

ev çareserkirineka wilo be, ku di Rohilata Navîn de, Kurdistaneka serbixwe, yekhev û demokrat were damezirandin.

**M. Trontî:** *Ji bo nimûne eger îro li Kurdistanê mafê mirovan were pejirandin (qebûl kirin), serbesthiştina axaftina kurdî çêbe, bi hinde reforman pêşvebirina standarda herêmê were bicihhanîn, gelo ev gişt dikarin bibin sedema astengbûnêka li ber têkoşina çekdariya serxwebûnê, yan jî ev li ser vê bin gehê dikare rêyê bide çî guhertinan?*

*"Polîtîkaya Tirkîyê ya li ser Kurdistanê her dem xwe spartiyê terorê. Tirkîyê dewleteke kolonyalist e. Ji bo nimûne dikare perwerwerdekirin û hindekariya kurdî bifikire, lê belê nikare birvêve bixe. Tirkîyê wisan bi hêsanî dev ji ew polîtîkaya xwe ya dagîrkeriya li Kurdistanê bernade. Bi gotineka din, her dem riyên dibindestde girtin û dibindeste de hiştina vê dagîrgeha xwe digere. Çawan dev jê berde? Iraq jî û Ecemistan jî dev ji Kurdistanê bernadin. Lê ji bo paşdebirina têkoşina çekdarî, dikarin rê bidine hinde nîşanên gelekî ucûbe yên otonomiyê. Weke bikaranîna zimên û hwd. Lê belê ew, dê her dem vê yekê bidine pêş: "Şert û mercê herî girîng yê memûrbûnê, zanîna zimanê tirkî ye. Eger hûn dixwazin bibin memûr, li unîversîteyê bixwînin. Eger hûn dixwazin li unîversîteyê jî bixwînin, hingê xwe fêrî tirkî bikin!"*

**Î. BEŞİKÇİ:** Li gor bîr û baweriya min ev tedbîr nikare were birêxistin. Dikarin bifikirin. Lê belê dolîwgeriya tirkî nikare vê yekê bi rêkûpêkî û sazandî birêvexe. Polîtîkaya Tirkîyê ya li ser Kurdistanê her dem xwe spartiyê terorê. Tirkîyê dewleteke kolonyalist e. Ji bo nimûne dikare perwerwerdekirin û hindekariya kurdî bifikire, lê belê nikare birêve bixe. Tirkîyê wisan bi hêsanî dev ji ew polîtîkaya xwe ya dagîrkeriya li Kurdistanê bernade. Bi gotineka din, her dem riyên dibindestde girtin û dibindeste de hiştina vê dagîrgeha xwe digere. Çawan dev jê berde? Iraq jî û Ecemistan jî dev ji Kurdistanê bernadin. Lê ji bo paşdebirina têkoşina çekdarî, dikarin rê bide-



ne hinde nîşanên gelekî ucûbe yên otonomiyê. Weke bikaranîna zimên û hwd. Lê belê ew, dê her dem vê yekê bidine pêş: "Şert û mercê herî girîng yê memûrbûnê, zanîna zimanê tirkî ye. Eger hûn dixwazin bibin memûr, li unîversîteyê bixwînin. Eger hûn dixwazin li unîversîteyê jî bixwînin, hingê xwe fêrî tirkî bikin!" Ji bo nimûne zimanê kurdî dikare di serpiika (seviya) dibistanê (xwandîna destpêkî/îptîdaî) de were serbest-hiştin. Lê belê dê xwendîna li unîversîteyê dîsan bi tirkî be. Heya xwandîna navîn jî dê bi zimanê tirkî be. Hingê ji bo bûna memûrekî divê mirov baş bi tirkî bizanibe. Ji bo bûyîna memûrekî di kerteke bilind de, divê mirov baştir bi tirkî bizanibe. Eger gava tu bi tirkî nizanîbî nikarî bibî memûr. Bi gotîneka din ji bo vê yekê dê hezar astengan li pêşiyê dahênin. Çimku bir û hizra wan ev e. Di nava du rojan de, guherandîna van bir û bawerîyan ne mumkun e.

**M. TRONTI:** *Hûn bawer dikin ku Tirkiye berî çareserkirina pîrsa kurdî bikaribe têkeve nav CAE (Civata Aborî ya Ewrûpî)? Ma pîrsa kurdî di ketîna navê CAE de li ber Tirkiyê bibe asteng?*

**Î. BEŞİKÇİ:** Bêguman erê. Tirkiye dolîwgeriyeke dagîrker e. Ma dagîrgeh di bin destê xwe de girtin wisan hêsan e? Gava ku Tirkiye serî li ketîna nav CAE'yê kir, wê gavê jî xwedî dagîrgehêkê bû û pîrsa kurdî hingê jî hebû. Lê belê pîrsa Kurdistanê hingê, ne ji hêla dengê giştî ya tirkî û ne ji hêla dengê giştî ya Ewrûpî ve, baş ne dihate zanîn. Neha jî di van deh salên dawiyê de, tiştên ku li Kurdistanê çêdibin, xwedîbûna Tirkiyê bi dagîrgehêkî û hem jî bi awayekî gelekî xerab xwe li hevberî jiyana vê dagîrgehê ragirtina wî, eşkere kir.

Ez welê dihizirim (difikirim): Tirkiye ji CAE'yê re dibêje ez jî dixwazim têkevime nav civata we. Bi rastî ev karekî nebeziyê ye. Lê belê piştî hingê, Tirkiye dê bi xwe rîya ji vê derê derketinê bigere. Çimku Tirkiye here û bikeve ku derê, li wê derê rastî pîrsên li ser Kurdistanê dibe. Gava profesoren tirk, nivîsevanên tirk yan jî çiyê tirk dibe bila bibe, dema diçine Ewrûpayê, duçarê pîrsa kurdî dibin û her kes, li ser pîrsa kurdî û Kurdistanê pîrsan ji wan dike. Van nûnerên dolîwgeriya tirkî, wisan bi serbilindî nikarin bersivên van pîrsan bidin. Dema ku bersivên van pîrsên li ser Kurdistanê

bidin, hingê jî divê lingî ji vê qadê bi şûnde bihavêjin. Ji bo ku her dem duçarê van pîrsan nebin, ew bi xwe gav ji vê qadê ber bi paş ve dihavêjin û wêca li ser çareserkirina pîrsê hûrdibin. Yan bi rastî û durustî pîrsê çareser dike - ku nikare vê yekê bike - yan jî ji wê meydanê derdikeve diçe.

**M. TRONTI:** *Ew gel û milletên ku di warê netewebûnê de dereng mane, her yek xwedî serok û rêberêkî ne. Ji hindan Mahatma Gandî, ji cihûyan Ben Guryon, ji tirkan M. Kemal rêberên vî cûreyî ne. Ma gelo serok û rêberêkî, şexsiyeteke dîrokî jî ji gelê kurd heye?*

**Î. BEŞİKÇİ:** *Ez ji bo vê pîrsê bersivêkê li ser navê xwe, li ser hîs û bawerîya xwe didim û dibêjim ku ji gelê kurd jî Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah OÇALAN rêberê neteweyê kurd e.*

**M. TRONTI:** *Bi rîya çapemenî beyanên Seddam Husênî hatine daxuyanîkirin ku dê çekên kimyewî werine bikarhanîn û mirov dê bi gîrsan werine qirkirin! Ev bi rîya çapemenî bi awayekî sistematîkî ji mirovan re hatine gotin. Gelo ew rewş weke di destpêka vê sedsalê de li ermenan hatibû kirin û yan jî weke li welatê Kamboçiyayê hatiye dîtin, dikare qirkirîneke mazin li serê gelê kurd jî were çêkirin? Çimku wisan xuya ye ku hinde kes û dorhêl mîna xwe ji bo vê yekê amade dikine!*

**Î. BEŞİKÇİ:** Sedam Husên jî xwe dikare tenê li Kurdistanê bike. Tirkiye jî dikare viya li Kurdistanê bike. Bi gotîneka din Tirkiye rana-be li Bexdadê naxe û Bexdad jî li Anqerê naxe. Her du dikarin tenê li kurdan bixin. Çimku gava li kurdan dihête xistin, dengê giştî ya cihanî dengê xwe dernaxe. Ma min gaveke din li ser helwêsta Gorbaçov kad ne kire?

**M. TRONTI:** *Ew gel û milletên ku di warê netewebûnê de dereng mane, her yek xwedî serok û rêberêkî ne. Ji hindan Mahatma Gandî, ji cihûyan Ben Guryon, ji tirkan M. Kemal rêberên vî cûreyî ne. Ma gelo serok û rêberêkî, şexsiyeteke dîrokî jî ji gelê kurd heye?*

**Î. BEŞİKÇİ:** *Ez ji bo vê pîrsê bersivêkê li ser navê xwe, li ser hîs û bawerîya xwe didim û dibêjim ku ji gelê kurd jî Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah OÇALAN rêberêkî wisan e.*

**A. BEER:** *Ez sala çûyî li başûra Kurdistanê bûm û min bi xwe dît ku otonomî çawa bênaverokekî û bêwate ye. Li ser vê yekê bi taybetî dixwazim vî tiştî bibêjim: Divê helwêst û tewra me ne li ser tercîh û awayê têkoşîna gelê kurd be, divê em berî her tiştî piştgiriya têkoşîna serxwebûna vî gelfî bikine. Lê em radibin*

*pêşniyar li ser pêşniyaran li vî gelfî dikin, mafê aqil û rênişandanê di xwe de dibînin. Têkiliyên xwe bi gelê kurd re li ser vê bingehê pêşvedibin. Wêca ez li ser vê yekê vî tiştî dibînim: Li derveyî pîrsa ku li Ewrûpayê û bi taybetî jî li Almanyayê li ser bizava serxwebûna gelê kurdî aqilnîşanî û rênişanî dikin, pîrsêka din li ku derê heye?*

*Di kîjan xal û nuxteyê de pêwendî û têkildarî diviya xurtir bibûya, lê hinde sedemên cihêreng hene ku li ber vê yekê astengan derdihênine?*

**Î. BEŞİKÇİ:** *Ez dixwazim hinek tiştan bibêjim ku têkildarî û pêwendîya wan bi vê yekê ve heye. Min gaveka din gote ku Kurdi-*

*staneka yekhev, serbixwe û demokrat. Dîsan min gote ku ew çareserkirina herî girîng û seranser e. Sedemên vê yekê ev in: Ji îro û pêve, Tirkiye dê zextkarî û zordariya xwe li ser kurdan bêhtir bidomîne. Tirkiye dê ji îro û bi şûnde têkildarî û kargûzariyên xwe yên herî giran li ser vî gelfî bişidîne. Çimku bizaveke neteweyî pêşve diçe. Ji bo di bin zextêdegirtina vê tevgerê, zordariyên bêhtir divêtin. Bêpîrs û bêsual gûxwarindana bi mirovan, gelekî bi hêsanî kuştina mirovan, li vê derê derdikevin meydanê. Her dem dî û êsir nayê-ne girtin, carinan jî ew bi candarî digirin. Lê wêca jî poz û guhê wî jêdike, çavên wî jî hêlînên wî derdixîne û jî helikopteran dihavêje xwarê. Lê em vana ji çapemaniya tirkî nabihîsin. Em vana ji wan mirovên ku li wê herêmê dijîn dibihîsin. Tirkiye li hinde ciyên din dibe nimûneyekî xerab. Ji bo nimûne Bulgaristan navê tirkên wê derê diguherîne û dibêje "Hûn ne tirk in, hûn bulgar in." Huviyeta wan înkare dike. Li vê derê kî nimûne ye? Bêguman Tirkiye nimûne ye! Em vê yekê carinan li Trakya Rojava jî dibînin. Hikûmeta Yûnistanê huviyeta tirkên wê derê înkare dike. Ew jî ji nimûneya Tirkiyê bi rê dikeve. Ew dibêje ma eger Tirkiye nîzanim bi çend milyonan kurdan bi yekcarî dikare înkare bike, min sed hezar tirkan înkare kiriye çi xerabî jî vê dikare derkeve? Tirkiye weke li Balkanan, li Iraq û li Ecmistanê jî dibe nimûneya gelekî xirab. Her kes jî bo înkarkirina huviyetên li welatê xwe, Tirkiyê jî xwe re pîvan û nimûne digire. Ji ber vê hindê, ku divê mirov bi vî rengî parçebûn û parvekirina Kurdistanê nexwaze. Divê kurd xwe bi xwe birêve bibin û îdare bikin. Xweidarekirin û xwebirêvebirina kurdan ya herî neqenc, ji birêve birin û îdarekirina herî baş a van dewletan çêtir e.*

# çend tîpênîyên li ser ziman û wêjeya klasîkî

M. Şevhat

Dema mirov dibêje ziman, du tişt dihêne bîra mirovî. Yek; axiftin, du; nivîsîn. Di gel axaftinê, nivîsîna zimanî jî, bi bîra mirovî dikeve. Bi nivîsînê re jî, tîp (herf) û alfabe, bi bîra mirov dikevin.

Dema te got jî "alfabeya kurdî", pê re çend pirs li serê te peyda dibin. Weke:

- Alfabeya kurdî, ji çi tîpan pêk hatiye?
- Kê, kengê, alfabeya kurdî daniye?
- Çend alfabeyên kurdî hene?
- Gelo, kurdan di rojarî û serdemên kevn ên dîrokî de, bi çi alfabeyek nivîsandine? hwd û hwd.. Dawiya pirsan nayê.

Berî gelek pirsan, tişteki diyar û eşkere heye. Ji bo nivîsandina kurdî, bi kêmanî du-sê alfabe, hatine bikarhanîn. Êdî, heya îro jî, bi kêmanî çar alfabeyên kurdî hatine peyda kirin. Vana li gora rêza xwe ev in:

- "Alfabeya kurdî bi tîpên erebî"
- "Alfabeya kurdî bi tîpên latînî"
- "Alfabeya kurdî bi tîpên krîlî (rûsî)"
- "Alfabeya kurdî bi tîpên ermenî"

Di gel van jî alfabeyên kurdî bi tîpên aramî û bi ibrânî jî peyda dibin.

Belê, alfabeya kurdî jî, weki welatê kurdan, ê bi kêmanî çarparçeyî, bi çar-pênc alfabeyên biyanî, hatiye rêzkirin.

Wisan diyar e, "alfabeya kurdî bi tîpên erebî", ji mêjve ye, ji aliyê kurdan ve hatiye bi karhanîn. Ewçend ji mêjve, ku ev yek, xwe digehîne dema belav û berfirehbûna ola îslamî. Li welatê me yê, ji hêla artêşên îslamî dagîrkirî, dema hatin û berfirehbûna ola îslamî, ferheng û toreya erebî jî, bi awayekî otomatîkî, belav û berfireh dibe. Bi awayekî fermanrewayî û ji ber bêgaviyê, nivîsîn, bi alfabeya erebî, ji hingê ve destpêdike. Her wisan, ev yek, xwe digehîne dema rabûna çend navên klasîkî yên ziman û torevaniya kurdî. Ji dema Baba Tahîrê Ekbetanî (Hemedanî), ku di sedsala 9'emîn de jiyaye, ji dema Mela Ehmedê Batêyî ku di sedsala 14'emîn de jiyayê, ji dema Melayê Cizîrî ku di sedsala 15'emîn de jiyayê, ji dema Ehmedê Xanî ku di sedsala 16'emîn de jiyaye û ber bi vê de ye, ku li ba kurdan her ev alfabeya bi tîpên erebî bi kar hatiye. Mirov dikare bibêje, ku destpêkirina nivîsandina kurdî, ya

bi tîpên erebî, ji wan deman çêbûye. Lewra berî ola îslamî kurd tekez û misoger bi tîpên erebî ne nivîsandine. Hingê çi sedem ne bûne ku kurd bi erebî binivîsîn. Berhemên van hozanvanên klasîkî yên kurd, nîşan û belgeyên vî tiştî ne.

Lê, di vî warî de, tişteki gelekî girîng (muhîm) heye, ku divê were ser zimên. Berhem û nivîsên van hozan û edîbên kurd, nikarin bibin belge û nîşandana danîn û bicîhkirina "alfabeya kurdî ya bi tîpên erebî". Bi gotineka din, çi kesek kurd, ku em pê dizanin, bi zanetî û bi taybetî alfabeyêke bi tîpên erebî dananiye. Lewra, heya neha, çi belgeyek di destên me de nîne, ku yek ji van hozanvan û edîban, bi şêweyêke rêk û pêk, li ser "alfabeya kurdî ya bi tîpên erebî her weke pirtûkekê" nîşan û diyardanek hiştibin. Her kes musulman bûye û "elîfbetika pîroz a erebî" jî, ji bo hemû gel û milletên cihanî bûye! Li nik erebên ku di wan deman de, rola van împeryalistên kulturê leyistine, mantiq û şarezayiya azadî, zanistî û mirovayetiyê, ev bûye!

Divê em li vê derê, ji babetê (mewzûyê) dûmekevin û li ser lêhûrnî-hêrîna dîroka alfabeya kurdî, ya bi tîpên erebî berdewambin. Tişteki şayanê bal û serinc (dîqqet) e, ku di destnivîsên ji wan deman mayî de, -ji bo nimûne di destnivîsa Mela Mehmedê Beyazîdî ya bi navê Tarîxê Qedîmê Kurdistan<sup>(1)</sup> de, mirov nikare ev alfabeya kurdî ya îroyîn (a bi tîpên erebî bi kar dihête), bibîne. Anku ji çarîn (rûbaiyat) û pexşanên (nesr) welê bi sedan sal kevn de, alfabeya kurdî, ya bi tîpên erebî, gelekî kevnare (primitiv) bûye. Çi sazî û sazendiyeke rêzimanîyê ne-bûye. Heya ev alfabeya kurdî bi tîpên erebî, bigihîje ev forma xwe ya pêşdeçûyî, ji gelek çonax û gehînekan derbas bûye û gehîştîye ev forma xwe ya vê rojê. Ji bo nimûne, di alfabeya wê demê de, dengê [ p / e ] bi tîpeke taybetî ne dihat nimandin û nîşandan.

Alfabeya kurdî ya berî ola îslamî, yan jî berî zayina Îsa, îro baş nayê naskirin. Lê belê kurd jî, weke gel û milletên îraniyên mîna afgan, belûc û farisan, bi hêsanî û bi serbilindî, dikarin xwedî li alfabe û zimanê Avestayê kevn ê li dor 600 salan berî zayina Îsa bi kar hatiye, derkevin û xwe jê beşdar û xwdîkelepore (xwedîmîrat) bibînin. Ji ber vê sedema suruştî ye, kurd dikarin vê yekê bikin. Ji lewra jî, zimanê kurdî, di bîngeh de, her weke zimanên afganî, belûcî û farisî, ji zimanê kevnê Avesta dihê. Em'ê li binî çend nimûneyên gotinên kurdiya îro û Avesta rûber û muqayese bikin.

Ev e dîroka alfabeya kurdî ya herî dûr û kûr, ku îro em dinasin. Dibe sibê roj, derfet û gengaziyên hîn baştir bi destên kurdan bikevin, hingê kurd, rastiya dîroka alfabeya xwe, bi kûrahî û dirêjahî derînin holê.

Alfabeya kurdî ya ku bi tîpên ermenî hatiye nivîsandin, diyar e ku weke alfabeyên kurdî bi tîpên aramî û ibrî, alfabeyeka wisan ne berfireh û dûr û dirêj û bikarhatî bûye. Berhema bi vê alfabeyê hatiye nivîsandin û ya heya neha hatiye naskirin, tenê pirtûka încîlê ye. Ev pirtûk di sala 1872'yê de, li Stanbolê bi navê Peymana Nû / Ehîdî Cedîd bi tîpên ermenî hatiye nivîsandin. Welê diyar e ku bi berfirehî rolekê ne leyistîye û dibe tenê ji bo mebesteya propagandaya ola (dînê) fîletiyê (mesîhiyê) hatibe çêkirin. Alfabeya kurdî ya bi tîpên aramî, ji hêla keşîş û metranên suryan û aşûran ku li Kurdistanê bûne, hatiye danîn û rêzkirin. Lavîj (îlahiyên olî-Îsa Nûranî) ên dêrê ku naveroka wê li ser roja qiyametê, li ser rewşa mirinê, li ser dunya û li ser jiyane û hwd e, bi vê alfabeyê hatiye nivîsîn. Alfabeya kurdî ya bi tîpên ibrî-ibrânî jî di warê stranên folklorî de bi kar hatiye. Bi destnivîs in.

Alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî, ku îro jî bi nêzikahî 4/3 (4'a 3'yên) kurdan wê bi kar dihênin, ew jî bi rastî û bi awayekî sistematîkî û



rêkûpêk nayête zanîn, ku cara pêşîn, kengî rêz bûye. Dihê gotin ku alfabe ya kurdî bi tîpên latînî, ku neha em pê dinivîsin, ji hêla Celadet Elî Bedirxanî ve ku bi kêmanî bi pênc zimanan baş zanibûye, hatiye danîn. Celadet Elî Bedirxan, li gel zimanê xwe, bi awayekî baş, erebî, farisî, frensî, rûsî û tirkî zanibûye. Ev di warê rêzkirina alfabe ya kurdî bi tîpên latînî de, jê re hêsaniyêke bêhempa çêkiriye. Wî, vê alfabe ya kurdî (bi tîpên latînî) di hingama şerê yekemîn ê cihanî de amade kiriye. Berî ku bi fermana Atatirk li ser alfabe yê, li Tirkîyê alfabe ya tirkî ya latînî bi kar were, Celadet Elî Bedirxan, alfabe ya latînî ya kurdî rêz kiriye. Lê belê dîsan jî, bi awayekî vekirî, dem û cîyê danîna alfabe ya kurdî bi tîpên latînî, ne diyar e. Ev bêguman ji ber sedema daxwaza dagîrkeriya dijminên Kurdistanê ya li ser windakirina zimanê me ye.

Li hêla din, di sala 1929'ê de, li nik kurdên Sovyetê, salek bi alfabe ya latînî-kurdî hatiye nivîsandin û paşê jî nivîsandina bi vê alfabe yê dawî hatiye.

Alfabe ya kurdî ya bi tîpên krîlî wekî alfabe yê li jor jimartî, ne xwedî dîrokeka welê dûr û dirêj e. Di salên 1940'î de, bi alfabe ya krîlî li cem kurdên Ermenistanê destpêkiriye û heya neha nivîsina bi vê alfabe yê berdeham e.

Ji zimanê avesta çend nimûneyên gotinan li beramberê kurdiya nû - bi her sê zaravayan û tevî farisî:

Kurdî li bakur (kurmancî)	Kurdî li bakura rojava (dimilî)	Kurdî li başûr (lorî / sorî)	Farisî (yê nuh)	Avesta
Beraz	xoz	beraz	xûk	varaza
Berf/befr	vor	berf	berf	vofra
Bîr	bîr	bîr, çal	çah	vîfra
Bîst	vîst	bîst	bîst	vîsant
Ba	va	ba	bad	vaya
Baran	varan	baran	baran	va
Gav	gam	gaw	gam	gama
Guh	goş	gu	guş	goaş
Çav	çim	çaw	çeşm	çeşman
Mazin	pîl / gird	gewre	buzurg	mazant
Mîh	mêşna / mer	mer	gufsend	maêşa
Tihni, tihnbûn	teyşan	têhnbûn	teşnegî	tarşna
Rewşen rohnî	roşn	roşna	revşen	roaxşna
Behr	behr	behr	behr	bexra
Dil	zer	dil	dil	zer
Rê, reh	rayir	rêga	rah	raitya
Şehr, şar, bajar	şaristan	şar	şehr	xîşatra

Kurdî (li bakur) (kurmancî)	Kurdî (li bakura rojava) (dimilî)	Kurdî (li başûr) (lorî / sorî)	Farisî (yê nuh)
Bazdan	vazdayiş	bezîn	reviden
Barîn	varayiş	barîn	baranameden
Gur	verg	gurg	gurg
Gotin	vatiş	wûtin	guften
Nav	name	naw	nam
Xav	xag	xam	xam
Hev	piya	hem	hem
Nîv	nîm / nême	nîm	nîm
Ziv	sîm / sêm	zîw	niqre
Zivistan	zimistan	zimistan	zimistan
Zava	zama	zawa	damad
Sivik	sivik	siwik	subek
Ava	awa	awa	abad
Şev	şew	şew	şeb
Nivîsîn	nûştîş	nûsîn	nûştên
suffix ~van	- wan	- wan	- ban
Pasevan	- wan	pasewan	pasban
Av	aw	aw	ab
Lêv	lew	lêw	leb

Kurdî, vokabulera avestayê kevn, heya îro jî bi awayekî baş û xurt di xwe de parastîye.

### Toreya (edebiyata) kurdî ya klasîkî

Wêjeya kurdî ya kevin û klasîkî ya heya îro naskirî, bi Babe Tahirê EKBETANÎ (Hemedanî) destpêdike. Babe Tahirê Ekbetanî di navbera salên 935-1010'î de jiyaye. Berhema wî ya navdar *çarîn* (rubaiyat) e.

Çarînen wî li Ecmistanê çap bûne. Weke dewlemendiyên din ên kurdî, faris, xwedî li vê dewlemendiya me ya dîrokî derdikeve û her çend Baba Tahirê Ekbetanî bi kurdî jî nivîsî be, dîsan dibêjin Babe Tahirê Hemedanî faris e û berhemên wî jî her bi farisî ne! Anku ev tişt bîr û hesteka dagîrkeriyê ku herî derveyî mantiq û şarezaiya mirovî ye.

Wêjeyek olî (dînî) jî, berî Babe Tahirê Ekbetanî, bi destê Mela Ehmedê Bateyî (1414 - 1495) bi rê ve ketiye. Wî *mewlûdnameyek* nivîsiye û *mewlûdnameya* wî ya bi kurdî, heya îro jî maye. Melayê Cizîrî (1407 - 1481) ku xwediyê dîwana helbestan e jî dîwana wî re *Nîşanî* jî dibêjin. Feqiyê Teyran (1590 - 1660) Dîwanên wî yê bi navên *Şexê Senan*, *Qewla Hespê Reş* hene. Ehmedê Xanî (1650 - 1706) bi berhema xwe ya *Mem û Zîn* û bi berhemên xwe yê bi navên *Nobara*

Biçûkan, *Eqîda Îmanê* navdar e. Ew warê tore û hozanên kurdî de, xwedî ciyê gelek bi nîrx û payedar digire. Di gencîneya dewlemendiya çand û hunerê de, bêguman toreya kurdî xwedî ciyê bilind e.

Çend hozanvan û edîben kurdên din ên ku di dîroka wêjeya klasîkî de rolên girîng leystine ev in:

Nalî (1797 - 1855)

Hecî Qadirê Koyî (1810 - 1896)

Salim (1800 - 1866)

Mehwî (1830 - 1904)

**Pexşan (nesr)**

Dîroka pexşana kurdî, ya heya roja îroyîn naskirî, bi Mela Mehmûdê BEYAZIDÎ destpêdike. Wî, di sala 1856'ê de nivîsareka bi navê "*Adat û Rusûmetnameyê Ekradiyê*" anku, tore, edet, rîzm, rabûn û rûniştina kurdî, bi alfabe ya kurdî ya bi tîpên erebî nivîsandiyê. Mela Mehmûdê Beyazidî, her dîsan, di sala 1859'ê de "*Tewarîxê Qedîmeyê Kurdistan*" jî nivîsiye. Ev pirtûk bi xwe kurtebireka wergera Şerefnamê Şerefxanê Bidlîsî ye. Weke dihête zanîn, Şerefxanê Bidlîsî Şerefnamê bi zimanê farisî nivîsandibû. Mela Mehmûdê Beyazidî jî, wê bi kurdî jî farisî wergerandiyê kiriye kurdî. Ev pirtûk bi destnivîs sala 1986'ê de, li Mosko, li Sovyetê çap bûye. Mirov dikare peyda bike. Destnivîs ya Mela Mehmûdê Beyazidî bi xwe ye û bi kumancî hatiye nivîsîn.

Ev berhema dîrokî, di warê rewşa alfabe ya kurdî ya bi tîpên erebî de, gelek agahdarî û înfomasyonên rêzimanî, bi taybetî jî, agahdariyên morfolojîkî dide me. Ev yek, bîr û bawerîya me ya li ser alfabe ya, ku me li jor diyar kiribû, dibeste (teyîd dike). Ji bo nimûne tîpê "a" ya di alfabe ya erebî de, li beranberê dengê [e] ya di zimanê kurdî de hatiye danîn. Ev pêşveçûna alfabetîkî, di destnivîsên jî vê destnivîsê kevintir (ji bo nimûne di destnivîsên klasîkî yê wekî din) de tune ye. Ev dengê [e], bi alfabe ya erebî, bi nişandana tîpa "o", di alfabe ya kurdî ya bi tîpên erebî ya roja me de, bi awayekî têkuz û pêşdeçûyî heye. Ev pêşveçûna alfabetîkî di klasîkan de tune ye.

Li vê derê, li ser pexşana bi alfabe ya latînî jî, çend pirs û gotin divête were kirin. Berî rêzkirin û danîna alfabe ya kurdî bi tîpên latînî jî hêla Celadet Elî Bedirxan, di dema desthilatiya osmaniyan de, hema nêzî sedî sedên kurdan, yê dikaribûn bixwînin û binivîsin, bi alfabe ya erebî, zimanê xwe kurdî dinivîsandin û dixwandin. Ji ber vê hindê, di wê demê de, çi kesekî bi alfabe ya latînî ne nivîsandiyê û ne jî xwandiyê. Ev rewş, bi awayekî tundî posîdeya (tesîr) xwe, li ser rewşenbîr û întellektuelên wê demê jî kiriye. Ji bo nimûne rewşenbîr û întellektuelên jî wê demê, piştî ku alfabe ya latînî jî çêbûye, wan dîsan berhemên xwe, bi tîpên erebî û bi tirkî nivîsandine. Pirtûkên Dr. M. Nûrî Dêrsimî yê bi navên "*Kurdistan Tarihinde Dersim*" û "*Hatiratım*", pirtûka Ekrem Cemil Paşa ya bi navê "*Muhtasar Hayatım*" jî van çendan in. Vana hemû bi alfabe ya erebî ne û bi zimanê kurdî jî, ne hatine nivîsîn.

Nivîsên kurdî (yên pexşanî), bi tîpên latînî berî pejiwandina alfabe ya latînî heya bibêjî nameyeka destnivîskî jî, mîna ku hîç tunebin xwe rêyî kesî ne dane. Piştî ku alfabe ya kurdî ya bi tîpên latînî hatiye danîn û jî sala 1932'yê ku kovara HAWARÊ û pişt re kovarên Ronahî û Roja Nû derketin vêca kultura latînî dest pêkir.


**Alphabets.**

Hebrew	Kašac	Aramaic papiri	Sabnari (Kurdî)	Kabak (Kurdî)	Parthian (Kurdî)	Serjan (Kurdî)	Salter	Book (Kurdî)	Transliteration
א	א	א	א	א	א	א	א	א	a
ב	ב	ב	ב	ב	ב	ב	ב	ב	b
ג	ג	ג	ג	ג	ג	ג	ג	ג	g
ד	ד	ד	ד	ד	ד	ד	ד	ד	d
ה	ה	ה	ה	ה	ה	ה	ה	ה	h
ו	ו	ו	ו	ו	ו	ו	ו	ו	w
ז	ז	ז	ז	ז	ז	ז	ז	ז	z
ח	ח	ח	ח	ח	ח	ח	ח	ח	h, h
ט	ט	ט	ט	ט	ט	ט	ט	ט	t
י	י	י	י	י	י	י	י	י	y (j)
כ	כ	כ	כ	כ	כ	כ	כ	כ	k
ל	ל	ל	ל	ל	ל	ל	ל	ל	l
מ	מ	מ	מ	מ	מ	מ	מ	מ	m
נ	נ	נ	נ	נ	נ	נ	נ	נ	n
ס	ס	ס	ס	ס	ס	ס	ס	ס	s
ע	ע	ע	ע	ע	ע	ע	ע	ע	c
פ	פ	פ	פ	פ	פ	פ	פ	פ	p
צ	צ	צ	צ	צ	צ	צ	צ	צ	c, s
ק	ק	ק	ק	ק	ק	ק	ק	ק	q
ר	ר	ר	ר	ר	ר	ר	ר	ר	r
ש	ש	ש	ש	ש	ש	ש	ש	ש	š
ת	ת	ת	ת	ת	ת	ת	ת	ת	t

The alphabet of the Avesta, and of Pazard:


1. Vowels:	2. Consonants:
<p>                     a: a    u: u                      e: e    i: i                      o: o    y: y                      o: u    g: a                 </p>	<p>                     g: k    e: p    s: s                      x: x    f: f    w: w                      y: y    n: n    m: m                      c: c    d: d    z: z    š: š                      t: t    d: d    y: y    s: s                      t: t    d: d    y: y    s: s                      s: s    d: d    y: y    s: s                 </p>

Çend alfabe yê li bajarvaniyên (medeniyetên) Rohilata Navîn; ibirî, meşa, aramî, palmîra, nebatî-nivîstên li ser kevîr, parsî, nivîstên kevîrî-farsî, tîpên tewratê, pehlewî .. û avesta li gel latîniya nûjen



Nivîseka avestayî





Nivîsareka folklorî, strana "Emîne-Emîne" bi tîpên îbrî - kurdî

çend zimanên kevn û têkiliya wan a bi zimanên îroyîn:

Helenîk > yûnanî

Hetîfî > —

Lîdî > —

Parsî, pehlewî û farisiya naverast > farisî

Sanskrtî > hindî

Latîn > portûgalî, spanî, katalonî, frensî, îtalî, rûmenî

Avesta > kurdî

Hemû zimanên cîhanî du beş in:

1 - Zimanên Analîktîkî: çînî

2 - Zimanên sîntektîkî: a / zimanê Flektîf


(tewanbar, dikare bitewe) : yûnanî

b / zimanê Aglutînik


(bihevdudayî): finî, macarî, tirkî û hwd

c / zimanê Polîsîmetîk


(dirêj û dijar): aztekî



Laviyên dêrê bi tîpên aramî - kurdî



Şaxên zimanê hind - ewrûpî



### Devokên zaravayên kurdî

A / mukriyanî (S)	I / silêmanî (S)
B / erdelanî (S)	Î / germiyanî (L)
C / zazî (G)	J / kelhorî (L)
Ç / botî (K)	K / bextiyarî (L)
D / hewramî / hewremanî (G)	L / lekî (L)
E / bayezidî (K)	M / kuhgalû (L)
Ê / hekarî / şemdinanî (K)	N / bacelanî (G)
F / berferadî / rojava (K)	O / şêxbizîni (G)
G / mamasanî (L)	P / Badînanî (K)
H / feylî/behreyî (L)	R / botanî (K)

**Mukrî / mukriyanî** li Rohilata Kurdistanê, li navçeya Mahabadê dihê peyivtin. Mahabad di dema xwe de navenda emareta Mukriyan bû. Weke din, mukriyanî li dorhêlên Şîno, Nexedeh, Xane (Pîranşehr), Serdeşt, Bokan, Sanqele, Seqizê dihê peyivtin. **Erdelanî** li Rohilata Kurdistanê, li derdorên Sinê dihê peyivtin. **Zazî** li Bakura Rojavaya Kurdistanê, li deverên Çebaxçûr, Mazra, Palo, Gênc, Hêne, Sêwreg û Çêrmûgê dihê peyivtin. Nêzikî devoka hewramî ye jî. **Botî / Botanî** li Navrasta Kurdistanê li deverên, pêşî li Cizîr, Sêrt, Şîrnex, Silopiya, Zaxo, Diyarbekir, Farqîn û Dêrika li Başûra Rojavaya Kurdistanê - (Malikiyê) dihê peyivtin. **Hewramî / hewremanî** li Rohilata Kurdistanê, li Ehmed Awa, Biyare, Tewêle, li Hewreman-î Text, Hewreman-î Lihon, Paweh, Newsûd, Nodşe, Dizlî, Dînewer, Zengene, Siyamen-sûr, Şêxan û li beşek ji devera Sinê jî dihê peyivtin. **Bayezidî** li Bakura Kurdistanê, li nêzîkî tevayîya Serhedan dihê peyivtin. **Hekarî / şemdinanî** weke nav li ser e, di hemû deverên Colemêrgê û li van navçeyên li jêr nîmandî de dihê peyivtin: Colemêrg, Nehrî, Oramar, Gever. **Berferadî / Rojava** li Riha, Mereş, Dilûk (Entab), Mazra û li Başûra Rojavaya Kurdistan, li Efrînê dihê peyivtin. **Mamasanî** li deverên Başûra Kurdistanê li Loristanê dihê peyivtin. **Feylî / Behreyî** li başûra Kurdistanê li Bedra û Bexdadê dihê peyivtin. **Silêmanî** li bajarên Silêmanî, Qela Çolan, Çiwarte, Mawet, Pênciwîn, Şehrezor, Kerkûk, Çemçemal, Qadî Kerem, Leylan û yên mayî dihê peyivtin. **Germiyanî** li Başûra Kurdistanê li dorhêlên Kerkûkê dihê peyivtin. **Kelhorî** li Rohilata Kurdistanê li deverên Kermanshan, xaneqîn, Mendelî, Bedra û Kût û li Bîcar, Qurwe û Sonqurê dihê peyivtin. **Bextiyarî** li Başûra Rohilata Kurdistanê, li deverên Daran, Mescidê Silêman, Şehre Kurd, Çarmihal navçeya Piştgo'yê û li deverên mayî dihê peyivtin. **Lekî** li dorhêlên Kermanshan, Îlam û Eywanşarê dihê peyivtin. **Kuhgalû** li Başûra Rohilata Kurdistanê, li deverên Behbehan û Qeleyê Golabê dihê peyivtin. **Bacelanî** li Rohilata Kurdistanê dihê peyivtin. Navçeyê eşayirî ye, ji gelek gundan pêkhatiye. **Şêxbizîni** kurdên ji demên kevin hatine ajotina nav Tirkîyê û ev devok bi piranî li deverên Enqere û Stanbolê dihê peyivtin. **Badînanî** - li deverên başûra Botan li deverên Dihok, Amêdî, Akrê, Şêxan, Zêbar û Barzan dihê peyivtin. **Badînanî** - li rohilata Hekarî Soma, Xoy, Mako û Mîrîye û li gundên Şîno. **Cizîrî** li deverên Mêrdîn, Midyad, Nisêbin, Qamişlo, Şengal û Amûdê dihê peyivtin.

**TBN:** Xebatên bi awayekî tevayî naskirina devokên zimanê kurdî, bê guman îro ji ber hebûna astengên kirina vekolîneke rêkûpêk li ser axa Kurdistanê, xwedî kêmasî ne. Ev erk bi awayekî baş tenê di rewş û pergaleke azad de û li ser axa welêt, dikare bi cih were. Lewra jî dê kêmasiyên vê xebatê hebin û em hêvîdar in dê xebatkarên vê babetê vî karî jî ve derê rahêjin û heya amancê, bibine serî.

(1) : Şerefnameya Mîr Şerefxanê Bidlîsî - 1859

### Jêder û çavkanî

- Kurdistan Devriminin Yolu / Manifesto - Weşanên Serxwebûn - 1978
- A Manual Of Pehlewi - By Henrik Samuel Nyberg, Otto Harrasowitz - Wiesbaden / W- Germany
- Tewartîxê Qedîmê Kurdistan - M. Mehmûdê Beyazidî, Mosko-1986
- Mêjûy Edebî Kurd - Aladîn Secadî - Ecemistan (Îran)
- Kovara Muzîk û Huner, hejmar 21- 22 1986, 1987
- Persisk Litteratur I Utomeuropelska Litteraturer Bo Utas, Sthlm 1966



## folklorê zazakî ra çend nimûney



J. Espar

## Dest

Mêrik keydê xwi ra veciyeno hetey bazarî ra şono. Ewiniyeno di tenî ha donî pêro. Mêrik şono dekweno yîni mîyon, yîni cê keno û parseno vono:

- Şîma çîrî donî pêro û beyntardê şîma di çi esto?

Pêrodayoxon ra yew vono:

- Inê comêrdî yew deme re ver, mi ra toy perey deyn kardî. Gonî deynê mi rewna bidaynî, nêda. Mi çend hewî (ray) verê zî ti ra vatîbi, eke yo peronê mi nêdo; ez destê yê derekeno. Eyrû (ewro) ez raştê yê ome-wo, gonî ez destê yê dereko.

Mêrik ageyreno deyndarî parseno vono:

- Îna mesela ona ya?

Deyndar vono:

- E, raştê yê zî, ez deyndarê inê mêrdimî yo, lablê destê mi zav teng o, ez nişno deynê yê bidardo.

Miyonkewtox, wayîrdê peron ra parseno vono:

- Inkey (nika) ti perondê xwi ser o destê inê mêrdimî derekenî?

Wayîrdê peron vono:

- La ez se keno? Ez derekeno hem zî ti senêhewa vacî ayhewa.

Miyonkewtox veceno, deynê deyndarî dono û deyndarî ra vono: "key ki perey to desti kewî, ti deynê mi donî."

Deyndar wexto ki hetey keyî ra şono, pîzedê xwi di vono "demek dîna

di hema mêrdimê onasarên zî estî.

Ay beyntar di yew deme şono, rocê deyn-

dar raştê miyonkewtoxî yeno, miyonkewtox deyndarî ra vono:

- Hey gîdî dey birak! Ay roj to virî yeno? Mi ra nêbîn î ay comêrdî destê to derekardî.

Deyndar zav xwi ver kuweno, vono:

- E, willay raştê zî ona bî. Key to awon bû, to mi rî yew hewida pîli kardî.

Çend rocî ra pey, deyndar yew cematî di raştê miyonkewtoxî yeno.

Miyonkewtox in hewî cematî mîyon di vono:

- Lîa raştê ay çi roj bi! De vacî, mi ra nêbînî ay comêrdî sekardî to?

Deyndar vengê xwi nêkeno, wardono şono teber.

Rocê, deyndar û miyonkewtox hewna raştê yewbînon yenî. Deyndar tewî gêno vono, ino hewna cayçî nêvaco. Miyankewtox vono:

- Axrîki ti xeyrê de mi ra bîy wayîrdê destî. Mi ra nêbînî Homay zono destê to kora bî.

Deyndar hêron ver, hêş seredê yê di nêmoneno. Wayîrdê peron ra vono:

- Inkey ino dest nêbi to xelesna?

Wayîrdê peron vono:

- La qey to xwi virî kard ayo bî?

Deyndar vono:

- Ez wardey inê destî nono wa hema çîne bû! Darey xwi paşt ra onceno, dono pîro destê xwi derekeno, arzeno ridê wayîrdê peron û vono:

- Ho, destî bigêri deki çimondê xwi!

## Vatey Verêno

1 - Awki hetonî lîl nêba, zeng nêbena.

2 - Ceney sewîdarî timo warway a.

3 - Kutiko ki nêzono bilawo, wayîrdê keyî rî misafiro ono.

4 - Ez vono ez xatim o", ti vonî "çend lacê to yî"?

5 - Dewa ki dîkî tede zav bi nimac erey beno.

6 - Çew dodê xwi rî nêvono tîrş o.

7 - Rojo weş serê sibay ra beylu beno.

8 - Cenîya coniki çuwa xwi nêresnena.

9 - Zuro biki durey di, westo bidî extarey di.

10 - Qanûn lastîg o, ti kom heta boncî a heta şono.

11 - Umbazey eskerey îstêsûn di qedêna.

12 - Ti tereso geyrenî şo axo het, ti ehmeqo geyrenî şo şêxo het!

13 - Pars pars kê şonî Qars.

14 - Xwarz xalon şono.

15 - Kutik lawenû karwon vêrenû.

16 - Her teyrî qordê xwi reyra firena.

17 - Gi bi gudvewri vînî nêbeno.

18 - Pisinga ki mast bora çimondê yay ra beylu wo.

19 - De'waya ki ciwenî ser o veciyêna wa hêga di vecya.

20 - Homay ko veyneno vewri dono bide.

21 - Dizdê xiyaron zimistono beylu beno.

22 - Serberê deveçîyo gonî barz bû.

23 - To çi dekarde destê mi ki, ez ridê to sawo.

24 - Wextê seyde gly tonzî yeno.

25 - Aqilo sivik baro gir o.

**Selîmono lawko**

Selîmono lawko yarî ya  
 Selîmay muxtarî barî ya  
 Hem barî ya, yarî ya  
 Yewda dindon wîrdî ya  
 Kom dîya, komî nêdiya  
 Bondê comî ro şîya  
 Gondê mi rî meraq biya  
 Ya rinday wesfo nîya  
 Yewda beşno barî ya  
 Zilay muxtarî yarî ya

**Cemîla**

Day leyro, leyro, leyro Cemîlay mi  
 Wesar wextê waron o, Cemîlay mi  
  
 Şar bar keno şono warono, Cemîlay mi  
 Ma şonî Homikono, Cemîlay mi  
  
 Homiko cay axon o Cemîlay mi  
 Homiko verê çemon o, Cemîlay mi  
  
 Sofî barê xwi wenono, Cemîlay mi  
 Yo şono Homikono Cemîlay mi  
  
 Hay nardi, nardi, nardi, Cemîlay mi  
 Cemîlî Cemîla bardî, Cemîlay mi  
  
 Kalay ı gêso pê sar di, Cemîlay mi  
 Day leyro, leyro, leyro, Cemîlay mi

(1): *Kalay*: In watiş fam nêbiyo.

**Nîna nîna bego nîna**

Bego ma şêrî gola teki  
 Mîro ma şêrî gola teki  
 Ez bimano ti gilze ki  
 Mi sek va, ti vengê xwi meki !  
 To fineno xwi toneki  
 Hetonî sukday Diyarbeki  
 To rî gêno yew fistono îpegi  
  
 Nîna nîna, bego nîna  
 Nîna nîna, mîro nîna  
 Hadî ma şêrî roy Welono  
 Beg arzeno çutay bimbono  
 Mîr arzeno çutay bimbono  
 Pa keno yew dêlay masono  
 Serey keyneki yew teki dono  
 Qolday xwi rî yew çuti vardono  
  
 Nîna nîna, bego nîna  
 Nîna nîna, mîro nîno  
 Bazinê destê mi tirka wo  
 Yew eyrû destê mi tadawo  
 Xerîb nîyo datîza wo  
 Qey dewicê dewdey ma wo  
 Yo mi rî biyo maro siya wo  
  
 Bawo to ez dawo leyirdê herî  
 Ser semedê çay-şekerî  
 Çay-şeker mi rî fişqî herî  
 Nîna nîna, bego nîno  
 Nîna nîna, mîro nîna



***Delal delal delalê***

Delal-delal delalê, delal lê lê, hevalê way

Delal-delal delalê, delal lê lê, hevalê way

Hewşo pîl o, hera wo, delal lê lê, hevalê way

Ma veyvey xwi ronawo, delal lê lê, hevalê way

Keyno tede refdawo 2 Delal lê lê, hevalê way

(.....) 1 ber di vecyawo, delal lê lê, hevalê way

Xwi pol ser di ewniyawo? Delal lê lê, hevalê way

Morê xwi çewî rî nêdawo, delal lê lê, hevalê way

(.....) 2 xwi ro dawo, delal lê lê, hevalê way

Delal, delal delalê, delal lê lê, hevalê way

Ti gulay elbîsî ya, delal lê lê, hevalê way

Ti çiçeka masî ya, delal lê lê, hevalê way

Gondê mi rî meraq bîya, delal lê lê, hevalê way

Ti.rinday wesfo niya, delal lê lê, hevalê way

(1) : Îtîya di laceko ki beno zama, nameyyê vêreno. Û no name (nome) hergû veyve di bedeliyêno. No semed ra nameyê ki deyîrê di vêrenî mi nênuştî.

(2) : Îtîya di zî keyneka ki bena veyekî namey yay vêreno.

***Hesro dilo lo dilo***

Hesro dilo, lo dilo

Îsro dilo, lo dilo

Hesro dilo, lo dilo

Îsro dilo, lo dilo

Ma şonî purdê Batmonî

Hesro dilo lo dilo

Ma şonî purdê Batmonî

Îsro dilo, lo dilo

Onî çutey bazîni

Hesro dilo, lo dilo

Onî çutey bazîni

Îsro dilo, lo dilo

Nîşonê ..... 1 rononî

Hesro dilo, lo dilo

Nîşonê ..... 1 rononî

Îsro dilo lo dilo

Pey keyfê ..... 2 onî

Hesro dilo, lo dilo

Pey keyfê ..... 2 onî

Îsro dilo, lo dilo

Awkey neqir kiho ya

Hesro dilo, lo dilo

Awkey neqir kiho ya

Îsro dilo, lo dilo


Kosteki..... 3 ye

Hesro dilo, lo dilo

Kosteki ..... 3 ye

Îsro dilo, lo dilo

(1) : Îta di keyneka ki bena veyeki namey yay vêreno û no name her veyve di bedeliyêno. No semed re nameyê ki deyîrê vêrenî, mi nênuştî. (2) : Îta di namey laceko ki beno zama vêreno. (3) : Îta di zî namey yew cenî vêreno. Na cenî gege mêrdimey zama ya. Gege zî zerey vatoxan komî biwaza namey ayay vonî.



## Fatima

Fatay mi Fatay Nebiyon a, Fatimay mi  
 Fatay mi Fatay Nebiyon a, Fatimay mi  
 Ti dergay şeş babon a, Fatimay mi  
 Ti dergay şeş babon a, qol-qutay mi  
 Qol-qutay Mendîşon a, Fatimay mi  
 Qol-qutay Mendîşon a, qol-qutay mi  
 Hêgay ver o boxarî, Fatimay mi  
 Hêgay ver o boxarî, qol-qutay mi  
 Eyelê aşiko xidar î, Fatimay mi  
 Eyelê aşiko xidar î, qol-qutay mi  
 Day leyro, leyro, leyro, Fatimay mi  
 Day leyro, leyro, leyro, qol-qutay mi  
 Mi elbi girotî şîyo awo, Fatimay mi  
 Mi elbî girotî şîyo awo, qol-qutay mi  
 Xalo Faris ver a wo, Fatimay mi  
 Xalo Faris ver a wo, qol-qutay mi  
 Xalê m' mi ra cîgrawo, Fatimay mi  
 Xalê m' mi ra cîgrawo, qol-qutay mi  
 Qolay m' ti şona çawo? Fatimay mi  
 Qolay m' ti şona çawo? qol-qutay mi  
 Ez peyser ageyrawo, Fatimay mi  
 Ez peyser ageyrawo, qol-qutay mi  
 Rayirê mezelfî verad o, Fatimay mi  
 Rayirê mezelfî verad o, qol-qutay mi  
 Kom ti ro şêro mirad o, Fatimay mi  
 Kom ti ro şê ro mirad o, qol-qutay mi  
 Husî, Fati karda bêmirad o, Fatimay mi  
 Husî, Fati karda bêmirad o, qol-qutay mi

Miradê Fati binê ard o, Fatimay mi  
 Miradê Fati binê ard o, qol-qutay mi  
 Day leyro, leyro, leyro, Fatimay mi  
 Day leyro, leyro, leyro qol-qutay mi  
 Cêr o yeno qifley aşikono, Fatimay mi  
 Cêr o yeno qifley aşikono, qol-qutay mi  
 Varnî Reşatê Aşikon o, Fatimay mi  
 Varnî Reşatê Aşikan o, qol-qutay mi  
 Peynî Husê Aşikon o, Fatimay mi  
 Peynî Husê Aşikon o, qol-qutay mi  
 Akeno berê dilavono, Fatimay mi  
 Akeno berê dilavono, qol-qutay mi  
 veceno zêrf û mektubono, Fatimay mi  
 Veceno zêrf û mektubono, qol-qutay mi  
 Beno dono yazçiyono, Fatimay mi  
 Beno dono yazçiyono, qol-qutay mi  
 Yazçî qelem kay dono, Fatimay mi  
 Yazçî qelem kay dono, qol-qutay mi  
 Day leyro, leyro, leyro, Fatimay mi  
 Day leyro, leyro, leyro, qol-qutay mi

Mi nê deyirê cêrênî dormarey (çorşmey) Pîranî ra arê-kerdî û hezey vatişdê di cenîyandê Pîranican nuştî. Pîran yew qezay Diyarbekir a. Nê deyirî, deyirê rojandê şayî û ey veyvan î. Cenîy ya zî, comêrdê ma Kîrdan nê deyîran reyra govend gêni.

Heze ki yeno zanayîş, vatişê deyîran bi gorê bê cayan û mintiqan bedeliyêno. Gilanga (gege) yew mintiqa di zî yew deyirî çend heway ra vaciyêna. Deyîrey "Fatima" deyîrandê onasarêno rî yew nimûne ya. Ez bi xwî raştê çend varyantê na deyirî omewo. Nê deyirê ki ma ewta nuştî, sew bîna varyantê jînî zî estî.

"Vatey verêno" ki ma ewta (îta, îtya) nuştî, dormarey Pîranî di vaciyênî. Hewawo ki mi eşnawitî û mi vîrî di mendî, mi 'eynî ayhewa nuştî.

Meselay "Dest" zî, mi Pîran di eşnawitîbî. Senêhewa mi vîrî di menda mi ayhewa nuştî.



# TEWAN Û TOLE LI KURDISTANÊ

A. DÎCLE

Dawiya sala 1985

## Xebatên palaftina şoreşa Kurdistanê tewanên girantirîn li hemberê têkoşîna rizgariya netewî.

**G**ava di Kurdistana vê rojê de em çêla çînan, berpîrsiyarên wan û hêzên ramyarî yên curbicur bikin, divêt em rastiyên wan ên taybetî jî baş têbigihîjin û em wan rast deynin ber çavan. Serdestên Kurdan û niwendêrên wan, di demên berê de pêşî xwe tevî "ittîhad ve Terakkî" û Kemalîzmê; paşê jî xwe tevî partiyên Tirk ên curbicur ên mîna AP (Partîya Adaletê) û CHP (Partîya Gel a Cumhuriyetê) kirine. Niha jî bûne çep û rastên Kenan Evremî; tevî partiyên bi navên MDP (Partîya Demokrat a Netewîperest), ANAP (Partîya Niştîman), SHP (Partîya Gel a Sosyal-Demokrat) û DSP (Partîya Demokratîk a çep) bûne. Di nava van partîyan de, li ser bingeha xulamtiyeke bê-tixûb, xwesparî û hevxbatkarîya ji bo van partîyan xebitîne ku ji xwe re jiyan peydbibikin û hebûna xwe bidomînin. Ev bûyer, ji dîrokê ber bi rojên niha ve, her çûye xwe xurt kiriye; bi şeweya xwe ya serdest, mîna çarenivîsekê xwe spartîye gelê me û di rojên niha de, xwe gihandîye radeyên herî dilxelînek û kirêt. Serdestên Kurdan û niwendêrên wan ên xulam, di rojên me de, hema tenê rojêke din dirêj kirina temênên xwe, di nava rêzên tevgera rizgariya netewa Kurdistanê de, ji dagîrkerên biyanî jî diwartir, bi hewleke çavsoz û har xwe dilivînin û rê ji bo pêkanîna gelek pîkolî, cewisadin û qirîkirinên li ser gelê me vedikin. Ev koma welatfiroşan ku yên mîna Kamûran İnan serkêşîya wê dikin, hinde xebatên ku nakevîne mîjîyê mirovî dide ber xwe. Li ber çavê her kesekî, her rojê û di her kêliyê de kesên ji vê komê gunehkariyên xwe berdewam dikin. Di serî de ev derdor, bi navê dagîrkeriya Tirk a faşîst, dixwazin têkoşîna me ya rizgariya netewî ku kêlî bi kêlî peşvetir diçe, bînin bin kontrola xwe, pêşveçûna têkoşîna rabiwestînin, ji hindurî ve şûrên xwe berdînin dilê têkoşîna. Ji bo van xiziyên xwe, li çare û derfetên digerin, pîlan didin pêşîya xwe, pêşniyarên xwe pêşkêş dikin û ji bo bikarhatina van hîma xwe datînin

holê. Weke ku gelekî baş tê zanîn, ev kes li ber deriyê dewleta Tirk xulamên bijarte ne. Lê di rastiyêde jî ne xwediyê çî nîrx û buhayekê ne. Lê dîsan jî ev derdor, li hemberê berxwedana netewî ya Kurdistanê, li cem dewleta Tirk xwediyê "buhayekê" ne. Ew bi xwe jî serwestê vê rastiyê bûne. Lewma jî, bi carekê wê kesaniya xwe ya erzan, xulam û tarî ji bir dikin û radibin aqil didin xwediyên rejîmê û dibin aqildarên wan. Ji mîjve, dest bi karekî weha kirine. Kamûran İnan van pêşniyarên datîne pêşîya dewleta dagîrker, "Çima rêxistîneka me jî ya weke CIA tune. Bi hêzên parastîne yên niha me hene, em nikarin ji derheqê terorîzmê derbikevin.", "Çawa Amerîka û Îsraîl di şikandina terorîzmê de firokan radikin û êrîşan pêktînin, divê em jî welê bikin." Ji aliyekê vî aqilî dide dagîrkeran, ji aliyê din gava ji wî diprisin, "Emê çawa Apo bigirin?", dibêje, "Dewleta me ya çêtirîn dizane, dewleta me dikare ji dewletên van tiştan dikin, karê xwe çêtir bike." Ev ajanê navnetewan ê tevîhevkar, ev dilreşê dijîmîne mîlet û mirovatîyê, rast û rast rûreşê Kurdistana vê rojê ye û berpîrsiyarê koma hevxbatkarên a bi vê nolê ye.

**P**ir êşkera ye, ku koma hevxbatkarên Kurd, dêmenekê bi vê radeyê kîret dide ber çavan, xwe amadeyê xulamtiyê dike. Her weha pir êşkera ye, ku ev bi rewşa dewleta Tirk û hêzên împeryalîstên navnetewan ve jî nêzik ve gîredayî ye. Ev jî bi wê rastiyê ve gîredayî ye, ku ev hêz berpîrsiyarîya wê dikin. Ji hêzên ku ew xulamtiya wê dikin, dewleta Tirk, ji sistêmên dolivgerên dîrokê yên hovtirîn e; di rojên me de rejîmeke, ji rejîmên leşkerî û faşîst a bi xetertirîn e. Dîsan ew hêzên împeryalîst ku ev xebatkar di xizmeta wan de ne, di pêşîde jî emperyalîstên amerîkî, weke ku tiştê wan nemabe bidin mirovatîyê, weha jî dibin dîwar li pêşîya pêşveçûna mirovatîyê. Serî didin her babet azîneyê ji bo şikandina têkoşîna serxwebûn û azadiya gelan. Ew berpîrsiyarên sistemeke weha ne, ku dixebitin vî tiştî di karguzeriyê de bigihînin serî. Ev, destên hevûdû didi hevûdû û di rojên me de gelên Tirkîyê û Kurdistanê didine ber qirkîman. Ji aboriyê heya ramyariyê, ji sincê heya çandê, di hemû

qadan de weke ku tu caran nehatibe dîtin, bi van gelan û li ser van gelan dileyîzin. Ramyariya kedxwariyê ya ku ev navenda dij-şoreşê vê rojê dispêre gelên me, li ser gelên cihanê yên paşmayîtir jî nayê bikaranîn. Ev gelên bindest, ji ber bûhabûna tiştên aborî, hatine ber keviya ku nekaribin bêhna xwe berdînin. Dîsan jî, "Lî cihanê gelekî biqasî gelê me helîm tine ye" tê gotin û bi vî rengî kenê xwe li gelê me dikin. Di cihana me ya vê rojê de, tevî banduriyên leşkerî û faşîst, çî sistemeke dolivgeriyê ne xwediyê wê hîmê ye, ku bikaribe bê-pervatiyeke weha û ramyariyên bê-mejî bispêrin gelên cihanê yên zanebûna wan a serxwebûn û azadiyê û pêre jî têkoşîna wan gihaye koçberên pêşketî. Li welatên mîna Fîlîpîn, Afrîkaya Başûr, Pakistan, Bangladeş, El Salvador û heya Tûnisê, ku nexwediyên wê hîmê ne ku bikaribin ji dehan yek ji bikaranînen weke yên dewleta Tirk bidin ber xwe, li dijî bandûriyan hêlwêstên gelfî yên şoreşger û berxwedana xwe heya were gotin pêş ve dane û van bandûriyan anîne heya ber keviya rûxîn û hilweşînê.

**L**ê belê gelekî êşkera ye, ku rastiya li Tirkîyê heye, li der veyî vê rastiyê jî dimîne. Bîlî azîneyên cewisandin û kedxwariyê yên rejîma Tirkên dagîrker û faşîst, ku her demê bêhtir wan kûr dike û wan gihandîye koçbera karên weke yên bêmejiyan, em dibînin ku berxwedaneke bikaribe were navdan li holê û ber çavan li Tirkîyê tune ye. Li Tirkîyê girsên gel ber bi gejbûn û şaşbûnekê ve herikîne. Ketine nava bê-biryariyê kûr û şiloyî. Ew hêrs û girra li dijî bikaranînen rejîmê yên gel nekarine ber bi berxwedaneke rêxistî ve werin zivirandin. Hinde berpîrsiyarên vê rewşê yên bin-gehî hene. Êşkera ye ku ev jî ev in; hêzên ku dibêjin emê pêşengîya vî gelfî bikin û bi vê "armançê" derketine holê. Ev hêz, ew berpîrsiyarî û "armançên" kiribûn barên xwe vê rojê li aliyekê danîne, û ji bo "demokrasiyê" bê seceretir û sextetir, ku nabe weke "demokratiya" Fîlîpînê jî danîne pêşîya xwe. Ji bo vê, bi armanca cih-girtina li aliyê çepê yê kesên mîna Evren, hema ketine nava hewildaneke bê tixûb û dest bi karekî weha erzan kirine. Tiştê ku di barên zend û qanûnên

weke "poşmaniyê" û "efûkirinê" de xwediyên rejîmê tevgerandine û hiştine ku ev hêvîdar bibin, ev rewşa ku hêzên "çep" di navê de ne, bi xwe ye. Ev hêzên "çep", bi lî hemû bikaranînan aborî û terora ramyarî yê cuntaya leşkerî û faşîst ên li ser gelên me û li ser law û keçên gelên me yê bi nixtirîn û şoreşger, berê xwe nedan sazûmanê. Em vê li aliyekê bihêlin, bizavaa rizgariya netewa Kurdistan ku li dijî vê rejîmê pêşve diçe, dikin hedefa xwe. Evçend erzan û bê rûmet dadikevin, ku bibêjin, ev bizav, "livbaziya PKK"ê nahêline em di demokratîyê de cih bigirin."

**G**elê, di dîrokê de û di rojên niha de, gelek hêzên bi çarika "çepitîyê" û meylên xwespar perest derketine. Eşkere ye ku mirov ne cara pêşemîne e, rûberê xebatên weha dibê. Lê em dixwazin hema bi lez bibêjin, ji bavîkê van meylan Bernstein heya gelek xwespar û hevxeberkarên xwe cih ên navdêr, tenê yek ji biqasî serokên "çepên" palafker (tasfiyekar) neketin. Evçend be rûmet, bê giyan û bê secereketin, weke ku mîna buqelemûnê (heywaneke rengguhertok) xwe dizivîrin rengê cuda ku ew xwe dayinê û ketine navê. spartina vê yeke, zivirandine awayê jiyana xwe bi xwe. Kesên li Ewropa, bûne navgînên xwû ji bo ramyariyên dewletên ku ew li wir in. Di vir de, nekarîne bibine navgînên (hacetên) ramyariyê ewrûpî ya gelemperî ji. Kesên li Alamyana dixwazin xwe bixin rengê xalê xwe Hans, kesên li Swêdê ji dixwazin xwe bişibînin mezinê xwe Eriksen. Belê xebata vê yekê danîne ber xwe. Her çend rastî tenê ev jî bin, ev hêz, nikarin serwest jî bibin, ka bi çi awayî sixuriyê dikin û bi çi rengî ketine hava jiyaneke pejmûrde û belengaz. Gava hevrêyên wan di zîndanên de dirizin, bi sedan mirov ji şikenceyan tîr derbaskirin, ev bûyê pênc-deh salin li Ewropa dimînin. Li derveyî welat kulavên xwe li vir-û-wir raxistine. Lê dîsa jî nafikirin, ku ev tîr çi wateyê. Evçend erzanketî û bê secere bûne, ku nekaribin hisab û hejmarê ve yekê jî bikin. Weha gêj û mest ketine, ku nekaribin li ser buhayên mezintir jî bihizirin. Her çend rewşa wan niha rastûrast ev e jî, berpirsiyarên vê "çepitîyê", dixwazin şanî bikin ka bê bi çi ravîtiyê bûne hunermendên burjuvaziya piçûk. Heke ev bi navê wan şermeke mezin jî be, dîsan jî xwe jê dûr nagirin, ku vê rewşê rûberê çavan bikin. Perspektîfên wan ên ji bo vê rojê û hatinê jî aliyê berpirsiyarên sazûmana damezirî tîr xîzandin. Ev berpirsiyarên "çepitîyê" ku li revrevokîya xwe ya jî têkoşinê binêrin; ango bilî teviya rastiya xwe ya jî têkoşinê dîr, nikarin biqasî endamên sazûmanê

bi xwe jî xebat û hebûneke xwe bidin şanîkirin. Bi xwendina stranê û awazên ji dîr û bi hêviyên ber-bi-xwe-ve anîna hinde partiyên sazûmanê, hêviya hatinekê danîne ber xwe. An jî dixwazin di nava partiyêke sazûmanê de cihê xwe bigirin, bibin tirşika wê yan jî temam kirina wê. Tenê xebata bi vî armancê pêşve dibin. Ev, naxwazin tenê gelê Tirkîyê bi ve sextekariya xwe bixapînin. Dixwazin vî bispêrên gelê Kurdistanê jî û vî bikin malê gelê Kurdistanê jî, Kurdistanana ku li wir sûç û gunekên kesnedîtî, hatine bikaranîn.

**V**ê rojê têkoşîna rizgariya netewî ya gelê Kurdistanê, di bin êriş, xebatên rawestandî û dij-bangeşiyê ku ji çep û rastê mîna taviya baranê tîr barandin, pêşveçûna xwe didomîne. Divêt em bi taybetî bibêjin, ku di vir de çepê palafker, xayinên revrevokê jî têkoşinê û meylên hevxeberkar ên ji her cureyî roleke bi sixletî dileyizin.

(...)

**L**ê bilî van hemû armancên bêbext, çi xebatek jî van nikarin têkoşîna gelê Kurdistanê û xebatên rêberê şoreşê rawestînin. Pêşengên gelê Kurdistanê law û keçên gelê Kurdistanê yê hogir û çelengirin in. Ev gelê jê re digotin, "mirî ye", "dawî hat", vî rojê jî hem bêza xwe berxwedaneke weha bilind dike, ku mejiyan dilerizîne. Ev berxwedan, ne tenê li dijî yekeniya artêşa tirk ên bijartî û hevxeberkarên mîna İdrîsê Bidlîsê yê bi destê dagirkeran hatine çekdarkirin e. Ev berxwedan li dijî hemû xulamokan, giyana hevxeberkariyê û her cure "çepê" bi çarîkan hatiye niximandinê. Di karvaniyê bi xwe de jî ev rastî bi hezaran caran îspat bûyê. Gelê Kurdistanê xwe gihandî wê rêxistinîya pîroz, ku bikaribe di karvaniyê de jî hîma xwe ya şer û cengê bi misogerî deyne pêşîya çavan. Ev rastî û hoyên (prensîbên) şoreşa Kurdistanê, endmên vî şoreşê ku rûmeta mirovî jî her tiştî bilindtir bibînin, êdî li Kurdistanê û Tirkîyê nahêlin ku reş jî sipî û sipî jî jî reş werin şanîkirin. Tu caran nema destûr didine tiştêkî weha. Çi kesek bi hesanî nema dikare rastiyan biniximîne. Kî bixwaze pêşîya şerê şoreşgerî yê gelan bixetimîne, wê bersîveke bê eman bistîne. Heya dev ji rewşa xwe ya bi sîç û gunehkar bemedin, tu kesek nama tê efûkirin û tolehildan wê bigihe encama xwe. Kî bi qasî serê derziyê bi doza gelan ve girêdayî be, divê nebe navgînê komên bêbext, xayin û wela tîroşan. Divêt

tu kesek bi navên sexte û şeweyên rengîn neyê xapandin û destûr nede, ku bi erzanî bi wî were leyistin.

## KUTAHÎ

### Gelê Kurdistanê dê mafê pirsîyarkirina dîrokê bibe serî

**V**ê rojê gelê Kurdistanê, bi têkoşîna xwe ya ku bilind dike, bi rastiya derêxistîye tonahiyê û bi berxwedana xwe ya li dijî xebatên berê xwe dane wî, bi eşkeretî dide danezanê, ku spartineke bê-dad napejirîne, bûyêrên paşverû napejirîne û nikare bipejirîne. Ma gelo ev tê çi wateyê? Ma gelo ev tê wêmaneyê, ku gelê Kurdistanê pirsîyarkirinê napejirîne? Na, gelê Kurdistanê jî dikare were pirsîyarkirin. Lê belê hinde hoy û prensîbên vî hene. Heke, gelê Kurdistanê li hemberê dîktatoriyên faşîst û hevxeberkarên wan ên faşîst li ber xwe nede yan jî dev ji berxwedana xwe berde, hingê eşkere ye ku bi hesanî dikare were pirsîyarkirin û heya divê bê-gorin were pirsîyarkirin. Heke gelê me êrişî nixê şoreşger û demokratîkî yê gelên Kurdistanê û Tirkîyê bike yan jî wan bi heftûlafta canê xwe neparêze, hingê bi hesanî dikare were pirsîyarkirin. Heke di şerê li hemberê faşîzmê yê bê-eman, ku li ser bîngeha hezaran zor û zehmetîyan te bilindkirinê de, gelê Kurdistanê şaşî û çewtiyên gelekî mezin bike paya xwe û van şaşiyên xwe bi zanabûnê bidonîne, hingê bi hesanî dikare were pirsîyarkirin. Gelê Kurdistanê di vî çarçivê de, weke ku şehîdê mezin M. Hayrî Durmuş jî gotî, "Ji ber ku min li pêşberê gelê xwe erk û delametên xwe bi tevayî bicihnehanîye, ez deyndar im" jî bo rakirina deynên xwe, amadeyê pirsîyarkirinê ye.

**B**elê, di têkoşîna vî rojê ku ew bi xurtî tê bilinkirin de, jî ber gelek sedeman, gelek kêmasî û şaşî jî çêdibin. Dîsan, di amadekariyan de jî gelek kêmasî hene. Di hemû aliyên xebatê de kêmasî çêdibin. Gelek delamat hîna nehatine bicihanîn û bersivên xwe negirtine. Kî were gotin, dikare lêgerîn li ser dîroka berxwedana mêjûyê were kirin û kêmasî û şaşiyên bi maneya ne liberxwedanê dikirin werin ronahîkirin û li ser vî bihgehê gelê Kurdistanê dikare were pirsîyarkirin. Di



vir de, gelê Kurdistanê jî pêşîn ve dide xweya kirin, ku amadeyê her babet nixandinan e û heya bi cezayên werin dayin wê razî be, heke ev li ser bingeha vê rastiya li jorin bin. Heke em welatê xwe û gelê xwe, bi hemû karînen xwe û mirovatiya xwe neparêzin, di vê barê de kêmkasiyên me yên dil û zanabûn hebin, em dibêjin, bila her kesek jî jêkirina serê xwe netirse. Ji ber vê yekê her cûre dadgeh dikarin werin avakirin û her cûre sîstemên pirsîyariyê dikaren werin bikaranîn. Gelê Kurdistanê tu caran xwe jî pirsîyarkirineke weha dûr nake. Berî her tiştî, gelê Kurdistanê di vê çarçivê de dixwaze, ku mirovatiya serbixwe û aza wî pirsîyar bike. Divê mirov li tiştên hatine nivîsîn, hatine gotin û berxwedana bilind dibe binêre; şaşî û kêmkasiyan rohnî bike. Heke di van de qestek û bi zanabûn li paş hîştinek were dîtin, hingê divêt were eşkerekirin, ka çi divê were efûkirin û çi ne, bi ser bingehê weha, her mirovekî civaka me, gava pêdivî be, dikare xebata şoreşê bi awayekî xurt rexne bike û hima her babet mafên pirsîyarkirinê di xwe de bibîne.

**Ç**epê Tirkîyê jî dikare vî tiştî bike. Çepê Tirkîyê îddîa dike, ku berpirsiyariya gelê Tirk dike û dibêje ev mafê min e. Ji demên dîrokê yên berê heya niha em û gelê Tirk yek çarenivîsê (qederê) li xwe par dikin, gelek bûyerên bi êş û dijwarî bûne aliyên hevpare yên jiyana me. Gelê Tirk û biqasî vî gelî jî law û keçên vî gelî yên jî dil û can pêşverû û şereşger, li ser bingeha têkoşinê bilind bikin û rastiya jiyandê dikarin berxwedana me pirsîyarkirinê û divê bikin jî. Ev jî, di çarçiva berxwedana li dijî hukmê li ser wan an jî di çarçiva amadekirina berxwedanê de, dikarin kêmasî û şaşyên me bibînin û bidin ber rexneyan. Bi taybetî, heke li pêşberê wan û gelê Tirk, rêdariyê me hebe, ku berjewendiyên wan nayne berçavan an jî berjewendiyên wan bi yên gelê Kurd re girênade, piştî hûrkolineke pêdivî ya têr û bes, divêt jî her cûre pirsîyarkirinekê netirsîn û serî bidin tiştêkî weha. Heke em nebin piştigerekî wan ê baş, divê sedemên vê deynine pêşya çavan. Heke em pêdiviyên xuşk û birayetiye bi cih neymin, heke me pozê xwe li hevberê wan bilind kiribe û ji jor ve li wan nêrîbe yan jî me xwe bi şovênîstî nêzîkî wan kiribe, ew dikarin jî aliyên îdeolojîkî, ramiyarî û aksiyonî, jî hemû aliyên vî hesab û hejmartinê jî me bixwazin. Heke gelê Kurdistanê jî dayina vê hejmar û hesabê bireve, bê-guman hingê çepê Tirk bi navê gelê Tirk, dikare mafê pirsîyarkirina me bi destê xwe ve bine. Lê belê, zelal û ranak e, ku tenê yên gelê

Trikîyê di hundir û derve de bi layiqî temsîl dikin, dikarin vî tiştî bikin. Em gelekî baş bawer dîtin ku kesên weha hene, eger ew yeko-yeko jî bin. Kesên weha ew kes in, ku li dijî faşîzma dagîrker di zindanan de serî didin lê sir nadin, li derveyî zindanan jî rûmeta şoreşgerî jî her tiştî bilindtir digirin; van buhayên diparêzin û ji bo pêşvebirina berxwedana şoreşgerî xwe didin xebatên jî dil û can û di vî warî de çi jî destê wan tê bi dirustî datînin pêşya çavan. Kesên weha di girtîgehên de jî û li derveyî girtîgehên jî hene. Kesên serê xwe naçemînin û "qanûna poşmaniyê" jî xwe dûr digirin hema di gelek tevgeran de hene. Belê, kesên ku bikaribin me pirsîyar bikin, tenê ev in û divê vî karê xwe bikin jî. Ev dikarin kêmasiyên me yên di lîva li hemberê faşîzma 12' yê Îlone de, heke hebin sîcûn me yên li Tirkîyê û Kurdistanê, li gora zenda (qanûna) têkoşina şoreşgerî deynin pêşya çavan û ronî bikin. Ma gelo me berê xwe jî şoreşê zivirandiye? Di bikaranîna koteka şoreşgerî de, di girêdana bi nixên buha de, di dema xwe de bikaranîna amadekarî û taktîkan de, hinde kêmasî û şaşiyên me? Gelê Kurdistanê berxwedana xwe çawa pêşvedibe û ber bi ku derê ve dibe? Di barê pêşvebirina berxwedana hevpare ya gelên Tirk û Kurd de çi dibin an jî nabin? Di vî pirsê de gavên teorîkî û karvanî (prafîkî) çi ne? Law û keçên çepê Tirk ên dirust, bîr û baweriyên xwe yên li ser berxwedana gelê Kurdistanê, divê eşkere bikin. Divê lêgerîn û hûrkolînen zirav deynin pêşya xwe û di vî barê de divê produktîf bin, bi îsrar bin.

**B**erxwedana gelê Kurdistanê ya nûjen, jî roje hebûnê û heya niha jî hemû aliyên ve dikare were pirsîyarkirin. Gelê Kurdistanê amadeyê encamên tiştêkî weha ye. Lê divêt were zanîn, ku afirandkarê hikm û encameke weha dîsan jî tenê gelê Kurdistanê û gelê Kurdistanê xwediyê wê baweriyê ye, ku li ser bingeha dostaniya bi gelê Tirk re, xwe gihandiye xaleke dîrokê yê herî serbilind û bi şeref.

**L**ê em dibêjin, ber her kesekî, di pirsîyarkirineke dawî de, divêt çînen serdest ên Tirk di serî de bin, jî ber ku jî bilî hemû sîcûn xwe, xwe mîna hêza pirsîyarkar dibînin ve daxwaza xwe ya gemar jî bo kotekê dispêrin gelê Kurdistanê. Di dîrokê de çendî gelan jî cihanê maliştine, divêt hisaba van kirînen xwe bidin. Hisaba jî serdestên tirkan were xwestin, divêt di serî de gelê Kurdistanê, qir

kirînen li dijî gelên din jî bike navaroka xwe. Em dibêjin, ne tenê sîcûn Hitler, sîcûn M. Kemal Ataturk jî divêt bîr hejmartin. Li Dêrsimê, li Dara Hênê, li Amedê û li Zilan (Agirî/ Gridax) çawa bi dehhezaran Kurd di şekeft û geliyan de komî ser hev kiriye, çawa hinekan daye ber agirî û şewitandiye, hinekan jî fetisandiye? Belê ev qirîkirînen wî divêt baş bêne rohnîkirin. "Pelên bi şeref ên dîroka Tirkan" xwediyê kîjan rastiyan dîrokî ne, divêt ev rût û tazî werin ronahî kirin.

**A**rtêşa generalên faşîst jî, ku gelek şoreşger û welatparêzan pirsîyarkirine û wan bi dar ve kirine, divê bê-eman werin pirsîyarkirin. Ev artêş çi ye, çi nîne? Dîroka wê ya paşverû, pêwendiyên wê yên bi împeryalîzmê û faşîzmê re di rojên me de, divêt werine zelal kirin. Berî tevan jî divê Kenan Evren were pirsîyarkirin. Ramiyariyên ekomîkî û civakî yên rejîma ku ew pêşkêşiya wê dike, divêt werine pirsîyarkirin. Her weha, divêt hiqûqa 12' yê Îlonê bi tevayî were pirsîyarkirin. Divêt şikencexaneyên artêşê, ku tê de xwîna bi hezaran şoreşger û welatparêzan hatiye herikandin, derkevin ronahiya rojê.

**Ç**epê sexte jî, ku vî rojê bi navê çepitiyê derketiye holê û lê hevxebatkarê rejîma 12' yê Îlonê ye, divêt tevî paşverûtiya xwe were eşkerekirin û pirsîyarkirin. Divêt rohnî bibe, ku ev parêzkarên demokrafî û sosyalîzmê ne, yan jî verbîrên demokrafî û sosyalîzmê ne?

**K**esên mîna Ecevit (CHP) û Demirel (AP) jî, ku duhî xwediyên rêxistinên jî milyon mirovan bûn, niha di serî de Kurdistan, her tiştî dane ber destê faşîzmê û berpirsiyarên faşîzmê generalên artêşê, divêt werine pirsîyarkirin. Xebatên wan yeko yek werine zelalkirin. Li ser vî bingehê, divêt pirsîyariyê hilbijartî ya dîroka Tirkan were bi cihanî. Heke ev tev li aliyekê werne danîn, di navenda yên tîrên pirsîyarkirin de tenê rêberên şoreşa Kurdistanê werine dîtin, ev nikare were fahmkirin û çî caran jî ne dadçih e. Gava hemû hêzên hov li aliyekê bêne hîştin, û tene gelê Kurdistanê were dîtin, ew çî caran nikare were pejrandin. Di vir de, bila çî kesek xwe şaş nakê û berê xwe nede gelê Kurdistanê! Ji ber ku gelek hêzên divê werine pirsîyarkirin hene, heya dor bigihe gelê Kurdistanê yê bindest. Gelek hêzên çepên Tirkîyê, bila

îdeolojiyên xwe, xetên xwe yên ramiyê, karvaniya xwe; berxwedana xwe ya di dadgehên de, li çiyên û bajaran de, ji ber çavan derbas bikin. Ka rewşa wan çi ye? Belê, divêt pirsîyariya van tevan baş were kirin.

**L**ê dîsan jî em bawer dikin, ku hinek hêzên Tirkîyê hene, berpîrsîyariya çepê Tirkîyê dikin, ger hejmarê wan hidik jî be. Belê, divêt nêrîna li ser pîrsîyarkirinê, tevan û toleyê weha be û gelê Kurdistanê her demê wê bibe şopdarê pîrsîyarkirineke weha. Li ser vê bingehe gelê Kurdistanê, li dijî cûntaya ku sucan pêkîne tevgerake cezakimê bilind bike.. Gelê Kurdistanê, di vê riyê de bi sedan law û keçên xwe feda kiriye. Niha li Kurdistanê, xort û keçên ciwan li çiyên lewma serên xwe dikin gorî. Heke armanceka pîroz nebana, girêdana bi rûmet û gel re nebana, ma berxwedaneke weha dikarî were pêşvebirin?

**G**elê Kurdistanê, ji ber vebîrîn û qirkirinan hatine bikaranîn, ji ber sûcên giran ên li dijî hebûna me ya netewî û civakî hatine pêkanîn, diranên xwe derbasî neynûkên xwe kiriye û hesabê dipirse. Heke, bi mirovatîyê re girêdaneke xwerû hebe, hingê her mirovek dikare bi hesanî bibîne, ku ev liveke bêgavî ye. Ma kî dikare vê bike naveroka guftûgoyan? Ma kî dikare vê bi awayeke din bide şanîkirin û bikaribe vê nepejirîne? Li hevberê hêzekî dagîrker û faşîst, ku li şûn wî dîrokeke barbarî û hoviye heye, piştîgiriya hêzên împeryalist ên paşverûtir distîne, ji serê mûyan heya binê piyan bi kotekê hatiye kemilandin û di her qadê de rûxîn û tunekirinê dispêre gelê Kurdistanê, domaneke berxwedanê destpêkîniye ku wê rûmeta gelê Kurdistanê biparêze. Ma kî dikare ji ber armancên xwe yên erzan û be-secere, vê rastîyê înkare bike?

**M**a çi jî gelê Kurdistanê tê xwestin? Ma divêt em sîcên serdestên Tirkan ên di dîrokê de û niha efûbgîkin? Ma Grîdax, Dêrsim, Zîlan dikarin werine ji bir kirin? Ma teviya dîrokê li Kurdistanê bi xwînê, şikenceyan û zilmê nehatiye şûştin? Ev toraderveyîmîrovî xwe nedagerandîye? Ma bi deh-nezaran, sedan hezaran mirovên Kurd nehatine qirkirin? Bi kîjan gelê cihanê ve gindê hatiye leyistin? Kesbûna netewî û civakî ya kîjan gelî weke ya kurdan hatiye rûxandin? Ji sing û hembêza kîjan gelê cihanê ve hindê bêbext, welatfiroş, xayîn, hevxeatkar derke-

tine? Niha li welatê me, bi qasî berpîrsîyarên berxwedêrên dîroka me, hindê jî berpîrsîyarên bêbextên mîna Îdrîsê Bidlîsî û Rêberan hene. Cûnta bi devê xwe eşkere kir, ku tenê li Sêrtê, ji bo li dijî tevgera rizgariya netewa Kurdistan şer bikin, heft hezar kes çekdar bûne. Dewleta Tirk, weke tê dîtin, bi sedan û hezaran mirovên me, dike hevparên sûcên xwe yên xinizî. Gel heya dawîyê dehfandiye nava perîşanî û xîzaniyê û di ser de jî, sûdan ji vê rewşê jî xwe re distîne û her kesekî li dijî kesên din bikartîne. Di dîroka kîjan dewletê de hindê sûc û tevan û gunehkarî hene. Gava mirov hevqasî bikevin, ku newêrin navê neteweyekî jî bixin devê xwe, xwesparî û welatfiroşîyê weke rizgariyê bibînin, ma gelo divêt navê vi tiştî çi were danîn? Ma ev rastîya li cihanê erzuantir e, bila were pejirandin? Ma em çavên xwe li ber bimiçînin, gava welatfiroş hema her rojekê mîna mar û dûpişkan bi gelê me vedin? Heke bersiv bibe "na", hingê em dipîrsin, divêt mirov çi bi van xayînan bike? Ji hemû hêzan em dipîrsin, ku dixwazin gelê Kurdistanê pîrsîyarkirin, em çi bi van bikin? Komên gilîkar û bê-şerefan hene, ku kom bi kom destên xwe di xwîna şoreşgeran de digîrin, ma em çi bi van bikin? Ma divêt em bê-ehlaqîyek weha bipejirînin? Ma em xwe di nava çandeka weha de bihefînin. Pir eşkere ye, ku gelê Kurdistanê li hevberê hemû hêzên berê xwe didin hebûna wî, têkoşîna wî ya berxwedanê û hatina ronak ku serî jî bo wê daniye, vê bê-eman be û bersiva kirînan wan bide. Di serî de jî cûntaya faşîst, ji ber ku xwedîyê sûcên cihanê yên bê-şereftirîn e.

**B**elê, gelê Kurdistanê bi eşkeretî dide zanîne, ku wê hemû dijminên gel û hêzên dagîrker, ceza bike. Ji ber ku ev, di barê tevan û toleyê de jî, hemû rastîyan çewt û bervajî dikin. Dixwazin mafê berxwedanê jî holê rakin û weha xwe ji hisabdayîne xilas bikin.

**H**inek hêz hene dixwazin îspat bikin, ku serleşker û serbazên tirkan ên li Çolamergê pêşverû ne. Dipîrsin û dibêjin "esker jî ji lawên gel in, çawan hûn dikarin wan bikujin?" Ev liveke çendî şovenîst e? Ev çi bê edebî ye? Kî dikare sextekariyên weha bipejirîne? Tiştên ku ev dixwazin bibêjin ev in: Gava eskerên Tirkan çekên xwe li Kurdistanê bikar bînin, hingê dibin pêşverû, lê belê gava ku Kurd destên xwe biavêjin çekan,

dibin paşverû! Ev hêz jî, kî çewtkirina rastîyan de, evçendî bê-şerm xwe ditevgirînin.

**P**îştî van tevan, ma mafê hinekan heye, ku bibêjin, "Gelê Kurdistanê dikare bibe hîmekî pîrsîyarkirinê, mafê kurdan ma ew kes hene?" Ji bîran derbaskirina pîrsên welê bi xwe, ev tenê bi serê xwe bê-mejîbûn û bê-hişbûn e. Gelê Kurdistanê, ku berxwedanên pîroz bilind dike, di kar û karguzeriya xwe de xwe îspat kiriye. Lewma li hemû deran jî, wê bibe hêzeke daddar û pîrsîyarkirinê. Lê eşkere ye, ku hîna bi sixletên me gotî pîrsîyariyekê pêşve ne birîye, bi cih ne haniye û hîna nekariye vê rola xwe bi têrî bileyize. Em dizanin ku yekenyên artêşa Tirk bi şikence û qirkirînan xwe jîyan li Kurdistanê bê-debar û bê-zar kiriye. Lewma li dijî wê û saziyên çetakeleş û cerdevanan mafê çekirina karguzerî û livbaziyan di xwe de dibîne, xwedîyê azadiya tiştêkî weha ye. Guftûgoyên li ser vê rastîyê tenê, xizmetên mezin in ji bo dagîrkeriyê. Çi kesek nikare gelê Kurdistanê ji şer û têkoşîneke weha dûr bixîne yan jî çi kesek nikare xwedîyê wê quwwetê be, ku bikaribe şoreşa Kurdistanê rabiwestîne. Ev mafê gelê me ye, ev li pêşîya gelên cihanê deyneka namûs û rûmetê ye. Di barê pêşvebirina berxwedana pîrozkirîne de û di barê ber bi serfirazîyê birina ve --- berxwedanê de, weke heya niha di dîroka nûjen de bûye, ji niha û pêve jî gelê Kurdistanê bi xwîna xwe xwedî li niştîmana xwe derkeve. Heke neteweyek û şoreşgerên vî netewî rûberê lêdanên mezin dibin, helbet wê xwedîyê mafê xweparastîne bin û li dijî êrişan serî hildin.

**K**in were gotin; em ji her kesekî dixwazin, ku ew carek, bi kûja gelê kurd jî li pîrsê binihêrin û li ser vê bingehe jî xwe nêzîkî pîrsa Kurdistanê bikin. Xwe rast û durust bilivînin û rastîyan bi dilrastî rohnî binirxînin. Em dixwazin wî çepê palafkar û tasfîyekar, ku rewşa xwe bi dil û can jî ber çavan re derbas bikin û xwe hesab bikin. Her kesek dikarin alîkariya xwe dahênin holê, da doza serxwebûn û azadiya Kurdistanê zû bigehê serefrazî û serkeftîne. Em banga xwe jî bo rapêrîne dîsan hildidin û bang dikin û dibêjin; ku dê gelê Kurdistanê bersiva hemû dijminan bi serzêdayiya wan bide wan.


**DAWÎ**



# EHMEDÊ XANÎ

rewanê gel, hunera vehunana  
helbestan û çend gotin

R. Cizîrî



**K**urdan ku, ne dikarîbûn rêxistinên xwe yê dema koledariyê bizivirînin hêzeka ramyarî ya mezin û berxwedaneke rêkûpêk, li ber êrişên dagîrker û hêzên biyanî neçar diman. Çekê wan ê bi tenê xwe berdana deşt û bajarên û paşê jî pêşvekişîna ber bi çiyên bû. Lewma rêxistinîya êl û eşîran bi xurtî berdewam kir. Civaka Kurdistanê jî li ser wê bingehê, di warê serxwebûn û azadiyê de bû xwediyê nêrîneke paşdemayî. Nêrînê teng cihê xwe girtin. Serxwebûna malbat, êl û eşîr (hoz) bi ser her karekî re dihate girtin. Nakokî û bi-hevketinên vê rewşê li hemberê pêşketina civakê û avakirina taybetiyên gelekî serbixwe herdemê asteng û nexweşî ava kirine ku, heya vê rojê jî li hemberê tevgera rizgariya Kurdistan çeperan ava dikin.

Gêlen herêmê mîna yûnanên mekdonî, ermenî, romanî, perthî û sasaniyan, di domana çerxên koledariyê de, cih û warên kurdan dikirin navenda şerekî bê dawî.

Avakirina împêratoriyeke mezin di herêma Rohilata Navîn de tenê bi avakirina doliwgeriyê xurt li ser hemû riyên bazirganiyê pêk dihat. Her hêzeke ku serê xwe hildida û dixwest tara bazara xwe fireh bike, pêşemîn planê vegirtina van riyên amade dikir. Ew rêna jî bi tevayî di Kurdistanê re derbas dibûn. Di nava Kurdan de, ew rewşa jihevketî ne

dihîşt ku, kurd bibin xwediyê hêzekê ku bikaribe wan riyên bixwe bin kontrola xwe. Cihê Kurdistanê (bakura Mêzopotamiyayê) bi co-grafî xwedî cihê gelekî stratejîkî bû. Ev rewş dibû sedema êrişên hemû hêzên biyanî.

Kurdan serdestiya hêzên dagîrker ne dipejirandin. Belê hêzeka navendî ji bo bersiva wan bide ava ne dibû. Bi tenê çekên kurdan li ser vê xalê kom dibû, li hemberê jiyana pêşketî û pêlên bajarvaniyê (sîvilîzasyonê) kurdan jiyana çiyên bi dilxwaziya xwe dipejirandin. Li wê derê taybetiyên civakê xwe diparastin. Buhayê wê dibû veqetandina ji dîrokê. Kurdan bajar weha nas dikirin, hovekî bê eman û navendên asimilasyon û wendabûnê.

Di çerxên dawîn ên jiyana koledariyê de, bi destpêka dagirkeriya ereban re, Kurdistan jî wê rewşa cihê herdem şerekî di navbera sasanî û bîzensiyan de, rizgar bû. Lê belê, ev êriş û dagirkeriya nuh ji yê berê ne hêsantir bûn. Di navbera salên 650 - 850 (p.z), li ser bingeha feodalîzmê ereban împêratoriyeke mezin avakiribûn. Ereban bûn nûnerên olekî nuh bi navê Îslamê. Dagirkeriya ereban li ser bingeha asimilasyonê hemû taybetî û keleporen netewî yê gelên herêmê xwe berfireh kir. Di bin nîre vê dagirkeriyê de, kurd hîn bêhtir rastê pêlên zor û koteka biyanî bûn. Her çend ku kurd berê wê demê xwediyê îdeolojiya Zer-

deştî (Mazdeîzm) bûn jî, dîsa bi darê zore û rola Îslamê wekî *Hespê Trûva*, ew îdeolojiya xwe winda kirin û neçare derbasbûna ser Îslamê bûn.

Îslam, bi vê otorîteya xwe ji bo tarîkirina rastiya dagirkeriya ereban bû navgînek di destên kesên feodalên hundir û derve de. Bi vê pîrsê ve girêdayî, çînen serdest ên kurd jî bûn mîna *Hespê Trûva* û di nava civakê kurdan de bi her awayî çand, ziman, sinc, urf û edetên ereban wergirtin û bûn wekî berdewamkirina çînen serdest ên biyanî.

Di navbera sedsalên X-XVI î de, ku feodalîzmê xwe bilind kir, koçberê nuh hêdfê hêdfê nîre dagirkeriya ereban bi perçembûn û serberjêrçûna împêratoriya Abbasî jar bû. Her weha împêratoriya bizansiyan bi sedema nakokiyên hundirî bû xwediyê posîdeyên gelekî hindik. Hêzên êlên tirk ên oguzan jî nikaribûn fermandariyê ramgarî ya xurt û berdewamî ava bikin. Kurdan di nava van hoyan de, careka dinê dikaribûn xwe kom bikin û hinekî bêhna xwe bigirin. Cihê birên feodalên kurdan hêza xwe ya ramyarî pêşve birin, dest bi avakirina mîrdariyan (mîrekiyan) kirin. Li cihanê ku koçbera sermayedariyê (Kapitalîzmê) destpêkiribû, girêdan û têkiliyên êlî jî hev xistin û paşveçûnê jî bo civakê kurdan jî pêkhatin. Ziman û çanda kurdî di vê domanê de, bi

derketina Feqiyê TEYRAN destpêkir û ev dem bi hilberin û berhemên Ehmedê XANî bi dawî hat.

Gava êlên oguzan di destpêka sedsala IV'emîn de derbasê Kurdistanê bûn, çendîn ku xwediyê rêkxistineka leşkerî jî bûn, dîsan nikaribûn pêşveçûna kurdan rabiwestînin. Di bin hikarî û posîdeyên xurtiya bingehên civaka kurdan û dewlemendiya çanda kurdan de, di demeke gelekî kin de rastê asimilasyonê bûn. Sedema ve yekê jî ew bû ku kurd di aliyê bajarvaniyê de jî wan gelekî pêşveçûyîtir û şarezatir bûn. Êrişên Mongulan jî ku di bin serokatiya Cengîzخان de pêk hatin, nikaribûn bigihîjin armanca xwe. Kurdistan nebû navendeka pêkanîna otrîte û dolweriya wan.

Di dawîya vê domanê de, careke din Kurdistan derbasî reşayî û tariya dagirkeriyê bû. Hêzên biyanî li ser axa Kurdistanê rastê hev hatin û şerên mezin jî bo parvekirina Kurdistanê destpê kirin.

Ji hêlekê ve persan (împiratoriya sefawîyan) û jî hêla din ve jî tirkên (împiratoriya osmanîyan) êrişên xwe ajotin ser Kurdistanê. Di encamê de jî Kurdistan di nava xwe de, bilîhevhatina Qesra Şêrîn sala 1639'ê de parve kirin. Egera vê serdestiya wan jî ew bû ku baş zanibûn çawa nakokiyên alî di nava kurdan de, geş bikin û sûd û berjewendên xwe li ser vê bingehê birêve birin. Çîna feodalên kurdan jî nekarî dewleteka feodalî ya navendî ava bike. Xwe bi xwe bihevduketin, şerê birakujiyê rê li pêşiya hemû pêşketinan girt. Kurd careke dinê bûn koleyên herdu hêzên dagirkerên tirk û farisan. Vana li gora berjewendên xwe çî dema pêwîst bikira kurd bi kurdan qir dikirin.

Di vê pêşgotina jorîn de, heya niha me li ser rohnîkirina hoyên Kurdistanê, jî destpêka sedsalên X-XVI'yî lîkolîneke kin çêkir. Armanca me jî vê yekê ew e ku salên rabûna seydayê toreya kurdî Şêx Ahmedê XANî zelal bikin. XANî rewş û hoyên wê demê bi xameya (pênûsa) xwe çawa derbasê dîroka kurdan kirine?

Şêx Ehmedê XANî kurê Şêx Îlyase kurê Rustem Begê ye. Malbata wî jî êla Xaniyan e ku, piştî parçekirina Kurdistanê ya cara yekemîn (sala 1639) jî bajarê Cixîra Botan koçber bûn û derdora salên 1562'ê de bûn şênî û nişteciyên bajarê Bayezîdê. Li wê derê Ehmedê XANî çavên xwe li jiyana xwe vekirin. Li ser vê yekê Ehmedê XANî weha dibêje:

**Lewra dema ji xeybê fek bû  
Tarîx hezar û şêst û yek bû**

Malbata XANî ku, gelekî evîndarê hilgirtina zanîne bûn, rê li pêşiya XANî vekirin. Lewma XANî li bajarê Bayezîdê di Mizgefta Mûradyê de xwendina xwe bi dawî hanî. Ji bo xwendina xwe bilind bike koçberka nuh û hîn kûrtir bike, dest bi gereka dirêj dike. Li gelek hêlên Kurdistanê digere. Weha jî seriyekî dide welatê Misrê. Hêdî hêdî stêrka XANî bilin dibê û di Kurdistanê de baş dihê naskirin. Di encama vê gerê de Seydayê XANî hoyên welat û rewşa gel têgihîşt. Rewanê welatparêziya pak geş bû, domaneke têkoşîna netewî di jiyana XANî de destpê dike.

XANî dibêje min dest bi nivîsê kiriye ne ku ez mirovekî di vî warî de derya me, yan jî békêmasî û bêşaşî me. Belê armanca min ew e ku kurd di nava gelên cihanê de, ci hê xwe bigrin. Çand û zimanê kurdan jî di nava rêza zimanên cihanê de werine danin. Bila zimanê kesekî dirêj nebe, nebêje kurd belengaz in, perîşan in û bê nivîs in. Lewma di nava pêşgotina Mem û Zînê de weha dibêje:

**XANî ji kemalê bê kemal e  
Di meydana kemalê têt xalî  
Yanî ne ji qabil û xebirî  
Belkî bi teesub û eşirî**

(...)

**Da xelk nebêjin ku ekrad  
Bê meerîfet in bê esil û binyad  
Enwaî meelê xudan kitêb in  
Kurmanc tenê di bê hêşêb in  
Hem ehlê nezer nebên ku kurmanc  
Îşqek ne kirin bo xwe amanc**

XANî, di wê demê de rewşa gelemperiya cihanê û herême dizane. Egera şer û cengên giran fam dike. Dizane ku bingeha hemû kuştinan, dagirkerî û êrişên pirsax talanê û nakokiyên li ser parvekirina welatan di navbera hêzên leşkerî yên dagirkerên feodalên mezin de ne. Kurdistan welatê xwediyê ciyekî evçend stratejîk e ku hemû hêzên biyanî diranên xwe jê re qîç dikirin û bi çavbirçîtî dixwastin lê xwedîtîyê bikin. Her yekê dixwest ku li wê derê bingeha dagirkeriya xwe bi xurtî damezirîne. XANî vê rewşê dibîne. Amancên êrişan dizane û dibêje rindbûn û çakbûna ciyê welatê me, wisan kiriye ku her yek pîlanê vegirtina ax û welatê me daye pêşiya xwe. Seyda li ser vê rewşê jî weha dibêje:

**Yênî ji temê dirav û dînar  
Heryek ji me ra we bûne diidar**

(...)

**Weqtê ku me dî zemanê ev reng  
Fîl - cumle li diravê bû ceng**

Dilpakîya kurdan û durustiya wan bi her kesekî re, weha aniye ziman:

**Qelbê me nekîr qebûl hiyle  
Qet bo xerezê ne bû wesîle  
Din çû û ne ket bi dest me dînar  
Paşê bi neçarî bûyîne sefar**

XANî, bersiva wê rewşê bi tevayî weha dide:

**Kurmanc ne pir di bê kemal in  
Ema di yetim û bê mecal in  
Fîl - cumle ne cahil û nezan in  
Belkî di sîffî û bê xudan in  
Ger dê hebûya me jî xudanek  
Alî keremek letîf e danek  
Ilîm û huner û kemal û izan  
Şîrî û xezel û kiteb û dîwan  
Ev cîns biba li ba wî me'mûl  
Ev neqîd biba li nik wî meqbûl  
Min dê e'lema kelimê mewzan  
Alî bikira li banê gerdûn**

XANî, weke ji hemû nivîsên wî xuya dibe, zimanên li herême yên wekî tirkî, erebî û farisî li gel zimanê dayka xwe yê kurdî dizanibû. Pirtûk û nivîsên XANî yên gihane vê rojê evin:

- Mem û Zîn: Ji bona ku XANî rewşa demê bîne ser ziman, destê xwe avêtîye vê destana gelêrî û ji nuh ve vejîrandîye. Bingeha Mem û Zînê bi xwe li ser dîrok û serpêhatiya Memê Alan hatiye ava kirin. Hîna di sedsala XI'an de Melayê CIZIRÎ pesnê evîndara xwe weha gotiye :

Mûyekî jî te nadim bi du sed Zîn û Şîrînan  
Çêdîbit ger tu hesêbkî me bi Ferhad û Memê

XANî, bi xwe jî egereka nivîsandina Mem û Zînê wisa tîne ziman :

**Şerha xemê dil bikim fêsane  
Zînê û Memê bikim behane  
Derman bikim ez ewan dewakim  
Wan bê mededan jî nûve rakim**

Nivîsevan û diroknasên kurdan yên mîna M. Emîn ZEKÎ, Şêrko, Celadet BEDIRXAN, Kamuran BEDIRXAN, Aladîn SECADÎ, Givî Mukriyanî û gelekî din, li ser jiyana XANî û berhemên wî nivîsîne. Her weha jî rojhilatnas



û kurdnasên biyanî wekî Alexander JABA, I. A. ORBELÎ, R. LESKO, M. B. RUDENKO gelek guh dane naskirina E.XANÎ û bi taybetî li ser şîrovekirina Mem û Zînê û giraniya wê rawestiyane.

Kovara Kurdî ya yekemîn ku, bi navê KURDISTAN li Qahirê bi tipên Erebi sala 1898`ê dihate weşandin perçe-perçe Mem û Zîn çap kir. Sala 1953`yê de jî li bajarê Hewlêrê torevan û diroknasê Kurd Gîvî MUKRIYANÎ, Mem û Zîn bi zaravayê Soranî çap kir. M.Emîn ZEKÎ jî sala 1968`ê bi tipên latîni li gel wegerandika bi zimanê Tirkî Mem û Zîn belav kiriye.

Cara pêşîn di sala 1920`î de, li Istanbulê Mem û Zîn bi dizî hate çapkirin. Belê mixabin ew çapa pirtoka Mem û Zînê bi tevayî ji hêla hukumeta tirkan ve hate şewitandin.

Kurdnasa hêja M. B. RUDENKO, şagirta jîra Akademiya Rojhilatnasyî ya Leningradê piştî karekî gelekî bi nîrx, sala 1962`an de Mem û Zîn li gel wergerandineka bi zimanê rûsî daye weşandin. Belê di van salên davîn de, bi dehan caran renga-reng pirtûka Mem û Zîn bi tipên Erebi û Latîni hatiye weşandin. RUDENKO di pêşgotina wê çapê de dibêje: "Mem û Zîna Ehmedê XANÎ hemberê şahnama FIRDEWÎ û Odêsa HOMEROS e".

Hacı Qadirê KOYÎ hozanvanê Kurdê hêja û bi navê deng di helbesteka xwe de pesnê Mem û Zînê weha aniye ziman: "Xezîney gewher û kîseş dirawe:

**Le mecnûhî diwê Soran û Bohtan  
Le sayey em kitêbe nasrawe**

Oskar MAN rojhilatnasê Almanî di sala 1909`an de, li ser giraniya Mem û Zînê di nava toreyê Kurdî de, gotiye: "Mem û Zîn hêjatîrîn şûnwar e li nav torya kurdî de"

Li ser rûmet û rêza bilind ku, Mem û Zînê di dîroka kurdan de hilgirtiyê gelek nêrin ji hêla gelek dîroknasên kurd û yên Rojhilatê hatine danin. Belê mîna encamekê di wê barê de, em dikarin nêrina Mamoste Prof Dr Qanatê KURDO ku bi çend gotinan, hema kin dibêje "Mem û Zîn insklopediya jiyana milletê kurde".

Nûbihar: Seydayê XANÎ ji bo hatineka bi rohnî ji kurdan re mîsoger bike, li ser hînkirina zaroyên kurdan radiweste. Gelekî bi dilvîni hîne xwendin û zanîne dikirin. Lewma ferhangêka mîna helbestan bi zimanê kurdî û erebî amade kir û li ser wê bîgehê di mizgefta Mûradyê de, ji zarokên kurdan re, dibistan

vedikirin. Di pêşgotina ferhengê de XANÎ mebesteya xwe weha diyar dike:

**Ne ji bo sahib rewacan  
Belkî ji bo biçûkêd kurmancan  
Wekî ji Quranê xilasbin  
Lazim e li sewadê çavnas bin  
Bi duayan me bir bînin  
Fatihan ji me re bixwînin**

Seydayê XANÎ naveroka wê pirtûka xwe weha diyar dike:

**Ji paş hemd û selewatan  
Ev çend kalîme ji luxatan  
Vêk êxistine Ehmedê XANÎ  
Nav lê Nûbara biçûkan danî**

Ne tenê vîya, belê di navbera birên ferhangê de, XANÎ ji hêlekê ve sazîyeka çêkirina helbestan rêz kiriye û ji hêla din ve fîlozofîya xwe di barê hînkirin û hînbûnê de aniye ser ziman. Her wisa jî azîneyên tinak û zelal, delamet û erkên şagirdan, rêz û rûmeta ji bo mamhosteyan, şerê li hemberê nezaniya reş, bi dijwarî û dilxurtî piştgirtina mafdariyê û firehiya dilê mamhosteyan nîşan daye. Seyda dibêje:

**Heta tu dewr û dersan  
nekî tekrar û mesrûf  
Di dinyayê tu nabî  
meşhur û ne jî me`ruf**

(...)

**Ger dê te meqsûdek hebî,  
lazim divê lêkî bi lez  
Xasma te mabadek hebî,  
dayim di emrê wî bi bez**

(...)

**Ger te divêtin  
tu bibî mîr û ser muteber  
Kezeb û xulafî mebêj,  
ger te bikin kêr bi kêr  
Ger te divêtin ku beraber nebîtin  
kes bi te ra  
Ulm bixûn hem emelê  
tu bike sine`t ji xwe ra**

(...)

**Mue`lim bila dil wekî ber bitin  
Divêtin ku şagirt dilber bitin.**

Hêviyên XANÎ ji bo avakirina paşeroja (rojên dahatî) kurdan a serbixwe, xwe pal didan ser evîneka mezin. Nûredîn ŪSIF di kovara HAWAR`ê de, di hejmarê 32`ê de, sala 1941`ê di bin semîvîsa "Şîretên Ehmedê XANÎ" de, dibêje:

"Rojekê, Ehmedê XANÎ şêst zaroyên kurd -keç û kur- birin mala xwe û ji wan re dawetê-ke mazin da pişt re di nav wan de rûnişt û ji wan re pirsên jêrin gotin.

Divê hûn di dilê xwe de veşêrin, ji ber ko, rêber û zanayê me yê mezin ew ne ji wan şêst zarokên bi tenê re gotine, lê ji bo hemû zaroyên kurd re. Gotinên rehmetî evin:

Hûn biçûk in, hûn geş in, bê derd û xem dileyizin û dikevin; ev dema dilxweşiyê ye.

Eger hûn dixwazin her gav bextiyar bibin û tucaran pir bedbext nebin, li du tiştan bigerin; hezkirin û xebat.

Kî hez ji we dike hez ji wî bikin. Îro hez ji merivên xwe bikin; hez ji diya xwe; hez ji bavê xwe bikin, hez ji hevalên xwe bikin, pişt re hûn ê hîni hezkirina diya me giştîyan Kurdistanê bikin.

Yê didoyan; bixebitin, îro ji bi hînbûnê, ji bo zanîne bixebitin; da ku halê dinê bizanin, bi pêşve herin, bibin meriv, bibin hêja, bibin serdest, bibin însan.

Gava hûn dersên xwe baş dizanin, dilê mamosteyên xwe xweş dikin. Hûn dibînin ku hûn jî geş dibin, ji bin barekî giran xelas dibin, sivik dibin. Ev her gav holê ye. Bixebitin da ku wîcdana we her gav ji we razî be! Û gava wîcdana we her gav ji we razi ba! Û wîcdana insan rihete dilê wî bi kêf e, ew insan tucaran ne bedbext e.

Zaroyên min ên delal! Niha ji bo xatirê min têr bixwin! Vexun û bikenin! Ez bi we bextiyar im. Ez dixwazim hûn jî bi min dilxweş bin, da ku welat jî bi hezkirina me her gav şad be!

- Eqîda Îmanê (Eqîdet El-Îman: Ev pirtûk, niha li pirtûkxaneyê Istanbulê de ye. Celadet BEDIRXAN di jimara 33`yê ya HAWARê de (çîriya pêşîn 1941) ev her du malik belav kirine:

**Sifatê di sebhê ji bo zilcelal  
Bizan heft in ey afirê pir kemal  
Xweşî, şîn û zanîn û vên û kelam  
Bihîstîn di gel ditin bû tamam**

Di wê pirtûkê de, Seyda nêrina xwe ya fîlozofî li ser pirsên gelemperî û bi taybetî li ser pirsên êtîka (zanîstiya ehlaqê) ku xwestiyê bi vî rengî ji gel re bixe rêdariyeka karvaniyê rawestiyê. Belê, neçar e di bin destên xwînmijokan de, ew nîrxên gelê me, yê pîroz dikin gazî li hewara leşkerên serxwebûnê mane.

Li gora tê gotinên Seydayê XANî xuşxaneyeka helbestên evinî amade kiriye. Celadet BEDIRXAN cardin di HAWARÊ de dibêje "Li gora tiştên min bihiştine XANî kitêbeka coxta-fiyayê jî çêkeriye û tê de qala ezman û stêrkan kiriye".

## Di nivîsên XANî de taybetiyên gelî û rewşa kurdan

Cih û rûmeta ku Seydayê XANî di nava dîroka Kurdistanê de girtiye, di bingeha xwe de, pal didin ser wê xalê ku Seyda ne tenê bingehêka nivîsa netewî daniye. Belê, ew çendî zane bûye ku di nava jiyana gel de, xwestiye hamû pirsgirêk û gelşan çareser bike. Berî hertiştî ji ewî baş psîkolojiya gelê kurd nas kiriye. Egerên paşvemayîn û bindestiya wan jî vedigerîne sademên taybetiyên wan û xurtiya nakokiyên êfî û malbatî:

*Hindî ji şecaetê xeyor in  
Ew çend ji minetê nifûr in  
Ew xîret û ulamê himmet  
Bû maniê hemil barê minnet  
Lew pêk ve hemîşe bê tîfay in  
Dayim bi temmerûd û siqay in*

XANî, mêraniya kurdan, serhîniya wan-merdî û ciwanmêriya wan wisa aniye ziman:

*Camerî û himmet û sexawet  
Mêranî û xîret û celadet  
Ew xetme ji bo qebîlê Ekrad  
Wan dane bi şûr û himmetê dad*

Di nava şerê hebûn û tunebûnê de, tuçaran kurdan qelsî û sistî ne kirine. Her demê berxwedana xwe bilind kirine. Bi hemû derfet û delivên xwe, li hemberê biyaniyan şer kirine. Belê, di têkoşina kurdan de, her demê xelegeke navendî dihate windakirin. Mîrdariyên kurdan di bin banekî netewî de ne dihatin ba hev. Di nava şerekî bêwate de hîma xwe badîlhe-wa belav dikirin. Bi dilpakîya xwe zû diketin nava xefik û torên dijminan. Hêzên serdest ên biyanî sozên derewîn didane wan. Kurd, di aşên şerên giran de, ku ji bo berjewendên rom û eceman çêdbûn, dihatin hêrandin. Serokên sexte jî bona mîrîtiya xwe aliyekî dijminan li hemberê aliyê din digirtin. Lewma, her carê welatê kurdan Kurdistan dibû qada şer, talan û şewatê. XANî ev rewş vedigerande rewşa kurdan ku, bê yekîti karûbar û livbaziyên xwe dikirin. Ramiyariyeka (Siyaseteka) serbixwe nedihavêtin holê. Dibû perçeyekî şerên bêdad ên di nava dijminan de.

Ev rewş Seydayê XANî weha aniye ser ziman:



*Bifikir ji ereb heta va gurcan  
Kurmançî ye bûye şubhê burcan  
Ev rom û ecem bi wan hisar in  
Kurmanç hemî li çar kinar in  
Herdu terefan qebîlê Kurmanç  
Bo tîrê qeza kirine amanc  
Guya ku li ser hedan kilîd in  
Her tayîfe sedekî sedîd in  
Ev qulzimê rom û behrê tacîk  
Hindî ku bikin xuruc û tehrîk  
Kurmanç dibin bi xûn miletek  
Wan ji êk vedikin mîsalê berzex*

Ji bona veristina vê pirsê û avakirina wêlêkî serbixwe, XANî dizanê ku ji bona guher-tina rewşê giring e pêşi hemû pirsgirêk û alozî bi azîneyên zelal, kûr û fireh werin şîrovekirin û dû re riya veristin û anîna alternatîveke werin danîn:

*Ez mame di hikmeta xwedê de  
Kurmanç di dewleta dinê de  
Aya bi çi wechî mane mehrûm?  
Bil-cumle ji bo çi bûne mehkûm?*

XANî, peydkirina otoriteyeka kurdan a navendî di serê hemû pirsan de dibine. Dixwaze dewleteka kurdan çêbe û di hemû aliyên jiyana de, bi rêk û pêk pirsên rojenin ên gel bigihên veristîneka şoreşgerî. Wê demê di Kurdistanê de, zanîn û huner wê bilid bibin û hebûna kurdan di nava serxwebûn û axadiyê

de rohnî bibe.

Van hemû pirsên li jor XANî bi avakirina yekîtiyeka fireh -li ser bingeha berxwedana li hemberê dijmin - û bi derxistina serokatîyeka girêdayê pirsên gel ve, girê dide.

*Ger dê hebûya me îtîfaqek  
Wisa bikira me inqiyadek  
Rom û ereb û ecem temami  
Hemûyan ji me ra dikir xulamî  
Tekmil dikir me dîn û dewlet  
Tehsil dikir me ilm û hikmet  
Temyiz dibûn ji hev meqalat  
Mumtaz dibûn xudan kemalat  
Ger dê hebûya me padişayek  
Layiq bidîya xwedî kulahek  
Te in bibûya ji bo wî tacek  
Zahir vedibû ji bo me bextek  
Hasil bibûya ji bo wî tacek  
Elbete dibû mê jî rewacek.*

XANî, serfiraziya kurdan bi van pirsan ve girê didan, mîsagoriyên pêkanîna serxwebû-nê weha nişan didan:

*Derdê me bibînitin î'lacê  
Î'lmê me bibînitin rewacê*

(...)

*Xemxwarî dikir li me yetiman  
Di înane derê ji dest leîman  
Xalib ne dibû li me ev rom  
Ne dibûne xerabê di destê bom  
Mehkûm elîho û seelîk  
Mexlûb û mutîê turk û tacîk*

Ji bona derbas kirina vê rewşê, dexistina hêzên biyanî ji welat û avakirina fermandariyeka serbixwe ya netewî, XANî tenê azîneyên şoreşgerî diparastin. Zanibû zimanê dijmin fam dike, tenê zimanê zor û kotekê ye. Lewma, dema banî gel dikir rola zorê di dîrokê nişan dida. Hemû rêdariyên reformist pûç û vala didifin. Nêrinên XANî di vê barê de, pal didan ser bingehên materyalizma dîrokî "Dîrok ne ji bilî şerên di navbera çînen dijê hev yê cuda de çêdibe. Tiştêkî din e. Zor dayika dîrokê ye".

Seyda dibêje:

*Pirsî ji dinê min ev bi hikmet  
Mehra te çi ? gote min ku himmet  
herçî bire şûrê destê himmet  
Zebt kir ji xwe re bi mêrî dewlet  
Bê ceng û cidal û bê tehewir  
Qet vê şuxlê mekin tesewwir*



Dîsa XANÎ vê mesajê gihandiyê me ku, hemû hêzên doliegeriya xwe avakirine tenê bi ramyariya şûran bi kar anîne. Bi wê yekê jî karibûne gelan bimêjin, ked û hebûna wan talan bikin.

**Wan girt bi şûr şehre Şuhret  
Têxîr kirin bîladê himmet.**

### XANÎ - mamostayê vehunana helbestan û çend nimûne

Ji helbestên XANÎ mirov dikare têbigihîje ku Seyda ne tenê di aliyên civakî û torevanî de zaniyarekî mezin bû. Heta di pirsên biyolojî de jî xwediyê pareka zanebû-namezin e:

**Her yek ji êdem kirin te peyda  
Ibda kirin te bê hîyola**

Seyda di nivîsa xwe de, hemû nêrînên xwe, bîr û baweriyên xwe bêtirs dihavêje holê. Tiştêk di nivê de û bêtemamî bernade. Her pirsêkî wekî li ser radiweste heya dawiyê lê xwedî derdikeve û diparêze. Di hemû karên xwe de jî doxmatizmê rizgar û azad dimîne. Bi lehengî xwe avêtiye nava hemû pirsan û li ser wan hevpeyvîn û danûstandin çêkirine. Mirov dikare nimûneyekî xurt di vê barê de, weha dide:

**Iblîsê feqîrê bê cînayet  
Hindî te hebû di gel înyet  
Her roj dikir hezar taet  
Wî sucde ne kir li xeyrî mebud  
Kira te ji ber derdê xwe merdûd  
Yek sucde nebîr li pêş exyar.  
Qehra te kire muxeled di nar  
Elqeyse ji hikmeta te agah  
Ferdek me nedî tebarekê ellah  
Îrfan telebê di sahib idrak  
Der heqê te got ma erefnak**

Li ser mêraniya kurdan û comerdîya wan di kesaniya Mîrê Bohtanê û herdu birayên wî de, anîye ziman:

**Muhtacê sexaweta we Hatem  
Mexlûbê şecaeta we Rustem**

(...)

**Eqil û huner û sexa û meydan  
Zebî û neseq û nizam û dîwan  
Dîndarî û dewlet û dîyanet  
Serdarî û dewlet û siyanet**

Di nava kurdan de, soza biratiyê gelekî giran û pîroz e. Mirovên bibin destbirayê hev bi hev re di xweşî û şahiyandê, di dijwarî û şînê de, bi mêranî li kêleka hev radiwestin. Çîrok û serpêhatiyên kurdan bi nimoneyên weha tijî ne. Seydayê XANÎ ev rengê biratiya rast parastiyê û li hemberê têkiliyên li ser bingeha berjewendên kesaniyê derketiye. Bi nimûneya hevaltiya Memo û Tacdîn Seyda nêrîna xwe li ser pîrsa hevaltiyê xuya kiriye. XANÎ weha dibêje:

**Tacddîn digotinê ciwanek  
Guhderzê zemanê pehlewaneke  
Lewra ku bi mêrî subhê şer bû  
Roja şerî ew hezar mêr bû  
Taxddîn du bira hebûn di qellaş  
Mane nedî du şahbazî cemmaş  
Daim dilê dijminan disotin  
Yek Arif û yek çeko digotin  
Lawek kiribû bira ji bo xwe  
Ne ez xelê im çira ji bo xwe  
Roja ku ew bira ne dîta  
Reşbîhê seva çira ne dîta**

(...)

**Memê jî li wî aşîqeh temam bû  
ne şubhê bira û bab û Mam bû  
Ew herdu ciwan li yêk aşîq  
Ew herdu bira û pêkve sadiq.**

XANÎ, wateya Newrozê baş dizanibû, çawa ku rojeka pîroz di dîroka kurdan û sembola yekîtiya Kurdane. Lewma, dema Mem ê û Zîne jî nih ve vedijîne, roja hevdiîna Memê û Zîne di wê rojê de, pêktîne. Ji ber ku wê çaxê ne tenê rojekê belê hefteyekê bi temamî Mîr bi êla xwe ve derdiketin neçîrê. Mêran bi kum û kolozê xwe diketin nava rewşa şer û mîna festîvalekî her reng listikên mêranî û qehremaniyê pêşkêş dikirin, Weha di mava rewêka biratî, xuşewistî, svînî û dilsozî de, rojên geş dihatin derbas kirin. XANÎ, ev şahî û dîlanên xweş derbasê destanê kirine, weha dibêje:

**Ye'nî ku dihate burca sersal  
Qet kes ne dima di mesken û mal  
Bil - cumle diçûne der ji malan  
Heha digihîşte pîr û kalan  
Roja ku dibûye eyda Newroz  
Tezîm ji bo dema dil ev roj**

Seyda, bi rewanekî tolehildanê yê xurt çûye ser îxanetî, tirsonekî û koledariyê. Mirov dizane ku XANÎ gelekî lêkolînên fireh di dîroka kurdan de, çêkime. Eger sedemên herî mezin yê şikestina serhildanên kurdan jî vê

yekê hatine, ku kurdan îxanetî ne perçiqandibûn. Heta ku gelek an xwe bi îxanetiya xwe serbilind didîtin. Xulamtiya biyaniyan mîna karekî bi rûmet didîtin.

Çendîn dîroka qehramanî û lehengiya kurdan kûr be, ewçend jî li kêleka wê xwesparî û îxanetî jî heye. Pirsgrêk di vê xalê de kom dibe. Her carê xwesparan û sîxûran xwe mîna milayketan nişan dane, pêşî gelekî jî navero-kê dûr, pesn û fortên rêber û serokên kurdan dane, cihê xwe xurtkirine û dî re bûne navgî-nên planên dijminan û gelê xwe bi erzani firotime. XANÎ baş têgihîştîyê vê rewşê bûye, ev rengên ne mirovan, bi çavên xwe dîtine, lewma tenê û tenê bi mirinê tewanên wan bersiv dane.

XANÎ, di Mem û Zîne de, hemû kesên jiyana xwe bi fitne û gellaciyan xwestine berdewan bikin, di kesaniya Bekoyê Ewan de tewanbar kirine û bi destê dadmendiya gel di dadgehên pîroz de gihandine berşiveka şoreşgerî. Mêraniya Kurdan, serkevtina rastiyê, dirustî û rewanê hevaltiya rast, şûrê tolehildanê û bersiva gel di kesaniya Tacdîn de û bi kuştina Beko de anîne ziman.

**Bû welwele û figan û zarî  
Bû zelzele û bezîn hewarî  
Buhtan ji mezin hetta biçûkan  
Niswan û keç û benat û bûkan**

Dema Tacdîn rastê Beko tê wisa dibêje:

**Go ey sebedê fesade alem  
Şeytanê sîfetê li şiklê adem  
Ey baisê fitne û fesadan  
Wey maniê meqsed û muradan  
Der heqê Memê seqet xeber da  
Hetta ku li min te Mem bi der da  
Ev çend munafiq û neyarî  
Hêja tu bi çavê min diyarî  
Mem dê bimrit tu dê bimîni  
Hêj xweş bigerî li royê zenîni**

Piştî vê gotinê jî, êdî mafê gel jê dixwaze û nişan dide ku dawîya sîxur û xayinan wê her weha be.

**Hazir wî Bekir li erdê rakir  
Cismê bi bela ji can cuda kir**

Belê bi kuştina Bekoyê Ewan, XANÎ dixwaze vê mesajê bighîne hemû xayin, sîxur û kesên li hevberê têkoşîna yekîtiyê û serxwebûnê radiwestin. Çi dibe bila bibe, neçar e her kes wê bighê bersiva xwe, rîya hemû tirsonek, sîxur, reformist û xwefiroşan rîya Bekoyê Ewan e.

Çiqasî XANÎ di bîr û baweriyên xwe de, dirust û kûr e ewçend e jî XANÎ di hunera vehunana helbestan de jî bilind e. Her pîrsekê dikare bixwe bîngeha rêzkirina helbestên xwe, bi zimanekî hêsan bi mûzîk û qafiyê bîne der. Di nava helbestên xwe de, her cûre hikmetên weha gotine ku, ji bona herdemê bi rastî û bi tevayî cihê xwe digrin :

*Herçend kelim şubhê dur bit  
Bê qedir dibê dema ku pir bit*

Di vir de XANÎ êrişê nexweşiya kariyerîz-mê dike ku, gelek kesên xwe rewşenbîr dibînin di nava çirava vê nexweşiyê de fetisîne. Ji bircên bilind, di nava gemara jiyana xwe ya kesani de dixwazin gel guhê xwe bide wan. Belê, XANÎ xwe dighîne vê rojê û banî wan dike "Hûn şaş in, eger gotinên mirov, ne ji nava kul û derdên gel derkevin der, derefet nîne ku bibin xwediyê posideyên hêja û bi jiyana gel ve bihêne girêdan". Nimûneyeka din ji bilindahiya hunerê Ehedê XANÎ ji hevpeyvîna di navbera wî û xameya wî de mirov dibîne :

*Ey xame te jî gelek dirêj kir  
Ev name bes e te pir qîre j kir*

(...)

*Hindî ku serê te min teraşî  
Ew çend te kir guneh telaşî  
Meşxûl bes e bi lêb û lehwan  
Tewba xwe bike ji xeta û sehwan  
Carek were ser terîqê tewbe  
Hindî neqihîştîye te newbe*

Xameya XANÎ bê bersiv namîne, li berxwe dide. Dixwaze rewş û tewanê xwe tam bike.

*Axir li me hate îtaban  
Ezman kiriya li wan cewaban  
Go Ehmed eger tu ne xebîs î  
Herçî te digo mi ew nivîsî  
Qewlêd te qenc û ger xerab in  
Fî'la te xeta û eger sewab in  
Ebedê me lo tu qenc dizanî  
Tu qayil û fail û zudan î  
Gava dor kirim linik hevalan  
Mehcûr kirim ji milik û malan  
Nefxa te li min dil û ceger sot  
Herçî ku te pufkirê min ew got*

Seyda dizane ku xameya wî bê guneh e, mafdar û bê tewan e. Lewma, ne dadiyê li xameya xwe kiriyê dizane û ham a bi lez dibêje:

*Ya Reb tu dizanî xaniyê jar  
Teşbîh bi xame ya gireftar*

XANÎ tevî hemû rastiyên ku diyarî xwen-devan û guhdarên xwe dike, bi dilekî fireh hebûn û zanîna xwe şîrove dike. Hemû kêmaniyên xwe dipejirîne û dixwaze bêje çawa be ez ewçendî dizanim :

*Ez pîlwer im ne gewherî me  
Xud riste me ez ne perwerî me  
Kurmanc im û kohê û kenarî  
Van çend xeber in di kewarî  
Eshabê xerez ku guh bedêr in  
Eyban bi kerem li min veşêr in  
Ava royê şair ne rêjin  
Ger mumkin e yek qenc bêjin  
Seho û xeletan nekin teecub  
Teeîl bikin ji bi teesub*

Belê, tevî ku hemû kêmaniyên xwe dizane, XANÎ li hemû nivîs û nêrinên xwe xwedî derdikeve :

*Ev meywe eger ne abdar e  
Kurmancî ye ew qedir li kare  
Ev tîf e eger ne nazênin e  
Nubar e bi min qewî şârîn e  
Ev meywe eger ne pir lezîz e  
Ev tîf e bi min qewî ezîz e  
Mehbûb û libas û koşewar e  
Mulkêd min in ne musteûr e.*

## Encam

Kurdnasê Sovyêti I. A. Orbeli weha dibêje: "Dema em dibêjin ku, helbestvan bi nivîsên xwe jî nêzik ve, bi gel ve girêdayî ne, wê çaxê em bê hemdê xwe gerek e navê sê helbestevanên mezin yê Rojhilatê mîna hev binin ser zimanê xwe. Ew hersê helbestevan jî evin : Yek FIRDEWSÎ yê faris e, yek Rûstavêliyê Gurcî ye, yek jî Ehmedê XANÎ yê Kurd e (Kurdistanîyê-Nivîsevan) .

Kesên xwe berdî deryayê vekolîna helbest û nivîsên XANÎ bi rastî giring e xwe jî gelek diwariyan re amade bikin. Hemû hunerên avjeniya tore û çandê bikar binin. Her weha jî giring e ku giraniya vî barî zanibin.

Em çî bikin? Pêşiyên me yên mîna (Ibin El-esîr, Ibin xelkan û hwd) xameyên xwe bi rewşa sêrdestiya xwînmijokan ve girêdane û nivîsên wan bûne perçeyekî ji hebûn û çanda gelên din. Mixabin mirovên ew tixûb şikandine jî (Melayê Cizîrî, Feqîhê TEYRAN, Eliyê HERÎRÎ, Melayê BATÎ û gelekî din) ne hatine parastin. Niha peydakirina informasyonê li ser jiyana van û helbest û nivîsên wan, mirov dixwe nava bêçaretîyeka mezin.

Belê, E. XANÎ ne tenê helbestevanek e lê her weha jî mamosteyekî konevanî, sosyolog û dîroknas e.

Niha, seroketiya rast ya ku, Seyda li benda wê mabû, peyda bûye. Xortên girêdayê doza gel, heta dawiyê bi xwîne rastî û mafdariya doza serxwebûn û azadiyê nîşan didin. "Şûrê Himmetê" jî ku Seyda gotiye:

*Herçî bire şûrê destê himmet  
Zebt kir ji xwe re bi mêrî dewlet*

Niha bi zend û bendên pêşmergên qehreman her rojê bilind dibe û li ser serê hêzên dagirker dikeve. Gul û çiçekên dewlata kurdan jî, niha di çiya û banî, deşt û bajarên Botan a rengîn de vedibin. Kurd derbasê rojên cejn û şahiyên mezin dibe. Gora Seydayê xwe ku, li bajarê Bayezîdê ye emê bi alên rengîn û kulîkên kesker û sor bixemlînin.

Şewq û çiraya Seyda Seydayê XANÎ dê herdem geş biminin. Berî ku em gotina xwe bibine serî dîsan guh bidine çend hunakên hozarvaniyên wî yên merd û şahane:

*Ger dê hebûya me îttîfaqek  
Wisa bikira me inqiyadek  
Rom û ereb û ecem temamî  
Hemûyan ji me ra dikir xulamî  
Tekmil dikir me dîn û dewlet  
Tehsil dikir me ilm û hikmet  
Temyîz dibûn ji hev meqalat  
Mumtaz dibûn xudan kemalat  
Ger dê hebûya me padişayek  
Layiq bidiya xwedî kulahek  
Te in bibûya ji bo wî tacek  
Zahir vedibû ji bo me bextek  
Hasil bibûya ji bo wî tacek  
Elbete dibû mê ji rewacek.*

## Çavkaniyê vekolîne

- Riya Şoreşa Kurdistan - Manifesto, Weşanên Serxwebûn.
- Mem û Zîn-Ehmedê XANÎ, Vejandina Perwîz Cihanî, Weşanên Navenda Weşanên Ferheng û Edeba Kurdî sal 1367- koçî
- Mêjûyî Edebî Kurdî - Aladîn Secadî.
- Tarîxa Edebiyata Kurdî cild I. Dr. Prof Qanatê KURDO. Weşanên Roj Nû,
- Kovara HAWAR
- Kovara RONAHI
- Rojnameya Berxwedan
- Kurdistan Dagîrgeha Nav Welatan, Îsmail BEŞÎKÇÎ - Weşanên Rewşen1990



# JI HUNERÊN ÇERXA 15

Beşîr Botanî



Naveroka vê nivîsê, ne tenê folklorî ye. Lê belê, klasîkî û dûrokî ye jî. Ne tenê çîrok e, lê belê stran û govend e jî. Di gel vê jî, çêja dastanê jê têt.

Ger li paşerojê, mirov bixwazit vê reş-belekê tekûztir bikit, hingê dê navê wê bite "Dastana Şîrîn û Temo". Anku niho pişkek jê hatiye komkirin û ji bo tekûzkirina wê, divêt mirov xwe biwestînit û hemû ji bo parastin û vejandina hunera kurdî ya ku roj bi roj winda dibit...

## Mîr Şeref

Weke têtê zanîn, ew kurê mîr Bîrahîm'î ye. Yek ji wan bi navûdengtirîn mîrên Botan têtê jimartin. Li gor çîrokbêjan, dû aliyên wî hebûn, baş û bed bû. Navê wî çî li dûrokê, çî jî li hozanên kevin û stiranên folklorî da, weke roja geş diyar e. Berî her tiştî, min navê wî ji stranên folklorî bihistiye û bi taybetî, ên "dengî" di gel çepikan û govendên coş (Botanî û Hekarî). Li babetekê dî, li dîwana Mela Ehmedê Cizîrî (1407-1481), dû hozanên bilind li ser wî hene. Mela Ehmedê Cizîrî pesna mîr Şerefî bê sinor daye. Cizîrî di çend hozanên xo da bi dîr û dirêjî wisan dibêjit:

*Ey şehinşahê muezem,  
heq nîgehdarê te bê  
Sûreyî "Înna fetehna",  
dor û madarê te bê*

(...)

*Rayeta fethê ji nesra te,  
ku her menşûr bû  
Şehsiwarê Ferrê subhanî,  
elemdarê te bê*

(...)

*Ne î tenê Tebrîz û Kurdistan,  
li ber hukmê te bin  
Sed wekî şehê Xurasanê,  
di ferwarê te bê*

Û heya dûmahiyê ...

## Şirovekirin û şikirina hesta Cizîrî

" - Ey mîr Şeref ! Ey padîşahê pir mezin! Yezdan te diparêzit, her dem kamîran û bextewer bi û rojên te hemû gewz, cejn û xoşî bin. Ala welatê te, ji serketina te her bilind û belav bit. Ne tinê Kurdistan, lê belê Tebrîz jî, ji te ra bit û fermanrewayê Xurasanê jî, xwe ji bo te biçemînit..."

Û li hozana diwê dibêjit:

*Xanê xanan! Lami'ê necma te  
her pir nûr bê  
Geştiya bextê te ez ji bayê  
muxalif dîr bê*

(...)

Anku:

" - Ey mezinê hemû serweran! Bextê te her dem ronahî bit û gemiya bextê te ji bayê bervajî dîr bit..."

Ji van hozanên pir dirêj û bilind, ji biilî pesnên kûr, rengîn û baş çî rexneyekê nabinîn. Lê ger xo berdine di nav cihana strana kurdî, em dê pesn û rexne jî bibînin û bi taybetî, dema Şîrînê strana "Mîr Şerefî" stira. Wesan awaza stranê ji hozanê ne kêmîtir e. Awazeka xoş û coş e û bi resen têtê jimartin...

## Şîrîn û Temo

Şîrîn ji malbata mîran bû û wê Temoyê ku nobedarê mîr Şerefî bû dievand. Ew lawekî sêwî û ji malbateka hejar bû.

1 - Strana "Zozan xoş bûye", govenda "Lê lê Weso"

Temo:

Zozan xoş bûye, pêkve da b'çînê  
Canê de were, Şîrînê  
De xo bilezîne, hey xemrevînê  
Bihar geş bûye, hey rewşa malê  
Yarê de rabe delalê  
Li benda te me, bejnşepalê

Dema mîr Şerefî bi evîna wan zanî, wî li destpêkê ne pejirand. Lê li dûmahiyê naçar bû. Ji lew ra jî, xwe ji doza wan kêşand. Şîrînê li ser yarê xo Temo'yî û mîr Şerefî stira. Di vê stiranê da, wê, xo gorî yarê xo kir û ji Cizîrî siviktir û xoştir pesna mîrî da û tevî vê jî, bi rexneyeka giring, stirana xo xemiland. Paşê diyar bû ku mîrî rexne dipejirandin...

2 - Strana "Temo lawo", govenda "Şêxanî"

Şîrîn:

Hey lêlê lêlê lêlê,  
Hey lolo lolo lolo  
Şeng û şoxê mala min,  
Heyrano, Temo lawo  
Mîr Şeref mîrê me ye  
Hey lolo lolo lolo  
Can Şeref mîrê me ye  
Heyrano, Temo lawo  
Bi topz û reşoke ye  
Hey lolo lolo lolo  
Bi topz û reşoke ye  
Heyrano, Temo lawo  
Şûrkêşê babê xwe ye  
Hey lolo lolo lolo  
Şûrkêşê babê xwe ye  
Heyrano, Temo lawo  
Dijminê nanê xwe ye  
Hey lolo lolo lolo  
Dijminê nanê xwe ye  
Heyrano, Temo lawo  
Mîr Şerefê Botanî  
Hey lolo lolo lolo  
Can Şerefê Goyanî  
Heyrano, Temo lawo  
Te l' serî kesrewanî  
Hey lolo lolo lolo  
Tel' serî kesrewanî  
Heyrano, Temo lawo  
Pilingê Kurdistan î  
Hey lolo lolo lolo  
Pilingê Kurdistan î  
Heyrano, Temo lawo  
Ser bextê min tu can î

Hey lolo lolo lolo  
Ser bextê min tu can î  
Heyrano, Temo lawo  
Mîr Şerefê çiyayî  
Hey lolo lolo lolo  
Mîr Şerefê çiyayî  
Heyrano, Temo lawo  
Bêhna gul û giya yî  
Hey lolo lolo lolo  
Bêhna gul û giya yî  
Heyrano, Temo lawo  
Bira û dostê kurda yî  
Hey lolo lolo lolo  
Bira û dostê kurda yî  
Heyrano, Temo lawo  
Ber dilê me hêja yî  
Hey lolo lolo lolo  
Ber dilê me hêja yî  
Heyrano, Temo lawo

Dibêjin ku ev mîrê difinbilind, ji ber ûştên ne weke hev, ne dikarî li ser karê xo berdewam bibit. Paşê roj bi roj, bihayê wî kêmtir dibû û li dûmahiyê, birayê wî mîr Bedo'yî cihê wî girt. Dibêjin dema mîr Bedo hate şûna birayê xo, hingê wî şahiyeka mezin ji bo wan her du dengbêjên evîndar berhev kir.

3 - Strana "Bûka Kurda", govenda "Delîlo"

Mêvan û xizim:

Bûka kurda delal î  
Rêzdar û xweşheval î  
Tu b' xweşhatî mala me  
Bûkê lê canê  
Ronahya j' yanê  
Tu b' xweşhatî mala me  
Bûka kurda hêja yî  
Rengê gul û giya yî  
Tu b' xweşhatî mala me  
Pîroz şahya te  
Hebit xweşya te  
Tu b' xweşhatî mala me

4 - Strana "Şîrînê nûgihayê", govenda "Hurzî"

Temo :

Şîrînê nûgihayê  
Li ser min pir bihayê  
Rabe çaxê keyfê ye  
Bê te keyfa min nayê

Rabe, rabe, Şîrîn rabe, seyran e  
Newroz e û agirê me pir ciwan e

Şîrînê jîn rengin e  
Tal e, tîrş e, şîrîn e  
Rabe çaxê keyfê ye  
Bê te jîyan çî nîn e

Rabe...

Şîrînê ez im Temo  
Ji bo te me her dem o  
Rabe çaxê keyfê ye  
Bê te dilê mi' b' xem o

Rabe ...

Mîr Bedo meznê me ye  
Mêhvanê gundê me ye  
Rabe çaxê keyfê ye  
Keyf keyfa min û te ye

Rabe...

Temo'yî li vê stiranê, bi serbilindî pesna mîr Bedo'yî da.

Erê çima û ji ber çî?

Bi rastî baştir e, ger xwendevar bi xo, dûrokê bixwînin û guhdariya stranan bikin. Hingê ew bê alîkariya vê reşbelekê, dikarin dîtina xone tinê li ser mîr Bedo'yî yan mîr Şerefî û yên dî bêjin, lê belê - li ser her mirovekî jî bit...

Li dûmahiyê karê bê rexne her ne kar e. Kêmasiyên wî mişe (gelek) ne û hêvîdar im ku rexneya Şîrînê ji bo me bibite ronahî û hemû ji bo karê tekûz.

Jêder

1 - Dîwanî Melayî Cizîrî - H. Mûkiryani, " D0 hozan"

2 - Şerefnameya Mîr Şerefxan Bidlîsî - H. Mûkiryani, " Mîrên Botan"

3 - Folklorê Kurdî - "Çar stiran li gel noteyan" B. Botanî

4 - Helbestvan û çîrokbêja kurd Nazê Goyanî



## Serhildan, Gel û Kevir I Riya Rast Ev e Bigir!

Me ji serî de gotibû ku hinek kes û dorhêl hene ku ew her wekî xwe dikin û "hesaba şaş vedigere berepaş." Lê wilo xuya dike ku gerek e, ku mirov bi zimanê wan qise bike û tiştina bi bîra wana bihêne. Weke serhildanên ku çêbûn û gel bi dar û keviran ketin kolanan, bi kevir û dar û depan li hember çekên herî modern rawestiyân û bi ser jî ketin. Di serhildanan de, kevirên MAZLUM'an laşê kedxwaran radixe erdê. Kevirên serhildanan girantirîn jî çekê dagirkeran têkdibe, bêfonksiyon dihêle. Serhildan, gel û kevir, riya rast ev e bigir!

Me di nav gotinên xwe de got, ku cîhan tev de zanibû Saddam çî mirovek e. Yê tu deng ji wan demediket, girêdana wan a ji aliyê aborî bi Saddam re hebû. Saddam ji wana çekê herî giran distand û petrol dida wan. Ji ber vê girêdana wan a bi rejîma Iraqê, bi destê konsolosxaneyên xwe yê li derveyî Iraq, cûrbecûrî kar dikin.

Eger hûn dixwazin, emê serî li lêkolîna rojnamevanekî bixin û hinekî li ser konsoloxaneyên Iraq li derveyî welat, hûr bibin.

Rojnamevanek bi navê Zîya Mûsa heye. Vî kesî, di roja 3'yê adarê sala 1990'î de, di rojnama Kahyan Al-Arabî de, wilo nivîsandîye: "Li Nav Welatên Cîhanê, Navendên Terorê; Konsolosxaneyên iraqî."

Konsolosxaneyên Iraqê, welatê ku lê ne, ji bilî karê xwe yê burokratiyê, li wê derê ji bo Iraqê sixurî û casûsiyê dikin. Bi hukmê pere dikevin her der û deverî. Informasyonên ji bo xwe girîng û pêwîst bi vî awayî bi dest dixin.

Ji xeynî vî karî jî, karekî din jî dikin. Ev kar jî ev e: Li derveyî welat, kuştina mirovan. Kesên ku konsolosxaneyên Iraqî de kar dikin, mîna polisên bi taybetî hatine perwerdekirin.

### Çend nimûne:

- Di havîna sala 1969'î de, li paytextê Misrê, li Qahîreyê, di nivê bajêr de, konsolosê Iraqî Ziyab Al Gawî, bi destê zorê, generalkî dijî rejîma Iraqî, bi navê Hamîd Al Huseynî revand. Xwest ku wî bikuje. Lê wezîrê hundurî yê misrî, pê hesiya. Dawî xwestin ku wî bi balafîrekê bişînin Iraqê. Wezîrekî bi navê Cûma Şorawî qebûl ne kir. Piştî çend hefteyan, bi zorê ji nav destên misriyan hat derêxistin.

# ONSOLOXANEYÊN IRAQÎ Û GOTINÊN PÊŞIYAN

## Gebar Ç.

Pîştî gelek serguzarî û serpehatîyan, gotinên pêşiyân hatine gotin. Îro jî mirovayetî ji van gotinan, sûd û kerkên pir mezin werdigire.

Lê mixabin, mirov hene ku her çend gelekî baş bi van gotin û qiseyan bizanibin, dîsan jî her wekî xwe dikin. Vana weke ya xwe dikin, lê encam şaşî derdikeve. Dawiyê jî mîna ku ne ew bûn, ku van şaşiyân kiribûn, li ser û çokên xwe dixin û digirîn. Ma tu fêde dike? Gilîh û gazîdên wan, bi cambazî ye. Ji xwe, ji bo van mirovan jî, bi gotinên pêşiyân tiştekî gelekî xweş hatiye gotin. "Herçî neke bi gotinên mezinan, qilochên wan dibe wek ên bizinan."

Trafîka Rojhilata Navîn ji ber çûn û hatinan, roj bi roj, germ dibe. Welatên împeryalist xwe di navçeyê de, ji bo filmeke nuh amade dikin.

Ev tacir û bazirganan, wê demokratiyê eksportê nav Rojhilata Navîn bikin! Weke mirîşka ku xwe dide ser çêfîka xwe, bi wê germiyê, wê me têxin bin hembêza xwe û me ji xeter û tehlûka Saddam rizgar bikin! Ne tenê me jî, ewana dê hemû gelên li Rojhilata Navîn ji xeter û tehlûkeya Saddam rizgar bikin!

Helbet kesî, derewên wilo mazin ên bi serî û gûh ne bihîstîye. Bavo tiştê ku meriv pê dizane, cama ji tengasiyê be jî, mirov derewandike. Ji ber ku piraniya caran bi ew derewên biçûkî kar pê diherin serî.

Derewên wan ew çend mezin in, ku ne pîne û rîqa ne, ku mirov bikaribe bidirû. Her kes pir baş pê dizane, dor û deverên, ku welatên împeryalist dikeviyê, ji bîhna xwîna mirovan pêve tiştekî din xuya nake.

Pirsa herî rast û nêzî mantiq ev e: Kê vê berpîrsîyariyê daye we ku hûn Rojhilata Navîn bikin buhuşt?

Dîsa pêşiyên me gotine: "Ji min keto, bi min hilveketo." Yan jî: "Axa cewrik mezin kir, kûçik axayê xwe dirand."

Dayik, wê çawa "law ceza bike"? Yan jî, "axa dê herê heyfê". Helbet, bi vê çûnê "dê û axa", çî li pêşiya wan be, ji neha de kes pê nizane.

Helbet, rola "dê û axa" û "cewrik" ne wek hev e. Lê, tiştê nêzîkî hev û wek hev e, ev e ku, "law li ruyê xwe rabûye", pêşî tadeyî li yê hundir kiriye û îro yê hundir bêhiş xistîye. Cîranan ji bergirîyane. Lê law, tadeyî jî xwe re kiriye kar û jê re bûye nexweşî.

Wekî ku em dizanin, nexweşiya wilo ku law pê ketiye, ji harbûna kuçikan xirabtir e. Kûçikê har jî dawî li xwediyê xwe vedigere, gez dike.

Dibêjin ku, "Gundê xuyani naxwaze rêberî". Ne tenê welatên împeryalist, welatên cîhanê tev, berî dagîrkirina Kuweytê gelekî baş dizanibûn, ku Saddam mirovekî xwînrîj û diktator bû. Lê, deng demedixistin. Kengî Saddam axayê xwe nas ne kir. Gava pêwîstî bi guhertina Saddam çêbû, wê demê, gotin berî ku tiştên mezintir di navçê de çêbibe, emê dest bavêjin navçê.

Helbet amanca wan her ne guhertina Saddam e. Ew ji bo wan tenê mahneyek e û bi vê mahnê ketin Rojhilata Navîn. Daxwaziya wan ê herî mezin, li navçeyê guhertinên nuh bikin û rejîmên nuh ên cûreyî (kûçik ên nuh) dahênin û hêzên şoreşger bifetisînin. Van tiştana wê bi rejîmên navçê yê kevneperest re bikin û amadekirina wan dê li ser vî bîngehî be.

Li piştî perdeyan, çî hatiye, hejmartin û hesab û pîlankirin, wê di rojên pêş de xwe nîşan bide. Lê gerek e neyê jîbirkin ku: "Hesabê şaş, vedigere ji Şamê berepaş."

Gelê di navçeyê de, roj bi roj dengê xwe bilind dikin û şerekî wilo talanker di navçeyê de naxwazin. Dolîwgeriya împeryalistan, li hemberî van dangan, roj bi roj çekê girantir dikîşînin navçeyê. Bi van çekên xwe yê hovanê dixwazin bizava welatparêziya gelê Kurdistanê di xwîne de bigerînin.

- Dîsa li Misrê, konsolosê îraqî li Qahîreyê, serleşkerê bi navê Ziyad El Kubeyî tevî sîh kesi girtin ser grûbek mirovên muxalîfê rejîma îraqî.

Gelek kes bi xedarî birîndar bûn. Di nav van kesan de, wezîr û leşkerên kevn ên îraqî jî hebûn. Weke Arif Abdurrezak-Amid, Reşîr Muhsîn-Ahmed Al Hubûbî.

(Van bûyerana di sala 1972'an de, çêbûbû. Evan mirovan jî, wezîr û serleşkerên kevn û muxalîfê Iraqê bûn).

- Dolabek mezîn li ser navê konsolosê îraqî li Karaçî tê Pakistanê. Polîs vê dolabê vedikê û bi hezaran çek û sîleh jê derdikeve. Dolap bi balafirê hatibû, li meydana balafirgehê dest li ser hat danîn.

- Di sala 1968'ê de, Abdurrezak Nayîf dixwaze Seddam û Ahmet Hesen Bahrî ji kar bixîne. Lê bi ser nakeve. Bazdide Ingilîstanê. Abdurrezak Nayîf jî hêla konsolosxaneyê îraqî, li London hat kuştin.

- Roja 11. 11. 1989'î, serokwezîrê îraqî, dixwaze bi wezîrên swêdîyan re rûne. Ji bo vê yekê tê Stockholmê. Lê mirovek derdikeve ber wezîrê swêdî û bang dike. Eger hûn wezîrê îraqî qebûl bikin, ezê benzîn bi xwe werkim û xwe bişewitînim. Dawî wezîrê îraqî vedigere Iraqê. Lê berî ku vegere, fermana kuştina wî kesî dide. Ev kes Ferîd Saatî ye. Ji bo kuştina Ferîd mirovekî bi girêdana konsolosxaneyê îraqî li Stockholmê tê girtin bi navê Meytham Cevad Taberî. Ev kes berî ku dest bi kar bike, kufş dibe û tê girtin."

Helbet tiştên ku rojnamevan Ziya Mûsa dibêje, tiştên xwedî binyad û spartek in û rast in. Mirov dikare çend mîsal û nimûneyên dinê bide û bi dayîna van nimûneyan mirov dikare dolîwgeriyên împeryalîst û Seddam pevê mehkûm bike. Ma qey van dolîwgeriyên împeryalîstî jî berê de nizanibûn ku Seddam çî mal e?

Çêkirina yan jî xwe amadekirina ji bo çêkirina topa qiyametê, bi xwe casûsiya (dizîya) teknîkî ye. Mirov dikare nimûneyan bêhtir bike. Weke li Iraqê çêkirina çekê kîmyewî, weke li Iraqê çêkirina santrala atomê û hwd...

Bêguman Iraq, di van kar û karguzariyên xwe de, çî di lebat û tevgera wî ya dizîkirinê di warê teknîkî de be û çî jî di warê kuştin û cîneyetên wî yê polîtîkî de be, wî van tiştana bi zanebûn û agahdariya axayên xwe kiriyê. Yan jî serrast bi rizabûna axayê xwe. Ji xeynî dizîya teknîkî û kuştinê polîtîkî, wî dizîya

# البعثات الدبلوماسية العراقية مركز للارهاب الدولي



شعراوى الجمعة مرة ثانية السبعون  
العراقى وابلاغه ان التسليمات  
صدرت لشروطه باقتحام السفارة  
العراقية واذا اصيب اللواء حميد  
بسوءه فان الحكومة المصرية  
تتحمل المسؤولية وستحاكمه  
كعجز عاوى وتعتدق به حكم  
الاعدام فى احدى ميادين  
القاهرة :انما يكون عزة لىمن  
اعتبر: وقلب السفير العراقى  
معلقة اربع وعشرين ساعة  
للاتصال بحكومته وبعد ذلك  
قام باطلاق سراح اللواء حميد

□ يشكل النظام العراقى بؤرة  
رعبية من بؤر التامر فى الشرق  
الوسط وسركنا للتخريب فى  
الادوار التى تحتجز اسرائيل  
عسى نسايتها قسى الساحة  
الاقليمية والدولية وقد اخذت  
سفارته ومراكزه الدبلوماسية فى  
العالم اوكارا لتسليمات الاعتقال  
ومعرا للتسليمات الارهابية  
الروسية التى تسديدها  
المخابرات العراقية وهو بذلك  
يشترط بين المنظمة العنقادية  
والعصرية بهذه الخصوصية واذا  
كانت الدبلوماسية كما يعرفها  
العديد من اساتذة العلاقات  
الدولية بانها الدفاع عن المصالح  
الحسوية للشعوب فليس  
الدبلوماسية فى عرف النظام  
العراقى هسى قتل الخصوم  
وتصفيتهم جديدا وتفسير  
القراعات العرقية والدينية فى  
الدول المجاورة لسراق وزرع  
التناقل والمنغرات فى المناطق  
الاهلة بالسكان فى عواصم  
نورل نسى نسى نسى نسى نسى

□ الخارجية المصرية تقول فى مذكرة لها الاحتجاجية ان الحكومة  
المصرية التى ذهلت من هول الجريمة التى اذمت عليها السفارة العراقية  
تعتبر بالقلق الشديد وتستنكر اشد الاستنكار مثل هذه الاعمال  
الانسانية.  
□ صحيفة الاهرام: ان السبعين الدبلوماسيين للنظام السعراوى  
لا يجدون سوى لغة القتل وعندما يتجمع الانسان مع اجدهم يشعرون بانهم  
جالسهم مع مجرم محترف وهو يركز فى حديثه على وسائل التهديد  
والاكره والفظن.

السيد حسين.  
٢- قامت السفارة العراقية  
بالتفاهة عن طريق السليح  
المسكوى بتزويد عمارة من  
سباط ومفوض الامن العراقى  
بالاسلحة والذخيرة السحبة  
لاعتقال ثلاثين شخصية عراقية  
تعيش فى مصر فى بداية آذار  
عام ١٩٧٢ وقد اصيب العميد  
زهاد النحرى بسجوح جبراء  
اضابته بيارات ناربية اطلقها  
عليه ضابط امن عراقى يدعى  
زيد الكبيسى، سيما نجا من  
عمليات الاعتقال كل من اللواء  
حميد السيد حسين قائد الفرقة  
الاولى واللواء عارف عبد الرزاق  
امر الدوة الجوية والعميد رشيد  
محمود مدير الامن العام واحمد  
الجوي وزير العمل والشؤون  
الاجتماعية.  
وقد استولت الاجهزة  
الامنية القاه الفضى على الجنات  
فى فترة زمنية قياسية وظهروا  
على شاشة التلفزيون معتزلىن  
بقيام السليح المسكوى  
بتزويدهم بروشاشات ومدسات  
كائمة للصوص، والسدعت وزارة  
الخارجى المصرية احمد فرج  
الله الخاتم بأعمال السفارة  
العراقية وقدمت له مذكرة

ان السبعين الدبلوماسيين الذين  
يختارهم النظام العراقى لتمثيله  
فى الخارج هم من معتزلى  
القتل والاجرام وهم مستعدون  
لقيام باعمال تفننى الى اسبسط  
المبادئ الاخلاقية وسوف  
تستعين بتماذج مما قامت به  
البعثات الدبلوماسية العراقية من  
اعمال اجرامية حسب تسلسلها  
الزمنى

١- قام السفير العراقى فى  
القاهرة ذياب التلكولى فى  
صيف عام ١٩٦٩ باستخفاف  
الاجنئ السياسى العراقى اللواء  
حميد السيد حسين واحتجازه  
داخل مبنى السفارة وقد ابلغت  
اسرته السلطات المصرية بعملية  
الخطف فسارع جهاز مباحث  
امن الدولة التى فرض حراسة  
مشددة على مبنى السفارة  
وفرض طوقا على الشارع الذى  
تقع فيه، واستدعى شعراوى  
جسمة وزير الداخلية السورى  
العراقى وابلاغه بان اختطاف  
الاجنئ السياسى العراقى هو  
وهو عريضة من نوعها فى مصر  
تلقاها حديد ولكن السفير  
اللواء حميد ولى السفير  
عليه بان لديه تعليمات من  
حكومته بإرسال اللواء حميد  
الى العراق لحمايته واته

pîsporên çekan jî kiriyê. Helbet dîsa ev yan dizî ye, yan jî bi dilê axa hatine Iraqê û kar dikin. Ev tiştana hemû rûreşî û durûtiyên împeryalîstan e.

Emê bibêjin ku di dijînantîyê de, minnet û merhamet çênabe. Seddam li Helepçê bi kêmanî pênc hezar kurd kuşt û Kurdistan wêran kir. Lê dengê ji we derket. Piştî Helepçê dîsa Seddam Helepçeyeka din çêkir. Lê vê carê yê hatin kuştin ne kurdbûn. Ma loma dengê we derket? Di navbera mêjûyên 10. 01. 1990 û 23. 01. 1990'î de li navçeya Ahvar-Nasiriye-Basra û Amaradê, 10 hezar

kesên ereb jî hêla rejîma îraqî hatine kuştin. Li ser vê qirkirinê roja 12. 02. 1990'î de, beyanek derket li Swêdê. Ev beyan, jî hêla Komîteya Parastina Mafê Mirovafî li Iraqê-Şaxê Swêdê, hatibû derxistin û belavkirin.

Helbet haya we hemûyan jî van tiştan hebû. Îro bê rîza gelê li herêmê, bi tevkarîya rejîmên paşverû re hûn ketin nav vê navçeya me ya buhuştî. Lê divê neyê jîbîrkirin ku "Hesaba mal li bajêr nayê."

- Raperîna gelî dê tîrba we bikole!



# Tenbûrên Kurdî

## Gulê Silopî

Li Kurdistanê gelek amûr (alet) hene. Weke; zurne, bilûr, tenbûr, kemençe (kevanîk), ûd, meşke, dûdûk, dehol, def (bi xiş-xiş), zengil, kefçik...

Ez bi vê nivîsarê dixwazim behsa tenbûrê bikim. Ev jî, ji ber ku bapîrê min tenbûrvan bû û carina tenbûr çêdikirin. Îro ew 95 salî ye û min xwest ku ew hindê behsa tenbûrê li kovara REWŞENê bike û ji ber vê hindê min hevpeyvîneke kurt li gel wî berhev kir.

**Gulê:** Navê xwe ji REWŞENê re bêje!

**Silo:** Navê min Silo, kurê Reşo'yî me. Ji devera (mıntıqa) Silopiya me - Botan.

**Gulê:** Te sala çend dest bi lédana tenbûrê kir?

**Silo:** Dema ez çar salî bûm, lédana tenbûrê ji birayê xwe fêr bûme. Çêkirina tenbûrê jî ji Seyda Ûsîfî fêr bûme. Ew Cizîrî ye.

**Gulê:** Tu ji kîjan dengbêjî hez dikî?

**Silo:** Yên kevn, weke Seîdê Cizîrî, Meyremîxan, Remezanê Cizîrî, Elmasxanê, M. Arîfê Cizîrî, Hesenê Cizîrî, Îsa'yê Berwarî.

**Gulê:** Bapîr, lê ji dengbêjên nû?

**Silo:** Tenê B. Botanî. Dengê wî kurdî ye. Di gel vê jî, ew dostê gelê xwe ye. Ji gotîna wî diyar e.

Mana navê tenbûrê *kod* (sendûq) e. Devera tenbûrê bi xwe Cizîra Kurê Emerî ye. Navê wî yê resen Mîr Ebdîlezîz Emer Bohtanî ye. Ev dever bi xwe dibe sê pişk û par.

- a/ Botan
- b/ Torê
- c/ Beriya Mêrdînê

Dibêjin ku tenbûr berî 3000 sal li Kurdistanê hebûye. Ew bi xwe (tenbûr) keça sîtarahindî ye. Û ji Yûnanistanê heta ku Hindistanê ew teknîka avabûna materyal û aletên wan nêzik û weke hev in. Ji bo nimûne Bizîqa yûnanî, Tara farisî û weke sazê, ya ku tirk jî




*Kevintîrîn Tenbûra kurdî, rû ji dar, kod ji kundir e*

xwe re vê paşiyê kirine mal û milk. Bi saya serê dengbêjê mezin û kehniya dengbêjên roja me, Mihemmed Arîfê Cizîrîyê nemir, tenbûr li Kurdistanê û li Rohilata Navîn belav bû.

## Tenbûrên Kurdî Li Botan

Nav	Têl	Perde	Rû	Materyal
Tenbûra Girover	yek (tek)	19	Çerm	Dar
Tenbûra Dûkodî	Dû (cot) (cot)	17	Dar	Dar
Tenbûra Hêkî	dû (tek) (tek)	23	Dar	Dar
Tenbûra Giroverî	sê (ot) (cot) (cot)	17	Dar	Kulind
Tenbûra Hêkî	du (cot) (cot)	14	Darê bi kun	Dar

Ciyê lédana tenbûrê di civatên kurdî de dîwanxana civatê yan jî li hundirê malan e. Li şahî û dawetan bi kar ne dihanîn, ji ber ku dengê wê nizm e. Li şûna wê, dehol û zirne, kemençe yan jî weke li dorhêlên oldar û mu-teessib erbana terîqî ya zikrê li şahî û dawetan bi kar dihanîn.



*Pênc tenbûrên Botanî*




# Niştimana xwe binase

# HEWLÊR

Piştîwan B.

Şarî Hewlêr dikewête deştî başûrî Kurdistan. Mêjûyî binyatnanî Hewlêr digêrêtewe ber le heşt hezar sal. Yekêke le kowntirîn şarekanî cihan. Berî pişt ewey şarî Hewlêr, şaxeberzekanî rohelat û çiyay Sefîn û hawîna hawargekanî Mesîf û Şeqlawe w tavgekanî gelî Elî Beg û Bêxal e. Berî pêşewey şarî Hewlêr deştî pan û porî başûr e. Daniştûwanî şarî Hewlêr nêzîkey yek mîlyon kes debêt. Dewey ewey rijêmî Baasî faşist destî kird be guhastinewey xelkî awayî gund û nahîye w qezay rojhelat bo şarî Hewlêr, be gorey planî bîstem (Xitt El-Îşrîn). Hewlêr be dirêjayî mêjû dûçarî dagîrkirdin hatûwe le ber hêrişekanî Aleksanderî Gewreyî grekî w dagîrkerî tirk û îngilîz û heta dagîrkerî ereb. Hewlêr nawe nawe twanîfî henaseyek bidat kolkemîr û paşay xelkî xoyî fermanrewayî şar bigirine dest, bo nimûne paşay Kore.

Hewlêr her le mêjewe çaqî olî (dîni) buye. Le serwextî desthelatî Xaçekan pitir le yanzdeh dêr le şarî Hewlêr da hebûye. Êsta le serwextî desthelatî îslam da, tenya yek yan dû dêr mayitewe w le birrî ewe da pitir le bîst mizgewt heye êsta. Wek yek dû fêrgayî dîni (medrese) bala her le konewe ewane îdarey mizgewt û fêrgedîniyekan degêrin û le jêrdestiyana brîtin le bûrjûway komprador dewlemendekanî şar. Bazirgan (tucar) yaxut xanewadey serokxêl û hoz le wana: Neqşebendî w Berzincî w Sucadî w ... hetit. Yarmetiy daring le layan mîrî



be dest dihênin. Rastewxo debestrênewe be dem û dezgay dewrêkî koneperestaneyan bîniwe. Le birrî ewe da, serokxanewadey ew xêl û tîrehozana ke destelatî dîniyan le dest ew cêgayî berzî mîriyan pê dedirêt û cêgayî mitmaney fermanreway iraqî ne. Herçenda ew bizûtnewedîniyan le katî xoy da, le formekî netewayî da serî helda, le katî bizûtnewey olî xêlî neqşebendiyek be mezhebî heqqeyî, tesewwûfî le nawçeyî şarî Silêmanî da destîpêkird. Katêk serokekeyan be nawî Mewlana Xalidî Eskerî gîraw dîrixirayewe bo Erebestan. Ewsa mirîdekanî Heqe bo xo pişandan le dijî paşa le dewrûberî salanî 30-40'ekan xopişandan sazîrd û jin û piyaw le bergî cunya da berew deştî şarî Kerkûk û Hewlêr hatin. Duway serûbinbûnî salî 1958'î temmûzî iraqî w nemanî destelatî padşayetî ew xanewade xêlekiyane, beşekî zoryan le şarî Hewlêr û Kerkûk niştêcê bûn. Ramyariyî

rijêmî iraqî, komarî helsta be misogerkirdinî pare w mulk û destelatî berêwebirdin bo yan û le şar da niştêcê kirdinyan. Axa û derebeg û serok tîrewozî gundekan, êsta le şar da dewrî konderaçî w bazirgab û zengînî le şar da. Beşekyan serokcaş û xofiroşî rasteqîne. Xelkî hêjar û zehmetkêş, sextirîn û naxoştirîn barî jiyani rojane debene ser, zorbayan le dewr û berî şar herêmekî niştêcê bûn. Le barêkî zorseretayî da dejîn bê elektrîk, bê aw, le teneke w berd û amêrî herzan xanû kalokeynarêk le palî yek dirûst kirdiwa. Zor car dûçarî ewe debine ke be siwarî ker û esip aw bigêzinewe yaxut elektrîk le hêlî şeqamî serekî be şew çetal ken û bidizin, bo tozêk rûnakî şewan. Hezaran xelkî aware w koçker le şar da, be em şeweye niştêcê bûyine. Gerekî milliyane. Her roja çendîn caran, le layan dezgayî şarawanî ruswa bibûne xelûzî şorişî aşbetafî wway aşbetaf le layan serkîrdekanî toqî

w encam; ne gund ma w ne şoriş!

Êsta jiyaneke qonaxseretayî w dîr le hîwa w gund û xêr û bêrî seretayî w biçûk, ke beşî nîwey mafûr û kargey kaşî (mermer), kargey şîremenî (elban). Hewlêr nawbang e be mêywe w genim û danewêle. Le hemû nawçekanî Hewlêr û deştî Hewlêr, deştêkî be pît e bo danewêle. We nawçexawiyekî Hewlêr be naw bang e be hawîna hawar û awî sazgar. Zengîne le mer û malat û ajal da. Xelkî ladeyekanî dewr û piştî Hewlêr zorbeyan jiyaniyan bendebe mer û malat, bexêwkirdin û cotyarî.

Şarî Hewlêr, wek hemû şarekanî Kurdistan, le layan rijêmî iraqî her le dewr û berî salanî 1960 da, gemaroyî aborî le ser û bizûtnewey aborî w komaleyatî le ew perî sistî da ye. Xelkî zehmetkêş bêkar in û çaweruwani hiwayekî tazen.



# KURD Û KURDISTAN - BERÊ 112 SALAN BI ÇAVÊN BIYANIYAN

*Em li jêr nivîsarek dîrokî û kevîn ku ji vê 112 sal berê li ser kurd û Kurdistanê hatiye nivîsandin, diweşînin. Ev nivîsar, di sala 1878'ê de ji almanî hatiye wergerandin ser zimanê swêdî û çap bûye. Pirtûk bi navê "Turkiet i Vara Dagar (Tirkîye Di Rojên Niha de) bi zimanê swêdiya kevîn hatiye nivîsandin*

*Ev pirtûk li Swêdê, li bajarê Stockholmê ji hêla P. W. THUNMAN ji almanî hatiye wergerandin. Nivîsevanên alman ên pirtûkê bi navên FR. Von HELLWALD û L. C. BECK, du kes in.*

*Nivîsar di pirtûkê de, di pişka bi navê Mezopotamien Och Kurdistan (Mezopotamiya û Kurdistan) de hatiye weşandin.*

*Her çend di pirtûkê de dîtinên ne objektîf yê dîrokî hebin jî, dîsan mîna belge û wesiqayêke nivîskî, ya bi çavên biyaniyan ku ji vê 112 sal berê, li pênuşê ketiye, xwedî girîngiyêke berçavî ye.*

*Dema dagîrkeriya tirk û faris, bi ser kurdan de hatiye, kurdan xwe spartine çuyan. Lê belê xwe ji spartina çuyan, çî êrîşên mirinî li dijminên xwe ne dane. Feqîrbûn, hejartî û rebeniya girseyên kurdî jî, rewşeke sosyo-dramatîkî ye ku di nivîsarê de bi bertîrehi salix dibe. Nexwe ev rewş, ji wê demê ye ku heya roja me ya îro, bi tundî berdewam e?*

Cîranê ereban li bakurê Mezopotamyayê kurd in. Ew li başûr û bakura beriyên Ermenistanê û li ser navçeyî çiyayê farisî-mezopotamiya, li herêma tixûbî dijîn. Ev şûnewarê binecîhî û dêmaniyê ku Karl Ritter dibêje herî hindik bi nêzikahiya 1300 mîl çarçik (1300 mîl kare) heye, li hemû der û ciyan bi navê Kurdistan dihê navandin. Cih û warên ku Moltke dibêje ku erdên bakura Kurdistan a resen pêk dihêne, dema xêzekê ji Diyarbekirê ber bi ser Mêrdînê, Nisêbinê, Cizîrê (Cezîreh İbn Umer), Mûşê, Paloyê, Darindeyê, Mereş û Adiyamanê, were kişandin, hingê diyar dibe. Girsên herî berfireh ên gel, li hêla herêmên farisî û ûrûsan, li navçeyên tirkan bi şeweyeka niv-serbixwe dijîn. Dibêjin hejmarê kurdên li hêla Tirkîyê, milyonekî heye. Ji vê hejmarê 491 000 li êrdima Amedê û 357 000 jî li hêla êrdima Erzeromê, yê mayî jî li Anatolyayê dijîn.

Kok û binyada kurdan hîna jî baş ne hatiye vekolîn. M. Wagner dibêje dibe ku kok û rega gelê kurd ji gelê arî, ku yê herdem li Kurdistanê binecîh bûne, hatibe. Ku gelê kurd ji ew gelê ku grekî wan bi navê kurtî yan jî kardûk dinavandin, hatine. Revok ku ji bo êrîşbirina ser dijminên xwe jî, jihevdeketî, di nava çuyan de jî her dem gerok... kurd bi xwe ne. Yan jî mirov dikare bibêje dagîrkerên zorker ên ku hatine nav welatê wan, xwe tevî wan kirine. Lêçûn û nêzikahiya zimanê kurdên resen bi farisî, nîşan dide ku zimanê wan ji beşeka îranî ye.

Kurd ji du şax yan jî du milên bingehîn pêk hatine, ku ji wan re dibêjin eşîret yan jî şerbaz û goran (bajarî, niştevan, niştecih, yê li navenda şûnewarêke jiyane bicihbûyî), yan jî cotkar. Her du şaxên pêşî, çînen serdest û desthilatdarên kurdan pêk dihênin û ji ew sekuya xwe ya bilind zextkarî li ser goranên ne-şerbaz dikin.

Rich ji bo jiyana van kurdên cotkar dibêje, "bi rastî jî feqîrî û hejartîyêke dijwar e tê de ne. Jiyana wan û jiyana reşikên li Amerîkaya Naverast (West-Indien) pir nêzikî hev e. Ya herî xerab û dijwar jî ew e

ku mirov nikare ew stem û zordariya wan axayên kurdan, ku li ser van cotkarên bindest ên reben zilmê dikin, bi wan bide pejiwandin. Mirov bi hêsanî dikare bibîne ku ev gundiyan reben, bi awayê rû û rûçika (wecê) xwe û bi awayê axefa xwe ya kurdî, ji endamên rastî yê şaxê hoz û eşayiriyê cuda ne. Û ji ber vê yekê ye ku gundî nikarin xwe bikin endamên bi esil ên eşîretê." Wekî dihête dîtin, tenê bi serê xwe hewildan û çîn, nikarin bibin sedema cudabûniya ev her du pişk û beşên gelî. Her wisa jî awayê laşê canê wan û zaravayê axiftina wan jî, li vê derê roleke girîng dileyîzin. Yê eşîr, xwedî rû û rûçikên girî xav û bi goşe ne. Xwedî eniyên pehn, çavên şîn yan jî çavên qer ên kûr î ziz in. Her wisa jî xwedî bejineke xeşim û biryardar in. Li hember vê jî, goran weke me û pîrî caran jî weke grekiyan, xwedî rûçikeke pir nerm in. Mîsyonerê bi navê Hørnle ku di nava wan de û bi taybetî jî, di navçeyî bakura rojava de û her dîsan jî li dorhêla gola Ūrmîyê maye, salixa wan wisa dide û dibêje, "kurd xwedî laşekî gelekî bi hêz û quwwet in. Xwedî şan û milê berfireh û tenê (rengê çerm, ten) wan reş e. Porên wan reş in û devên wan mazin in. Dirûbê hovan li wan çavên wan ên reş î biçûçikî dikeve. Carinan ev çavên ku ji form û awayên bingehîn cuda ne, heya dawiyê tijî bi bîr û bawerî û bi biryardarî xuya dibûn. Avahiya laş û canên wan gelekî bi sazandî û nîzami xuya dike û helwêstên wan li ber çavên mirov çî nexweşiyêke dervayê bajarvaniya mirovî diyar nake. Ew xebat û lebatên wan ên gelekî sext û dijwar ku ji dema xortaniya wan destpêdike, çî caran nabe astengê gihastina jî û temeneke (emr) dirêj. Pîrî caran temenê wan dibe 100 sal û hîna jî bi bîr û hest û bi laşê canê xwe, gelekî li ser xwe ne." Rich jî, van gotinên Hørnle yê li ser kurdan rast dike û bi serzêdayî jî dibêje, "ku ez li çî derê dunyayê, weke li Kurdistanê, ji her du cînsên [Jin/mêr-w] mirovên kal û pîr, wisa mirovên lihev û xweşik, min li tu derê ne dîtine."

Vambery ku bi gerokiya xwe dihête nasîn, dibêje kurd ew mirov e ku gelekî caran lawaz û zêf e, lê xwedî bejin û baleke rind û ciwan

e. Xwedî rû û rûçikeke welê ye, ku ev rû û rûçika herî bawermend tenê li ser nijada kevin a mêdî-farîsî heye. Belê kurd bi ew bejindirêjîya xwe, bi ew lêçûna xwe ya lawaz, bûye nîşana fizyonomiya kevin a farîs, wan peykerên dîrokî li bajarê Persepolisê [bajarê kevnare yê ku li bakurê rohela bajarê Şîrazê li Ecemistanê ye. Ev bajar berî Îsa di sala 500'î de, ji hêla Darius hatîye avakirin. Persepolis gelekî caran bûye paytextê hexamênşîyan (550-331) û berî Îsa di sala 330'yî de ji hêla Skenderê Mezin ve hatiye kavilkirin-W] û li Şahpûrê. Li hindê ciyên dinê jî, mîna dirûbê tevlihevbûna nijadên tirk û ereb, îraniyên [Bal! Ne tenê farîs! - w] roja me pêkdihênin. Tiştê ku bi taybetî bal û serinca mirov dikişîne, çavê wan e. Çavên kurdan welê rind û ciwan in, ku mîna çavên hemû koçeran xweş dibirsin. Her wisa xwedî çavên wisa tirsnaq û xapînok in jî.

Kinc û cilên kurdan li gor şûn û warên ku lê dijîn, ji cil û bergên din cihê û cuda ne û li gor ser û ruyên wan e û li wan xweş dihê. Ew kumê bilind û zer ku kurd didin ser serên xwe, li hemû cih û waran tune ye. Lewra li Ermenistana Tirkîyê û li Ermenistana Rûsyayê, kurd xavikên sultanî jî li serên xwe dipêçin. Ev kumê ku me dawî nimand, ji paç yan jî ji şarên badayî, bi awayeke ne rêkûpêk lê dîsa li gora kêfa dil, çep û rast li ser serî pêçandî, dihê jidandin û girêdan. Ev girêdana li ser serê kurdan, wan ruyên wan ên bi rih û rîç, hindê dirêj xuya dide û dilxweşiyek berdide ser ruyên wan ên xav, ku li ber tîrêja tavê hatiye qemirandin. Her wisa jî ev girêdana li ser serê wan bi wan cilên wan ên din ku li ser bejna wan hene, bi ew kirasê reş û fireh ê pînekirî û dirêj, bi ew şalê (pantolon) fireh ji mûyê bizin (merez), bi heşûyên (çakêt) kin û kurt û milfireh, gelekî lihevên. Li ser vana jî kurk û ebbayên xwe yên dirêj li xwe dikin.

Hemû kurd, bi tevayî, hem jin û hem jî mêr, ji rengên jîndar û çîr hez dikin. Li dorhêlên başûra Kurdistanê, peyayên kurd fîstaneke qeftanî yê fireh di rengê sipî û qehweyî li xwe dikin. Di binê wî de jî fîstaneke wekî kirasê tirkî dirûtdandî li ser wan heye. Li ser vî kirasî jî li piştê wî kembereka ji çerm ku kêr û xencerên wî li ser rûdinê heye.

Li bakûrê rojavaya Kurdistanê, cil û bergên kurdan li cil û girêdana tetaran diçe. Girêdana cil û bergên wan ên li herêma çiyayî, ya li dorhêla naverasta çemê Amedê jî li ereban diçe. Her wisa jî çek û çekgirêdana wan jî welê ji hev cuda ye. Çekên agirî yên wan [çêla debançe û tîfingî dîke-w] gelekî neqenc in û kêr dihên dîtî. Heta li cem mal û malbatên wan ên dewlemend û gîrgire jî, piraniya caran, ji her deh mirovan yek tenê xwediyê tîfingê ye. Lê belê suwarên kurd li Ermenistana Tirkîyê xwedî cûreyek rimên dirêj in, ku li ser serê wan keziyên reş ên badayî yên ji mûyên dûva hespî yan jî, ji hirî badayî hene. Gelek ji wan xwediyê şûrên xwar û badayî û kêrên fireh î dirêj in ku jê re dibêjin xencer. Serekên eşîran gelek caran xwediyê debançe ne. Navê barûdê li cem kurdan derman e, ku wateya "dermanê rehetbûnê" ye. Mortal jî li cem kurdan dihê dîtî, lê li hêla bakura Mezopotamyayê mortal bi kar nahênin.

Xaniyên kurdên koçer ji cawê reş çêbûyî ye ku jê re dibêjin (Qaraçadîr). Xaniyên kurdên dêmanî û binecîh jî, ji xaniyên nizm ên kevirî çêdibin. Kurdên li bakura Ermenistanê jî, li havînan di konên taybetî de dijîn. Konên van kurdan, bi her aliyên xwe vekirî ne û di binê wan de darên dirêj ên çargoşe çikandî ne. Li binê qatîyên wan jî, cawên di rengê qehweyî hene. Her sê dorhêlên konê, ji qamîşên bi hevûdu ve girêdayî dihê girtin. Benên ku pê qamîşan bi hev girêdidin, ji hirî yan jî ji benê hevrişimî çêbûne. Eşîretên kurd ji du beş û piştan pêkhatine. Beşa yekem beşa sereke û beşa dinê jî beşên berjêr in. Mîna ku xuya ye goran bi vî beşê ve girêdayî ne. Her qebîleyên taybetî, xwedî navên

taybetî ne. Van dewlemendiya navan di warê vekofînê de rewşeke gelemşeyî derdihêne meydanê. Dema ku di nava her qebîleyan de, bi kêmanî du navên malbatên mazin dihên ser ziman, dibe sedema dijiwariya li ber vekofîngeran.

Kurdên rohelê bi van qebîleyên eşayiriyê hatine parvekirin: hekarî, zîbarî, şîrwan, rewanduz, bradost, balekî, mukrî û bilbas. Ev duduyên dumahîkê, li Ecemistanê [Persien-W] dimînin. Li başûr qebîleyên eşayirî yên bi navên çaf û kelhorên-xwedî gelek peya hene. Aştîtan jî li başûr dimînin. Li hêla bakurê rojavê jî, qebîleyên eşayirî yên bi navên şîkakî, heyderanî, melayî û celalî dimînin. Li serê qebile û grûbokan, serokekî yan jî pîremêrekî wan heye. Ji wan re dibêjin; emîr, xan, beg, axa, mezin û hwd. Bi nîrx û qîmetbûna malbatan jî, ji bav û kalên wan dimîne. Her dem li ba kurdan kal û pîrê wan ên qebîleyên eşayirî, eger ji malbata mîrekiyê jî nebin, dîsa jî xwedî cih û bihayeke herî berz in. Her şev di mal yan jî di konê serek de mirovên herî gîrgire yên civata wan dicivin ser hev. Li ser mehfûrê di awayê nivçemberekê de rûdinin û ji wê titûna mîna tozê (pûlwer) ya ji Rewandûzê di qelûnên dirêjî de dikişînin. Gava yekê xort were hundirê civînê, destê hemû mazinên xwe maçîdîke û mazin jî, ji eniya wî maçî dikin. Eger yê hatî hundirî, yekê bi temen be, hingê (wê gavê) tenê bi destê serekê qebîla eşayirî digire û yên li civatê rûniştî jî, destê xwe dibin eniya xwe û bi vî rengî silava wî hildihênin. Dema serekek ketibê hundurî, hingê civat radiabin ser xwe û heya serek xwe danehêne û rûnenê, ew rûnanên.

Li cem hemû qebîleyên eşayirî yên kurdan, her dem serek ji bo xelat û diyariyên ji gundî û ji gundên cîran werin, vekirî ne. Endamên qebîleyan, ji beg û axayên xwe re pez yan jî zad û teneyên zevî û bostanan mîna diyarî û xelatê dihênin. Her mîreki kurd, ji bo bi cihanîna mêvanperweriya xwe, rojê 30-40 serî mih û beranan serjêdîke, ji bo pîlawê jî 4-5 elbên bi sarî riz û birincê dikelîne, çend gurz û baqên titûn û elbên qehwê jî ji bo pêşkêşkirina mêvanan amade dike. Li Rohelê [Orient] ferheng û toreya jîyanê, li ser dewlemendiya lîserhev civiyayî radiweste û digere. Mirovên mazin ên di nava gel de, bi ciwanmerdiya xwe ya di warê mêvanperwerî û malmezîniyê de, dibin xwedî nav û deng. Bi vî rengî jî ew xelat û diyariyên mal û pere ku ji wan re dihê, kêmek dîsa vedigere ji gel û şênî re. Li Ecemistan û li Tirkîyê heya şah û sultan jî gelek caran dest didin ser mal û dewlemendiya mîrên mazin û gîrgireyên civatê, ku dewlemendî di destekî de ne cive ser hev.

Xwarina rojane ya li mala kurdekî şad û şên, kufte û birinc e. Anku goştê lîmelîmkirî yê mihî ku bi pîvaz, şîr û îsotê têwerbûyî ye. Wekî dinê jî birinca kelandî, goştê biraştî yê berxî, penêr û şîr ji xwarina rojane ya kurdekî ye. Li ser sênîyekî çar yan jî pênc kes dixwin. Piştî destê xwe dişon bi tiliyan dikevin ser xwarina bi çêj û dixwin. Piştî yên bi temen (ango kal û pîr) û gîrgire xwarina xwe dixwin û bi paş ve dikişin, dûre teyîk û sênîkan ji mêvanên beşa berjêr re dihêlin. Dîsa piştî ku evna jî têr dibin, hingê dora berdest, hejar û feqîran e. Li ser xwarinê re destê xwe dişon û dûre qehweya xwe vedixin.

Kurd bi cir û bêhna xwe mêr û nebez e, azadîhez e, mêvanhez e û gelek jî dilrast û heya kertekê jî xwedîsoz û peyman e. Li ber vê yekê jî, ji bo kar û barekî berdewamî û sazandî gelekî sist e. Ji bo hilanîna toleyê, xwinê jî gelekî jêhatî ye. Di nav bédengiya şerkarî û talankeriyekê de ye. Li gor bir û bawerîya wan talankerî mêraniya rast e. Ew serekên navdar ên di stran û klamên wan de cih digirin, ne tenê li hember paşayên tirkî û îrisên bêbawerî [bêîman] şer kirine, her wisa jî ew talana karwanan kirine û êrişan birine ser gundên farîsên kafîr. Li ber vana jî, li rohelê ev bir û bawerî heye ku dibêjin kurd di êrişên





*Kurdên bi çend nimûneyên ji girêdana cil û bergên kurdî yên berê çerxekê*

talankeriya xwe de, ji tetaran (nogairen), ji tirkmanan û ji erebên bedewiyan bi awayekî baştir û mirovtir, dilovantir êriş dibin ser nêçîrên xwe.

Gelek caran, kurd dema êrişên xwe yên li ser gundan de, çî tiştên kêrhatî yên gundiyan hebin, heya bighê fanêlya ser canê wan jî, bi xwe re dibin. Lê belê di dewsa wan de, cil û kincên xwe yên kevn ên li ser xwe jî gundiyan feqîr re dihêlin. Hetta ji ew gundiyan feqîr ên talanbûyî re jî bo ji ber birçibûnê nemirin, hindêk xwarin jî dihêlin. Piçek jî be çî spasdarî li cem wan nabîni. Li nik dost û hevalên xwe jî, li malên ku lê bûne mêvan jî, bêyî spasdariyekî, dikarin malê talan bikin û ji bo dîsan xweşkirin û şîrînkirina navbera xwe û xwediyê malê, dikarin paşê jî bibêjin: "Ma eger ne em bana, dê hinek desthişkên dinê we bişelandin."

Gava yek bibe mêvanê wan û nanî deynine ber wan, malxwê (xwedîmalê) li destê mêvanên xwe dinihêrin, ku mêvan nanî ji çî derê dişikênin. Nanê ku pêşkêşî mêvanên xwe dikin divêt ji hêla mêvan jî

nivê ve were duqetkîrin, ne ji koşê û kenarê nanî. Lê belê gava ji ber xwe be jî lêvên mêvanên wan li kenarê nanî be, hingê xwe mîna deynadarê spasdariya mêvanên xwe dibînin û lewra jî naxwazin dest bihavêjine barê mêvanî. Dema xwedî mêvanekî bin, bi rastî û jidil mêvanperweriya xwe dihênin çih. Gerok û seferberê frensî Lejean derbarê vê rewşa kurdan de welê dibêje: "Bi rastî mirov piçekî bi dijwarî dibe mêvanên wan, lê belê dema ku tu bûyî mêvanê wan jî, eger di tûrika te de hezar zêrên venîsî (dukat) jî hebin, dîsan jî bi dilxweşî razê." Di jêhatîbûniya wan a dizîkirinê de, li ser wan kes tune ye. Lê belê tu caran naxwazin karê qaçaxçîtiyê bikin, ku ev kar li ser tixûba Êrîsan, li tenîştî Tirkîyê û Ecemîstanê bi qazenceka baş dihê kirin jî. Ji ser kurdan re kes tune ye ku şarezayên riyên çiyayî bin. Li ser wî re jî kes tune ye ku wekî wî xweş û rind, bi kaş û zinaran de hilbikişê. Eger kurd bixwestaya karê qaçaxçîtiyê bikira, dê xwedî hatineke hêsan û baş bûya. Lê kurd jî ev cûre nerastiyê re biyanî ye. Gava çend bazirganên emen dixwastin perekî baş jî bidin kurdekî û li hember vê yekê jê dixwastin ji wan re, şarezayiya rê bike, ji bo carekî be jî ne dikir. Lewra ev yek di ferheng û toreya qebîleya wî ya eşayiriyê de tune ye loma ne dikir.

Yek ji gelek tore û ferhengê qebîleya eşayiriyê, yê kevn û pîs jî ku heya neha bi kar dihête ku ev şerê xwînê ye. Weke li cem gelên çiyayî yên arawûd û qefqasiyan, li cem kurdan jî tawan û sûcek dikare bibe sedema jiholêrabûna hemû malbatê. Lê belê her dîsan jî li nik wan, rîya bêyî xwînrijanekî çareserkirina kuştinên giran jî çêdibin. Ji bo nimûne li ber kuştina yekî dikarin tibabek pere jî bo kuştinê dahênin holê û ev yek dikare dibe sedema lihevhatinê û çêkirina aştiyê di navbera her du hêlên dijminî de. Yan jî ketina jinekê nav bûyerê û dîsan eger ew ê xwedî tawan xwe avêtibe ber bextê dilovanî û ciwanmerdiya xwediyê bûyerê, ev yek jî dikare bibe sedema bexişandin, lihevhatin û aşbûnê. Van a hemû dikarin bibin sedema lihevhatina her du hêlên dijminî. Gava yê tawanbar û xwedîsûcê, şûrê xwe li pişt xwe, yan jî di dest de parçeyeka cawê pembû hebe - ku ev nişana bi yekcarî xwe avêtina ber bextê dijminê xwe ye - û dû re hatibe ber mala serekê eşîr yan jî ber mala melleyê civat û taxê û xwe avêtibe ber dilovanî û bextê wan û ustî û canê xwe li ber dijminê xwe danîbe holê ber ferman û gotina wan, serê xwe li ber wan çimandibe, ev yek li çî qanûn û toreyên milletê din de tunebin jî, lê belê li cem tore û ededên kurdan bexişandin û lihevhatin bi xwe ye bi vî rengî jî dikare aşbûn û aştiyê di navbera her du hêlên dijminî de çêbe. Eger hingê yê xwedî bûyer û dozê, çiçekî jî be neqenciyeke nişanî dijminê xwe ye bextxwaz bideku xwe avêtibe ber bextê ocaxa wî, anku nav deriyê mala wî, hingê ev helwêst li nav civatê dibe eyb û fediyeyeke mazin ku ev şerm û fedî dibe tenê behr û para xwedîdoz û bûyerî. Şeva barbariya li cem van niv-hovan, Bi vî rengî gelek tirêjên ronahiyê jî derdihanî holê.

Hezkirin û evîna ji malbatê re û rewşa bi bêhtirî azadbûna jinan li cem kurdan ewçend ne gelekî xurt e. Her çend mihemmedî ne jî, dîsan jinên wan ên ewçend nelihev pûşî nadin ber ruyên xwe. Ew keçên kurd ên mîna kew û ezalan rind û ciwan ne layiqê van gotinan in. Rindbûn û xweşikbûna wan, bi taybetî jî rindbûn û ciwaniya keçên kurd, yekser li ruyên wan xwe nişan dide. Kinçêk hêsan li ser wan heye ku ev li bejna wan dihê, şûn û ciyên tijî û gilover ên laşên wan vedîşêre. Gelek jî li rû û gerden û qirikên wan dihê. Jinên kurd ne li heremê (enderûn) ne jî. Dikarin bi azadî li hespan siwarbin û bêyî şermîniyek hevaltiya peyayên biyanî jî bikin. Tenê kurdên dewlemend û gîrgire dikarin xwediyê çend jinan bin. Gava şerbaz û goran eger bikanbin ji xwe re jinek tenê jî bikin û bihênin û bibin xwediyê zaroyan, hingê xwe geş û dilxweş dibînin.

Moltke dibêje min jinên kurd dîtin ku di pozên wan de gustîl hebûn û gelek xemilandinên perpeliyê li ber porên wan bûn. Thielman jî dibêje awayê ruyên lihev û gir ên jinên kurd, ên li hêla Ecemistanê ne wekî ruyên jinên kurd ên li hêla Tirkîyê bi deqkirinê ve hatine xerabkirin. Kar û karguzeriya jinên kurd her dem lênihêrîna dewaran, li ser tevnê rûniştin û rêstin e. Peyayên xort jî kar û karguzeriya wan lênihêrîna pezan û li dû nêçîra lawir û sewaleka têgoşt in.

Jina kurd her weke jinên tirkman û bi teyayî jî her weke jinên koçeran, di nav jêhatîbûn û kêrhatîbûneke hêja de xwe dilivîne. Vambery dibêje jinên kurd zaro li piştê, mih û bizinan didoşe, gore dirêse, hespê peyayê xwe amade dîke, çeka wî dimale û carinan jî xavika wî ya jî paçikên dirêj jê re li serê wî digerîne û girê dide. Di baran û berfê de, di bahoz û tofanê de, di germayiya tavê de yê bi liv û lebat her dem jina kurd e. Ew her dem endama bi liv û lebat a malbata xwe ye. Lê belê ne gelek nix û qiymeta wê dihê girtin. Gava jî ber karê malîştina malê, amadekirina xwarin û vexwarinê bêzar û jarketî be jî, dîsa bi serberjêriyêke dîl û êsîriyê li civata peyayan dinihêre ku çawa zikên xwe têr dikin. Lewra yên jin divê xwezî û qiyma xwe tenê bi yên berma û avrûya peyayan bihênin. Belê deyx û sebra jineke koçer bêsaloxdan e.

Kurd di navbera xwe de jî farisan kêmtir bêjok û gotinpir in. Lê belê, kenekî wan ê xav û dengbilind heye ku dema li ser riyêke rastê hev werin dikarin li ser hev rakin. Ew, lê bi piranî jî jinên wan jî govend û awaza muzîkê hez dikin. Hemû govendên rohelatê xwedî yek karakter in û jî demên kevnare mane. Govenda kurdî ya bi navê çopî yan jî govenda glover her cûreyeka qulupandî yên govendên grekî yên bi navê sîrto yan jî romayikan e. Lê belê yên kurdî şêntir in. Rich di civata şahiya jinanînekê (zewacê) de, di form û awaya xwe ya herî berdayî de, li ber dengên bilind ên dehol û zirnan de, gerandina vê govendê dîtiye. Di vê govendê de govendger bi rêzê destên xwe li hev dixin, laşê canê xwe dilerizînin û lingê xwe li erdê dixin. Pê re jî bi dengê bilind bangêk dikin. Pêşî peya jî govendê derdikevin û vêca dibe dora jinên ku kinc û cilên hevrişîmî li ber xwe kirine, bi zêrên gloverî xwe xemilandine û çî pûşî li ser ruyên wan nine. Pê re jî xwe di nav gera govendê de gelekî hêsan û spehî dilivînin.

Bi evîna xwe ya jî muzîkê re, dest bi pîfa ew bilûra xwe ya dengnêr û awazxweş dikin. Heya wan stranên wan ên kûvî jî, ku pîrî caran bi koro dibêjin bi rastî gelekî hezkirî ye.

Li cem muzîk û stranên, helbest jî xwedî cîyêke diyar e. Helbesta kurdî ewçend ne hatiye naskirin lê belê dîsa jî helbesta kurdî nişana berfirehbûna hezkirina ferhengê û rêzgirtina wê mîna diyariyêke hêja nişan dide.

Zimanê kurdan tenê devkî ye, anku ne nivîskî. Di nava kurdan de nivîsên ku hatine naskirin farisî yan jî tirkî ye. Zimanê wan xwedî gelek devokan e, ku hemû jî yan jî saxê zimanê farisî yan jî yê tirkî ne. Sedema vê yekê jî ew e ku pêşveçûna zimanê kurdî di nebûna zimanekî nivîskî de ye û di rûxanbûna rewşa eşayirî de ye. Van her du xalên dawîn ku me nimandin, girêdan û nêzikbûna wan a bi jî zimanê gelên cîran heye ku di zimanê kurdan de gelek gotinên erebî, tirkî suryanî û rûsî hene. Her wisa jî zimanê kurdî bi nêzikayiya xwe ya di warê rêzimanê farisî de xwedî li gotinên xwe derketiye. Deng û awaza devokên kurdî jî gelekî xav e, lê belê dîsa jî di nav dengên wan de çî dengên daketî û jî qiriqa kûr wekî di zimanên din ên asyayî de hene, di zimanê kurdan de nîne. Di warê taybetiyeta ziman jî, Rich dibêje jî zimanê eşayirî û goranan, zimanê gundiyan bêhtir nêzikê farisî ye. Her bi vî rengî jî di warê şarezabûniyê de gundî jî şerbazan berjortir in.

Di van çend dehsalên dawiyê de kurd hêdî hêdî ketine bindestê tirkan, lê belê bi tundî gelê kurd di bin dest de girtin diwar bûye. "Kurd li bizina kûvî diçe" got tirkê jî gerokê herî dawî nimandî re [Rich re]. "Yê dixwazê şîrê wê bidoşe, divê li dû wî jî ser zinarekî bazde ser zinarekî din. Û eger sultanê me jî nikare vê yekê bike, wisa xuya ye ku kurd xwe bi hêsanî jî nav lîstinê şiqitandîye." Li vê derê wateyêke (manayêke) kûr heye! "Şîrdotina gel û milletan" - ku her dem jêhatîbûna hikûmeta tirk e!

Her wekî diyar e ku kurd nahêlin şîra wan were dotin. Wekî serekên çerkezan, mîrên kurdan jî di kelehên kevin û asê de dijîn. Van kelehên li ser kop û ewçên (doruk) çiyayên herî bilind û bi dûman, mîna hêlinên eyloyan [qertel], bê rê û gihanek in. Mîr jî vê derê desthilatdariya xwe li nav welat belav dikin, êrişên xwe yên talankeriyê li ser nastoriyan û ermenên aşîtxwaz û karwan û rêviyan jî vê derê birêve dibin. Van kelehên asê gelek gelş li ber amanca berfirehbûna tirkan derxistiye û tirkan bi gelek êrişên leşkerî xwe li van kelehên ragirtine.

Li ber azadiyê kelebûn, jî bo cengê xwe nivîsandin û her çend erkên diwarên din ên ku tirkan jî bo kurdan ber bi pêş ve derdixin, li hember zextkarên tirkan li ba kurdan bûye sedema bêzî û nefreteke neteweyî ya kûr. Hetta ev bêzî, nefret û êş, di awazên stranên gelêriyên kurdî de jî xwe li derve dixê.

Her çend ku kurd musulmanên sunnî yên pêşde ne jî, divê dîsa li ber vê yekê bikevin ku jin û keçên wan mîna berdest û xulamên dihêtin birin. Li gora Quranê jî ev yek nerast e ku tenê yên bêbawerî dikarin bibin berdest û xulam. Li ba tirkan filehbûna yekî têrî berdest û xulamkirina wî dîke. Lê belê her dîsa tirk dikare jin û keçên hevbwermendên xwe yên çerkes û kurdan jî bike berdest û xulam. Çerkez ku zaroyên xwe difiroşin, zaroyên xwe mîna berdest û xulam dibînin. "Bila guneh li serê kolefiroş be!" dibêje musulmanê qenc û li ser pîr dîke û dibêje: "Em bêgav (meqbûr) in ku herema (enderûn) xwe her dem li piya bihêlin û jî lewre jî hemû riyên ku dihere jî bo vê amancê, qenc û baş in."

Tirk jî bo xulam û berdestên kurd ku jî xwe re bigirin, jî wan re dibêjin: "Çêrî seg bike jî bo ku tu baş lêdî û wî bikûjî!" Û ew ê ku tu dê wî bişelîni mîna "şeytanperestan" yan jî mîna mirovê bêbawerî û bêyîqanûn bi şewatê wî dax bike. Piştê gava mirov keça yê ketî jî xwe re mîna berdest bigire ev ne tawan (sûc) e. Li gor Von Lankenau, jina Umer Paşa ya pêşî, xenîmetek bû ku wî, jî sfereka xwe ya jî êrişa ser Kurdistanê jî xwe re hanîbû.

Ev kirinên hovane dibin sedema ku kurd nabin dostê Sultan. Alîkariya kurdan jî Sultan re, her dem alîkariyêke nerêkûpêk e. Lewra tenê xenîmetên gelekî dewlemend dikare wan jî bo şerê Sultan di nav refan de bigire. Eger niya berdeyamkirina şerî li ser navçeyê dijmin nebe û şerkerên alîkar ên kurd nikarin talanê bikin, hingê van komên şerker ên kurd yan diherin malê, yan jî eger dijminên wan di şer de serkeftî bin, dikarin derbasî hêla dijmin bi xwe jî bin. Di şerê sala 1877-78'ê de, gelek eşayirên kurd ên li hêla Tirkîyê piştî ketina Qersê jî ûrisan re gotin em amadeyê alîkarîkirina we ne. Heya di demên aşîyê de jî tîkiliyên di navbera hikûmeta tirk û kurdan de gelekî jihevketî ye. Di rewşa şer û nakokiyekî de, eger kurd dîsa xwar neçin û lîstin xerab nebe, yê pêşî desthilatî bigire dest, dilxweş e. Lewra hikûmeta tirk hiç tîkilê gelek eşayirên kurdan nabe û wan di cûreyek serbestiyê de dihêle.

Weke me got hikûmeta tirk, kurdan li gor daxwaziya xwe bi kar dihêne ku gava pêwîst be wan bi ser gelên cîranên wekî nastûrî, yezîdî û qizilbaşên serrakirî dihajo.



**HELBEST****HOZAN****HELBEST****HOZAN****HELBEST****Nameyek ji Şehîd re**

*Ey şehîd !  
çend bilind î !  
Ji çîyan bilintir î  
Ji pêlên deryan xurttir î  
Ji ezmanan bilintir î  
Tu çîqas bilind î...*

*Pozên çîyan  
Xwe bervî Te radikşînin  
Dixwazin ramûsin  
Ji ew eniya Te ya bilind  
Dixwazin hembêz bikin  
Ew sînga Te ya ji pesara  
Ku ji deşta Sirûcê berferihtir  
Da ku bi pêlên ala  
Di dest Te de li ba bikin  
Dilê xwe yê xemgîn  
Şa bikin*

*Lê mixabin, Ey Şehîd  
Çi carî nikarin  
bighên bilindiya Te ...*

*Hildikşim ser  
Pişta ezmanan  
Ewr û sayîyan  
Di bin xwe de  
Diperiqînim  
Hêrs û girra  
Tavan di nhêrim  
Û her zor û zehmetiyê dibînim  
Tenê ji bo ku  
Eniya Te  
Bi herdû lêvên xwe  
Yên qelişî ramûsim  
Da ku bibhîsim  
Lêdana dilê Te  
Û xuşe-xuşa xwîna  
Di damarên tede  
Tenê ji bo ku  
Li ber bejn û bala Te*


*Ya bilind li ser çok bibim...  
Lê mixabin, Ey Şehîd !  
Ez nikarin bighê  
Wê bilindiyê*

*Min çendîn dixwest  
Ez herdû zendên xwe  
li situyê Te bigerînim  
Û Te, bi gema yê hembêz bikim...*

*Li min bibore  
Li min bibexşe  
Ez naghê  
Tu pir bilind î  
Ta ku bighê  
Tenê divêt ku  
Şop û rêça Te bidomînim !*

**Dilbixwîn****Strana-PKK'ê**

*Hey PeKeKe, Hey PeKeKe!  
Karê me xebat û çek e.  
Hey teq û teq, hey teq û teq,  
Çare nîn e, tolê veke!*



*Kurdistan welatê me ye  
Millet hemû li pey te ye  
Hey teq û teq, hey teq û teq  
Me îro şoreşek heyê*

*Şev û rojê me xebat e  
Ser û malê me xelat e  
Hey teq û teq, hey teq û teq  
Me dîn û îman welat e*

*Hey PeKeKe û her PeKeKe  
Hey PeKeKe û her PeKeKe*

**Her Bijî APOyo!**

*Xebat û karên pîroz - Her Bijî APOyo!  
Serkeftina me Newroz - Her Bijî APOyo!  
Tu pilingê çîyan î - Her Bijî APOyo!  
Hawar î tu vedan - Her Bijî APOyo!*

*Hêviya me ye şoreş - Her Bijî APOyo!  
Cenga me ya coş e geş - Her Bijî APOyo!  
Dikîn ji bo Kurdistan - Her Bijî APOyo!  
Em dimirîn ji bo jîyan - Her Bijî APOyo!*

**Sipanê Şîşilî-1990****Eger Welat Rizgar Nebit**

*Eger welat rizgar nebit  
Dunya hemû malê te bit  
Dildarî qet nagihê serî  
Nadin me gulvîn û evîn  
Min vîn ji yarê xweş d'girt  
Min nezanî bê niştiman  
Ev çar sal in yar dûrketî  
Sed êş û kûrbirîn vebûn  
Xwe li min dipêçe rengê mor  
Ne min tenê pir dî stem  
Ma ta kengî ev rewş û jîn  
Dê sed hezar car kim tîfû  
Ji bo her kesî rûgeş bû ew  
Ta serxwebûnê nebînim  
Ger bizanim yek rê heyê  
Welat em paqij kin bi zor  
Li her der û cih wekhevî  
Ji nû ve em bêtirs bijîn  
Ji bo çûna buhuştê ger*

*Tim dê bijîm bê dost û yar  
Rûmet nade bê cih û war  
Her dem di dil da pêt û ar  
Dil dimîne l' çola beyar  
Lê bo welat nebûm şiyar  
Tim dê bijîm bê dost û yar  
Ji dil xweş tê qir û hewar  
Mirin li rojê hezar car  
Bêzar û dîl bindest û jar  
Milyonan wek min birîndar  
Bo min diyarî kin neyar?  
Li pelên dîroka gemar  
Ji bo min tenê bêbext û har  
Tim zivistan im bê bihar  
Ku em derînin koledar  
Ji rengê çewt û pîs û xwar  
Ronî be tev deşt û beyar  
Bi rastî em bibine vîndar  
Dawetê em deynin li dar*

**D. Hoşiyar**

## Têkoşera Botan

Binefşê Bêrîvanê

Rêberê şoreşvanê

Binefş çûye Botanê

Dergûşa Kurdistanê

Binefş çûye Cizîrê

Heyran çavê wê jîrê

Cizîr warê pîroz e

Ew lahdika Botanê

Giha Kaniya Qesara

Heval têne ji para

Zînê jê ra kir li-lî

Memê salix didanê

Mîrê Êzîn hilwestî

Lê pêrgînê rawestî

Hesen, Çeko bi hev ra

Silav, giram lêxistî

Birca Belek pir şa bû

Ronahî lê bela bû

Şahî kete meydanê

Bi hatina Mêvanê

Heyran çavê şepalê

Rahiştî tox û alê

Temen hîna biçûk e

Têkoşerê ciwanê

Dijmin hatî bi ser da

Ewê berik berdanê

Cizîr kirî seranser

Keleha berxwedanê

Bi şêranî û nebezî

Rawestayê l' meydanê

Tabûrek leşkerê tirk

Bi Binefşê nikanî

Heyran çavê pilingê

Zend li darê tîfingê

Cizîr kirî ser û bin

Têkoşîn e l' meydanê

Ev roj ketî dîrokê

Hêjatir e j' Yermokê

Ne pêwîst e bipirsîn

Banê Xanê dizanê

Dîrok tu rabe ser xwe

Serê xwe neke bere xwe

Şêra kurda bibîne

Dermakeve ji lanê

Heyran çavên Binefşê

Dest avêtî derefşê

Tevger gihand çî rewşê

Lehengê qehremanê

Perizadê firîştê

Ketî nava behîştê

Li ser ruyê siruştê

Ji bo me xweş nîşanê

Binefşa min Tu mizgîn

Navê Te naz û şêrîn

Navê te yê sêyemîn

Têkoşera Botanê

Xamevan

## Pêşmergeyên Welatê Min

Şervan in têkoşer in

Gemas in şoreşger in

Bi vê dozê bawer in

Tu car j' rê venager in

*Her sê rengên ala min  
Ew kesk û sor û zer in  
Pêşmergeyên welatê min  
Wek bahoz û bager in*

Gelê serê xwe hilda

Li rohilatê deng da

Nava cîhanê tev da

Xortino rabin em herin!

*Her sê rengên...*

Heyran çavên wan xortan

Qurban çavên wan dotan

Li vê herêma Botan

Hîmên dijmin tev sotan

*Her sê rengên...*

Li ser xaka Kurdistan

Têkoşînek bê westan

Top û mawzer di destan

Kurdino rabin raperin

*Her sê rengên...*

Heyran çavên pêşmergan

Rext û fişek li singan

Qurban çavên çelengan

Dest avêtin tîfingan!

*Her sê rengên...*

Li ser xaka Mîdîyan

Sêrt û Şax û baniyan

Dehl û bax û kaniyan

Tim lêxin pêşve herin



## Hawar

Serê çiyayê Cûdî tu raweste û binêr  
Axa welatê kurdan hemî ziv e û tev zêr

Ji wê dê tu dibînî Şernex û Zaxo û Cizîr  
Sed heyf û sed mixabin hemî bê hakim û mîr

Gulî, sindî, silopî weko eynê diyar e  
Bêspin Bêşêr û Hewlêr hatin bi yadigar e

Berde Dêrgul, Herekol, heta biçit Piştkever  
Tor û Şingar û Bêxêr Kela Memê beranber

Hemî qesta te dikin, ey Cûdiyê miradan  
Tu qiblegah î îro ji bo vî qewmê kurdan

Çendî xweş î, bilind î, Tu ey Çiyayê Cûdî  
Te çend nav û nîşan hişt ji bo vî qewmê kurdf

Bejna te bejna Zînê, mêranî wek Memê al  
Dinalim ser te îro, ji qehran bûme evdal

Taca serê te zêrîn, tu serbilindê Eyran  
Wextek hebî te zû da hemî ji bo te heyran

Heke nîzik heke dûr, weke Mekeh Medînê  
Ev jî cîhek muqeddes werin de em herînê

Ku roj hate rastê Te, heval heliv û stêr in  
Li vê rewş û xemla Te, hemî pêk ve dinhêrin

Selam û erzi hîmet ji bi Cûdî Nûh-nebî  
Tu misteheq î fexr î bibêjî ma kî hebî

Botî ji bo te dibêjît : Hero sed car ezbenî!  
Taqê eywana Kesra li pêş te her dikenî

M. E. Botî

Ji kovara HAWARê  
sal 1942



## SÊ KULM AX

- Bîranîna Ehmêdê Xanî

Sê kulm ax,  
sê kevîrên çûçkirî.  
Ez li wir bûm,  
Li nik te.  
Tu li wir bûyî,  
Li ber serê xwe  
Li ba xwe

Me l' hev nihêrî;  
Ne min tu dîtî,  
ne te ez...

Tiştêk hebû,  
Tiştêk negotî,  
Dî nav lêvên te,  
Bi sede-salan vaşartî,  
Û bi sede-salan girtî.

Belku sirra Zînê bû  
Bi sedan rûpel.  
Ne min prsî  
Ne jî te gotî...

Ew dîwarkê xerabeyî li ber  
Serê te;  
Xwe xwar kirî  
Li ser min û te;  
Dawşand toza li ser xwe  
Tiştêk hebû,  
Qet negotî.  
Ji sirra Zînê mezintir,  
Belku dîrok bû,  
Ew dîroka hilawistî,  
Daliqandî,  
Bi bend-bestî û qeydkirî...

Min ax mizda,

Gote: "Av!"  
Me li hev nihêrî,  
Ne min tu dîtî  
Ne te ez...

Tiştêk hebû,  
Tiştêk du felqe,  
Nîvî riziyayî, nîvî ew bû  
Ewê l' ser ziman  
Ewê negotî.  
Min'ê pirsîba  
Ji ber serê xwe,  
Tu rabûyî çûyî.

Bayê li wan da û hejyan  
Ewan kevîrên kevîran  
Tiştêk hebû,  
Ji min û jî te.  
Ji axê û jî kevîran  
Û jî dîwêr mazintir.  
Ew bû, ewê negotî,  
Ewê dî siya ewran de,  
Ewê bê av û bê tav,  
Ewê bê dê û bê bav,  
Sêwîkê li ber dîwaran.  
Ne min got kê ye,  
Ne te beyan kir...

Moza hingiv  
Xwe danî ser eniya min.  
Me li hev nihêrî.  
Ne min ew dîtî,  
Ne wê ez  
Destê min çû eniya min,  
Sîrek hênîk berba bû.  
Tiştêk hebû,  
Tiştêk negotî.  
Nîvî xwelî bû li ser rîya min.  
Nîvî ew bû.  
Ewê di kortala meteorê de,  
Ewê l' serê Agirî.  
Belku sira Memê bû,  
Belku jê mazintir.

Ez li wê bûm,  
Berxwedankar,  
Bi hêvî.  
Tu li wê bû,

Li ber serê min.  
Me l' hev nihêrî,  
Ne min tu dîtî  
Ne te ez.....

Tiştêk hebû  
Tiştêk nedîtî  
Belku jîyan bû  
Belku rabûn bû  
Belku mazintir.  
Ne min pirsî  
Ne te beyan kir...

Ronahiya hîvê , l' axê da.  
Berd û kevîr teyisîn.  
Ez li wê bûm, tu li wê bûyî  
Mem û Zîn hatin  
Li me nihêrîn , derbas bûn  
çûn.

Mem azad,  
Zîn serbilind û dilxweş bû.  
Me l' hev nihêrî,  
Te nava dilê min dît,  
Min dilê te.  
Tavê l' me da,  
Mûrî, dûpişk,  
Mar û mişk,  
Mişk û kîvroşk û roví  
Hemû çavên tarî  
Derhatin ji kunên xwe.  
Bê xew  
bê xwarin  
Bi kelegirî,  
Du morîkên çavên min,  
Axa zuwa şil kirin.  
Me li hev nihêrî  
Ne min tu dîtî  
Ne te ez....

Tiştêk hebû,  
Tiştêk negotî.  
Belku sira Siyabendî  
Belku ya Xecê.  
Belku jî qesîde bû.  
Qesîda Feqiyê Teyran,  
Ne min pirs kir  
Ne te beyan kir...

M. Bozan

## ZINDANÎ EJDEHAK

- Bo bîtekanî faşîzm

Ejdehak! Zindanî qela-qela ye  
Dîwarî konkîrê dergay pola ye

Ejdehak! Kunbir e sext e zindanî  
Narûşe be birben bendî giranî!

Hêztî leş mirêne kot û zencîrî  
Karî ye le damar nepakîy û bîrî

Dilreqt her law e çêşne sîza ye  
Bo bendî xawen, xoş exatekaye

Hênd çêş in serbir û zindanewanî  
Serxos in be xûnî gişt bendîyekanî

Ejdehak! Ey le bîr ziraw çû  
Ey naşray maranî, bêmêşîk kirdû

Ew mêşîk tazene y zencîrî kirdûn  
Le lêwî pêçalî mêrga ratgirtûn

Çawerê ferman in be rêy nehata  
Bîrêne bertenaf le nore w kata

Mêşîkyan amancyan hîwa w taseyan  
Le peta bitasê wek henaseyan

Belam to Ejdehak, le helpey xorak  
Natiwanî bikevî bo marî napak

Her egirî, ekujî, edey le gerdin  
Mêşîk derxward edey be marî newsîn

Ta rojê ew xûney be neheq rîştî  
Ew birey watzanî êcgarî kuştî

Taw eden tenûrî demarî Kawe  
Ew çakûş weşênêy rolekujrawe

Exiroşê w ecoşê komel yek exa  
Her hêsa w ebînî zindanî rûxa

Ew hele her lawe le zindan ta mird  
Ebête mayey bex bo netewey kurd

Le binkey peykerya enusrê nawî  
Le gel gişt kirdewey pesend kirawî

Goran (1904 - 1963)

Şarezor - 1953

# JI ROHILATA NAVÎN ÇEND TERAQÊN HINGIVÎN

## Resûl

### "MATMAZEL HEMED"

Li paytextê Sûriyê. Li bajarê Şamê, polîsekî trafikê dibîne ku keçikeke porzer otomobilekê dihajo.

Ji kêfa xwe, polîs wê dide rawestandî.

- Hop... hop! (Raweste... Raweste!)

Keçik, otomobîla xwe radiwestîne.

Polîsê ereb:

- Hewî tic! (Ka huviyeta te?)

Keçik bi zareke şêrîn:

- Tefeddel (Fermol) dibêje û huviyeta xwe didiyê.

Polîsê trafikê huviyeta wê digire destê xwe, ku bixwîne. Lê belê vajî digire destê xwe û lê dinihêre. Pê re jî, ji keçikê dipirse:

- Sişmiş? (Navê te çi ye?)

Hingê (wê demê), keçik tedi-gihîje (fam dike), ku polîs bixwadinê nizane. Ew jî dixwaze piçek henekan pê bike û bersiva xwe wisan dide:

- Matmazel Suso...

Polîs:

- Suso fehimit, bes şû me-nat matmazêl? (Min Suso fam kir, lê belê manaya Matmazel çi ye?)

Keçik:

- Matmazêl ya`nî badnî ma mutezewwic binit. (Matmazel yanê ez ne zewicî me û navê keçan e.)

Polîs:

- Haaaaaa!

Vêca keçik dipirse:

- Şû ismek? (Lê navê te çi ye?)

Polîsê trafikê dibêje:

- Anî ismî: **Matmazêl Hemed!** (Navê min jî Matmazêl Hemed e) dibêje.

### "EZO GELİN ÇORBASI"

Mele Elî û gundiye xwe, ji mal derdikevin û bi otobusê diçin Stanbolê. Demsala zivistanê ye, serma û baran e. Dema digihên Stanbolê, sibê zû, dema xwirîni û taştê ye. Gundiye Mele Elî dibêje:

- Mela, de ka em herine lo-qentê, xwarinekê bixwin!

Mela jî dibêje:

- Keremke em herin.

Diçin, li loqentê rûdinin. Garson ji wan dipirse:

- Ma hûnê çi bixwin?

Mele Elî û gundiye xwe di nava xwe de welê dibêjin:

- Ev loqenta Stanbolê ye. Pir buha û giran e. Peryên me pir tune ne. Em'ê şorbeyekê bixwin û hew. Ma ne welê?

Mele ji garson re dibêje:

- De ji me re şorbekî werîne!

Garson:

- Ma hûn çi şorbe dixwazin?

Gundî:

- Ma çend "çeşit" şorbeyên we hene?

Garson:

- "Îşkenbê çorbasi", "Terxana çorbasi", "Ayran çorbasi", "Mercîmek çorbasi", "Ezo gelîn çorbasi" dibêje.

Gundî dîsa dipirse:

- Mele ma, ne me yên dinê bihîstine? Lê ev "Ezo gelîn" çi ye gidî?

Mela jî dibêje:

- Eger em vê bixwazin, wê gelek perên me lê herin. Lê eger em nexwazin jî, hingê, ji me re wê bibe derd û miraq!

Garson li ser wan rawestiyaye û dipirse:

- Ma we çi qerar dan?

Gundî got:

- Hema du "Ez û Gelin" werî-

ne! Gava garson şorbeyên "Ezo Gelin" dihêne, mela û gundiye xwe dibinin, ku va ye şorbeya nîskê bi xwe ye!

Mela dibêje:

- Ma ev ne nîske kuro? Ev sih sal in ku em vî dixwin!

Li ser vê gotina gundî, li ser garson diqîre:

- Birazî! Me ne nîsk xwastiya! Me "Ez û Gelin" jî te xwastiya!

Garson jî dibêje:

- Welle, "Ezo Gelin" ev e!

### "BIL FRENSI"

Arasê xort bi bavê xwe re, li daîreyeka resmî, li ser kar û mûameleyeka xwemijûl in. Dema şirtayê (polîsê Sûriyê) daîreyê bi çêkirina karê Aras û bavê wî mijûl e, bavê Aras ji Arasî bi kurdî dipirse:

- Lawo, ma ev bêbav kengî karê me ji me re biqedîne?

Li ser van gotinên bavê Aras, şirta li Aras dinihêre û jê dipirse:

- Bi ey lîsan yehkî ebak?

(Bavê te bi kîjan zimanî dipeyivî)

Ji ber dagîrkeriya Suriyê li ser gel û welatê kurdan, Aras bi dilêşî û bi xemxurî ji bo vê pîrsê piçek bêdeng dimîne û paşê jî bi hêdîkan dibêje:

- Bil frensî. (Bi frensî)

Li ser vê bersiva Aras, şirta jî ji bavê Aras re gelekî qedr û qiymete nişan dide dibêje:

- Tefeddel, tefeddel. (Fermo, fermo) Û ciyê xwe nişanî wî dike û jê re çay û qehwe dixwaze...

### "ÎFADESÎ WARI"

Şeş meh bi piştî hatina cûntaya faşîsta tirk e. Polîsên siyasî, tev li teqiyeya komando, dihavêjin ser avahiyeke dewletê. Ji ber ku şopa şoreşgerê li wê derê dîtine û dixwazin wî bigirin.

Esker û polîs, berî ku bi çar-medorî dora avahiyê bigirin, Ezo xwe ji pencereya avahiyê ya tebeqa sisiyan dihavêje xwarê û bi lez û bez ji wê derê direve. Diçe, li ciyê karê xwe temaşe dike. Piştî ku asker-polîs, bêyî ku encam û netîceyek bi dest bixin, ji wê derê diçin. Ezoyê ku zemanek bi rêxistinek pir-xeberbêj û pir-întlektuell ve girêdayî bû, ji ber pasîf-ketina rêxistinawî ya ku hewla astengbûneke biçûçûkî jî li hevberî cûntaya faşîst nekiriye, pir li ber vê rewşê û li ber xwe dikeve. Lewra rêxistina wî, li gora bîr û baweriya şoreşgerî, dema cûnta hatiye ser textê dest-hilatdariyê, mîna ku ji cûntayê re li çepikan li çepikan dabe, çi berxwedanekê jî nekiriye. Ji xwe ew miroveke dilpak, dilgerm, xwîngerm û şoreşger e jî.

Berî ku ji şargeha xwe (ciyê ku xwe lê veşartîye) derkeve û ji wê derê here, dibîne ku va ye serokê sendîkata ciyê karê wî, di pêşiya 'bekçiyekî' (polîsên tirk ku kerket ji polîsên normal kêmtir xwedî erk û berpirsiyarî ne) bêdebançe de ye û diherin. Ew kesê bi 'bekçî' ew daye pêşiya xwe dibe, serokê 4500 karkeran e. Ezo rewşê dibîne û derdikeve pêşiya wan û bi kurdî û bi hêrs dibêje wan:

- Ha, xêr e? Hûn diherin ku?



Bekçî li ser vê pirsê, serê xwe radike û pozê xwe li hewa pik dike û bi tirkîyeke nêr û çirandî dibêje:

- **"İfadesî warr!"** (Anku divêt em li cem polis pirs jê bikin.)

Ezo tew guhê xwe nade 'bekçî' û li ser berpîrsiyarê sendîkatê (ku ji DDKD'ê ye, serokatiya 4500 karkerên şirketa dewletê ye) dizivire û bi rû û weceke tîrş û dîsan bi hêrs dibêje:

- Heval fedî ye, şerm e! 'Bekçiyekî' bêdebançe te dide pêşiya xwe, bi 4500 karkeran mîna bi segekî bileyize, dilîze! Ev çi bêbextî ye? Ev çi...

'Bekçî' gotinên Ezo bi hêrs dibire:

- **Hadê! İfadesî warr! Çaboq ol!** (De bilezîne! divêt tu li cem polis îfadeya xwe bidî!)

Ezo ku ji hatina ewçend polis û komandoyan, ji ber nepejirandina rewşeka wilo bêbextî dîrokî, bi vê hêrs û kelê, bi ser 'bekçî' de dizivire û bi kurdî li ser 'bekçî' wisan diqire:

- Bicehime, berî ku min ew şewqeya te çîr-çîr nekiriye û nekiriye wî devê te yê xwar! Hû... Hû...

'Bekçî' ji tîrsa canê xwe yê şêrîn, vêca bi lavayî dibêje:

- **"Oldî abê, Têbî abê!** Baş e keko... tamam keko!

## "HAZA SARIQ MOTOR SEYYARA, BA'DÛ ŞEXXALI"

Dema ku leşkerê Sûriyê ketibûn Libnanê û Beyrûd kiribûn binê kontrola xwe, hingê wela-tiyek libanî, bi otomobîla xwe ya bi marka VW (Volkswagen-otomobîla kôsî) ji ser riyekî kontrol-kirî re derbas dibe. Eskerên Sûriyê wî didin rawestandî. Huviyeta wî dixwazin. Libnanî huviyeta xwe dide wan. Piştî li hi-viyetê temaşe dikin, destê xwe li piştê "bagaja" otomobîla wî ya VW didin û dibêjin:

- **Iftex el bagaj!** (Bagajê veke!) Gava libnanî "bagajê", anku piştê otomobîla xwe vedike,

hingê esker bi carek lûleyên ti-fingên xwe rastî wî dikin û jê re dibêjin:

- **Imşî ya micrim!** (De we-re dizê heram!)

Mirovê feqîr, bi neçarî dide pêşiya wan û diherin. Ew eskerê ku jê re gotibû, "bagajê veke!" li rê welê diqire:

- **Tera enî kemaştû!** (Va ye min ew girt!)

Dema wî dibin cem efsere xwe, efsere diprise:

- **Şû zenbû hada?** (Wî çi kiriye?)

Esker jî dibêjin:

- **Hada sariq motor seyyara ba'dû şexxal!** (Wî motoreka otomobîlê diziye û motor di bagaja otomobîla wî de ye û hîna jî dişixule!)

## Fermana Melleyê Faris: "NİGEHDARI"

Melleyekî faris, piştî ketina şah, bi helikoptera xwe diçe teftîş û çavdêriyê. Dema ew li hewa ne, tiştêk diqewime û helikoptera wan dihêje. Melle ji vê yekê zaf ditirse. Li ser vê derhal ferman dide pilotê xwe û dibêje wî:

- **Nîgehdar... İst!** (Raweste!)

Pîlotê reben:

- **Men qebl ez der zemîn ne bûdem, nemîtevanem nîgeh darem!** (Eger em heya li erdê daneynin, ez nikarim li hewa rawestim!)

Melle hîna jî bi qêrîn:

- **Şoma der muqabeleyê qanûnê İslam serpiçî mîkonî? Aya şomamunafeq estî?** (Ma tu lu hevberî qanûnê İslam derdikevî? Ma tu munafiq î?)

Dema helikopter datîne erdê, pîlot ji ber vê "tewanê-sûcê" li ser fermana melleyê kevnepe-rest, dikeve ber gulle-baranê.

## "SÛ-BASMASIYA XANIYÊ MIN"

Sal 1981 e. Dagîrkerên tirk, zindanên xwe bi şoreşgeran Riya mehandin, helandin, teslîmbûnê, mukurandin û îxanetê spartine wan. Bi wî awayî dijmin, di kesa

niya van girtiyan de, vemirandina doza serxwebûna gelê me dabû pêşiya xwe.

Lê belê dîrok, van dijminên gelê me sûcdar û tewanbar... di rûçik û kesaniya law û keçên me yên li van zîndanên jî, serbilindî û rûmeta gelê me bigerdenazadî parast. Lewra law û keçên me di warê berxwedanê de, azmûneke (imtîthaneke) bêhempa li zîndan dan.

Weke me gotî, zîndan tîjî bûn. Sebrî jî, yek ji van girtiyan dema cûntayê bû. Ji ber endambûna nav PKK'ê dihat "sûcdar" kirin. "Wî nuh ji şikenceyê deranibûn û avêtibûn şikbeyê (koxuşê). Li erdê, jihvedeketî û bêzar, nivxewirî dirêjketî ye.

Piştî demekê, deriyê şikbeyaya wan dîsan vedibe û bi kulm û pehînan girtiyeke nûhatî dihavêjin hundirê wan. Ev kes serokê TOB-DERê, yê ji bajarekî Kurdistanê ye. Ji DDKD'ê ye.

Sebrî derdixînin û wî dibin şikenceyê. Saetek derbas nabe, dîsan wî dihênin û dihavêjin ciyê ku jê biribûn.

Hevalên girtî dixwazin alîkariya wî bikin, ku hebe birîn û êşa canê wî, bipêçin. Lewra çûye şikenceyê û hatiye. Paşê jî jê dipirsin, bê ka di şikenceyê de çi jê pirsîne û wî çi gotiye, yan ji çi ne gotiye.

Li ser pirsiyara girtiyan li şikbeyaya wî, welê dibêje:

- Belê, min kuştina du kesan qebûl kirin. Min debarê şikenceyê nekir û kuştina tirşikî û Apociyekî girt ser xwe. Tişt nabe! Bi çi awayî be, ez'ê paşê ji vê derê derkevim. Lewra min van tiştan ne kiriye.

Ew'ê tehqîqat bikin û paşê ji jî bêgaviye (mecbûrî) min berdî. Ji xwe ez "oritman" im (mamoste me). Eger van kuştinan li ser min îspat nekin, wê gavê maaşê min ji her meh li ser hev bicive. Ji xwe min "sûbasmasiya" (bingeha) xaniyê xwe jî lêkiriye û hema amade ye. Gava ez ji vê derkevim, ez'ê bi van pereyên xwe yên civandî, xaniyê xwe jî lêbikim.

Li ser van gotinan Sebrîyê niv-mirî, hêz û quwwetek di canê xwe de dibîne û bi lez û pele, xwe ji ciyê xwe hol dike û destê xwe dirêjî "oritman" dike. Her du destên xwe yên lerizandî dike qirika wî û diqire:

- Kê vî xulamokê kedxwaran aniye vê derê? Kê ev qewraş û newêrekê berdest haniye vê derê? Ev ne şoreşger e! Ev der ciyê şoreşgeran e! Wî ji vê derê bibin! Wî ji vê derê derxînin!

Qardiyan (guard) bi Sebrî û "oritman" dihesin. Sebrî, careka din digirin şikenceyê...

## "ŞU EŞACİR-I ENACİREYE QEND Û BEND

### EYLEDIM HİMARIM"

Dema sultanetiya osmaniyan, gundiyeke tirk, lawê xwe dişeyîne medreseya bajarekî mezin, weke bajarê Bûrsayê yan ji Stanbolê. Da ku lawê wî bixwîne û ji ilm û zanîna serdema xwe têbigihîje.

Lawê wî dihere li gora merc û nîrên wê demê xwandina xwe ya "tirkî" dike û dibe serfî. Rojekê vedigere gundê xwe. Dema digihîje nav gund, dema xutba nimêja îne ye. Divêt berî ku here malê, xwe bighîne xutba îne. Bi lez û pele kera xwe dihajo nav hewşa mizgeftê. Ji ber ku lez û pele kiriye, kera xwe bi awayekî sist -û-mist li dara hêjîrê ya li nîverasta hewşa mizgeftê girê dide. Nimêjê tamam dibe, lê ji ber ku ew xwandina medresê kiriye, nimêja xwe çiçekî (piçekî) dirêj dike.

Gava derdikeve der ve û dihere ber dara hêjîrê, dinihêre va ye kera wî wenda bûye! Xwedê bide! Kera wî ya bi dara hêjîrê ve sist girêdayî, xwe bi hêsanî ji hefsêr azad kiriye û çûye. Yan jî, yekî ji xwe re bi hêsanî kera wî girtiye û biriye. Li hewşa mizgeftê ji wî û ji çend sofiyên kal ên li ber berojka tavê pê ve kes nemaye. Berê xwe dide sofiyên kal û pîrsa kera xwe ji wan bi vê nolê dike:

- **Ey İxwanuddîn! Şû aşacîr-i enacîreye qend û bend eyledim**

himarim. Welakîn hal, eylemiş qend û bendinden xelas. Yuksek mazar-î alînzî oldû mû?

Sofî hemû bi devekî dibêjin:  
- El-fatîha!

## TE ÇEND KUŞTINE?

Badîn ji Kurdistanê hatiye û bextê siyasî ji welatê Swêdê xwastiye. Polîsên swêdî wî dane rûniştandinê û jê pirsan dikin.

Ji ber ku Badîn, ji navçeyeka têrşer (Botan) a welatê me hatiye, gelek kuştin û birîn dîtiye, lewra ev bûyer di hinde ciyan de, jê re gelekî normal e. Lewma hevalên wî yên ku li derbareye rewş û hoyên bextxwaziya siyasî de hinde agahdarî dane wî, jê re gotine, "Dema polîs ji te tişt pirsîn, ne bêje wan min kuştina mirov filan bêvan dîtiye ha! Ma ji xwe tu kesî nekuştîyî lê behsa kuştinan meke. Yan na bextxwaziya te napejirînin!" Badîn bi van agahdariyan li ber polîsan rûniştîye û polîs jê dipirse:

- Tu ji Kurdistanêyî, ne?  
- Belê ez benî.

Polîs li wergêrê (tercûmanê) xwe dinihêre û bi awayekî taybetî serê xwe dihejîne û paşê jî welê dipirse:

- Baş e, ma te çend mirov kuştine?

Badîn mirovekî dilvekirî ye û çîcar be, naxwaze di bin gotineke nerast de vezele. Lewma welê li polîs vedigerîne:

- Birako, tu bibêjî deh, hema ezê bibêjim dindik e! Piştî wergêr dizivirîne, polîs:

- Rast?

Badîn lê vedigerîne:

- Rast lê!

Paşê bi her du destên xwe jî nîşan dide ku çawa mirovan kuştîye û dibêje:

- Min kêrê da ser ustiyên wan û min ew mîna mih û berxan, gurandin!

Polîs têdighîje ku Badîn ji wê pirsar wî ya kuştinê dilteng bûye. Lê belê dîsan jî weha dipirse:

- Ma mirovên wekî te qenc û rind, hiç hemneşînên xwe dikuje? Ma ne divê em wekî mirovan bijîn?

Badîn li wergêr vedigere û bersiv dide:

- Birako... jê re bibêje; ez bi te re me. Lê jê jî bipirse û bibêje: Eger hêz û quwweteke biyanî bikeve nav welatê te û ev hêza biyanî, hemû fabrîqe û kargehên te, bajar û gundên te yên wisan delal bike bin destên xwe, mirov û însanên te mîna pez û sewalan bihajo û şikenceyên kesnedîtî bi wan bik, ma hingê tu kesî nekuji?

Bersiva polîs:

- Ew ji bêgaviyê (ji mecbûriyetê) ye!

Badîn:

- Ma yê mi ji çi ye... ma qey ji kêfê ye?

## "SMORGOS"

Kurdekî li cem swêdiyekî mirîşkek sorkirî (qemirandî) dixwe. Hingî birçî bûye, carinan hestiyên mirîşkê jî, di berdananê (diranên) xwe de dikirîtîne û dixwe.

Dema keçik vê dibîne, ji wî welê dipirse:

- Rebeno ma te hestî jî xwar?

Li welatê we hûn ji segan re çî dihêlin?

Kurd dibêje:

- Smorgaos! (Nanerûn)

## ÇÊLEKA

### BAVÊ MIHEME

Rojekê bavê Miheme mangeya xwe ya pîr, dibe bazara dewaran ku bifiroşe. Ji ber ku cûntaya tirkên li Miheme digere û ji bo derbasbûna binxetê (Sûriyê). pere ji Miheme re divêtu ku bide qaçaqxçiyar, ji bo ku wî derbasê binxetê bikin.. Lê belê jî ser çûn û hatina bazara dewaran mehek jî derbas dibe, dîsan jî mangeya pîr nayê firotan. Her cambazên dewar û pêzî ku dihen li mangê dinihêrin, devê wê jî hev dikin û ji botêgihîştina temenê (emrê) wê, li dinanên wê dinihêrin, paşê wê nakirin û diherin.

Vêca hingî pir li dinanên mangeyê dinhêrin, rojên dawiyê dema cambaz nêzî mangê dibin, mange bi xwe devê xwe vedike û dinanên xwe nîşanê cambazan dide!

## "EGER HÛN EV MÊR BÛN, ÇIMA HÛN KETIN NAV VÎ KARÎ?"

Hevalê Miheme Ado, ji dayi-na pesnên xwe gelekî kêfxweş dibû. Miheme vê yekê baş dizanîbû. Dîsan rojekê li qehwexanê li cem hevalan bi hev re rûniştibûn. Miheme dest bi çirokên "mêrxasîyên" Ado kir. Yek, dido, sidê... Ado pê gelekî kêfxweş dibû. Singa xwe bilind dikir û hilmên kûr li cigareya xwe dida, xwe pik dikir. Bi carekê Miheme pirsî:

- Ma hûn dizanin çima dema çatişma (musadereya) li hevberî polîsan bûbû, Ado ji ber polîsan reviya bû?

Li ser vê pirsê Ado, ruyê xwe tîrş kir û mîna ku Miheme bikuje bi bêbextî li Miheme nihêrî. Lewra baş dizanibû ku dê Miheme ji hevalan re çêl û behsa çî bikira! Adoyê ku li ber pesnan bêdeng û xwoşnûd bû, vêca bi tûjî:

- Lawo eyb e, nebêje, bi şeref emê hevdu rezîl bikin!

Gefan da Miheme. Lê, serê Miheme jêbûbûya jî, dê dîsan ji hevalan re çêla qewimandina Ado bikira. Li ber protestoyên Ado, welê berdeyam kir:

Rojekê vî hevalê me yê Ado û çend hevalên wî, bi polîsan re dikevin nav musaderê!

Ado hez ji destpêkê kir. Lewra bi polîsan re ketina nav musaderê bi rastî jî mîrani ye. Lê belê Adoyê me, ji dawîya çîrokê mîna ku cin ji hesin bitirsîya, ditirsîya. Lewma car caran bi kel û hêrseke mazin, gotina Miheme dibirî û digot:

- De bes e! Ev çî qeşmerî ye? Ma tiştêkî dinê tunebû te çêlê bikira.

Guhdar jî, ji ber şermê nedigotin, "De Miheme, de..." Lê pir dixwastin ku Miheme berdeyam bike. Li ser piştigirîya guhdaran Miheme hêz digirt û tevî kena xwe wisan berdeyam dikir:

- Vêca gulleyên (berikên) Ado wan feqîran nemabûn! Tedî, gelekî zor e.

Mirov bêgulle be û dijmin li ser pişt mirov be û divêtu ku tu berevî... Ado:

- Lawo, ax... off...

Miheme:

- Dest bi revê kirin!

Guhdar:

- Ha, ha, ha ,hî, hî, hî...

Miheme, bi berdeyamî:

- Polîsan dane ser pişt wan û wan û ew dest bi revê kirin...

Ado:

- Lawo bes e! Te em hetikan-din!

Miheme:

- Reviyan. Gava ji ber mala me re derbas bûn, diya min jî li ber derî bû. Ji ber dengê debançe û gulleyan, hesk di destê de, ji metbexê beziyabû hatibû ber derî, ku bibîne çî dibe çî diqewime. Bi carekê dît ku Ado û çend hevalên xwe ber bi mala me de direvin. Diya min li reva Ado û polîsan temaşê dikir. Berî ku polîs kuçe badin, Ado û hevalên xwe, dighên ber deriyê me.

Çav bi diya min dikevin. Ji diya min re lavayîya dikin dibêjin "me veşêre, polîs li ser pişt me ne!" Diya min di wê lez û peleyê de gumana şargehekê (ciyê veşartî) nake û ji wan re dibêje:

- De werine zû xwe têkin nav vê pîna (koxa) mirîşkan! De zû, de ha!

- Welle Ado û pênc hevalên xwe, çî gumanekî jî nakin û dikevî nav pînê. Lê pirin. Hemû naçin hundir. Diya min dibîne ku eger nelezînin, dê polîs werine hundir û bibînin ku va ye Ado û hevalên wî, xwe di nava pînê de vedîşêrin. Li hêlekî dibêje; "de lezkin!" Li hêla din jî heska destê xwe li qûna Ado û hevalên wî dixê û dibêje:

- Ma hûn ev mîr bûn, çima hûn ketin nav van îş û karan!

Ado, berî ku Miheme çiroka reva wî bibe serî, berî ku dawîya çîroka Miheme guhdar bike, ji wê derê çûbû jî. Gava çûyî jî, ji Miheme re gotibû:

- Kero tu bisekine! Ma ez û tu, emê paşê hev û du nebibînin?



# OZAL Û BUSH Û REAGAN

Kurdo

\* Berxwedana li zindanan, SERÎHILDANA li çiya, gund û bajarên Kurdistanê roj bi roj gurr û geştir dibe. Pêşmergeyên ARGK'ê kulmên ji pola li nav çavên dijmin û neyaran dixînin. Bingeha komara Tîrkiya faşîst dihejin. Tirs û xofên mazin difirînin cerg û dilên serok û serbazên ordiyên

Li ser vê yekê, serokwezîrê tirk Ozalê xwînmij û nêmmij, dikeve nav gumanan û rê û çareserkerînan digere, da ku SERÎHILDANA Gelê Kurdistanê bide rawestandî. Lewra, radi-be telefonêkî lêdide bavê kedxwar û xwînmijan, serokên Amerîka Bush û Reagan...

**OZAL :** Elo-Elo, serok Bush, serok Reagan!

**BUSH :** Belê, belê, belê can...

**OZAL :** Di bextê Xwedê û di bextê we Em xulam û koleyên we Sed hewar û gazi ye Rêça rizgarî çi ye?

**BUSH :** Çi bûye, çi qewimiye? Ma hiş û aqilê te wenda bûye?

**OZAL :** Serok Bush, Ma hiş û aqil çine? Em nizanin çi bikine! Kurdan serê xwe hilandin Li zindan Li bajar û li gundan!

**BUSH :** Na! Kurdan serê xwe hildan?

**OZAL :** Erê, kurdan serê xwe hildan Jin û mîr, kal û pîr, keç û kur, biçûk û mezin! Tev de bi rext û tîfing in!

**BUSH :** Vêca kurd ji serê me kêmbûn Dema ew jî serê xwe hildin Mehmetçik li ser wan Bike şer û êrişên giran Bi kuştin û bi lêdan Bi sosret û hovîti Ya ku kesek nedîti Wan bigirin bikujin Biperçiqînin serên wan Wan bihavêjin bin lîngan Ku êdî kesek nebêje Kurd yan jî Kurdistan

**OZAL :** Serok Bush, serok Reagan!

Ew dem îro derbas bû  
Îsal ne weke par bû  
Xwendevan karker gundî  
Hemû bûne yek bendî  
Tirs û xof xistine dil  
Li me şikenandin pişt û mil  
Di nav refên AReGeKe  
Hemû bûne pêşmerge  
Dema dibin APO'ci  
Agir li me dirij!

Bush û Reagan jî dikevine nav seyr û ecêbmayîneke mazin. Dipirsin dibêjin: Çawan gelê kurd ji bo serxwebûnê dest dane hev? Ji Ozal re welê dibêjin:

**BUSH :** Ya rind û çê û ciwan  
Siyaset û xapandina kurdan  
Muzîk û zimanê kurdî  
Bila bêjin bi serbestî  
Emê xilasbin ji destên wan  
Dê raweste ev SERÎHILDAN!

**OZAL:** Mesele ne helbest, muzîk û ziman! Amanc e serxwebûn yan neman!

**BUSH :** Ev xeber hîç nexweş!  
Cîhan dikî gora reş!

- Gelî heval û hogiran!  
Eger em bi hev re bin  
û bidin hev destan  
Ne Bush û ne jî Reagan  
Dê bikaribin bidine rawestan  
Ev bergirî û berxwedan  
û ev rabûn û SERÎHILDAN!



Kovara ŞEWQA BERXWEDAN

Hejmara 13' emîn a kovara ŞEWQA BERXWEDANê giha destên me. Ev Kovar ji mehê carekê li zindana Diyarbêkrê derdikewe. Weke li ser berga Kovarê jî hatiye diyarkirin, kovareke mehane, ramiyarî, çandî û hunerî ye. Dûrîşma "Berxwedan Jiyan e!" dûrîşma Kovarê ye. Bêguman li zindanê derketina vê kovarê, derxistina Wê ya ji hêla dîl û girtiyên cengê ve, xwedî wateyeke (manayeke) mazin û giran e.

Bi pêşdeçûna têkoşîna rizgariya gelê me, çand û toreya me gelî jî, bi vê domana pêşketî re rê digire û bi paraleliya têkoşîna şoreşa Kurdistanê, ji doman û qonaxên dîrokî ve derbas dibe û roj bi roj pêşve diçe. Ev pêşketin di zindanên reş û tarî de be jî, dê dîsan bibe.

Heya neha mişe pirtûk û kovar li ser jiyana li zindanê derketibe jî, dîsan jî ew bersiva pêdivîtiyê û pêwîstiya naskirin û jêfêrbûna ho û ûştên jiyana û berxwedana zindanî nikaribûne bi giştî bidine ber çavan. Lewra ew bergirî û berxwedana dîl û girtiyên cenga serxwebûn û azadiya gelê me, bi hezaran ji pirtûk û kovaran re dikare bibe babet û nave-rok. Lê van hezarên kovar û pirtûkan, dîsan jî nikarin ew bergirî û berxwedanên lehengane û qehremane bi tevayî bihênine ser zimên.

Bi berzbûna têkoşîna rizgariya netewî û bi rabûn û serîkişandina rêberiyeka bi sedan salan çaverêkirî, dijmin bi hemû hêz û hebûnên xwe, xwe da ber singa vê tîrêja hêviyê ku wê vemirîne û wê ji kok û binyadê hilbikişîne. Bi rabûna vê pêlê, dijmin, bi dehan hezaran jlaw û keçên gelê me kire nava dest û lepên xwe ku di kesaniya wan de, ew bergirî û berxwedana li çiya û gund û bajarên Kurdistanê biceribîne bide rawestandî. Lê, ew zinda-

## KOVAREK JI NAVTARIYA ZINDANA DAGÎRKERAN

# ŞEWQA BERXWEDAN

nên kor û tarî, bi berxwedana law û keçên leheng, bûne ewça herî rohiya têkoşîn û berxwedana gelî. Dijmin li ber vê rewşê kete nav seyr û ecêbmayneke kûr û jî hêl û taybetiyên gelê kurd, hêleke din a qehremaniyê jî xwe re di guhên xwe de kire guhar.

Dijminê faşîst û hov û har, dixwast rejîmeke tarî û hovîtiyê bi gelê me bide pejirandin. Dengê berxwedanê herî zû ji zindanan, ji dîl û girtiyên cengê derhat û her çû bilind bû ev deng. Zindanên dijminan bi berxwedana law û keçên me yên egîd û dilsoz, bûne keleheke herî tund ên şoreşê. Di van zindanan de gelek şoreşger û egîden gelê kurd, bi xwîn û canê xwe, çiraya şoreşa Kurdistanê veketî hiştin û nehiştin ev çiraya hêviyê vemire. Îro ev çiraya hêviyê şewq û ronahiya xwe dide çaraliyên Kurdistanê û ne hindik ji çarmedora cîhanê... Îro jî, ev bergirî û hilawistina li hevberî dijminan, bêrawestan û bi tundî berdeewam e. Li zindanên dijminên dagîrker, berxwedan bi her cûreyî li dar e.

Kovara ŞEWQA BERXWEDANê berhemke berxwedanê ye. Berxwedana ew şoreşgerên ku di herî pêşiya çeper û kozikên têkoşînê de, sing li hemû babet şer û êrişên dijminî vekirine, têdikoşin.

Sala çûyî jî kovareke zaroyan, ji hêla girtiyên zindana li Rûhayê hatibû derxistin. Dijminên dagîrker wan girtiyên ku Kovarê derxistibûn, ajotin û ew li gelek zindanên din belav kirin. Lê tuar nikarin bighên ew armancên xwe yên pîs û kirêt. Berxwedanên li zindanan îro bi kelepora hêza têkoşîna xwe ya rojên berê û her bi cûreyên têkoşînên nuh ve xurtir û geştir dibin.

Di kovara ŞEWQA BERXWEDANê de, li nik mişe nivîsarên ramiyarî, nivîsên çandî û torevanî jî rêzbûyî ne. Yek ji van nivîsarên çandî û torevaniyê, ji hêla HÊLÛN û BÊMAL'ê ve bi navê "XEMÊN ESTETÎKÎ" (Estetik Kaygilar) hatiye amade û belavkirin. Me pişkek ji vê nivîsarê (rûpel 69-70) ji zimanê tirkî, wergerande ser zimanê kurdî û li vê derê jî xwendevanên REWŞENê re diguhezin:

"Di vê gehîneka têkoşîna me de, li hevberî dijmin bi karanîna navgînên (wasitayên) weke

ramiyarî, leşkerî, pêdivî û pêwîst e, ku em navgînên hunermendiyê jî bi kar werînin. Ji bo derêxistina rindbûn û ciwaniya têkoşîna me ber bi ronahiya rojê, ji boji girsan re pêşkêşkirina rewş û pergala nakokiyên li welatê me, ji bo bi naskirindana rewş û awayên kategoriya hunera li welatê me, navgînên huner û hunermediyê, ji bo me gelek derefet û mecalan peyda dikin. Ji bo nixandina van derefet û mecalan, di rewşa zindanê ya azad de, dê bibe sedema afirandina gelek xebat û kêferatên gelekî giranbûna. Gelek heval û hevreyên me yên ku bi vê rewşê dizanin, xwe li vê qadê ragirtine û dest pêkirine ku bi zimanê navgîna hunermendiyê, ew rûdan û bûyerên ku di têkoşîna me de rû didin, bihênine ser zimên. Ev cûreya xebatê ku ji me re gelekî nuh û taze ye, bi xwe re hinde kêmasî û şaşî jî nişan didine. Ev rewşa ku di vê gehînekê de xwe bi siruştî diyar dide, ne ji ew gelşên bêçareserîkirinî ne. Divê em gav ji ser vê gelşê bihavêjin û ev tişt di nava derefet û karînen me de ye. Hindek vekolîn, hindek zanyarî, dê bikaribe bibe sedema afirandin û derhanîna xebat û karguzeriyên ku her rojên were dibine xwedî nix û hêjayiyên bêhtir û bêhtir.

Belê, xema me, xema beşdarbûna nav têkoşîna rizgariya welatê me, xema ji bo vê yekê bûna can û xwîn e. Dema em ew berhemên çandî yên ku li hevberî bangêşî û propagandaya nijadperest û dagîrkeran, li hevberî rewşa înkâr û wendakirina hebûna welatê me, ji bo nişandana rastî û bidadbûna têkoşîna me, ji bo hebûn û xurtbûna baweriyaya me ya bi serkeftinê, em dihênin ziman, dadihênin holê, yan jî em ji bo vê yekê di vî warî de hewl didin, hingê rastiya me bi awayekî serpilkî û xav were ser zimên, ev ne encameke baş e. Xebateka vê nolê, dê bibe xebateke yekalî û di domanekedirêj de, dê nikaribe bersiva bi bingehebûna têkoşîna me bihêne ser zimên. Ji ber vê sedemê ye ku, divê em di kar û barên xwe yên hunerî de, ew xemên zanistîya estetîkî jî bixwin lewra ev zanistî, taybetiyên afirandina hunerî û çarçîva giştî ya xebata hunerî derdiêxe ber çavan."



# XAÇATÛR ABOVYAN Û PIRTÛKEKA WÎ YA BI NAVÊ "KURD-ÊZDÎ"

## B. Izet

Heya neha, li ser kurd û Kurdistanê, gelek nivîsevan, dîroknas, gerok û seyyahan, nivîs û berhem dane. Diyardana wan, bi tevayî ji bo me gelekî grîng e. Kurd û Kurdistan, bi çav û lêniherînen biyaniyan, çawa hatiye nixandî, ev ji bo me gelekî girîng û pêdivî ye. Ji hêla din ve jî, van vekolînan, bûne belge û ketine dîrokê. Bêguman, ew van berheman li gora zanîn û dîtina xwe, rêz kirine. Yek ji van nivîsevan û dîroknasan, Xaçatûr Abovyan e, ku li cem me kurdan, gelekî kêr hatiye naskirin. Abovyan, mîna mirovekî dost û hevalê gelên bindest, li gelsên herêmê temaşe kiriye û dagîrkeriya tirk û farsan, tawenber kiriye. Abovyan, di nav çarçîva dostaniya kurd û ermenan de, têkiliyên xwe yê germ, bi hoz û eşîrên kurdan çêkiriye. Li ser vê bîngê, li gelek navçeyên Kurdistanê, vekolînan çêkiriye. Encamên van vekolînan jî, pêşkêşî zanistgeh û unîversîteyên rojavayî kiriye.

Ji ber ku Wezîrê Eşo, di pêşgotina vê pirtûkê de, gelek bi berfirehî, li ser jiyana û xebata Abovyan rawestiyaye, li vê derê, em careka dinê, pêwîstiya bi hûrî û kûrî nasandina wî nabînin. Tiştê ku em li vê derê dixwazin berpêş bikin, li ser berhema wî ya, bi navê "Kurd-Êzdî" rawestî. Vekolîna wî ya li jor nimandî, bi şeweyeke kûr, li ser civata kurdan, li ser rabûn û rûniştina kurdan, li ser rewşa jinên kurdan û hwd e. Eger mirov, dema wê rojê bigire ber çavan, ku navgînên guhestinê (wasitayên bihevdugirêdanê), di navbera bajar û li ciyên rûniştinan, gelekî jar û kêr bûne, vî xebata wî, her çend xwedî hinek kêmasî û nerêkûpêkiyê be jî, dîsan xwedî cîyê bi nîrx û bûha ye. Çimku Abovyan, li Kurdistanê ge-niyaye û di cîh û dem de, bi nav û nişan, çav-dêriyên (observasyonên) xwe, diyar kiriye. Di hinde ciyan de, wekî dema li ser rewş û jiyana jinên kurdan nivîsandiyê, tê de gelek dîtînen rast û di cîh de diyar kiriye. Wekî din jî, li ser rewşa xort û ciwanên civata kurdan, heya li ser xwarin û vexwarina wan, li ser rewşa aboriya wan û hwd, bi berfirehî gelekî rawestiyaye. Lê belê, dema li ser ol û zimanê kurdan dipeyive, agahdariyên wî diyar e, ku kêr in. Dema li ser ola (dînê) Êzidî şirove dike, ola êzidiyan nikare bigihîjîne çavkaniya wê Zerdeşt û Zerdeştîyê. Radibe ola êzidiyî, nêzî Îslamiyê û bi taybetî jî, bêhtir ber bi nêzîkahiya filletiyê dikişîne. Abovyan kurdên êzidî di hêla netewî de, ji kurdan cuda nake.

Ziman, ferheng û rabûn-rûniştin û bajarvaniya wan yek e. Lê belê, ji hêla baweriya wan li ser ola êzidiyê, wisan kûr dike, ku dixwaze wan mîna civateke cihê nişan bide. Ola êzidî, olek nepenî (veşartî) ye. Ew, baweriya xwe, ji kesên derve re diyar û eşkere nakin. Abovyan, li vê derê xwastiye ji dostaniya wan gelek kelk û îstîfade wergire û bi yekê ev rewşa wan a nepenî, eşkere bike. Û wî, bawer kiriye, ku ew bi xwe, di her babet û meseleyên ola êzidiyî de şareza ye. Lê belê, baş bi ser ne ketiye. Di vî warî de, li ber tiştên rast, hinek tiştên nerast jî diyar kiriye. Olêzidîtiyê, ji bav û kalên kurdan yê herî kevin û kevnare maye. Hezar heyf û mixabin ku wekî esl û bîngê xwe ya berê ne maye û ji derve gelek posîde û hîkarî li ser çêbûne û ji riya xwe ya berê bi dûr ketiye. Dema Abovyan li ser ziman jî dipeyive, zara-vayên kurdî dijmêre, hingê tenê çêla kurmançî û zazakî dike. Diyar e, ku haya wî, ji kurdiya başûr ne bûye. Van kêmasiyên wî, girîngî û cîyê berhema wî nade wendakirin, lê belê, mirov nikare bibêje ku ev berhema wî, tenê birekê Kurdistanê digire nav xwe. Ev pirtûk ne berhemeka li ser teoriya dîrokî ye. Dîsan jî di babeta kok û binyada kurdan de, diyardanên rast jî kiriye. Lewra karibûye kurdan bi me-diyan ve girêbide. Hêla giraniya berhema wî li ser civata rojane ya kurdan bûye. Ji bo vê yekê tenê di çarçîva hoz û eşîrên kurdan de girtî maye. Dîsan jî, van agahdariyên wî, xwedî cîyê tek û enda ne. Çimku wî karek-tera civata kurd, detay û taybetiyên civata kurd ên gelekî helez (înteresant) derxistiyê ber çavan. Gelo wî xwastiye tenê li ser gelê kurd bi tevayî, yan jî bi giranî li ser hindek eşîrên kurd, ola û jiyana wan kurdan dîtîna xuya bike? Gelo dema unîversîte erk û delamete-ka vekolîne spartiyê ser wî, çî pirs ji wî kirine? Eger me bersiva vê pirsê zanibûya, emê baştir naveroka vekolîna wî şirove bikira. Vekolîn, bêhtir mîna vekolîneke sosyolojîkî xuya dike.

Di cîyêkî pirtûkê de, li ser rêbir û eşqiyabû-na hinek kurdan guftûgoyek ji Abovyan hatiye kirin û Wezîrê Eşo jî li ser şirove aniyê. Hindek gerok û seyyahên ewrûpî jî, li ser vê yekê nivîsandine û dixwazin kurdan ne wekî xwe, lê wekî rêbir û dizan, nişan bidin. Di serdemên kevin de, riya bazirgan, karwan û rêwiyan hemû rohilatê, ji Kurdistanê derbas dibûn. Wekî riya hevrişimê û hwd. Bac û qemçûra



van rîyan, ji hêla tirk û farisan dihat xwarin. Eşîrên kurd, ên li wê herêmê, vê yekê ne dipejirandin. Ew jî dixwastin, otorîteya xwe ya li ser van rîyan welatê xwe, bidine nişandan. Gava gelên bindest serî hildidin, ji aliyê dethilatdar û dagîrkeran dibin rêbir, serbir û eşqîya. Lê belê gava ev gelên bindest bi ser jî dikevin, hingê dibin welat û desthilatî, bi fermanrewayî dihên naskirin. Ji bo nimûne, gava Napolyon dest bi şerê xwe kir û ajot ser Parîsê, pêşiyê jê re gotin eşqîya, nêzîkê Parîsê hat, jê re gotin general û gava Parîsê girt, jê re destan li hev dan û gotin serokkomar. Vêca eger heya kurd bi ser nekevin, wê ji wan re jî her dem bibêjin rêbir û eşqîya. Ji ber ku zend û qanûnên dagîrkeran, ji gelê bindest re çî parek ne hiştine. Em kurd jî wan zend û qanûnên dagîrkeran nas nakin û me xwe li hember girtiye û emê xwe li hember jî bigirin.

Abovyan wekî gelek ermenan kurdî jî fêr bûye û helbest û stranên gelek hêja û bi nîrx berhev kiriye. Û van staman ji resenî û orjînalî-teya xwe tiştêk wenda ne kirine. Giraniya ba-betên stran û awazan, li ser evîndarî, li ser jiyana û li ser şerên mêraniyê ne.

Pirtûkê ji zimanê ermenî hatiye zivirandin ser kurdî-îpên krîlîkî. Vî karî Wezîrê Eşo kiriye. Dr Şakîrê Xido jî, ji bo wê pêşgotineke dûr û dirêj nivîsandiyê. Dîsan ji hêla Dr Xido, karê redektekirina pirtûkê hatiye kirin. Ji hêla Prof. Heciyê Cindî jî kar û barên nivîsandin û rêzkirina pirtûkê hatiye kirin. Doçent Kinyazê Îbrahîm jî li ser sparteka filolkojîya berhemê rawestiyeye. Di vê domanê de jî pirtûk, di destê min de ye û ez hewil didim ku wê bi kurdiya îpên latînî ji bo xwendevanên kurd re amadeyê ber xwandinê bikim. ■

# BERXWEDANKARÎ Û GERDENAZADIYA

## Emê GOZÊ

### Û DU GOTIN LI SER

## Bişarê ÇETO

R. Dengîr

**"Emê Gozê Me  
Hûtê Beriyê Me  
Beranê Heriyê Me  
Bişar Xayino!  
Dest Li Gewriyê Me!"**

Dijminên kedxwar û dagîrker, di hemû war û deman de, li hevberî gelên bindest, li tenişta cenga xweya eşkere, cengeke "veşartî" û taybetî jî bi kar anîne. Weke îro gelekî zelal û diyar e, yek ji van şer û cengên "veşartî" û taybetî, ya bi navê "koy koruculugu", li hevberî gelê me yê bindest, pir aşîkar û vekirî hatiye kirin.

Di nav gelê me de, damezirandin û bicîhkirina sîstem û sazûmaniya çete-keleşiyê, mîna dîroka têkoşîna serxwebûn û azadiya gelê me, kevn e. Ji dema osmanîyan, bi taybetî jî, ji dema bicîhkirina rêxistina wan a leşkerî, ya bi navê "Hemîdiye Alayları", ji dema guherandinên wan ên bi navê "İttîhad ve Teraqî" û heya neha, ev doman û proses bi tundî berdewam e. Gelekî bêbextî bi destên "Hemîdiye Alayları" bi gelên kurd û ermen hatine kirin. Amanca dagîrkerî û talankeriya tirkên osmanî, bi danîn û damezirandina "Teşkilat-ı Meksûsa", (Organîzasyonê ku MIT jê çêbûye) hêj bêhtir pêşdebirina encamên rêxistina "Hemîdiye Alayları" bi xwe bû. Ya ku fermana fileh û ermenan rakiribû, ev rêxistina "parastina" dewleta tirk bi xwe bû. Ev rêxistina bi navê "Teşkilat-ı Meksûsa" xwedî hewildan û karguzariyeka welê bû, ku dixwest gelê kurd û ermen tevî hev ji ser ruyê erdê rabike. Ji bo vê yekê bû jî, ku ev rêxistin, pîlana kuştin û qirkirina ermen û kurdan xwe bi xwe, amade kiribû.

Neha jî, di sala 1985'ê de, dagîrkeriya tirk, dîsan xwast tiştekî welê li darxê û dîrokê dubare û tekerrur bike. Dagîrkeriya tirk, di sala 1985'ê de, li Kurdistanê dîsan xwast sîstemeka bêbextiyê biceribîne. Loma dagîrkeriya tirk ew bêbextiya bi navê "Koy korucu-

lugu" damezirand. Lêbelê vê carê ev merem û mebeste di qirika vê dagîrkeriya bêbext û dijûn de ma. Lewra dem ne ew dem, sal ne ew sal bû, ku êdî welatê me dîsan bê berxwedaneke yekmeji û dilsoz, mîna PKK'ê, bê karguzariyeka yekdest û hevbend, mîna ERNK'ê û bê cengeke yekdil û yekçek mîna ARGK'ê bû.

Îro van çekên gelê kurd, sîstema çete-keleşiyê, sîstema bi dijmin re hevxeberkarî û sîxuriyê, careke din êdî ranebe ser xwe, vemirandiyê û xweş kiriyê û kuştîye. Em êdî baş pê dizanin ku rabûna miriyên goran heye, lê rabûna sîstema çetekeleşiya li Kurdistanê tuneye.

Li Kurdistanê xelk, pîrî caran, kada Bişarê Çeto û li hember vî çetekeleşê jî, çêl û kada nebezi û mîrxasiya Emê GOZÊ ☆ dikir. Bişar, yek ji ew bêbext, xwefiroş û hevxeberkar û xulamên dagîrkeriya tirk bûye. Ew bêbextiya ku wî bi gelê xwe kiriyê, heya îro jî ku bi kêmanî 70-80 sal ji ser re derbas bûne jî, dîsan di nav gel de kad û çêl dibe. Gava ev

û Cemîlê Çeto bihîstibû. Lewra bûyer û qewimandina Emê GOZÊ, bûyer û qewimandineke gelekî mazin û watedar e li Kurdistanê. Gelek gund û bajarên Kurdistanê, van navan dinasin û Emê GOZÊ, mîrxas û nebezê gelek dil û mejiyên mîr û xweşkalemêrên dilsoz ên kurd e. Bi taybetî jî li tevayiya gundên hem li deştê û hem jî li gundên çiyayên Kurdistanê ev berxwedankarê dilsoz pir baş hatiye naskirin. Heya li bajarên Kurdistanê jî pir baş dihête naskirin. Lê belê ne weke li gundên Kurdistanê pir baş.

Me bi awayekî zelal û tîkuz, ciyê ceng û berxwedana Emê GOZÊ, sedema cenga Emê GOZÊ baş nizanibû. Lewra jiyana me kurdên li bajarên, ne mîna jiyana li gundan bû. Di warê çand û toreya kurdî de, gundên Kurdistanê bêguman ji bajarên cihêtir, xwedî ciyê taybetî ne. Li gundan, ji bajarên cihêtir rewşeke toreyîya kurdayetiyê heye. Ji ber sedema xwe ya siruştîya li bajarên tundbûna dagîrkeriya tirk, fars û ereban, li bajarên Kurdistanê hebûn û parastina nîrx û berhemên



*"Koy Korucu" yên dema E. GOZÊ*

bûyer mîna stran dihê ser ziman, ew xwefiroşiya wî ya bêbext, hîna jî, her roj binerd û binax dibe.

Dema em zaro bûn, mîna bi sedhezaran zaroyên kurd, me jî navê Emê GOZÊ, Bişar

toreyî û çandîya kurdî, jar û mesttir e. Eger em ji bo vê yekê nimûneyeke vekirî bidin; li gundan êvaran piştî şivê, dema civatên malbatê dicivin hev, hemû zaro û xort, guhên xwe didine serpêhatî, çîrok û serguzariyên (mace-




rayên) sere û mezinan. Ji wan fêrî gelekî tiştan dibin. Heta van salên dawiyê, li beşek mazin ên gundên Kurdistanê, radyo û televîzyona dagîrkeran tunebûn. Dema zaro û xort ên gundî, di civatan de dibûn guhdarên sere û mazinan, fêrî gelek tiştên xweş î kurdî dibûn. Ji bo nimûne yek ji van tiştê xweş, "serguzariya" lehengane ya Emê GOZÊ bi xwe ye. Lê em ên li bajarên, me çi dikir? Evaran yan me dersên xwe yê dibistanê çêdikir, yan jî havînan em li kolanan li ber ronahiya lampeya elektrîkê dileyistin û zivistanan jî em diçûn sînemayan û şevê jî reht dibûn û radiketîn. Herçî yê xort jî diçûn qehwexaneyan, fêrî lîstina qumarê dibûn. Van salên dawiyê jî, televîzyon demeka dirêj ji xortên me digirt û dibir. Carekê ji caran, yan kalemêrekî rîsipî, yan jî pîrejineka porsipî, ji gundan bibana mêhvanên me, wan piştî kirina gilî û gazindên pirs û problemên, ku axa û feodalan ji wan re derxistibûn, piştî wê, ji me re kad û çêla tiştêkî kurdî bikirana yan na. Li bajarên, ji bilî bi awayekî jar û mest mayina ziman, ji bilî rabûn û rûniştinên me yê kurdî, tiştê ku me bi navê çand û torevaniya kurdan werbigirta, hem û ev bûn.

Derbareyê Emê GOZÊ de, li bajarên, me ji bilî bêbextî û xulamtiya Bişar pêve, tiştêkî dinê ne bihîstibû û ne jî dizanibû. Heya carina, me digot qey Bişar û Cemîlê Çeto jî, li hevberî osmaniyan şer kirine. Lê belê li vir, dîsan egîdî û mêrxasî, tenê para Em bû. Me di ciyeka wê strana ku ji Apê Nûrî yê rîsipî bihîstibû, welê digot :

**"Emê GOZÊ me  
Hûtê beriyê me  
Beranê heriyê me  
Bişar xayino !  
Dest li gewriyê me!**

Strana Emê GOZÊ, bi şeweyeke têkuz nebe jî, ji hêla stranbêjekî dengixweş î kurdê Ermenistana Sovyetê hatiye lîlandin. Li gor muzîk û awaznasê kurd, Beşîrê Botanî navê wî stranbêjê dengixweş Şêroyê Biro ye. Lê gelekî heyf û mixabin ku ev stranbêj, vê strana dîrokî bi tevayîya bûyera stranê nastrê. Bi wî dengê xwe yê tîr û xweş, pahîzokê guhartiye û bi awayê heyranokê distrê û dilîfîne.

Strana bûyera Emê GOZÊ, di kovara Kamûran Elî Bedirxan, di kovara Roja Nû de, li du hejmar û ciyan hatiye nivîsîn. Di hejmarên 21 û 59'ê de. Ya di hejmarê 21'ê de, ji hêla kurdekî bi navê Ebdulhadî Mihemed hatiye nivîsandin, têde gelekî kêmasî hene. Di vê nivîsê de, stran bi xwe jî, bi navê Emê Ga zê hatiye navandin. Naveroka wê pir tevihev e.



Têde navên gelek nenas derbas dibin. Ji ber vê hindê ye ku me pêdivî ne dît, ku em careke din, vê strana li hejmar 21'ê, li vê derê biguhezin. Mirov her dikare van gotinan ji strana ku di hejmar 59'ê de, ji hêla kurdekî bi navê Ezîzê Merzika hatiye nivîsîn, jê re jî bibêje. Stran li vê derê jî, bi navê H emê Gozê hatiye navandin- ne wekî ku di nava gel de dihê strandin: *Emê GOZÊ*. Me bi şeweyeke têkuz, ne di kovara Hawarê (1-52) de û ne jî di kovara Ronahî'yê de, strana Emê GOZÊ dît. Lê belê me vê strana berxwedankarî, lehengi û dilsoziyê, bi şeweyeke tam têkuz nebe jî, dîsan nêzî rastiya dîroka wê lêgeriya û ji devê kurdekî ji herêma me ya BOTAN, bi navê Farûqê Dêrewerî, bihîst û li vê derê ji welatparêzên stranhez û berxwedanhez re pêşkêş dikin.

Em hêvîdar in ku avahiyên welatparêz ên hunermendiya kurdî, yê wekî HUNERKOM, vê xebata me, ji vê derê rahêjin û tevî gufte

gufte û bestaya wê, vê pahîzoka mardane bikine Operayeka berxwedankarî û lehengiyê û ji gelê me yê welatparêz re, bi şeweyeke geştir û ciwantir pêşkêş bikin. Yan jî operayeka welê, ji berxwedankar û şoreşgerê hemdem, ji EGÎD re amade bikin. Em dîsa bawer in ku dê bicihanîna xebateka vê nolê, di nav çarçîva gengazî û derefetên avahiyên weke HUNERKOMê de be. Lewra HUNERKOM ji wan avahiyên sexte û hevxeatkar ên weke avahiyên xulamokên kurd cihêtir, avahiyeke li ser nîrx û hêjayiyên têkoşîna rizgariya Kurdistanê hatiye avabûn û li ser vê bingehê li piya ye. Nîrx û berhemên HUNERKOMê, li ser xwîn û canê şehîd û xebatkarên vê têkoşîna pîroz ava dibe. HUNERKOM hewildar û karguzerê xebata hunera şoreşger û welatparêz e. Xebat û karguzeriya hunermendiya, ji bo pêşdebirina zanêbûna şoreşgeriyê di nava girsên gelî de, xwedî cih û giringiyeke taybetî ne.

# CENG Û BERXWEDANA EMÊ GOZÊ

Awaza stranê li deverên Botan:

PAHIZOKA DÉMANÎ

Awaza li deverên derveyî Botan:

HEYRANOK

*Bişar kire gazî got:*

*Emo lawo were rayê!*

*Eger tu têyî rayê were rayê,*

*Eger tu neyê rayê,*

*Qesem dikim bi navê Xudayê!*

*Min aniyê vê sibê alaya hikûmetê!*

*Bi Cemîlê Bira, Eliyê Yûnis*

*- Qewmê Çiyê*

*û Canbêzarê Deşta Mûşê!*

*Ma tu mar î,*

*ku tu bi erdê bidebirî?*

*Tu ne çûka ezmanan î tu bifirî!*

*Qet û bîlêh çi felata te*

*tunîne ji nav dest û lepên min el*

*Emê bersiv da û got bi mêranî:*

*Bişaro lawol!*

*Ez Emo me, Emê Gozê me*

*Ez fexê dê, beranê bavê me*

*Ez qisasê serê mêrê çê me*

*Tu dizanî ku kuştina min heyê*

*Lê tucar reva min tunîne!*

*Letê bi milletê!*

*Pêr û mêzîne me*

*Derketin ji qubletê*

*Şewq û şemala xwe avêtine*

*Benda benderê*

*Newqa bavê Şemseddîn el*

*Bişar dîsan bang dîke dibêje:*

*Emo ez Bişar im, Bişarê Çeto me!*

*Tu dizanî ku rizgarbûna te ji dest û lepên  
min tunîne!*

(Diya Emo bi wan dihesê)

*Gozê bang dîke û dibêje:*

*Emo lawol!*

*Tu vê sibê rabe*

*Derbekî berde bejn û bala Bişarê Çeto*

*û Bînbaşiyê Romê pê rel*

*Herçî nefîram e*

*Çavê malîya wan li rîya wan e*

*Ew gunê ne!*

*Eger tu vê sibê ranebî*

*derbekî bernedî bejn û bala Bişarê Çeto*

*û bînbaşiyê Romê pê rel*

*Bila ji heft rojan vê de*

*Şîrê pêsîra min*

*Li te jehr û heram bel*

*Bila hingê Şêrê Eskîfê*

*Ziyareta Qolî Babê, Şehîdê Zewê*

*Tev de bi urd û ucaxê te ve vedel!*

*Emo bi sê dangan dîke gazî û dibêje:*

*Gozelê lê dayê!*

*Ma tu nizanî ku ez Emo me?*

*Emê Gozê me*

*Fexê dê, beranê bavê me*

*Min sond xwariye bi sonda Qesem el*

*Ku kuştina lawê te Em heyê*

*Lê rewê wî tunîne!*

*Eger tu bawer nekî!*

*Va ye ji te re lingên min*

*Li qeydê ne!*

*Destên min li kalemçê ne!*

*û ustiyê min jî li lelê ye!*

*û eger tu dîsa bawer nekî!*

*Va ye mîfta qeydê, di birca odê de*

*Di bêrîka saqoyê xalê min ê*

*Hesenê Osmên de ye!*

*Bişar dîsa bang dîke, dibêje:*

*Emol!*

*Ji te re dibêjim, were rayê!*

*Tu têyî rayê were rayê*

*Tu neyê rayê*

*Nîn e çi felata tel!*

*Ji nav dest û lepên me*

*Li vê Dinyayê*

*Emo dîsan lê vedigerîne û dibêje:*

*Bişarol!*

*Ez Emo me, Emol!*

*Emê Gozê me*

*Ez ne yê zirt û forta me!*

*Here zirt û poyên xwe*

*Bike li kêleka tola jîna xwê!*

*Ma tu nizanî ku li ba me,*

*Gava şer û cenga giran be*

*Ku wekî li şahiyên dawetan*

*Bi heft def û heft zirnan*

*Bi kêf û şanazî ye*

*Bişar dîsan bang dîke û dibêje:*

*Emol! Tu têyî rayê were rayê*

*Eger tu neyê rayê*

*Ezê Qesra Baxemsê*

*Alîkê jêrîn têxime kadîna kayê*

*Alîkê jêrîn bikime tewilxane*

*Jî bo hespan el*

(☆) : Navê Em ji Umer'ê ji zimanê erebî hatiye: (Umer > Emo > Em). Navê Gozê jî, navê diya Emê bûye û ji navê kurdî, ji Gozelê hatiye: (Gozel > Gozê).

Emê GOZÊ ji êrdima Xerzan ji eşîra Mala Remo bû. Navê gundê Em, li herêma Qubînê / Bişêriyê (Beşîri), gundê / Qesra Baxemsê bûye. Emê Gozê li vî gundî xwediyê qesrekî bûye. Ji qesra wî re digotin, Qesra Baxemsê, yan jî Kelha Baxemsê. Ciyê ku lê ceng kiriye, navê wî ciyê jî: Kozîka Kolan bûye. Ev cih, li benda bendera gundê Baxemsê ye. Şêrê Bişarê Çeto bi Emê GOZÊ re, çend sal berî hatina rûsan ber bi kevîrê Qulê nêzîke bajarê Bedlîsê çêbûye. Rûsan berî şoreşa Çirîya yekem (Oktober) a sala 1917'yê, nêzî nivê bakura Kurdistan dagîr kiribûn. Hinde kurdên wê navçeyê ku beşdarê berxwedana li hevberî dagîrkeriya rûsan bûbûn, wan rojan wisa dihênin bi bîra xwe.

*" Ez bîm, Mico bî*

*Hes ma yê Kaposî bî*

*Dema Ūris hatibî*

*Li Geliyê Bilîsê-Li kevîrê Qulî*

*Tiqe-tiqe tifengan bî! "*

Sedema çêbûna şêrê Bişarê Çeto bi Emê GOZÊ re, dibêjin ji ber ve yekê jî bûye, ku Em mirovekî pir dîrast, durust û camêr bûye. Di ser de jî welatheziya wî ne hiştîye ku bibe çetekerê dijîman.

Bişar, ku bi xwe mîlîsê osmanî-çetekerê leşkerî bêbext û dijûn bûye, di navçeya Xerzan de ji ser xwe pêve mirov ne pejirandîye. Vê bêbextiya xwe jî bi alîkariya dewleta osmanî dikir. Bişar û Cemîl bi tenê nikaribûn bi Emê. Ew nikaribûn bi tenê li ber nebezî û mêraniya Emê rawestiyana. Lewma çûbûn alayeka leşkerî, leşkerê osmanî ya wekî xwe bêbext hanîbûn û tevî Cemîlê Bira, Eliyê Yûnis-Qewmê Çiyê û canbêzarê Deşta Mûşê (dibêjin piraniya van eşîran mîna "koy korucu" yê wê dema me, li ser kîsê osmaniyan, li ser gelê xwe mîlîsî û bêbextiyêke dîrokî dikirin. Lêbelê dîsan dibêjin ku ji nav van eşîran, eşîra Mala Eliyê Yûnis, her dem ne bi osmaniyan re bûne. Derbareyê ve yekê de Osman Sebrîyê xweşkalemêr, di pirtûka xwe ya bi navê 'Çar Leheng' de, kad û çêla çar mîrxasan dîke û li vê derê kada mîrxasiyêka Mala Eliyê Yûnis dîke. Dibêje ev mal gelek çaran li hevberî dewleta tirkan şer jî kirine. Dîsan Zinar Silopî (Qedîrî Cemîl Paşa) di pirtûka xwe ya bi navê 'Doza Kurdistan' de dibêje ku Mala Eliyê Yûnis di gelek şerên li hevberî dewleta tirk de cih girtine û helwêsteka (rawêzeka/tawîreka)



welatparêziyê nîşan dane) vana bi hev re çarmedora Qesra Baxemsê digirin. Bişar bang li Em dike ku li ber wî û dewleta bêbext a osmanî, serî biçimîne û xwe bispêre bextê van bêbextan. Tiştê ku ji Em dixwastin, wekî Bişarê Çeto pejrîrandina çetekerşiyê bû.

Lê belê gava dora Qesra Baxemsê-Kozika Kolan digirin û bang li Emo dikin û dibêjin were rayê (anku xwe bispêre bextê wan û serê xwe li ber wan biçimîne), Emo bersiva vê daxwaziya bêbext û kirêti bî gulleya ji lûleya tîfinga xwe dide û her çend tenê bi serê xwe mabe ji dîsan tiştêkî ji nebezî û mîrxasiya gelê kurd wenda nake. Piştî ceng û berxwedaneke dûr û dirêj, bi gulleyên dijminên dagîrkeran û hevxebarî û xulamokên wan dihê-te kuştin. Mala Emo talan dikin û zaroyên wî derdihênin meydana gund. Kurikê Emo (Şemsedîn) xuya nake.

Li ser vê yekê Bişar ji bînbashiya tirk re dibêje "ka kurê wî ne xuya ye!" Bînbashi ji jina Emo ji Melesê dipirse dibêje "ka kurê te li ku ye? Tu çima kurê xwe nahênî der?" Meles ji bo parastina kurê xwe Şemsedîn, dibêje "çi bi kurikê bûye ez pê nizanîm?"

Bînbashi jê re soz û peyman dide, dibêje: "Eger tu kurik werîni der, ezê nehêlim tiştêkî bi wî were!" Li ser vê bexta bînbashi, Meles kurik ji şargeha wî dihêne derve.

Vêca Bişarê çeto dike hawar û qîrîn û ji bînbashi re dibêje "Bavê wî alayeyekî pê nikaribû. Eger ev mazin bibe, dê du alayî pê nikaribin! Li ser van gotinên Bişarê xayin, kurik jî dikujin.

Em, strana Emê GOZÊ ku ji dengê stranbêjekî dengîxweşê kurdê ji Ermenistana Sovyetê hatiye strandin (Şeroyê Biro), li gora bûyerê diguherînin û li jêrê dinivîsin. Me guherandina stranê li gor rastî û reseniya bûyerê û qewimandina Emê GOZÊ pêdivî dît. Çimku di vê strana dengîxweş û muzîk û awazxweşa ku li nig kurdên Sovyetê hatiye lîlandin, heyf û mixabin li gora bûyerê, li gora çêl û kada ku li ser berxwedankarî û mîraniya Emê GOZÊ heye, xwedî şaşiyêke pir mazin e. Lewra di vê lîlandina ji hêla kurdê ji Sovyetê hatiye kirin, di benda dawiyê de, tiştêkî welê şaşî heye ku dibêje:

"Gozê kire gazî, got Emo lawo, bextê min û bavê min e ji te re werî rayê / Maqûlo bextê min û bavê min e ji te re tu werî rayê! / Ax de dibê tu tîyî rayê werî rayê / Eger tu nayê rayê Bişarê Sordeqê xwariye ordekê pê re / De lêlê... Ezê Kelha Baxemsê wisa bikim taxê jêrê tîxime kadîna kayê û taxê jorê ji mala kafirê Dîbo re tîxime ciyê çayê li wê qamê! "

Em dibînin ku di ew stranên Emê GOZÊ ku li ser zimanê gelî ne, tiştêkî welê nîn e. Di rastiyê de diya Emo welê dibêje:

"Emo lawo!  
Tu vê sibê rabe derbekî berde bejn û bala Bişarê Çeto û bînbashiya Romê pê re!  
(...)  
Eger tu vê sibê ranebî û derbekî bernedî bejn û bala Bişarê Çeto û Bînbashiya Romê pê re!  
Bila şîrê pêsîra min ji heft rojan vê de Li te jehr û heram be!  
Bila şêrê Eskîfê, ziyareta Qolî Babê û şehîdê Zêwê  
Bila bi urd û ucaxê te ve vede!"

Strana Emê GOZÊ ya ku li ba kurdên Ermenistana sovyetî hatiye strandin û ya ku me gelek caran ji Radyoya Kurdî ya li Erîvanê guhdarî kiriye, bi hemû bend û rêzên xwe ev in:

"De hayêê  
De hayêê  
Hêy de hayêê  
Hay de hayêê, hay de hayêê!  
Sîsilê digot Melesê dayê dayikê bila keziya min û te di dest min da bê oy oy  
Keziyê Diyarbekira sofî, li vê elemê mêzeke çawan bazdane (Canbêzarê) Deştî Mûşê Qeymaqama Zoqê û miclisê û dewletê...  
were li min dayê ooy, hêêw!

Howêêy!  
De dewrê, maqûlo ez bi heyrano ezê ramûsim her du çavayêê..  
De bûk û zaroyên min rebeno..  
Eskerê Brahîmê Aso hat û em helanîn ooy, hêêw  
û îşev ji êvar da, ser êla mala bavê min têda cara din serê têda..  
De hay de hayê  
Hay de hayê, hay de wayê, ooy..

Howêêy, de dibê  
Bişar kire gazî got Emo lawo Kolekê Kolan e, were der lêlê!  
Maqûlo dibê kolekê kolan e were der lêlê ooy Emo dibê; Ma lo Bişaro ezê dizanim Kolekê kolan e ez nayê der lê lê..  
Te ez kirime nemê e, Tu wê vê rabî di nava welat û eşîretê da  
Poyê xwe bidî û bêjî Emoyê Gozê ketiye ser vê riyê va ye direve ooy!  
Howêêy!

Ax de dibê  
Gozê kire gazî got Emo lawo bextê min û bavê min e ji te re tu werî rayê!  
Maqûlo dibê bextê min û bavê min e ji te re tu neyî rayê ooy!  
Ax de dibê gava tu neyê rayê, Bişarê Sordeqê xwariye ordekê pê re..  
De lê lê, dibêje ezê Kelha Baxemsê wisa bikim, taxê jêrê tîxime kadîna kayê  
Taxê jorê, ji mala kafirê Dîbo re tîxime ciyê çayê li wê qamê oy oy .."

TBN: Strana Emê GOZÊ ji bilî stranbêjê kurd ên li Sovyetê, ji hêla Îsa BERWARÎ, MIRADKO, Ebdilezîzê Mihê ji devera Botan û stranbêjekî aşûrî Pitris SINDÎ ji hatiye strandin.

### Fêhngoka Nivîsaran

Birêvebirin: îdarekirin  
Bûyer: Qewimandin, hedîse, waqîa  
Dagîrker: Kolonyalîst  
Daniştin: Celseya dadgehê, lihevrûniştin  
Dêmanî: Binecih, niştêcê, goran, ne koçer, yêku her dem li şûnewarek bi cihin.  
Dijwar: Zehmet  
Em/ Emo: Kurtkirina navê Umer e  
Ewç: Bilindtirin cih, [doruk]  
Encam: Netîce  
Guncandin: Girêdan, bestin  
Heyranok: Awaza stranagelêriya kurd  
Hevpeyvîn: Reportaj  
Hêz: Quwwet  
Jînenîgarî: Bîbîyografya  
Kafirê Dîbo: Serekê leşkerê tirkî bûye yan jî Îbrahîmê Aso ye  
Karguzerî: Aksiyon, çalakî, livbazî, emel  
Karguzarî: Jêhatîbûn  
Kêferat: Meşxele, mijûlbûn  
Li lêlê: li ber kindira dardekirinê, li ber hejandinê  
Nefîram: Nefer, esker  
Nirx: Qiymet  
Pahîzok: Awaza strana gelêriya kurd  
Po: Fort, fors, zirt  
Pêr û mêzîn: Komika stêrên 'pêr û mêzîn' li ezman  
Rewan: Herêk, zû  
Rewş: Weziyet  
Sizadan: Cezadan  
Sîsil: Navê keça Emê GOZÊ ye  
Sedem: Sebeb  
Taybetî: Hûsûsî  
Têbînî / TBN: Not, P.S.  
Tore: Edebiyat  
Wate: Mana  
Watedar: Manadar



## Bang

**Ji torevan, vekolîner, hunermend, dîroknas û zanyarên Kurdistanê re...**

Sernivîsariya kovara **REWŞENê**, bang li hemû hunermend, torevan, hozanvan û pisporên şaxên zanyariyê û rewşenbîrên welatparêzên Kurdistanê dike, ku bi nivîs û berhemên xwe, her weke nivîsarên xwe yê vekolîn, gotar, helbest, çîrok, wêne, stranan û hwd., têkilî karguzerî û bizava **REWŞENê** bibin. Da ku ev gula gulistana Kurdistanê, bêhtir têrav û têrreng bibe. Da ku bi dilevîndariyeke bêdawî û serteser geştir bibe.

Ew hevalbendiya ku em avahiya xwe li ser xurt dikin, bingeha welatparêzî û rizgarîvaniya netewa kurd e. Em'ê rêveçûna xwe ya rewşenbîriyê, bi canekî pak û şoreşgerî, bi rê ve bibin. Em'ê vê rêveçûnê, bigehînine roja serxwebûnê. Em'ê xameya xwe, ku li ser singa dagîrkeran dikole, di piştgirtina cenga netewa Kurdistanê de bi kar bihênin... Em'ê li gel hev programa rojpergala xwe, di her warî de xurttir û dewlemendtir bikin.

Kovara **REWŞENê**, ku dengê **Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan - YRWKê** ye, bi hêviyeke bilind berhemên we hambêz dike û di têkiliya we de xurtbûn û pêşveçûneke rizgariya netewî dibîne.

**REWŞEN**



YRWK

*Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan*

*Max Str. 50 - 52*

*5300 Bonn 1 / BRD*